

HEJMAR: 12 • SAL: 2021
• BIHAR •

Wêje û Rexne

KOVARA LÊKOLÎN, REXNE Û TEORÎYA WÊJEYÊ



WÊNEYÊ BERGÊ

Joan Miró, "Parler seul" (Bi tenê peyîvîn)

WÊJE Û REXNE

Kovara Şeş Mehane ya Lêkolîn, Rexne û Teorîya Wêjeyê
Weşana Demane (Du-demsalî)
Hejmar: 12 • Sal: 2021 • Bihar •

■
ISSN: 2148-2500

■
XWEDÎYÊ KOVARÊ: Mehmet Sebih Yoldaş

■
EDÎTOR: Davut Yeşilmen, Ömer Delikaya, Serdar Ay

■
LIJNEYA WEŞANÊ: Davut Yeşilmen, Serdar Ay, Ömer Delikaya,
Nurgül Ay, Sinan Gültekin, Nebîyê Dûro û Sîbel Er

■
RASTKIRIN: (Kurmancî û Zazakî): Nebîyê Dûro, Sîbel Er

■
ŞÊWIRMENDÊ HUNERÊ: Ömer Delikaya

■
KARÊN ABORÎ-TEKNÎKÎ: Bawer Berşev

■
BELAVKER: Pirtûka kurdî • <https://www.pirtukakurdi.com>

■
BERGSAZÎ: GRAFÎKURD

RÛPELSAZÎ: Ridwan Xelîl | ridwanxelil@gmail.com

■
TÊBINÎ: Mafê çapkirina nivîsaran, tenê di destê lijneya weşanê de ye. Lê nivîskar ji naveroka nivîsarên xwe berpîrsîyar in. Herweha nivîsên ku ji kovarê re têne şandin, neyêne weşandin ji li nivîskar nayêne vegerandin û bi şertê ku çavkanî bê nîşandan, jêgirtina ji kovarê serbest e.

■
ÇAPXANE: ALİOĞLU MATBAACILIK, Sertifika No: 11946, Orta Mh. Fatin Rüştü Sk. No: 1/3-A, Bayrampaşa/İstanbul Tel: 0212 612 95 59

■
ŞERTÊN ABONETIYÊ: Bihayê kovarê ₺15 ye. Ji bo Ewropa jî €15 ye. Abonetîya ji bo salekê ₺40 û ji bo Ewropayê €40 ye.

■
HESABÊ BANQEYÊ: İŞ BANKASI Diyarbakır 3. Sanayi Şubesi

Xwedî: Mehmet Sebih Yoldaş

Hesap No: 8306-0006720

Iban: TR19 0006 4000 0018 3060 0067 20

Swift/Bic: ISBKTRIS

Western Union: Mehmet Sebih Yoldaş

■
NAVNÎŞAN: Kooperatifler Mah. Akkoyunlu 4. Sk. Hukukçular Apt. No: 1, Yenişehir/DİYARBAKIR

■
Tel: 0533 307 5717

E-Mail: wejeurexne@gmail.com

facebook: wejerexne

skype: wejeurexne

twitter: wejeurexne

instagram: kovarawejeurexne

NAVEROK

- 004-005 Ji Edîtorîyê**
- 006-011 Serdar Ay**
Kovar: Der, Derdor, Tor
- 012-037 Jordi Tegel Gorgas**
Wegera Ji Fransî: Nebîyê Dûro
Pêwendîya Franko-Kurdî Li Lubnan û Surîyeyê (1930-1946)
û Bandora Wê Li Ser Avabûna Nasnameya Neteweyî Ya Kurdî
- 038-047 Dilawer Zeraq**
Wekî Şûngeha Dij-Mêtinger;
Gor Di Çîrokên "*Leylana Rastiyê*" û "*Li Goristaneke Amedê*" De
- 048-069 Zana Zengenî**
Ji Nifşê *Hawarê Şa'irekî* Nepenî: Xemgîn
- 070-086 Fîrat Aydinkaya**
Wegera Ji Tirkî: Sînan Gûltekîn
Di Derbareyê "Nameya Ji Rewşenbîrekî Kurd Bo Mustafa Kemalî" Da
- 087-099 Elîf Gun**
Ji Perspektîfa Rexneya Femînîst A Wêjeyî
Lêkolînek Li Ser Çîroka Nûredîn Zaza A Bî Navê "Gulê"
- 100-106 Serdar Ay**
Li Ser Sansûr û Sirgûnê Bi Yaqob Tilermenî Ra Hevpeyvîn
- 107-120 Merve Şivan**
Nêrîneke Rexneyî Li Ser Romana *Êvara Perwaneyê* Ya Bextîyar Elî
- 121-128 Elîf Gun**
Danasîna Çend Xebatên Di Derbarê Qonaxa Hawarê Da


JI EDÎTORÎYÊ

Xwendevanên wêje û rexneyê,

Em keyfxweş û bi coş in ku hejmara nû ya kovarê li ber destê we ye.

Wêje û Rexneyê di vê hejmarê da dosyeyeke li ser qonaxa Hawarê daye ber xwe. Nivîsa Serdar Ay li ser kovar û kovargerîyê disekine wek objeyeke lêkolînê. Ji ber ku *Hawar* berî her tiştî kovarek e û dîroka wêjeya kurdî tijî kovar e û bi wan e, nivîsa wî hewl dide ku girîngîya ji qama xwe mezintir a kovar û kovargerîyê, bo qada kurdî, bikirpîne. Lêkolînerê katalan Jordi Tejel Gorgas bala me dikişîne ser pêwendîya franko-kurdî ku girîngîyeye wê ya mezin heye bo hebûna *Hawarê* û asoya wê ya netewî. Nivîsa wî, ku ji hêla Nebîyê Dûro ve ji fransî hatiye wergerandin, alîkarîya wê yekê dike ji bo nasîna baştir ya *Hawarê*, pêşevanên wê û derdora wê di peywenda Sûrîya di bin desthilata mandaya fransî da. Nivîsa Dilawer Zeraq, "Gor"ê wek şûngeheke dij-mêtinger destnîşan dike di derdora du çîrokên ku di *Hawarê* da weşiyane. Zana Zengînî, bi nivîsa xwe ya balkêş ra, berê me dide ser nivîskarekî *Hawarê*, Xemgîn, ku heta niha nehatiye naskirin bi vê kovarê ra. Nivîsa Firat Aydinkaya, ku ji hêla Sînan Gültekin ve ji tirkî hatiye wergerandin, li ser nameya Celadet Bedirxanî diraweste ku bo Mustafa Kemalî hatibû nivîsandin. Me xwest em vê nivîsa girîng ji bo xwendevanên me yên ku bi tirkî nizanin ra wergerînin; divê bi taybetî em hesabê xwendevanên Rojava jî bikin êdî. Elîf Gun, di ser nêrîna rexneya femînîst a wêjeyî ra, çîroka Gulê a Nûredîn Zaza vediçirre. Dîsa, ew, bi nivîseke din ra, çend xebatên di derbarê qonaxa *Hawarê* da weşiyayî bi me dida nasîn. Bo ku em balê bikişînine ser pêla dawî ya sansûra li ser qada kurdî ya li Tirkîyeyê, û bandor û rengvedanên wê li ser nivîskarên kurdî, me hevpeyvînek bi Yaqob Tilermenî ra çêkir li ser sansûr û sirgûnê. Herweha, li derveyî dosyeyê, nivîsa Merve Şivan jî cih girtîye di vê hejmarê da ku bi nêrîneke rexneyî, me dadixe nava kûrayîya romana *Êvara Perwaneyê* ya Bextîyar Elî.

Heta hejmareke din, bimînin di nav wêje û rexneyê da.



KOVAR: DER, DARDOR, TOR

Wek objeyeke lêkolînê, kovar bi van taybetmedîyên xwe yê sereke ve berbiçav dibe di lîteratûrê da:

Wek rêzeke hem ji “lezgînîya” rojnamegerîyê û hem jî ji “dema dirêj” a pirtûkê cuda, kovar xwedî dem û rîtmeke xweser e.

Derek e ku dibe dardor, û lewra tor (dera bîrekê, demekê, dera têkîldarîyê, dera hilberînê û berbelavkirina hilberînê, dera xwe derbirînê).

Laboratuar an jî atolyaya fesilandina hin raman, helwest û daxwazan e, lewma laboratuara ceribandinan e ku tişt bi wan dicebirin.

Şahidîyek e ku gelek şahidên wê hene, ji ber ku her kovar xwe bi zanebûn li ber tiştêkî radike di demekê da û yan jî di deman da.

Fenomeneke civakî ye ku dewrdarîyê pêkan dike.

Hilgirtina kelecaniya çandî, hunerî, ramanî ku pirranîya caran ciwan, nîfşên nû tê da germ dibin û xwe li asoyên nû diqelibînin.

Kovar, enstitusyoneke mîkro ye.

Kovar dibistan e.

Kovargerî, ji xwezaya evîndarîyê ye ku dîdarîyan, bûyeran, bûyînan pêkan dike.

Kovargerî zindîbûn e; bi qasî ku em kovarekê bi rê ve dibin, difesilînin, berê wê didine bi vir û wir ve, ew jî me bi rê ve dibe, me difesilîne û berê me dide bi vir û wir ve. Ango “para wê ya jînê” heye ku ne hindik e.

Herwiha, Kovar diyalogekeke bi demê ra ye û lewma diyalogekeke bi der û dardorên demê ra ye jî. Ji ber ku kovar ji dînamîzmekê, sînerjîyekê, mebestêke nû, pêdevîyekê, nêrîneke nû, xîretekê, daxwazekê xwe li ber tiştêkî rakirinê diwelide, em dikarin bêjin her kovar mudaxileyek û bi awayekî ji awayan hewldana vekirina cihokeke cihê ye jî (pirranîya caran, li hemberî bawerî û qeheatên serdest bûyî û cih girtî, bi kok û şax bûyî. Ev yek, di xakên

bindest da, dibe berxwedan û serhildana li dijî desthilatdarîyê) ku ev yek di dîroka kovargerîyê da yek ji taybetmendîyên sereke ya kovarê ye ku sedema hebûna wê qayîm dike. Ji xwe, di dîroka kovargerîyê da, kevneşopa destpêkirina bi “manîfesto”yekê ve, vê rastîya kovarê pesend dike. Bi vî awayî, em dikarin bêjin ku yek ji taybetmendîyên din ên girîng ên kovarê xwezaya wê ya ji “qûtbûn”ê ye ku li ser bingehekî duhêl e; ji hundir ve û ji derve ve¹. Her kovar avakirina malekê ye ku “derve”ya wê û “hundir”ê wê heye. Icar, ev halê duhêl hem bi “qûtbûnek”e bi “derve” ve û hem jî bi “qûtbûnek”e bi “hundir” ve têkildar e. Ji ber ku ji her “mal”ê “cihêbûn” çêdibin. Bi vê xwezaya xwe ve kovar dera peqîna kanîyên nû ye.

Dîsa, wek ku hate gotin, her kovar derek e ku jê derdorek diwelide, û lewra torek e ku di dîyakronî û senkronîyê da, ew têkildarî hin derdorên din e. Ev rewşa têkildarîyê, ne bi tenê deqî ye û yan jî tekstuel e, ew “mirovî” ye jî. Ango kovarek hem derek û derdoreke tekstuel e û hem jî derek û derdoreke mirovî ye ku bi gelek der û derdorên din ra jî di têkilîyê(yan) da ye. Heger wiha be, bi qasî teksta ku di kovarê da weşîyaye, konteksta kovarê ku tê da derketîye jî girîng dibe ku ev bêhtir digihê hêla wê ya mirovî (civakî, hevaltî, sîyasî, bîrdozî, aborî û hwd.). Lewra, mirov dikare bêje ku her kovar der û derdorek e ku li dora wê gelek têkilîyên tekstî, mirovî,, sîyasî, ramanî, aborî, çandî, wêjeyî, zimanî û hwd. têne hunandin. Lewma, her kovar gelek girêk e di toreke xwedî gelek teybetmendî ya qadekê da.

Di vê çarçoveyê da, kovar wê derfetê dide ku em wê di berdewamîya dîroka dema qadekê da bi cih bikin. Berepaşkî û berepêşkî, em dikarin çibûn û çawabûna kovarekê bişopînin di demekê da, di berdewamîya demekê da: têkilîya(ên) wê bi kovarên din ra, bi derdorên din ra, nûya ku wê anî, teqla ku wê avet, girêka ku wê bi ser xist, yan jî tiştê ku wê dubare kir. Ango, ew derfeteke pirhêl e ku dibetîya naskirina berdewamîya (çandî, hunerî, zimanî, wêjeyî, sîyasî û hwd.) qadekê pêkan dike û di vê berdewamîyê da, derfeta selmandin û şopandina derz, qûtbûn, vebirrîn û hwd. jî çêdike. Bi vî awayî ew wekî avahîyeke, binyadeke mînor wê îmkanê dide me ku em bi çavekî din ê mîkroskopîk li dîrok û çandê binihêrin ku ev yek bêhtir ji bo qadên bindest û pêrîfêrîk derbasdar e. Lewra li van qadan, hêla sazûmanî, an jî em bêjin enstîtusîyonel qels e ji ber kiryarên desthilatên hegemonîk û despotîk². Ji

1 Hourmant, François, “De de la double nature des revues et des ruptures”, tê da François Hourmant, Jean Baudouin, Les revues et la dynamique des ruptures, Presses universitaires de da Rennes, 2007, rr. 11-20.

2 Boschetti, Anna, “Des revues et des hommes”, La Revue des revues, n°18, 1994, rr. 51-65; Domenache, Jean-Marie, “Entre le prophétie et le clérical”, La Revue des revues, n°1, 1986, rr. 21-30; Pluet-Despatin, Jacqueline, “Une contribution à l’histoire des intellectuels: les revues”, Cahiers

lewma ye ku van salên dawî, berevajî nêrîna têorîk a Pierre Bourdieu ku wek “qad”ê (champ) hatibû destnîşankirin³, “tor” tê pêşnîyarkirin wek metodeke civakî-dîrokî ya xebatê bo qadên “pêrîfêrîk” û “bindest” ku “benîştokî” tir, “vekirî”tir in li gorî qadên “homojen”tir û “serdest”tir û ji hêla “sazûmanî” ve xurttir. Li van qadên bindest û pêrîfêrîk ku hatine “biçûkkirin”, ji “sermîyana simbolîk” bêhtir, “sermîyana peywendîdar” (*capital relationnel*) li holê ye ku ji peywendîyên wek hevaltî, hevalbendî, nêzîkayîyên ramanî û hwd. pêk tê⁴.

Di hin deman da, bi taybetî di demên bi qeyranên polîtîk da, kovar statuyên xwe yê xwezeyî derbas dikin û dibine warên mayîna li ser pîyan, warên derketina ji hêkê ên tiştên nû, warên jinûvekirin û veguherînên çandî, wêjeyî, hunerî û sîyasî ku mesele di rewşa Fransaya ji hêla Almaniyaya Nazî ve dagirkirî da (1940-1944) tê çavdêrî kirin⁵. Dîsa, bi heman awayî, em dibînin ku li cîhana kolonîzekirî jî kovar xwedî girîngîyeke ew qasî mezin in ku hemû tevgerên çandî û wêjeyî yê bindestan di wan da û bi wan ra krîstalîze bûne⁶.

Li gorî Pierre Bourdieu, krîzên polîtîk, polîtîzasîyona çavkanî û armancên civakî dermalê dikin ku ev yek senkronîzasîyon û harmonîzasîyona qadan (ci-

de l’Institut d’Histoire du Temps présent, n° 20, 1992, rr. 125-136; Sirinelli, Jean-François, “Les intellectuels”, tê da Rémond, René (dir.), Pour une histoire politique, Paris, Editions du Seuil, 1988; Pluet, Jacqueline, “Pour une histoire et une politique des revues”, tê da Curatolo, B., Poirier, Jacques (dir.), Les Revues littéraires au XX e siècle, Dijon, Éditions Universitaires de Dijon, 2002, rr. 19-30; Leymarie, Michel, “Introduction”, Leymarie, M., Mollier, Jean-Yves (dir.), La Belle Époque Des Revues 1884-1914, Paris, Édition De L’IMEC, 2002; Corpet, Olivier, “avant-propos”, La Belle Époque Des Revues 1884-1914, Paris, Édition De L’IMEC, 2002; Paul, Aron û Soucy Pierre-Yves, Les Revues littéraires belges de langue française de 1830 à nos jours: essai de répertoire, Bruxelles, Éditions Labor, “Archives du futur”, 1993, rr. 7-65; Aron, Paul û Denis, Benoît, “Introduction: Réseaux et institution faible”, tê da Denis, Benoît û de Marneffe, Daphné (dir.), Les Réseaux littéraires, Bruxelles, Le Cri-CIEL, 2006, rr. 7-21; Sapiro, Gisèle, “Réseaux, institution(s) et champ”, tê da Denis, Benoît û de Marneffe, Daphné (dir.), Les Réseaux littéraires, Bruxelles, Le Cri-CIEL, 2006, rr. 44-59; Prochasson, Christophe, Les intellectuels, le socialisme et la guerre (1900-1938), Paris, Éditions du Seuil, 1993; Uyar, Tomris, Kitapla Direniş, Yazılar, Söyleşiler, Soruşturmalar, İstanbul, YKY, 2011, rr. 71-77.

3 Bourdieu, Pierre, “Le champ littéraire”, Actes de la recherche en sciences sociales. n°89, septembre 1991, rr. 3-46; Les règles de l’art: genèse et structure du champ littéraire, Paris, Seuil, 1992.

4 De Marneffe, Daphné û Denis, Benoît, Les réseaux littéraires, Bruxelles, Le Cri - CIEL - ULB - Ulg., 2006; Denis, Benoît, “La littérature francophone de Belgique. Périphérie et autonomie”, tê da Dubois, Jacques, Durand, Pascal û Winkin, Yves (dir.), Le symbolique et le social. La réception internationale de la pensée de Pierre Bourdieu, Liège, Éditions de l’Université de Liège, 2005, rr. 183-184; Aron, Paul û Denis, Benoît, “Introduction. Réseaux et institution faible”, tê da De Marneffe, Daphné et Denis, Benoît (ed.), bnb., r. 16; Dozo, Björn-Olav û Fréché, Bibiane, “Réseaux et bases de données”, dans de Marneffe, Daphné et Denis, Benoît (éd.), bnb., r. 86.

5 Sapiro, Gisèle, La guerre des écrivains 1940-1953, Paris, Fayard, 1999; Les écrivains et la politique en France, De l’affaire Dreyfus à la guerre d’Algérie, Paris, Seuil, 2018.

6 Van Hove, Julie, “Les Revues du monde noir”, La Revue des revues, n°3, 1987, rr. 30-40; Césaire, Aimé, Tropique, 1941-1945, collection complète reliée, Paris, Jean-Michel Place, 1978, rr. 5-18.

vakî, sîyasî, hunerî, wêjeyî û hwd.) jî bi xwe ra tîne⁷ ku navê wê dibe yekere bûyîn. Di rewsên wiha da, kovar , bi taybetmendiyên xwe yên xususî dikarin bibine xwedî şîyaneke wiha ku lîstina roleke “pexemberane” pêkan dibe. Ji bo Bourdieu, helwesta “pêxemberane” helwesta qûtbûna bi pergala heyî ra ye. “Pêxember, merivê rewşên qeyranan e ku di wan da pergala heyî xera dibe û pêşeroj bi her awayî betalbûyî ye”. Li gorî Bourdieu, berevajî helwesta “patrik” û “keşê” (ku em dikarin wek “şêx” û “mele” jî bifikirin), ji ber ku ew berbiemir in, “pêxember” ew kes e ku bi hin awayên avaker ên dijîtîyê, berberîyê dike bi pergala heyî ra û li dijî ortodoksîyê ye. Peyama wî ji aqilmendîyê bêhtir bi coşdarîyê avabûyî ye. Lewma ew yekî “kafir” e⁸.

Piştî van taybetmendiyên kovargerîyê, em bawer in ku em niha dikarin ji xwe bipirsîn bê ma çima ew qas kovarên kurdî (li vir mebesta me ji kovarên kurdîya kurmancî ye ku li Tirkîyeyê derçûne) derketine û nivîskarên kurdî di kovaran da çêbûne, ferî kurdî bûne û bûne nivîskar li gel sansûra dewletê a hişk û tund, û baştir fahm bikin bê ka çima wêjeya kurdî (bi giştî çanda kurdîya kurmancî ya nivîskî) di kovaran da destpêkirîye û bi rê ve çûye. Ji xwe, gava em bînin bîra xwe ku bi giştî warê kurdî û bi taybetî qada kurdîya kurmancî perçeperçebûyî ye û tişt lê ne berbelav in û yan jî bi awayekî pirr hindik berbelav in, û danûstandin pirr kêma⁹ (ji hela kurdên Tirkîyeyê ve, ev yek bi taybetî heya salên 2000an wiha ye), wî çaxî kovargerîya kurdî bêhtir watedar dibe. Bêguman sedema bingehîn a vê yekê sansûra dewleta tirk a li dijî kurdan e ku em dikarin wek “dema bi qeyran” fahm bikin. Lê curbicuriya “zaravayên” zimanê kurdî¹⁰ û yan jî “cureyên zimanî” ku ji hêla kurdan ve têne peyivîn¹¹, û “pir-standardîzasîyona” zimanî (ku ev yek jî heta radeyekê bi halê bindest ê kurdan ve elaqedar e) jî dikarin wek hin sedemên din ên vê rewşa

7 Bourdieu, P., *Homo Academicus*, Paris, Editions de Minuit, 1992 [1984].

8 Bourdieu, P., “Genèse et structure des champs religieux”, *Revue française de sociologie*, 1971, vol. 12, n°2, pp. 295-334.

9 Vali, Abbas, “The Kurds and Their “Others“: Fragmented Identity and Fragmented Politics”, *Comparative Studies of South Asia, Africa and the Middle East*, n°18 (2), 1 August 1998, rr. 82–95; Ahmedzade, Hasim, *Ulus ve Roman, Fars ve Kürt Anlatısal Söylemi Üzerine Bir Çalıma*, Istanbul, Perî Yayınları, 2004; Alan, Remezan, “Careke Dîn “Edebiyata Netewî””, *Bendname*, li ser rûhê edebiyatekê, Istanbul, Avesta, 2009, rr. 115-123; Amida, İrfan, *Qonaxeke Modernîzma kurdî helbesta Tirêjê*, Amed (Diyarbakir), Lîs, 2016. Lê li vir dive bê diyar kirin ku ev halê perçeperbûyî, bêberdewamî yê qada kurd(i) ku tişt lê ne berbelav in, bi tenê wek “tespîtekê” hatiye bilêv kirin ji hêla van kesan ve. Ango, bi awayekî civakî-діrokî, wan geşedana fenomenên vî halî destnîşan nekirine, neşopandine di qada kurd(i) da û bi vî awayî li ser nexebitîne.

10 Scalbert-Yücel Clémence, “Les langues des Kurdes de Turquie: la nécessité de repenser l’expression “langue kurde””, *Langage et société*, 2006/3 n° 117, rr. 117-140.

11 Haig, J. û Opengin, E., “Introduction to Special Issue Kurdish: A critical research overview”, *Kurdish Studies*, vol. 2, n°2, 2014, rr. 99-122.

perçeperçebûyî û ne-berbelavbûnê û yan jî nedanûstendinê bêne hesiban-din. Bi awayekî din, em dikarin vê rewşê wek rewşeke di “dê-sîvîlîzasîyon”ê da bûyîn jî bi nav bikin ku Hamit Bozarslan vê yekê, di çarçoveyêke din da, wek bêkapasîte bûna karîna bi rê ve birin û hesap kirina “dem”ê pênase dike. Ango, gava em ji “dem”ê bêbawerî bûbin û yan jî, jê hatibin bêbawerî kirin, û ji ber vê yekê, gava em nikaribin li paşerojê bifikirin, li nihayê hikim bikin û xwe li pêşerojê tesewir bikin û lewra nema karibin di wêr da bilivin bê tirs û bê bênavberî wek xweyêke takekesî, pevrayî û lewma gerdûnî¹². Lewra, awaya hilberîna kurdî ya zimanî-wêjeyî an jî bi awayekî giştî çandî û hunerî li Tirkîyeyê, ji “ponijîn” û “ramîn”ê bêhtir, li ser bingeha “tevgerîn” û “çalakî bûyîn”ê rûdine. Ev şêla hilberîne, bi awayekî çandî û hunerî, bi pirsra “çawa lîstina li jîyanê” ve girêdayî ye¹³ ku pirranîya caran di demên bi qeyran û “dê-sîvîlîze” da wiha ye ku li wan “lîstik”a jîyanê xera dibe û yan jî tê xerakirin.

Di bin banê literatûreke wiha ya kovargerîyê û rewşa sansûrê da, kovara kurdî bi awayekî taybet balê dikişîne. Di qada kurdî ya bindest û ji hêla sazûmanî ve qels da, kovara kurdî wek forma, şeweya têkoşer û “pêxemberane” û yan jî hewldana mayîna li ser pîya ya çand, wêje û zimanê kurdî xûya dibe di “êkosîstema” hov û zor a sansûra dewleta tirk da. Li gorî me, ev yek gelekî girîng e ku dikare xwendinên me yên li ser dîrok, çand, ziman-wêje û hunera kurdî gelekî biguherîne, ji nû ve bide nivîsandin û yan jî dewlemendtir bike û berê xwendinên me bide ber bi vexwendinan ve¹⁴.

Gava ku bi awayekî spêsîfik, em ji bo wêjeya kurdîya kurmancî dêhn û bala xwe didine kovara kurdî, em dibînin ku kovara kurdî wek dibistana nivîskarê kurdî, enstîtusîyona şîn û yan jî hezna filolojîk, hosîname û yan jî wesîyetnameya netewî, qada bûyîn û jîna wêjeyî, binyad û kevirê anîşkê yê dîroka wêjeya kurdîya kurmancî dîyar dibe¹⁵. Çavkanîyêke wiha ye ku bê wê

12 Bozarslan, Hamit, *Crise, violence, dé-civilisation*, Paris, CNRS éditions, 2019.

13 Even-Zohar, Itamar, “The Making of Culture Repertoires and the Role of Transfer”, *Papers in Culture Research*, Tel Aviv, Unit of Culture Research, Tel Aviv University, 2010, rr. 70-76.

14 Li gel vê girîngiya mezin a kovara kurdî, tê difin ku ew wek objeyêke xebatê, lêkolînê hê bi cih nebûye û nehatiye çandin di xaka lêkolînên kurd(i) da. Lê divê bê gotin ku her çi qasî bi awayekî gellekî kurt û biçûk jî be, çend kesan bal kişandiya ser hin hêlên kovargerîya kurdî : Gorgas, Tejel Jordi, *Le mouvement national kurde de Turquie en exil: continuités et discontinuités du nationalisme kurde sous le mandat français en Syrie et au Liban (1925-1946)*, Paris, Teza doctorayê, EHESS-Paris, 2004, rr. 262-265; Scalbert-Yücel, Clémence, *Engagement, langue et littérature, Le Champs littéraire kurde en Turquie (1980-2000)*, Paris, Editions Petra, 2014, rr. 282-285; Seydo, Ibrahim Aydogan, “Littérature par la presse”, *Yod [En ligne]*, 17 | 2012, mis en ligne le 27 octobre 2012, consulté le 09 juin 2015. URL: <http://yod.revues.org/1578>; DOI: 10.4000/yod.1578.

15 Ay, Serdar, *La Littérature kurde kurmandji en Turquie entre émergence et (re)découverte. Écrire, par le biais des revues, l’histoire d’une littérature de combat*, Teza doktorayê, Institut National

em nikarin tewqeyî fahm kirina geşedan û dîroka wêjeya kurdîya kurmancî bibin. Axir, ew çavkanîya sereke ya dîroka vê wêjeyê ye ku “roj bi roj” (bi awayekî peryodîk) dîroka wê lê hatîye nivîsandin. Ji xwe wek ku me qal kir, ku qada kurdî qadeke parçeparçeyî bûyî be û tişt tê da ne berbelav bin, ango di çirrava bêberdewamîyê da teqînî mayî be, li vir tekane rê ew e ku em wê di mala wê da, di kovarê da bişopînin. Ku me bi vî awayî kir, em ê bibînin ku li gel bêberdewamîyê, di vê bêberdewamîyê da hin cure berdewamî hene.

Bo kirina vê yekê, hewldana xwendina kovarê wek derek û derdorekê dikare alîkarîya şopandina girêkan bike ku di tora giştî (zimanî-wejeyî-sîyasî-netewî) ya vê wêjeyê da hatine avêtin ku ev tor dibe dîroka wê bixwe. Ev yek bi xwendineke dusêrî pêk tê; ji ber ku her kovar dikare di senkronî û dîyakroniyê da, di ser têkilîyên tekstuel û mirovî ra bê dan ber hev. Li gorî vê cure metoda lêkolînê ku dikare gelekî bi kêrî xebat û lêkolînên kurd(î) bê, me di xebata xwe ya doktorayê da hewl da, wek gaveke destpêkê, dîroka wêjeya kurdîya kurmancî ya li Tirkîyeyê wek torekê bixwînin û destnîşan bikin di derdora kovaran ra. Encama ku me ji bo niha bi dest xist: gelek girêkan (zimanî, wêjeyî, netewî, bîrdozî, sîyasî, patronojî...) torek çekiribûn, lê dişibi-ya tevnepeîreke qulqulî.

Jordi Tegel Gorgas
Wergera ji fransî: Nebîyê DÛRO

PÊWENDÎYA FRANKO-KURDÎ LI LUBNAN Û SÛRÎYÊYÊ (1930-1946) Û BANDORA WÊ LI SER AVABÛNA NASNAMEYA NETEWÊYÎ YA KURDÎ¹

Kurte

Ev nivîs pêşî berê xwe dide wê ramana oryantîzmê ya di navbera her du şerên cihanê de û bi dû ra bala nivîsê dikişîne, tîne ser têgeha nasnameya kurdî û dipirse ka elîtên Kurdan kengî, çira û çawa xebat kirin ku konseptêke maqûl ya nasnameya kurdî ava bibe. Ji ber pêşveçûnên li Rojhilata Navîn, ev xebata ji bo avakirina nasnameyê an jî çêkirina “civakeke yekgirtî ya xeyalî” -mebest ji civakê, civaka kurmanca ye- di bin bandora fransîyan da pêk hat, ji ber ku hingê Sûrîye di bin desthilata fransîyan da bû. Pêwendîya di navbera karmendên fransî û rewşenbîrên kurd da welê kir ku di encama hevkarîya wan da berhemên nivîskî derkevin holê ku him hêz û îlhamê da ji bo avakirina nasnameya kurdî, him jî îmajê kurdan li Ewropayê xweş kir. Lê di çêkirina nasnameyêke kurdî da ku her kesê ku dixwest nikaribû tevî wê proseya çêkirinê bibe, encameke berbiçav derket holê: “Rewşenbîrê Ewropa dîtî” mecbûr man di nav civakeke sembolîk da bijîn, ev civak ji wê civaka berê gellekî cuda bû ewa ku yên ne-elît yan jî elîtên ‘adetî wekî şêx û serok’êşîr tê de xwedî-hukm bûn.

¹ Rerefansa înternetî, Jordi Tegel Gorgas, “Les constructions de l’identité kurde sous l’influence de la “connexion kurdofrançaise” au Levant (1930-1946)”, *European Journal of Turkish Studies*, 5 | 2006, <http://journals.openedition.org/ejts/751>; DOI: <https://doi.org/10.4000/ejts.751>

Digel ku tevgera sîyasî ya kurdan gellekî ji hev belavbûyî be jî, dîsa jî gellek partîyên kurdan li ser hin tiştan li hev dikin, bo mînak li ser esl û esasa gelê kurd û nexşeya Kurdistanê û herwuha li ser “şêwaza neteweyî” ya kurdan, partîyên kurdan li ser yek fikrê ne. Ji xeynî partîyên îslamî, pîrranîya partîyên kurdî dibêjin ku kurd wekî millet bêhtir nêzîkî Ewropîyan e çimkî zimanê wan zimanekî hîndo-ewropî ye û mîna tirk û ereban, misilmanê radîkal nînin. Lê belê, gellek guman çêbûn li ser vê dîskûra neteweperwer a tevgerên kurdan gava ku ji destpêka salên 90î bi şûn de, tevgerên çekdar yên îslamî wekî *Hiz-bullah* ji nav kurdên Tirkîyeyê û *Ansar al-Islam* ji nav kurdên Iraqê derketin û li Ewropayê ji nav penaberên kurd nûçeyên li ser jinên kurd derketin ên ku bi hinceta namûsê hatibûn kuştin. Ji ber van rûdan û bûyeran, dîskûra tevgerên kurdî yên neteweperest ku digotin Kurd milletekî pêşverû û modern in, ew dîskûr hemû têk çûn û gellek lêkolîner û rojnamegerên ewropî yên ku berê bi “pirsgirêka kurdî” ra eleqedar bûbûn, êdî bi şik û guman li vê pirsgirêkê nihêrin.

Armanca vê gotarê ne ew e ku derxe holê ka bê dîskûra kurdî ya neteweperwer heta çi radeyî teqabulî xuy û kerekterê gelê Kurd dike, yan jî nake? Armanca vê xebatê ew e ku nîşan bide ka ev dîskûra han kengî, çima, çawan û ji hêla kê ve hatiye pêşxistin û belavkirin. Ji bo vê yekê jî, wê ev gotar pêşî behsa çarçoveya oryantalîzma wê dewrê bike, dewra di navbera her du şerên cihanî de. Bi dû re, wê gotara me tehlîla hin şert û mercên musaîd bike yên ku hîştin yekem kurdologên fransî û entellektuelên kurd ên neteweperwer yên li Lubnan û Sûrîye bi hev ra bixebitin. Axirê, wê ev nivîs encamên vê hevkarîyê bide xuyakirin, hevkarîya li ser avakirina nasnameyêke neteweyî ya kurdên kurmanç.

Vegera ser esl û esasê milletek ji bo avakirina wî tiştî ku ez jê ra dibêjim “bîrewerîya hevpar” (Tejel 2007) dikare bide ronîkirin ka gelo çawa têkilîya di navbera warê zanistî û yê sîyasî de, helbet bi demê ra û qet nebe li Tirkîyê, wateya “nasnameya kurdî” diyar kir. Belê, hevkarîya di navbera yekem kurdologên fransî û entellektuelên kurd yên ku Ewropa dîtibûn -bi taybetî jî bi-rayên Bedirxanî- hîşt ku di serê salên 1900î heta salên 50yî de, sînorên welêt û çarçoveya nasnameya kurdî êdî bi zelalî bîn diyar kirin. Ev xebata rewşenbîrî ku mohra “social closure” li serê bû (ango derfetê kêman kesan hebû ku xebatên wuha rewşenbîrî bikin), dîsa jî encamên gellekî xurt derxistin holê: Elîtên kurd tevli civateke simbolîk dibûn ku ev civat nedişibîya civata elîtên klasîk yên berê. Ji ber vê sedemê jî, jixwe gava ku elîta modern ya nû li ser navê “milletekî xeyalî” (Anderson 1996) banga serhildaneke çekdar dikirin, derûdorên muhafazakar û aktorên anonîm ên civaka kurdî guh nedan van bangan.

I. Şert û mercên sosyo-polîtîk ku kurdologên fransî yê nûjen tê de gihîştin.

Heta sedsala 20an jî, oryantalîstan, wekî ku pirs û derseke zaningehî be, eynî wusa, behsa “*Oryanê*” ango behsa “*Rojhilatê*” dikin, û dîsa wusa wekî babetên zaningehî, tekstên rojhilatî wergdigerînin ser zimanên ewropî, medenîyeta rojhilatîyan didin naskirin, dîne wan rave dikin û behsa malbatên rêvebir yê rojhilatî dikin. Oryantalîst pisporek e û karê wê/wî ew e ku ji hemwelatîyên xwe ra welatên Rojhilatî rave bike. Yanî *Oryantalîst li derveyî Oryanê (rojhilat)* dimîne, loma di navbera wî/wê û lêkolîna wî/wê da her tim mesafe hene wekî mesafeya çandî, mesafeya erdnigarî û mesafeya demê. Lê belê, mêtîngerî û şerê cihanî yê yekem hêdî hêdî mesafeyên di navbera Rojhilat û Rojavayê (Ewropa) da kêr dikin. Êdî pisporên nû yê babeta rojhilatê, kesên karmend in û karmendên dewletên xwedan-mêtîngeh ne.

Li gorî Edward Said (1997), hevdîtina di navbera oryantalîzma *veşartî* û oryantalîzma *eşkere da* encama vê veguherînê ye. Vêca gava ku Brîtanîyaya Mezin (Împaratoriya Îngilîzan) û Fransa bi hev ra xwe amade kirin ku Împaratoriya Osmanî bi renekî *zanistî* perçe bikin, encamên hevdîtina di navbera bîrdoziya oryantalîst ya *veşartî* û tecrubeyên oryantalîzma *eşkere*, ji binî ve xwe dan der. Digel ku berîya sedsala 20an, nav û dengê Kurdan têra xwe neyînî bû, çimkî gerrokên Ewropî û herwuha şandeyên fermî yê Ewropî ku çûbûn Kurdistanê, wusa behsa Kurdan kiribûn; lê dîsa jî hate xwestin ku qîmeta gelê Kurd li ber çavê raya giştî ya îngilîz bê bilindkirin çimkî êdî Brîtanîyaya Mezin, li Mezopotamyayê û li Îranê hin projeyên sîyasî dabûn ber xwe.

Wekî ku kurdologê rusî, Basil Nikitine vedibêje (Nikitine 1956: 65): “Ev navlêkirin û pênaseyên han, pîrî caran anegorî tercîh û hezkirina demê, diguherin. Em îro dikarin ji ber tiştêkî, pesnê xelkekî bidin; lê dikarin sibê ji wî heman xelkî ra bidin xeberan. Em ê carinan li dijî hişmendîya garankî, pesnê endîvîdualîzmê (şexsîbûn/takekesî) bidin, carinan jî em ê berovajî wê bikin, em ê behsa zîrar û xerabîyên îndîvîdualîzmê bikin û pesnê civakbûnê û hevgerîna neteweyî bidin” Eleqeya “zanistî” ya dewletên Ewropî her berde-wam bû di dewra Hîmayetê (Manda)² da, ji ber ku erdê rojhilata navîn di

2 Pey Şerê Cihanî yê Yekem, Sûriye û Lubnan li gorî Rêzîknameya Mandayê (La charte du Mandat) ya 1923yan, ketin bin *hîmayeya* Fransayê, ev rêzîkname ji bo wê bû ku dewletên pêşketî ango yê xwedan “şaristanî” bikaribin dewletên “kêm pêşketî” ji bo demê di bin *hîmayeya* xwe da amade bikin ji bo serxwebûnê. Heta ku dewleta kêm-pêşketî bibe xweser û azad, dewleta pêşketî ku hîmaye dike, xwedan hemû mafan e û nûnerên wê wan welatan birêve dibin. Li Sûriye û Lubnanê ku di bin *hîmayeya* Fransayê da bû, nûnerêkî dewleta fransî hebû ku jê ra digotin “commissaire” (wekî qomiserê polîsan), û ew li Qesra Mezin a Beyrûdê (Grand Sérail da Beyrouth) rûdinişt.

bin rêvebirîya wan dewletên Ewropî da bû û rêvebirina wan erdan êdî bûbû “pêwîstîyeke” fermî. Belê, gava ku axa Îraqê kete bin desthilata Îngilîzan, eleqeya wan di derbarê xelkên wî welatî da zêdetir bû; lêkolînên dîrokî, antropolojîk û zimanî yên li ser Kurdan di demeke kurt da zêde bûn. Lê, dewleta Fransî bi derengî ket ku têkilîyekê dayne li gel xelkên Kurdistanê. Fransî ber bi dawîya salên 1920î pê *hisîyan* ku Kurd dikarin bi kêrî wan werin, bi taybetî ji bo hukmkirina devera Cizîra Jorînê. Lewma, Fransîyan bi xêra Enstîtuya Fransî ya Şamê (E. F. Ş.),³ hewl dan wan kurd û xelkên herêmê nas bikin, yên ku berîya wê hingê li Fransayê, nedihatî naskirin.

Robert Montagne, ji sala 1930an heta 1938ê, wekî serokê enstîtuya Fransî kar kir û hez dikir Kurdan nas bike, lê ew meraq ne tenê ji bo birêvebirina wî welatî bû, herwuha ji ber bawerîya wî ya şexsî bû; wî wusa bawer dikir ku Fransa wekî dewleteke xwedî “*medenîyet*” diviyabû “*peywira*” xwe encam bidaya û li ser wan erdan pêşengî bikira ji bo avakirina dewleteke modern. Lê mixabin, Kurd jî wekî hindêk kê-m-neteweyan û wekî bedewîyan, nedihîştin, dibûn asteng li ber avakirina dewleteke modern. Ji bo Montagne û şagirdên wî, Fransa xwedî wê mîsyonê ye ku hêdî hêdî berê Kurdan (bi xêra cîwarkirin, zeîfkirina têkilîyên eşîrî, tevîkirina Kurdan a nav ekonomîya hilberîner, vejîna çandî) bide ber bi şikl û şêweyeke jîyanê ya wusa ku bikaribe xêrekê ji Kurdan bibîne di nav dewleteke modern ya di bin hîmayeya xwe da (Rondot 1939: 124). Hingê, pêwîst e mirov di derheqê wan da lêkolînan bike, pêwîst e mirov hewl bide wan nas bike ku bikaribe dû ra wana bi şiklekî maqûl tevî civata gelên Surîyeyê bike. Ji bo ku ev mîsyon biçê serî, lazim bû ku endamên

Karê wî ew bû ku navbeynîyê bike di navbera du alîyan de, yek Wezareta Fransî ya Kar û Barên Derve û yê din, dewletên di bin hîmayeya Fransî de. Li ser dewra Hîmayeya Fransî ya li Sûriye û Lubnanê lêkolînên şareza hatine çêkirin wekî Khoury (1987), Méouchy (2002), Mizrahi (2003), Méouchy; Sluglett (2004), Tatchjian (2004).

3 Pêşî sala 1922 yan da gava ku tê avakirin, navê wê Enstîtuya Fransî ya Arkeolojîyê û ya Hunera Islamî ye lê dû ra di sala 1930an da navê wê dîkin “Enstîtuya Fransî ya Şamê”. Li vê enstîtuya ku di nav Qesra Azemê bû, du civatên cuda dihatin cem hev, him ji hêla eslî ve him ji hêla hişmendî ve ev du civat ji hev cuda bûn. Ya yekê civata xwendeyan bû yên ku lêkolîner bûn li zanîngehan, ya diduya jî civata serbaz û fermanbaran bû, herwuha hin kesên din yên bîmeraq jî hebûn ku ji aliyê serokê enstîtuyê ve, Robert Montagne, dihatin teşwîqkirin (Avez 1993). Montagneyê ku heşt sala serokatîya Enstîtuya Fransî ya Şamê kir, hez dikir enstîtû bibe xwedî xweserîya zanistî, loma xwe nespirt hêza dewletê, piştî xwe da sazîyên din yên wekî Enstîtuya Lêkolînên Îslamî, Enstîtuya Etnolojîyê û Muzeya Trocadero-yê. Di nav estîtûyê da du alî hebûn ku li ser pîrsa zanistî pev diçûn, aliyekî digot gerek e em ilm û zanîneke welê biafirînin ku di sîberojê da bikeve bin xizmeta dewleteke nûjen ya Sûriye (Montagne, Rondot û Lescot ji wî aliyê bûn), îca aliyê din digot gerek e em ilm û zanîneke pratîk biafirînin ku em pê ra bikarin bi hêsanî xelkê Sûriye bi rê ve bibin (Métral 2004: 224, Trégan 2004: 234-247).

ekîba Montagneyê biçûna ilm û zanistên wekî civaknasî, zaravanasî (dîyalektolojî), antropolojî û coğrafyaya beşerî (mirovî) bixwendana. Belê, eynî wusa, du serbazên fransî, Pierre Rondot û Roger Lescot, bi teşwîq û zora Montagneyê, dest bi xwendinê kirin û bûn kurdologên fransî yên pêşîn.

II. Lehengên “Pêwendîya franko-kurdî”

Kurdologên bi eslê xwe fransî pêwîstî bi wê yekê hebûn ku ji xwe ra li ser erdê heval û hogiran peyda bikin, ji bo ku karê xwe bibin serî, hewce bû ku kesên welê bibînin ku bikaribin agahîyan ji wan bistînin û ew kes bibin hevkarên wan. Di serî de, ev “hevkarî” li ser du esasan pêk tê. Ya yekê, ji bo ku hevkarîyek di navbera du hêlan da pêk were, pêwîst e ku ew du hêl, nêzî hev bin, yan jî wekî hev bin. Di mînaka têkilîya di navbera elîtên fransî û kurdan da jî ev yek dîyar û zelal e. Kurdologên fransî bi elîtên Kurd ra têkilî datînin û bi wan ra hevaltîyê dikin, çimkî ji bo kurdologên fransî, elîtên Kurd “pêşketî” û xwende ne, ji ber vê yekê tiştê maqul û kêrhatî ew e ku mirov bi wan ra têkilîyekê dayne. Têkilîyêke wuha dê demdirêj be û dê bi kêrî her du alîyan bê. Jixwe mirov dikare bi hêsanî fahm bike vê tercîha kurdologên fransî û hevkarîya wan a ligel elîtên Kurd bi armanca avakirina nasnameyêke neteweyî ya kurdî, ji ber ku elîtên kurd û oryantalistên fransî, -elîtên tirk û ereb jî tede-, hemû bi hev ra xwedan wê bawêrîyê ne ku Ewropa ango Cîhana Rojavayê çavkanîya pêşketin û medenîyetê ye.⁴

Ya duyem, him li gorî bîr û bawerîya kurdên elît yên ewropadîtî, him jî li gorî bîr û bawerîya kurdologên fransî, tenê Ewropî dikarin bi awayekî siyasî û ji hêla maddî û manewîyetê ve alîkarîya gelê Kurd bikin. Ber bi hilweşana dewleta Osmanî, komên kurdperest⁵ li bendê bûn û hêvî dikirin ku alîkarîyekê

4 Elîtên kurdan her wekî elîtên tirk û ereban yên di nav *Komîteya Yekîti û Pêşveçûnê* (Îttîhad ve Terakki) de, ketibûn bin bandora bîrewerîya sosyo-darwînîzma Ewropî ya dawîya sedsala 19an, û wusa difikirîn ku netewe, wekî bûnewerekî zindî ye û dikare, him ji hêla endamên “nexweş” ve, him jî ji hêla neteweyên din ve, bikeve nav metirsîyê. Heger ew metirsî rû da, lazim e her netewe, xwe bi parêze û heger hewce bike, divê ew netewe îmha bike wan endamên li hundir an li derve ku îxtîmala xeterebûnê bi wan ra heye (Bozarslan 2003 : 36-37). Li gorî vê fikrê, avakirina netewe-dewletan, ji bo “her komeke neteweyî” tiştêkî pêwîst e, çimkî ji bo elîtên ku dibêjin em nûnerên gelê xwe, ev rê, tekane rê ye ku bikaribin gelê xwe biparêzin û wî ber bi “medenîyetê ewropî” ve bibin pêş ve. Elîtên kurd yên ku serê sedsala 20an dilsozên bîrewerîya Pan-Osmanî ne, dê hedî hêdî, lê ne bêyî sergêjîyê, ramana neteweperwer bihebînin, elîtên kurd li dijî elîtên din dikevin ‘eksê, pêşî li dijî elîtên ermen, bi dû ra yên tirk ku êdî ramana neteweperwer ji xwe ra kirine bîrdozî.

5 Ji nav tevgerên siyasî yên kurdan, ya ku herî girîng e, tevgera *Kurdistan Teali Cemîyeti* (Komeleya Bilindbûna Kurd) ye. Ev rêxistin di 17ê Berfanbarê sala 1918an da hate

ji Brîtanayê bistînin ji bo avakirina Kurdistaneke xweser; rewşenbîrên kurd û sirgûnî yên li Lubnan û Sûriyê jî, heman hevî dikirin, li bendê bûn ku hêzeke Ewropî wekî Fransa yan jî Brîtanîya, piştgirîya wan bikin, helbet ev yek gava ku şert û mercên navneteweyî ji bo vê yekê guncaw bibûya.⁶ Pêşengên tevgera neteweyî ya Kurdî nîşan didin ku ew amade ne bi oryantalistên fransî ra hevkarîyekê bikin da ku di nav civata dîplomatên fransî da, herwuha di nav raya giştî ya fransî da meyl û tandanseke *kurdhezîyê* ava bibe.

avakirin. Him di nivîsên xwe de, him jî di nav wan nameyan da yên ku dişînin bo nûnerên dewletên mezin yên Ewropî, rêvebirên Kurdistan Tealî Cemîyetî hewl didin nîşan bidin ku gelê kurd wekî her gelî xwedî hin taybetmendîyan e û xwedî dîrokeka neteweyî ne; bi vê yekê dixwazin biselîmînin ku Kurd jî pêwîst e bibin xwedî heqên neteweyî û bibin xwedî antîteyeka otonom. Ev komele xwedî amûreke çapemenîyê ye (1918-1919), navê kovara wan Jîn e û ev kovar roleka girîng dilîze di derheqê avakirina nasyonalîzma kurdî ya modern de.

6 Piştî ku Împaratoriya Osmanî ji hev belav dibe û Rojhilata Navîn wekî peydabûnên (antîte) dewletî an pêş-dewletî parçe dibe, stratejîya “birêxistinîkirina nasnameyan” di nav komên cuda yên etnikî da xurttir û kurttir dibe. Destwerdana hêzên beyanî bi tenê dibe sedema wê yekê ku elîtên reqîb yên neteweyên cûr bi cûr li dijî hev sor bibin. Hêzên Ewropî ku hez dikin hukma xwe firehtir bikin, destwerdanê li hêrêmê dikin da ku bikaribin li ser meseleyên sîyasî û aborî bibin xwedan bandor û hêzekê. Di nav van şert û mercan de, em dibînin ku doz û daxwazên kêmaneteweyan ên ji bo ax û nasnameyên xwe, li dijî berjewendîyên dewletên nû yên herêmê ne. Elîtên kêmaneteweyan dizanin ku hêz û qeweta wan têrî van dewletên nû yên herêmê nake, loma berê xwe didin dewletên Ewropî ku bi alîkarîya wan qet nebe beşekê ji armanc û hedefên xwe pêk bînin, ji bo vê alîkarîyê jî li gorî daxwazên hêzên Ewropî tevdiagerin ku ev yek jî ew risk di xwe da dihewand ku şerekî bê ser û ber di navbera kêmanetewe û nû-dewletên herêmê da dest pê bike. Lê ev têkiliya 3 alî; hêzên Ewropî, dewletên li herêmê û hêzên kêmaneteweyî û etnikî, dê her berdewam bûya piştî parçebûna împaratoriya nexweş, avabûna dewletên nû û danîna pergala hîmaye ango mandayê. Bi tevlêkirina hin hevkarên nû yên herêmî, hêzên hîmaye û mandayê alîkarîya wê yekê dikin ku helwest û sekna kes û komên etnikî û olî biguhere. Fransa jî, wekî Îngîltereya ku hukma Iraqê dikir, hay ji “sînoren” di navbera “kêmanetewe” û “neteweyê esasî” da hebû. Lê hevkarîya ku di navbera Fransî û Kurdan da ku sala 1925an da dest pê kiribû, hevkarîyêke bêqisûr nebû, ji ber ku piştgirîya ku Kurdan didan vê hevkarîyê û piştgirîya ku Fransîyan didanê, ne piştgrîyên bi rêk û pêk û berdewam bûn. Herçî koma Kurda ye, ew gellekî dûrî avakirina yekîtiyêke neteweyî bûn. Hinek e’şîrên Kurda (eşîrên li hêla Cizîrê ya Sûriye û yên li hêla Çiyayê Kurda) xwe nêzikî Tirka dikirin, hinekê din nêzikî Ereba dibûn, axirê pirranîya Kurda xwe nêzikî Fransîya dikirin, lê divê mirov ji bîr neke ku e’şîrên Kurda hindêk caran ji nişkê ve dev ji hevkarîyê berdane û çûne bûne hevkarê hêzekî din. Axirê hemû hêz û kirdeyên sîyasêtê dizanibûn ku “Pirsgirêka Kurdî” pirsgirêkeke navneteweyî ye û li ber sînoran asê namîne. Digelê vê jî, hîç hêzek neditirsîya û li ber nediket ku pirsgirêka kurdî li hêrêmê bibe sedema aloziyên zêdetir û belkî kontrola vê pirsgirêkê ji dest biçê; berovajî vê, her hêzekî dixwast vê pirsgirêkê li gorî berjewendîyên xwe bi kar bîne.

Hin weşanxaneyên fransî, berhemên ji folklor û helbesta kurdî li Fransayê bi fransî çap dikin. Kamuran Bedir Khanê rewşenbîrê kurd yê neteweperwer “*Proverbes kurdes*” (Gotinên Pêşîyan ên Kurdan) dinivîse (Bedir Khan 1937), Roger Lescot jî berhemekê bi du cildan, *Textes Kurdes, Contes, Proverbes et Enigmes* (Tekstên Kurdî; Pêşgotin, Çîrok û Tiştanok) dinivîse (Lescot 1940, 1942). Kesayetekî din ku berê serbazek ji artêşê bûye, André Brunel, di sala 1946an da berhema bi navê *Gulusar, contes et légendes du Kurdistan*⁷ (Gulusar, çîrok û destanên Kurdistanê) dinivîse.

Hevkarîya li gel Malbata Bedirxanî û li gel Hawirdorên Kurdewar yê Ewropayî

Dema ku Mustafa Kemal dibe desthilatdar, nasyonalîzma Kurdî ku hîn nû dibîşkive, dikeve nav bobelatekê. Rêvebirên Kurd terka Stenbolê dikin, yan dibin penaber yan jî xwe vedişêrin. Kesayetên ji derdora kurdî ya “pêşketî” ku direvin dibin penaber li Sûrîyeyê û li wir di bin mandaya Fransayê da disitirin, di nav wan da endamên malbata Bedirxanî jî hebûn. Celadet Bedirxan (1893-1951), lawê Emin Alî Bedirxan⁸ e, li paytexta Osmanî mezin dibe û li wir di mektebên rojavayî da dixwine. Ev yek wê derfetê dide wî ku bikaribe pozîtîvîzma Ewropî nas bike. Xwendina li ser huqûqê dike li Stenbolê, pêşî dibe katîb li mahkemeya Edîrneyê, pey ra wekî redaktor xizmet dike ji bo weşanên Wezereta Osmanî ya Kar û Barên Derve; paşê li Stenbolê dest bi rojnamevanîyê dike. Piştî rawestina Şerê Cîhanî yê Yekem jî, li paytextê wekî avûqat karê xwe berdewam dike. Celadet tevî fealîyetên kurdewarîyê dibe li Stenbole, di sala 1919an da li gel Fermandarê Brîtanî E. M Noel diçe Kurdis-

7 Lêbelê, lazim e neyê jibîrkirin ku di dema Mandayê de, li Lubnan û Sûrîye, Kurd nika-rin bi temamî piştî xwe bispêrin rewşenbîrên fransî û kesayetên girîng yê di nav artêşa fransî de. Çunkî hingê gelek nivîskar û rojnamegerên fransî hene ku kêfa wan ji rejîma kemalîst ra tê û gelek dîplomatên fransî yê payebilind yê di nav Wezaretê Karên Derve ya Fransî da hene ku razî ne ji Tirkîyaya Kemalîst ku dujminê tevgera Kurd e.

8 Li bin banê împaratorîya Osmanî, du kom hene ku navenda kurdayetîyê temsîl dikin: yek di bin rêveberîya Seyyid Abdulqadir (1851-1925) da ye ku ji Şemzînanê ye, yê din jî Emin Alî Bedirxan (1851-1926) e ji Botanê ye. Emin Alî Bedirxan jî binemala Bedirxan Paşa ye, mirê dawîn yê Botanê ye ku heta 1842an tim sadiqê Sultan bû, lê wê sala 1842an serî hildide ji bo guhertina miqam û têkiliyên xwe yê ligel Sultên. Piştî têkbirina serhildana li Botanê, Osmanî Mîr Bedirxan û malbata wî pêşî dişînin Stenbolê, dû ra jî wira wana sirgûnê Girîtê dikin, li Girîtê Bedirxan û malbata wî wekî me'mûrên Osmanî dixebitin. Bi saya xizmetên ku li Girîtê pêk tînin, destûr tê dayîn ku Bedirxan û malbata wî vegezin Stenbolê. Wekî malbata Şemzînanîyan, endamên malbata Bedirxanî jî di ber wezîfeyên xwe yê di burokrasiya Osmanî re, xebatên xwe yê çandî yê di cemîyetên kurdî yê Stenbolê da jî birêve dibin. Bnr Malmîsanij (1994) û Özoglu (2004).

tana Tirkîyeyê, bi armanca sazkirina serhildaneke Kurd ji bo serxwebûneke bi piştgirîya Îngiltereyê. Têkçûna “Mîsyona Noelî”⁹ û guhertinên sîyasi yên li Tirkîyê, dibin sedem ku here li Almanyayê cihûwar dibe, û li wî felsefeya Nietzsche nas dike (Bedirxan 1997). Rejîma kemalîst cezayê îdamê dide wî, û ew di sala 1927an da berê xwe dide Beyrûdê, li wir tev li kongreya pêşîn ya Xoybûnê dibe û dibe serokê wê tevgerê.

Xoybûn baş fahm dike bê çawa xwe têxe nav sîstemeke hevpeymanîyê ya sîyasî û leşkerî û çawa bibe aktorek heremî ya gellekî giran û girîng di serhildana Agirîyê da (1927-1931) ya ku di nav sînoren Tirkîyê da diqewime. Di nav tifaqên Xoybûnê de, ya herî bi feyde bê guman ya bi partîya Ermenî ya Taşnakê ra ye, ev tifaq him ji bo birêxistinîkirina¹⁰ komîteya Kurdan, him jî ji aliyê îdeolojîk ve¹¹ kêrhatî bû.

Hevkarîya Tirkîya û Îranê li dijî serhildêrên Kurd bi ser dikeve û serhildana ku Xoybûnê organîze kiribû, têk diçe, ji ber vê têkçûnê koma Xoybûnê di destpêka salên 1930an da li ser stratejîya xwe ya leşkerî nîqaşan dike.

Tecrubeya li Araratê welê diyar dike ku bêyî alîkarîya hêzeke (dewleteke) mezin, serhildanên dem demî bêfejde ne li hemberî hêzeke mîna ya Tirkîyê. Digel vê jî, Celadet Bedirxan bawer dikir ku her çend zehmetiyên demkî hebin jî, karekî gelekî girîng hebû ku divîya bi lez û bez bihata encamdan, ew kar jî

9 Hikûmeta Osmanî razî bûye ku Major Noel ji bo projeya xwe ya sîyasî here Kurdistanê, rêvebirên Osmanî wusa kirine ku xebatên kemalîstan lawaz bibe. Pîlan û proje ji hêla E. M. Noel û Sir Arnold Wilson ve li Bexdayê hatîye çêkirin, armanca pîlanê ew bûye ku bizanin ka derfetek heye ku bikaribin Kurdan li dijî Mîstefa Kemal rakin. Lê axirê Qomîsera Bilind ya Îngilîz ya li Qahîreyê biryar dide ku ev pîlan bê rawestandî ji ber ku hez nekirîye ku hêzên Britanî rasterast bi hêzên neteweperwer yên Kemalîst ra bikevin nav şerekî.

10 Taşnax û Xoybûn di Cotmeha sala 1927an de, di nav xwe de, peymaneke hevkarîyê îmze dikin, hedefa vê peymanê rizgarîya Ermen û Kurda ye. Li gorî vê peymanê, tevgera Taşnakê teqez dike ku ew ê ji dewletên Ewropî ra û di nav civaka wan da ji bo xêra doza Kurdî propagandayê bikin, ew ê “ji bo demekê” alîkarîya darayî û ya techîzatê bidin Xoybûnê, ew ê bi xebata diplomasiyê ve, dewletekê bikin piştevanê serhildana Kurdan û axirê perwerdekirina “teknîsyen, pisporên rêvebirinê û yên propagandayê”. Lê belê di tu bendên vê peymanê da peywirekî bi temamî û bi tenê ji Xoybûnê ra nehatîye hiştin, ev jî nîşan dide ku di nav Xoybûnê da ango di nav komîteya kurdî da ya li sirgûnê, pirsgirêk û qelsîya rêxistinî hebûye. ‘Peymana di navbera du alîyan da : Partîya şoreşger ya Ermenan ango Daschaktzoutioun, û Koma Neteweyî ya Kurdan ango Xoybûn, (Bozarlsan 1997 : 182-186).

11 Ji ber nebûna piştgirîyeke aborî û lojîstîk ya ji hêla dewleteke bihêz ya Ewropî, rêvebirên kurd û ermen hewl didin rêvebirên Îranê qaneh bikin ku li ser navê biratîya milletên arî, Îran alîkarîya doza Ermen û Kurdan bike. Armanca wan a dawîn ew e ku “Konfederasyonê Arî” ya Ermen û Kurdan bê avakirin di bin serokatîya dewleta Persan de. (Tatchijan, 2004, Tejel 2007).

xurtkirina hesta aîdîyetê bû, ji bo ku ev hesta endambûna civata kurdî pêk bihata, hewce bû ku zimanê kurdî bihata xurtkirin, bihata perwerdekirin û wêjeya gelêrî ji nû ve bihata kifşkirin.

Ev rêbaz ji aliyê desthilatên mandayê ve jî tê piştgirîkirin, ji ber ku desthilata fransî ya mandayê naxwaze bi Tirkîyê ra bikeve nax xirecirên dîplomatik.¹² Wekî Ermenîyan, serokên neteweperwerên Kurd jî qebûl dikin bibin perçeyek ji sazîyên legal, loma desthilat jî alîkarîyeke maddî û manewî dide rewşenbîrên Kurdan ku bikaribin xebatên çandî bimeşînin da ku “komeke etnikî” ya Sûrîyeyê wenda nebe (Watenpaugh 2004: 603). Hingî rêvebirîya fransî ya mandayê, teşwîq dike û piştgirî dide çalakîyên çandî yên Kurdên li Lubnan û Sûrîyeyê, wekî avakirina derseke kurdî li Zankoya Erebi ya Şamê, yeka din ji bo zabitên fransî yên Qomîserîya Bilind (*Haut Commissariat*), dişa derseke êvarê ya kurdî li Beyrûtê, herwiha destûrdayîna ji bo weşana kovara *Hawarê* li Sûrîyeyê. Celadet Bedirxan him edîtorê kovara *Hawarê* (1932-1943) ya duzimanî (Kurdî/Fransî) ye, him jî edîtorê *Ronahîyê* (1942-1943) ye ku ev kovar pêveka *Hawarê* ye.

Celadet Bedirxan avakerê alfabeya Kurdî ya bi tîpên latînî û ya rêzimanekî kurdî ye (ku di kovara xwe da diweşîne), herwiha xwedîyê gellekî broşurên sîyasî yên bi fransî û tirkî ye jî. Ji bo îdareya xwe ya aborî pêk bîne, Celadet mamosteyîya fransî dike (1934-1935) û herwiha wekî avûqat dixebite (1939). Di dema Şerê Duyem ê Cihanî da her çend ji aliyê sîyasî ve gellekî aktîf bûbe jî, piştî 1945an ew êdî ewqas çalak nabe. Di sala 1951an de, li malê qezayek pêk tê û dibe sebaba mirina wî.

Kamuran Bedirxanê (1895-1978) ku herwuha kurê Emîn Elî Bedirxan e, li Şamê ji dayîk dibe lê li Stenbolê mezin dibe. Li Zanîngeha Stenbolê beşa dad û hiqûqê diqedîne û li zanîngeha Leipzigê li ser dad û hiqûqê doktorayekê çêdike û dîploma xwe werdigire. Li Stenbolê wekî parêzer dixebite, demekê li Şamê dijî paşê vedigere li Beyrûtê bi cîhûwar dibe. Di sala 1917an de, di nav Şerê Cihanî yê Yekem da wezîfedar dibe û li enîya Balkanan tev li şerê dibe. Vedigere Stenbolê, dikeve nav civata kurdperweran û ji bo kovarên *Jîn û Serbestî* dinivîse. Dibe nûnerê Xoybûnê li Beyrûtê û dû ra di nav tevgera çandî da ya bi zaravayê kurmançî wekî kedkarê sereke yê duyem xebatan dimeşîne. Ji bo çapkirina *Hawarê* alîkarîya birayê xwe dike, piştî dibe berpîrsê rojnameya *Roja Nû* (1943-1946) û pêveka wê ya bi navê *Stêr* (1944-1945).

Kamuran herwuha Qur'anê werdigerîne ser kurmançî, ferhengê kurdî-almanî çêdike û bi zimanê almanî û fransî gellek hînkerên kurdî û pirtûkên li

12 CADN, Fonds Beyrouth, Cabinet Politique, n° 1055. Note n° 121, du Cabinet Politique pour M. l'Inspecteur général des Douanes. Damas, le 28 décembre 1932, r. 1.

ser wêje û edebîyata kurdî dinivîsîne. Ew li Radyoya *Levant*¹³ wekî pêşkêşvan dixebite ji bo bernameyeke nûçeyan ya bi zimanê Kurdî ku bi destûra rayederên Fransî pêk tê. Bi saya têkilîyên xwe yê şexsî, ber bi dawîya Mandayê ve, Fransî destûr didin wî ji bo li Fransayê bijî, û ew li Parîsê beşa zimanê Kurdî li Enstituya Zimanên Rojhilatî bi rê ve dibe. Di wan salên xwe yê li Fransayê de, Kamuran tim doza Kurd li ber hêzên rojavayî diparêze.

Sureya Bedir Khan (1883-1938) tev li tevgerên li dij Sultanê Osmanî dibe. Piştî beyannameya *jonturkan*, ew ji sirgûnê vedigere, û rojnameya *Kurdistanê* bi rê ve dibe. Demekê bi şûn da, rojname tê qedexekirin, û wî jî dîsa dixin zindanê. Tê efûkirin lê karên xwe yê dijî nîzama heyî berdewam dike û di sala 1912an da bi dizî komîteyeke şoreşgerî ya Kurdî saz dike, û dîsa cara sêyem dikeve girtûgehê. Ji wir direve û di sala 1913an da bi tamamî terka Tirkîyê dide. Di dema Şerê Yekem yê Cîhanî de, ji nû ve dest bi weşandina rojnameya *Kurdistanê* dike, heta sala 1917an vî karî li Qahîreyê berdewam dike. Li Misrê, dîsa komîteyeke serxwebûna kurd ava dike, û bi Brîtanîyan ra dikeve têkilîyê da ku li ser çêkirina Peymana Sevresê ya 1920an tesîr bike. Di sala 1927an de, tev li Tevgera Xoybûnê dibe, bi karê propagandayê ra yê ji bo welatên rojavayî eleqedar dibe. Ji 1930an şûn de, welatên di bin mandayê da jê ra qedexe dibin, û ew mecbûr dibe biçê Parîsê bibe penaber, û li wir nûnerîya Tevgera Xoybûnê dike (Nitikin 1960: 895).

Yekem Nifşê Kurdologên Fransî

Pierre Rondot di sala 1904an da çêdibe, cara pêşîn di 18 salîya xwe de, di 1922an de, li Saint-Cyrê dest bi dibistana leşkerî dike, di sala 1926an da tevî Artêşa Bîyanîyan a Fransî dibe. Dikeve nav îstîxbarata fransî di sala 1928an da, di bin emrê “Komîserîya Bilind” da kar dike, cîhê karê wî Beyrût e, tîma wî ya di nav îstîxbaratê da Tîma Lêkolinkirina Lubnan û Sûriyeyê ye, û peywira wî ew e ku bi têkilîyên li gel keşeyan ra mijûl bibe. Robert Montagne nas dike, ew berê Pierre dide xebat û lêkolînên kurdî li E. F. Ş (Enstîtûya Fransî a Şamê) yê. Celadet û Kamuran dibîne, hevdu nas dikin û dû ra ew her du ji bo wî dibin wekî “hevalên dilsoz” (Rondot 1993; 98-99). Fêrî kurdî dibe û li ser jîyana civakî ya Kurdên Surîyê lêkolîn û anketan çêdike.¹⁴

13 *Levant* ew herêm e ku Lubnan û Sûriyê hildigire nav xwe.

14 Gellek xebatên Pierre Rondot hene li ser Kurdan, em dikarin çend heb ji wan li vir parve bikin : “3 Ceribandinên Latînkirina Alfabeya Kurdî : Iraq, Sûriye, Yekitîya Sovyetî” (1935); “E’şîrên çiyayî yê li Rojavayê Asyayê, çend taybetmendiyên civakî di nav cim’eta kurdî û aşûrî da” (1937); “Kurd û Tevgerên Yekitîya Sovyetî li Rojhilatê Asyayê” (1940); “Tiştên ku Kurd wekî netewe doz û de’wa dikin” (1946); “Gelê Kurd, yê li hember tevgerên erebî” (1958); “Cil û bergên mêran û çêkirina wan li cem Kurdên li herêma Cizîr ya Sûriye” (1972).

Pierre Rondot bi awayekî ciddî hevkarîya Bedirxanîyan dike, herçî çavdêrî û sererastkirina beşa fransî ya kovara *Hawarê ye*, ew wî karî dide ser milê xwe.¹⁵ Ev nameyên di navbera Pierre Rondot û birayên Bedirxanî da tişteki nû fêrî me dike, ew jî ev e ku em dibînin Pierre Rondot di xebatên kurdolojîyê da bi awayekî taybet cîh girtîye. Belê, her di serê sala 1930an de, welê xuya dike ku Pierre Rondot xebatên destpêkê yên li ser alfabeya kurdî ya bi tîpên latînî ku ji alîyê Celadet Elî Bedirxan ve tê çêkirin, sererast dike. Eynî wekî Tewfiq Wehbî û C. J. Edmonds ku li Iraqê li ser projeya latînîkirina kurdîya soranî bi hev ra dixebitin, Celadet Bedirxan û Pierre Rondot jî danûstandina fikr û dîtinan dikin ji bo pêşvebirin û cîhbicîhkirina krîterên esasî yên alfabeke nû. Gava ku mirov gotara Pierre Rondotê ya sala 1935ê ya bi navê *3 Ceribandinên Latînîkirina Alfabeya Kurdî: Iraq, Sûriye, Yekitîya Sovyetî*, dixwîne; mirov dizane ku ev hîpoteza me ya hevkarîya li ser çêkirina alfabeke xurttir dibe. Di wê gotarê de, serbazê fransî “*xalên pêwîst ji bo avakirina alfabeke latînî*” diyar dike û birayên Bedirxanî jî wekî di pratîkê da xuya dike rêzê li van xalên pêwîst digirin di çêkirina alfabeke kurdî ya bi tîpên latînî da (Rondot 1935: 29).

Herwuha Rondot tev li xebata çêkirina pirtûkeka rêzimana kurdî dibe, armanc ew e ku mirov bikare bi hêsanî zimanê kurdî fêrî oryantalist û serbazên fransî bike. Alîkarîya Rondotê ya ji bo tevgera Bedirxanîyan, bi van xebatan naqede; ew herwuha dem bi dem alîkarîya aborî digihîne wan û carinan jî di hin ha’letan da şexsen mudaxîl dibe ku îş û karên hin kesayetên kurd yên nêzîkî Bedirxanîyan li hev bîne.

Roger Lescot (rojbûn 1914) beşa wêjeya erebî di sala 1935an da diqedîne û dîploma xwe werdigire. Dû ra dîplomeya tirkî û farisî jî werdigire. Rasterast di sala 1935an da li E. F. Ş ’ê dest bi kar dike û ji 1938ê heta 1944ê him li E. F. Ş ê dixebite him jî di lojmanên E. F. Şê da dimîne. Di navbera 1941 û 1944ê da rêvebirîya Zankoya Erebi ya Şamê dike. Di navbera 1939 û 1940î jî ber seferberîya leşkerî di nav artêşa fransî da erka xwe encam dide lê di meha Hêzîrana 1942yê da tevlî Hêzên Azad yên Fransî dibe.

Di sala 1935an de, Roger Lescotê ku dide ser şopa Rondotê, dest bi xwendina kurdî dike û ji xwe ra nivîsandina tezeke doktorayê ya li ser Kurdan dike armanc. Sala 1936ê, du caran diçe dikeve nav civata Êzidîyên li Bakûrê Sûriye û hingê di heman demê da rapirsîyekê amade dike li ser Şîyên li Başûrê Lubnanê. Lescot rêzimaneka kurdî jî dinivîse ku wekî pirtûkek ji kolleksiyona Zankoya Erebi ya Şamê tê çapkirin (Lescot 1991). Ew ligel Kamuran Bedirxan

15 Binihêrin li nameyên ku Pierre Rondot û birayên Bedirxanî ji hev ra şandine, û ku ji hêla Bozarslan (2001,2002) ve hatiye belavkirin.

tevlî amadekarîya ferhegeka kurdî/fransî dibe ku heta nuha ev berhem hîn nehatiye çapkirin.¹⁶ Di serdema Şerê Cîhanî yê Yekem de, Lescot bi şêweyekî çalak tevlî tevgera kurdî ya çandî dibe û hejmareka mezin a gotarên bi fransî dinivîsîne di nav kovarên wekî *Hawar*, *Ronahî* û *Roja Nû* de. Ew ji bo van kovaran gellek gotinên pêşîyan, çîrok û destanan werdigerîne ser fransî, ew herwuha destana *Memê Alan* werdigerîne ya ku weka destan çavkanîya *Mem û Zîn* e ku ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn.

Di sala 1944an da wekî karmend dikeve nav kadroya Wezaretê Kar û Barên Derve ya Fransî. Piştî, di navbera 1945 û 46an da li Zankoya Neteweyî ya Zimanên Rojhilatî dersan dide. Roger Lescot karîyera xwe ya dîplomatîk wekî nûnerekî sereke yê Wezaretê Kar û Barên Derve bi dawî dike.

Keşe Thomas Bois (rojbuîn 1900) di serdema navbera her du şerên cîhanî (1918-1939) da tevlî nîşên nû yên fransî dibe yê ku li Fransayê pisporên kurdî ne. Bois di 1919an da dikeve nav Terîqata Birayên Dilsoz ya Ezîz Domînik û di sala 1925an da dibe keşe. Du sal pey re, tê Misûlê û li wir piştî demekê wekî Salihê keşexaneya *Mar Yaqûb*ê tê hîlbijartin ku ev keşexane yek ji wan du keşexaneyên terîqatê ye li Misûlê. Di sala 1936an de, erk û peywirek dikeve ser milê Thomas Bois ku here herêma Cizîrê ya Sûriye û li wir mîsyona xristîyanî ya terîqata ezîz Domînik bi rê ve bibe. Giregirên terîqatê ji Thomas Bois dixwazin ku here wê herêmê li wir Nestûriyan nas bike herwuha li ser Kurdan lêkolînê bike, wan nas bike da ku ew sibêro bikaribin dest bi xebata avakirina cim'eteka mesîhî bikin di nav Kurdan¹⁷ da. Thomas Bois bi Pierre Rondot û Roger Lescot ra têkilî datîne, herwuha bi yek ji endamên sereke ya Tevgera Xoybûnê, Memduh Selîm Beg ra ji bo demeke kurt hevkarîyê dike û sala 1940an terka herêma Cizîra Sûriye dike.

Diçe li Trablusê li cem hevrêyên xwe di Dibistana Mesîhiyan da mamoste-tiya felsefeyê dike lê digel vê jî peywendîya xwe bi der û dorên kurdî ra qut nake û ji bo *Roja Nû*.¹⁸ gotaran dinivîse. Ev hevkarî kêmek berîya dawîlêhatina rojnameyê xurttir dibe gava ku Thomas Bois tê Beyrûtê ku wekî seydayekî mesîhî yê di nav terîqata Karmelîten Ezîz Joseph da dersan bide. Li Beyrûtê gellek caran Kamuran Bedirxan dibîne û bi wî ra têkilîyeke xurt datîne. Tewer

16 Ev xebata ku tê behskirin, piştî 11salan ser vê nivîsê re, di 2017an da bi rêvebirîya Kendal NEZAN ve tê temamkirin û çapkirin : https://www.institutkurde.org/activites_culturelles/evenement_478.html (Nota Wergêr)

17 Saulchoir, Série Djézireh, Dossier n° 44. 'Les Kurdes'. Correspondance da r. Drapier au r. Tunmer, 16 novembre 1938, r. 1.

18 Binêrin li gotarên wekî "Çîgerxwînê helbestavê Kurd" (Bois 1945a); "Di destpêka sedsala 19an da herêma Cebel Sincar" (Bois 1945b); "Kela Xûrsê" (Bois 1945c)

Kamûran Bedirxan ji Thomas Bois ra behsa serborîyên xwe dike û ew jî wan serborîyan dike nivîs (Blau 2000a: 71-90). Bois ji sala 1947an pê ve hejmareka mezin ya xebatan dinivîse di hemû beşên kurdolojîyê da: zimannasî, ol, folklor, dírok, civaknasî.¹⁹ Ew herwuha tevî xebata duristkirina ferhengeka kurdî/fransî jî dibe ligel Kamuran Bedirxan û Roger Lescot.

Digel ku ev her sê kurdolog xwedan taybetmendîyên cuda bin jî, di hin xalan da rewşa van her sê kesan dişibe hevûdu. Ya yekem, em dikarin bêjin ku yek ji wan xalan ew bû ku di warê kurdolojîyê da pispor kêmbûn û ji bo wan pêwîstîyeke berbiçav bû ku bi Kurdan ra têkilîyê daynin. Ya diduya, xal-êke hevpar ya di navbera Rondot, Lescot û Bois ew bû ku wan her sêyan jî erk û peywira xwe ya fermî (zanistî, leşkerî, olî) wêdetir tişt kirin, alîkarîyeke mezin dan birayên Bedirxanî yên ku rewşerbîrên serkirde bûn di nav tevgera neteweperwerîya kurdî da. Pierre Rondot vê yekê di rojnivîska xwe ya sala 1940an da wuha îtiraf dike: “Min wekî wan kir, min sîrr û razên wan veşartin, ez şîrîkê wan bûm. Tiştên ku ew îro di derheqê min da dibêjin, dilê min xweş dikin” (Blau 2000b: 101). Herwuha, van her sê kesan, piştî ku hîmayet û mandaya fransî sala 1946an li Lubnan û Sûriye bi dawî hat, hevaltîya xwe ya li gel rêvebirên Kurdan qut nekirin her berdewam kirin; ev têkilî ji aliyê berjewendîyên sîyasî ve bêfeyde ye çimkî êdî hukma fransî li wir xilas bûye loma mirov dikare bêje ku hevaltîya wan ji berjewendîyên sîyasî wêdetir bûye.²⁰

Yek ji wan xalên hevpar ev e ku ev kurdologên fransî di nav tengasîyeka daîmî da xebatên xwe yên rewşenbîrî birin serî ji ber ku ji hêlekê ve mecbûr bûn ku erk û peywîrên xwe yên sereke encam bidin -Îstîxbarat ji bo Lescot û Rondot, Mîsyonerîya Mesîhî li Rojhilata Navîn ji bo Thomas Bois-, ji hêlekê ve jî divîya bû lêkolîna zanistî bikin. Wekî ku me qal kir, Rondot û Lescotê ku di destpêkê da bi teşwîqa Montagneyê ve ketibûn nav xebatên kurdolojîyê, dest bi xebatên xurt kirin, ji xwe ra kirin armanc ku korpuseka akademîk ya hevdem û bi rêk û pêk ji bo xebatên kurdî ava bikin lê ev armanc tu carî ne di xema rêvebirîya fransî da bû. Lê digel vê jî em nikarin bêjin ku ev her sê kurdolog tenê ji bo xatirê kurdî xebat kirin, ew hertim xwedanên “du armancan” bûn.

19 Ji bo hûngilîyên li ser jîyana Thomas Bois û li ser lîsteya temamê berhemên wî yên di derheqê Kurdan da, binihêrin Blau (1995 : 85-96)

20 Herwuha, em dibînin ku Thomas Bois û Pierre Rondot îmze û piştgirî didin kampanyayê alîkarîyê ji bo “Gelê Mexdûr yê Kurdistan Iraqê” ku ji aliyê Kamuran Bedirxan ve tê destpêkirin di sala 1967an da. Saulchoir, Série Djézireh, Dossier n° 74. Nameya Kamuran Bedirxan bo Thomas Bois, Paris, 14ê Rêbendanê 1967 û teksta Banga Alîkarîyê ku ji aliyê kesayetên cûr bi cûr yên fransî ve hatiye îmzekirin.

Îro em dizanin ku hevkarîya di navbera Lescot û Bedirxanîyan da ji çarçoveya rewşenbîrî wêdetir bû. Belê, Roger Lescot di Rêbendana sala 1940an da raportekê dinivîse bi sernavê *Bingehên Mihtemel Yên Bo Sîyaseteka Kurdî* û tê de pêşnîyaz dike li rêvebirên fransî yên mandayê ku piştgirîya xwe ji bo tevgera çandî ya kurdî xûrtir bikin da ku li Kurdistanê bi şêweyekî giştî, pêşî li propagandaya Sovyetan bê girtin. Bi raya Lescot, mafên çandî ku rêvebirîya Sovyetî daye Kurdên Ermenistanê dikare bandorê li ser wan Kurdan bike ku bibin alîgirê Sovyetan ên ku ji sala 1932yan ve xebat û çalakîyên çandî dimeşînin li Lubnan û Sûriye. Ji ber vê, Lescot hingê pêşnîyaz dike ku dersên kurdî ku berî şer li herêma Cizîra Jorîn û Şamê hebûn,²¹ dîsa ji nû ve bên vekirin, herwuha daxwaz dike ku pirtûkên dibistanê bên çapkirin û heger îmkan hebe rojnameyek yan kovarekê bê çapkirin.²² Tenê 3 meh bi dû vê daxwaza Lescot, vêca Kamuran Bedirxan nameyekê dişîne Komîserîya Bilind ya Hîmayeta Fransî û daxwaz dike ku dewleta Fransa li Lubnan û Sûriye piştgirîya tevgera çandî ya kurdî bike û di nameya xwe da metirsîyên ku Lescot vedibêje, dubare dike. Digel ku ne hesan e mirov bêje di navbera van du nameyên Kamuran Bedirxan û Roger Lescot da lihevkirinek tunne ye, herçi stratejîya wan e em dikarin bi hêsanî bêjin ku her du jî ji bo pêşvebirina çalakî û xebatên kurdî xwedan stratejîyeke hevpar in.

Helbet, raporta Lescot welê pêşnîyar dike ku alîkarî bo Kurdan bê kirin da ku ew bikevin bin kontrol û çavdêriya rêvebirîya fransî. Her wekî Robert Montagne, Roger Lescot jî him rewşenbîr bû him jî *xizmetkarekî* dilsoz yê rêvebirîya hîmayetê bû. Axirê rewşenbîrên kurd bersiveke erênî digirin ji bo daxwazên xwe. Herwuha, ew *kurdîzanê hişyar* ku divîya bi dizî biketa nav civata Kurdan, ji xeynî Roger Lescot kesekî din nebû.²³

Mirov nezalalîyekê peyda dike di pêwendîya Rondot û Lescotê ya li gel rewşenbîr û serkirdeyên Kurdan. Çi ye gelo hedefa esasî ya Roger Lescot gava ku tevî tevgera çandî ya kurdî dibe? Gelo hez dike berê wê tevgerê bide ber bi *modernîteyê*, yan hema wusa ji xwe ra qadeke zanistî ya nû, vala û serbest digere ku afirînerîya xwe pêş bixe? Gelo hez dike tevgera kurdî ya bihêz

21 Di salên 1930î da, Kamuran Bedirxan berpîrsê dersên kurdî yên li Beyrûtê ye. Ev dersên kurdî berbelav dibin di sala 1938an da bi avabûna dibistanekê li Şamê û dibistanekê din li herêma Cezîreya Jorîn.

22 Fonds Rondot, Dossier Kurdes da Syrie. 'Bases éventuelles d'une politique kurde', (Bingehên Muxtemel Yên Bo Sîyaseteka Kurdî) ji hêla Roger Lescot ve di Rêbendana sala 1940an da hatîye nivîsîn. tê de binêre li rûpela duyem.

23 Fonds Rondot, Di Derheqê Kurdên Sûriye da, Notek bi hejmara 98/SS/VI ji bo birêz delegeyê Komîserîya Bilind. Ofisa Taybet. Muhafazata li Şamê, Hauran, Şam, 10 Rêbendan 1941, rûpel 1'2.

ava bike ku ew hêz bibe piştgirê Fransayê li Rojhilata Navîn? Herwuha, gelo gava ku Pierre Rondot dibêje “ez îtiraf dikim, ez hevkar û hogirê Bedirxaniyan bûm”, hingê Rondot ji bîr nake û dîsa dibêje ku jixwe erk û peywira serbazên fransî ew e ku “têkilî xwe ya li gel hevkar û muxbîrên xwe qut nekin, her li ser xwendin û lêkolînkirina cîhana kurdî berdewam bin ji bo ku heger rojekê nîqaşek derket, da mirov bizane biryara rast kîjan e, heger mudaxeleyek pewîst bû da mirov bizane kiryara baştir kîjan e, heger rojekê dewleta fransî tiştê nekir jî, da ku gava dema wî hat qet nebe bila dewlet bikaribe gotina xwe bêje, her çî piçûk be jî bila bikaribe rola xwe bilîze û bikaribe tehlîla kiryarên alîyên din bike û jê fahm bike” (Rondot 1938: 16).

Axirê herçiqas ku ev sê kurdologên fransî bêjin ku ew daxwaz dikin kurdolojîyeka ser esasên zanistî ava bikin, mixabin beşek ji xebata wan ser esasekî din e. Lescot gellek lêkolîn û xebatên serkeftî yên etnografîk çêdike bi taybetî jî li ser Êzidiyên li Sûriyeyê. Lê ji ber ku lêkolîn û zanyariyêke hewqasî Kurd û Kurdistanî çêdike ku navê xwe yî rastî di pirtûkê da bi kar nayîne, maxlasekê bi kar tîne. Lescot (bi navê nivîskarîyê, Robert Surie) herwuha îtiraf dike ku beşek ji erk û peywira wî ew bû ku “fîkr û gotinên neyînî yên Ewropîyan yên di derheqê Kurdan da sererast bike” û wan biguherîne bi gotûbêjên li gel wan kesên ku Kurdan baş dikin û bêhtir bi wan ra dem derbas kirine. Ya rastî, “gelê Kurd bi karaktera xwe ya çê û baş, xwe ji gelên din ên Rojhilata Navîn cuda dike.” Ji bo Roger Lescotê ku wekî hevalên xwe yên Brîtanî yên salên 1910-1920an difikire, Kurd mêvanperwer in, rastgo ne û xebatkarên welê ne ku qet nawestin. Ew ji axa xwe hez dikin, ser soza xwe ne, bifahm in û gellek hez dikin bixwînin û fêr bibin (Surieu 1944: 3).

Dîsa bi heman şeweyê, Bois jî, bi maxlasekê, pirtûkekê bi navê *Kurd û Mafê Wan* dinivîse, ev pirtûka keşeyê Domînikî yek ji berhemên wî yên herî angaje ye ku piştevanîya mafên sîyasî yên Kurdan dike (Rambout 1947). Herçi Rondot e ku dibêje ez notr û bêalî me, ew jî le cem hevalên xwe yên nêzik yên ji Navenda Xwendinên Bilind ya Rêvebirina Misilmanan (NXBRM) îtiraf dike ku kêfa wî ji Kurdan ra tê (Rondot 1938: 14-15).

III. Berhemên ji Têkilîya Kurdo-fransî Çêbûne

Heta dewra jihevbelavbûna Osmanîyan jî, reng û şeweya nasnameya kurdî baş nehatibû diyarkirin. Nasnameya kurdî -berovajî nasnameya tirkî- piştî ku Komara Kemalîst ava dibe û raperîna Şêx Seîd di nav xwîne da tê tepisandin, hingê ava dibe. Xoybûn bi broşurên xwe yên propagandaya sîyasî ve hewl dide ferq û cudahîyê baştir bide xuyakirin di navbera Kurd û dijminên wan yê bav û kalan ku ew Tirkên “hov”in (Tejel 2004: 41-58). Lê Xoybûn nabêje

bê ka nasnameya kurdî çî ye. Li gor Xoybûnê, Kurd “qurbanîyê” zilmê Tirkan e, ev îmajî mazlumîyê dikare hestên mirovan sor bike, lê ji xeynî vê sorkirina hestan, wateya Kurdîniyê nehatîye diyarkirin û vala maye.

Lê em dikarin bêjin ku ev valahî bi xebata rewşenbîrî ve hatîye tijekirin, belê, xebata rewşenbîrî ya di navbera kurdologên pêşîn yên fransî û elitên kurdî da encameka mezin derxist holê, nasnameya kurdî hat *etnîsîzekirin*. Ev entînisîzekirin bi xebatên folklorê ve çêbû, bi xêra îrtîbata di navbera kurdologên fransî û entellektuelên Kurdan da fikra lêkolînê ya li ser folklorî kurdî (çîrok, destan, stran, gotinên pêşîyan, a’det û tradîsyon) çêbû, ev lêkolîn hatin kirin û êdî mirov dikaribû *spesîfite û taybetmendîya* nasnameya kurdî nîşan bidaya, ango bi peyvên Thomas Bois ve, *gîyana Kurdî* hatibû dîtin.

Mirov dikare ji analîz û tehlîla John Hutchinson ya li ser neteweperwerîya çandî (Hutchinson 1994) sîd werbigire ji bo ku mirov baştir fahm bike wateya xebata ku Badirxaniyan ji salên 1930î ve pêk anîne. Berovajî Ernest Gellner (Gellner 1999) û Hans Kohn (Kohn 1946), Hutchinson dibêje ku nasyonalîzma çandî di pêvajoya pêşveçûn û modernîzasyonê da roleke erênî dilîze, ji ber ku vîzyona nasyonalîzma çandî ne ew e ku gel paş ve here, lê ew e ku gel bikaribe *biguhere*. Yanî vegera ser esl û esasê bi xebatên folklorê ve nayê wê wateyê ku ew nasyonalîstên çandî hez dikin ku xelk vegere wan rojên kevn yên folklorîk, berovajî vê yekê ku Gellner û Kohn dibêjin wusa ye, vegera ser folklorê ne ji bo paşveçûnê ye lê ji bo pêşveçûnê ye. Li pişt perdeya folklorê da, vîzyoneka dînamîk a neteweyî heye ku ew xwe wekî netewekî xwedan çandeka bilind dibîne û herwuha wekî netewekî xwedan cîhekî taybet dibîne di pêşketina mirovahîyê da. Ev tê vê wateyê ku qîmetdana ji bo folklorê ji hêlekê ve nîşaneya daxwaza guherîn û pêşveçûnê ye, ji hêlekî din ve jî nîşaneya daxwaza xwebûn û orjinalbûnê ye (Bedirxan 1932: 32-33).

Çandên ku li Ewropoyê jê ra dibêjin “çandên neteweyî”, pêvajoya *folklorîzasyon* van çandan, rê û rêçekê ango modelekê datîne ber elitên rojhilatî da ku bizanin ka bê folklorîzasyon çawa tê çêkirin (O’Shea 2004: 158-163). Gava ku avabûna nasnameyê neteweyî pêşve diçe û hewcetî bi hin sembola referansên neteweyî çêdibe; hingê lêkolîna li ser a’det û folklorî li gundan jî pêş ve diçe û zêdetir dibe. Lê mesele ne ew e ku mirov bizane di dîrokê da li filan deverê “di rastîyê da” çî qewimîye, mesele ew e ku mirov bizane bi çî rengî wê bûyera dîrokî “bifikire”; herçî ev karê fikrîn û xeyalkirina bûyera e, ev kar jî alîyê kesên bajarî yên wekî kesayetên sîyasî, dîroknas, folklorzan, filolog û hwd. ve tê kirin. Belê li ber me nakokîyek heye. Digel ku nasnameya neteweyî li Rojavayê Ewropayê bûbe beşek ji modernîteya liberal, sîyasî û aborî jî, meşrûiyeta wê nasnameyê li ser dîroka kevnare û li ser determînîzmeke hişk,

teşe girtîye. Gundewarî êdî bi kêrî wî tiştî tê ku êdî em dikarin bi xêra hebûna gundewarîyê îsbat bikin ku herçiqas “netewe” di nav guherînên mezin ra derbas bibe jî, kok û reha neteweyê dîsa wekî berê dimîne û naguhere (Thiesse 1999: 161-162).

Lêkolîn û berhevkirinên ku Roger Lescot ji bo edîtorên *Hawar* û *Roja Nû* dike, ji bo wan edîtoran “materyalên zêrîn” in, ji ber ku ew berhevkirinên çîrok û gotinên pêşîyan wekî materyeleke etnografîk wê derfetê dide rewşenbîrên Kurd ku ew bikaribin bi wê materyalê, çanda kurdî pêşkêş bikin û bi xerîban û bi taybetî jî bi raya giştî ya Ewropî çanda kurdî bidin naskirin.²⁴ Bi heman şeweyê, îcar Pierre Rondot hindêk gotinên pêşîyan ji Bedirxaniyan fêr dibe û ji wan gotinên pêşîyan sîd werdigire ji bo destnîşankirina ferq û cudahiya “gelê kurd” ji gelên din (Rondot 1937: 27-28). Bi vî rengî, êdî Kurd dikarin xwe di nav çarçoveyê navneteweyî da nîşan bidin, çimkî êdî “xwe nas dikin” û dizanin ku ew jî xwedî folkloreke zengîn in û folklorê wan ne kême ji yên Ewropîyan yan jî ji yên gelên din ên rojhilatî.

Berhevkirinên ji folklorê kurdî²⁵ ku ber bi dawîya sedsala 19an çap bûn û lêkolînên ku kurdologên ewropî di destpêka sedsala 20an da pêk anîn, ev her du bi hev ra bûn dermanek ji nebûna çandê bilind ya kurdî ra û welê kirin ku Kurdan êdî dikaribûn çanda xwe ji çandên din yên beyanî (tirk, ereb yan faris) kêmtir nebînin. Ji xeynî vê meyla berhevkirina materyalên folklorîk, rewşenbîrên kurd berê xwe didin avakirina helbestvaniyê nûjen ku digel ku wekî berdewama tradîsyona helbestvaniyê xuya bike jî ev helbestvaniya nûjen, li gorî helbestvaniya gelêrî, xwedî gellek hêlên cuda ye. Helbestvan şewe û tematîka tevgerên wêjeyî yên çax û dewra xwe dişopînin û wan di berhemên xwe da bikar tînin.²⁶

24 Bo mînak, Sureya Bedirxan (Bedirxan 1936) tevî Kongreya 16emîn ya Antropolojîyê dibe ku li Brukselê sala 1935an dicive, li wê kongreyê Sureya Bedirxan wêjeya kurdî ya klasîk û gelêrî pêşkêş dike.

25 Berhemên pêşîn yên ji folklorê kurdî ji hêla gellek oryantalistan ve hatine berhevkirin ku ew oryantalist yên wekî Jaba, Lerch, Socin, Prym, Makas û Mann her yek ji welatekî cuda ne. Mann van berhemên dide çapkirin : Mem û Zîn, Las û Xezal, Nasir û Malmal, Ferkh û Asti, Culindî. Li Yekitîya Sovyetîyê xebat û eleqeya li ser folklorê kurdî bi xêra Kurdên li Ermenîstanê û çend oryantalistên sovyetî her berdewam dibe. Herçî oryantalistên Brîtanî ne, ew jî xebatên li ser wêjeya kurdî û wergerên ji wêjeya gelêrî ya kurdî didin çapkirin. Basile Nikitinê ku bi eslê xwe Rûs e lê xebatên di derheqê Kurdan da bi fransî dinivîse, ew jî li teniştê oryantalistên fransî yên li Sûrîye û Lubnanê xebatan dimeşîne. Nivîskarên herî afirîner û jêhatî di nav fransîyan de, Roger Lescot û Thomas Bois in.

26 Bo mînak, Kamuran Bedirxan û Qedrican helbestên serbest yên bê kafiye dinivîsin.

Li ser vê yekê, em dikarin berê xwe bidin Ernest Gellnerê ku diyar dike ku “nasyonalîzm pêşî ser nav û xatirê çandeke gelêrî radibe û xwe bi xelkê dide qebûlîkirin. Nasyonalîzm, ji jîyana ku gundî dijîn, ji jîyana ku gel, *Volk* û *Narod* dimeşînin, nasyonalîzm ji ked, paktî û saxlemîya wê jîyanê ji xwe ra sembol û nîşaneyan çêdike. (...) Gava ku nasyonalîzm xurttir dibe, hêdî hêdî çanda bilind ya biyanî dihelîne û têk dibe, lê naçe di şûna wê da çanda xwemalî ya kevnare û paşvemaî nake çanda xwe ya nû. Nasyonalîzm ruh û gîyan dide çanda xwemalî angû ji xwe ra bi alîkarîya zanyar û pisporan ve çandeke nû ya herêmî lê pêşketî diafirîne, helbet mecbûr e ku îtîraf bike ev çanda han çandeke welê ye ku reng û rûçikên herêmî yê berê dihewîne” (Gellner 1999: 88-89).

Tiştê girîng ev e ku diskûrsa li ser nasnameya kurdî dibe xwedan meşrûûyeteke û ev diskûrs pêşî ji aliyê kurdologan ve, bi dû ra ji aliyê rojnameger û sempatîzanên *doza kurdî* ve tê belavkirin. Belê, Thomas Bois, bi armanca jinavbirina klîşeyên neyînî yê di derheqê Kurdan da, di pirtûka xwe da cîh dide nivîsên sîxûrên Brîtanî yê ku ji nêzik ve ligel Kurdan kar kirine û di pirtûka xwe da wuha qala vê yekê dike: “Rast e ku hinek ji Brîtanîyan gellekî hişk bûne li dijî Kurdan, tew gotine ku Kurd *netemam* in, lê hinek ji wan jî hene, zêdetir in û ne ku em bêjin ji koma ewil kêmtir bêalî bin, ew dibêjin ku Kurd xwedan fazîlet in. Hindek ji wan ku ji nêz ve Kurd nas kirine, yê wekî Soane,²⁷ Hay,²⁸ Hamilton²⁹ û gelekên din ku em li vir navê wan nanivîsin, qet tereddud nakin û dibêjin ku Kurd ji cînarên xwe yê Ereba, Tirk û Faris ne kêmtir in, tewer ji wan çêtir in û siberojeke rind li benda wan e (Bois 1962: 639). Li gorî portreyê Kurdan ku ji aliyê van nivîskarên ve tê danîn, fazîletên Kurdan

27 Femandar Soane (Soane 1926: 398-399) dibêje ku “gellek ji wan porzer û çavşîn in; heger mirov zarokekî bi wî rengî têxe nav zarokên îngiliz, wê kes pê nehise ku ew zarokekî xerîb e çimkî çermê wî jî spî ye”. Dû ra lê zêde dike: “Erê ji hêla fizîkî ve em dirûvê hevûdu didin; lê herwuha ji hêla zimanî ve jî em dibînin ku zimanê anglo-Sakson û zimanê kurdî ji heman çavkanîyê ne”.

28 Serbazê Brîtanî, Mr. Hay, ber xwe dikeve ji ber ku mixabin raya giştî ya ewropî baş nas nakin “vî gelê aryan ku dişibin wan”. Li gorî Mr. Hay, “fitrat û karaktera Kurdan hema bêje wekî ya gelên bakûrî yê Ewropî ne û kurd gellekî xebatkar in, ciddî ne û bi hesabê xwe dizanin” (Hay 1921: 35 et 62).

29 Eynî wekî mêtîngerên fransî yê ku bawer dikin ku “mêrê Kabîl” ji mêrê Ereba xebatkartir e, biaqiltir e û ji mêrê ereba zêdetir berê wî li guherîn û modernîzmê ye, Hamilton jî wuha dinivîse: “Kurd çiyayî ne û piçekî cuda ne, bêdeng in û xûyê wan gellekî dişibe xûyê Îskoçîyan (...) Kurdek ku carekî bû hevalê te, êdî ew hevalê te ye herî dilsoz e, dilsoziya wan tewer ji ya Ereba çêtir e. Lê Kurd ne gêj in. Ew bi çavên tije-meraqa dinyayê dişopîne, û her çiqas welatê wan paşve mabe û bi derengî ketibe jî ew bixwe her pêşketîneka zanistî û teknolojîyê bi baldariyeka xurt dişopîne. (Hamilton 1994: 237-238).

gellek in: Ew ser soza xwe disekinin, ji xizim û mirovên xwe hez dikin, rêz û hurmeta wan ji bo jinan bilindtir e anegorî neteweyên din yên misilman, ji wêjeyê fahm dikin, ji helbestan hez dikin, ji Kurdbûna xwe razî ne, xwedan mîzah û hesta pêkenokîyê ne, xwe ji îş û kar nadin alî û mazûvanên baş in. Herwuha, zilamê kurd ne radîkal e û ne *maço* ye.

Dîsa li ser vê meseleyê, di nav kovar û mecmu'ayên kurdî yên dewra Osmanîyan da gazin jê tê kirin ku Kurd gellek paşve mane û bi taybetî jî di nav wan weşanan da gilîya rewşa xirab ya jinên Kurd tê kirin (Klien 2001), lê belê herçî di wan kovaran da yên ku ji alîyê Bedirxanîyan ve li Lubnan û Sûriye tèn çapkirin, tê de tê angaştîkirin ku "jinên Kurd li gorî jinên din ên li Rojhilata Navîn, azadtir û serbesttir in." Herçiqas ne rast be jî, tê gotin ku "rewşa jinên Kurd ji jinên din çêtir e û ev rewş ji bo Kurdan wekî hêvîyekê û wekî faktoreke ronesansa rojhilatî" tê qebûlîkirin (Bedir Khan 1933: 390). Ev dîskursa ku armanc jê ew e ku Kurdan li ber çavê raya giştî ya Ewropî wekî "netewekî medenî" nîşan bide, ev heman dîskurs ji alîyê kurdologên fransî ve jî hatiye piştrastîkirin û dubarekirin. Belê, Thomas Bois dibêje "li cem Kurdan, jin li gorî neteweyên din ên misilman, hîn serbesttir e" (Bois 1965: 43 et 52).

Ev dîskursa ku ji bo raya giştî ya Ewropîyan û herwuha ji bo elîtên rojhilatî yên ewropayîbûyî hatibû çêkirin, bi demê ra êdî Kurdan jî hêdî hêdî ji vê dîkursê bawer kirin û vê yekê welê kir ku nasnameya kurdî ya di proseya avabûnê da,³⁰ dewlemendtir bibe û hîşt ku Kurd jî bikevin nav "cîhana navneteweyî" (ya Ewropî). Tiştê ecêb û paradoksal ew e ku herçiqas Bedirxanîyan ji bo nîşandana ferqa di navbera Tirk û Kurdan da xebatên oryantalistan bi kar anîbin jî; di nav xebatên oryantalistan da ferqekî mezin xuya nake, "tebîet û karaktera neteweyî" ya Kurdî ku oryantalist behs dikin ne dûrî wê karaktera neteweyî ye ku dîsa ew dibêjin ya Tirkan³¹ e. Sedema wê yekê, ku mirov dibîne nêzîkatîyek heye di danasîna tebîeta neteweya Kurd û Tirkan da, ev e ku îdeologên van her du neteweyan xwastinê neteweyên xwe anegorî standardên neteweyên ewropî bidin naskirin û ew îdeolog di çarçoveyê hevpar ya ew-

30 Rejîma Kemalîst di derheqê nasnameya Kurdan da agahîyên nerast û klîşeyên neyînî belav dikirin, li dijî wan agahîyên nerast pêwîstî hebû ku Kurd hindêk delîlan nîşan bidin û bikaribin ji nû ve werin ser hemdê xwe. Loma ji bo cara yekem nîrx û qîmetek hate zanîn ji bo folklorê kurdî (stran, kilam, govend, çîrok, destan, a' det û kevneşopî) û "karakterê neteweyî" ya Kurdan.

31 Marcel Clerget'ê (Clerget 1938: 76-77) ku ketibû bin bandora klîşeyên ku elîtên kemalîstan di derheqê tirkan da belav kiribûn, di berhema xwe da Tirkan bi vî rengî teswîr dike : "Tirk ji sermayê hez dike, sekan e, ciddî ye, xwedan nîzam û disîplîn e, karê mantixî dike û hişê wî zelal e" Ji bo ku hûn bandor û te'sîra turkologên ewropî bibînin li ser avabûna nasnameya tirkî, kerem kin vê çavkanîyê Copeaux (1997: 34-40).

ropî da ku xwedî eynikekê be ku tê de bikaribin xwe bibînin, neteweyên xwe dişibînin neteweyên ewropî. Bi vî rengî, Tirk û Kurd, ev her du neteweyên ku di esasê xwe da rojhilatî ne, welê hatibûn danasîn wekî ev du netewe xwedî taybetmendî û çanda ewropî bin. Ji bo danasînê ev hatine bikaranîn: Tolerans û xweşbînî ji bo cudahîyên olî, rêz û hurmet ji bo jinan, cesaret û wêrekî di demên dijwar da û camêrî, yanî xûy û karatera zilamekî *gentleman*. Herwuha, alfabe ya latînî ya ku bi hevkarîya dizî ya Celadet Bedirxan û Pierre Rondot hatibû çêkirin û wekî pêşketineke çandî dihate hesabandin, Kurdan ji Ereb û Farisan diqetîne lê belê wan nêzîkî Tirkan dike (Rondot 1935: 26).

Xebata ji bo avakirina nasnameyekê nikare xwe ji rewş û bandora nasnameyên din azad bike, bivê nevê ev xebat dikeve bin bandora xebatên din yan jî ew bixwe li ser yê din bandorê çêdike, welhasil xebateke dînamîk û bitevger e. Bo mînak, ji ber ku muxalefetek hebû di navbera nasyonalîstên kurd û tirk de, îdeologên van du neteweyên reqîb diskûrs û beyanên xwe diguherandin, heger ê tirkan tiştêkî bigota yê kurdan tiştêkî din digot yan jî îdeologê kurdan tiştêkî bigota yê tirkan tiştêkî din digot. Ev yek welê kir ku teqlîdeke dualî derket holê di navbera “yê ku hukm dike” û “yê ku di bin hukmê da ye.”³²

Encam

Hevkarîya Kurdologên Fransî û rewşenbîrên Kurd paradoksek derdixe holê. Rêvebîrên Enstîtuya Fransî ya Şamê (E. F. Ş) hewl didan ilm û zanîneke pratîkî bê afirandin ku avakirina dewleteke Sûrîye ya yekbûyî hesantir bibe, lê belê berovajî vê gava ku Montagne û kurdologên Fransî li ser Kurdan lêkolîn dikirin, xebata wan bi rengekî din bû, lêkolîna xwe wekî ku xebateke li ser “kêmetewekî” ji rêzê ya etnîkî û olî be, yan jî tenê wekî ku realîteyek be, lêkolînê xwe welê birêve nedibirin. Herçiqas ku Kurdên Sûrîye ne xwedan yekîtîyekê bûn û ne wekî hev bûn jî, kurdologên fransî û nasyonalîstên kurd bi lêkolîn û xebatên xwe hez dikirin wan wekî “netewekî yekgirtî” û “yekreng” nîşan bidin ku ev yek zirareke mezin dida nasyonalîstên ereb yê ku hez diki-

32 Belê rewşenbîrên Kurdan herçiqas ji hêla maddî ve xwedî tiştêkî nebin jî, dîsa jî bi jêhatîbûna xwe dibin muxatabên ciddî li hember rejîma kemalîst. Bo mînak, haya elîtên Tirkan ji wan teorîyan hebû yê ku Bedirxanî li ser pîrsa esl û esasa Kurdan danîbûn, herwuha elîtên tirkan ev teorî di nav xwe da bi dizî nîqaş dikirin. Bedirxanî êdî dibûn sembolek û ev yek xeternak bû ji bo kemalîstan, loma heyeteke tirkan di sala 1935an da çend çaran tên Beyrûtê, Celadet Bedirxan dibînin û jê ra hindê teklîfan dikin ji bo ku vegere welêt. Fonds Rondot, Dossier Kurdes da Syrie, Raporta ku Pierre Rondot bi destê xwe nivîsiye û vê sernavê lê kirîye : ‘Conversation entre Djeladet Bedir Khan et les Turcs’, s. 1, 3 juillet 1935.

rin Sûrîyeyeke hevgirtî ava bikin. Gelo ev mexsûs dihate kirin ji bo ku civakeka dabeşkirî çêbe û hêsantir were birêvebirin? Gelo ev israra domandina hinek paradîgmayên kolonyalist in ên wekî lêgerîna ‘celeb’, rengê herêmî, herwuha wekî pêvajoya analîtîk û wekî awayekî dîtina tiştên nas bi berçavkeke nû?

Gava ku mirov berê xwe dide wan berhemên yênan ku kurdologên fransî çêkirine, ji mirov ra eşkere dibe bê çawa peywendî û stratejîyên tevlihev hene di navbera berhemên cihêreng da yênan ilm û sîyasetê. Helbet ev sê kurdologên fransî bi ser dikevin, ilm û zanîneke nû diafirînin û ev ilm û zanîna durrî zanîyên wê oryantalîzma klasîk e ku tê de bi şeweyekî dîyar “zanîstên elît” yênan wekî arkeolojî û îslamolojî hukm dikin. Lescot û Rondot dan ser şopa Montagne, loma hewl dan xwe piçekî ji hukma rêvebirên mandayê rizgar bikin û di kar û barên xwe da bibin xwedan otonomîyekê. Lê dîsa jî lêkolîn û xebatên wan sedî sed ne objektîf bûn, sedî sed ji mantiqa mêtînger ne durr bûn; wan bi xebata xwe ya zanîstî ji hêlekî ve nîşan dan bê ka realîteya civakî, sîyasî, aborî û çandî li ser erdê kolonîkirî çî ye, ji hêlekî din ve jî wan bi xebatên xwe yênan zanîstî prestîja neteweyî ya Fransayê bilind kirin (Méouchy 2004: 31). Axirê xebateke zanîstî û objektîf ya li ser “kêmneteweyan” wê derfet û meşrûiyetê dide Fransayê ku li Lubnan û Sûrîyeyê wekî hêzeke maqûl ya kolonîyal di navbera komên cuda yênan etnîkî û olî da hekemtiyê bike.

Xebat û hevkarîya elîtên Kurd û Fransîyan bandoreke gellek mezin çêdike li ser dîyarkirina sînor û xetên nasnameya kurdî, çunkî ji hêlekî ve Kurd dipejirînin û qebûl dikin wan paradîgmayên ku di oryantalîzma destpêka sedsala 20an da berbelav in, ji hêlekî din ve jî, kurdologên fransî bi xêra palpiştîya Enstituya Fransî ya Şamê di serdema mandayê da bi lêkolînên xwe ve li ser Kurdan tiştên nû kifş dikin.

Herçiqaş hejmara wan ne zêde be jî, koma rewşenbîrên Kurd yênan li Lubnan û Sûrîye toreke rewşenbîrî ava kirin û ev tor him sînorên dewletan derbas kir him jî tenê di nav komên kurdî da nema. Giregirên tevgera çandî ya kurdî ya li Lubnan û Sûrîye, danûstandina fikr û projeyan kirin li gel “berpîrsên çandê” yênan ji nav Kurdên Ermenistana Sovyetîyê û ji nav Kurdên Iraqê. Di heman demê de, kurdolog û oryantalîstên Ewropî ji berhemên birayên Bedirxanî sûd werdigirin û berhemên wan wekî referans bi kar tînin. Pêwendîya di navbera rewşenbîrên kurd û kurdologên fransî da helbet gellekî xurt bû. Pêşî, hevkarîya van du alîyan ji ber hewcetîya fransîyan dest pê dike, fransî dixwazin gelên li ser erdê Sûrîye nas bikin da ku rêvebirina wê erdê ji wan ra hêsantir be, lê paşê ev hevkarîya di navbera du alîyan da ji hewcetîyê wedetir diçe û hevkarî werdigere ser hevaltîyê lê ev hevaltî piçekî tevlihev e. Çimkî hevaltîya di navbera birayên Bedirxanî û kurdologên fransî (Pierre Rondot û

Roger Lescot) de, pêşî li wan nagire ku bidin pey armancên cuda: Bedirxanî li pey xûrtkirina hest û nasnameya kurdî ne, Pierre Rondot û Roger Lescot jî li pey parastina berjewendîyên eskerî û aborî yê dewleta Fransayê ne. Ev tevlihevîya peywendîya franko-kurdî, di nivîsandina berhemên li ser Kurdan da jî, xwe nîşan dide. Roger Lescot, Thomas Bois, û heta radeyekê Pierre Rondot, ji bilî çêkirina lêkolînên zanistî ya bi hewla bêalîbûn û objektîvîteyê, tevî meşrûkirina dîskûrsa nasyonalîst a kurdî jî dibin ku ev dîskûrs ji aliyê rewşenbîrên kurd yê li Lubnan û Sûrîyê ve dihat belavkirin.

Belê ev danûstandina di navbera elîta kurdî û kurdologên fransî da welê dike doktrîneke nasyonalîst bizê, lê ev wekî zayîneke *ji nav malê* ye, kes baş nizane kî ji nav kurdologên fransî û rewşenbîrên kurd, xwedanê vê doktrîne ye ku ev doktrîn dîskûrseke nasnameyî ji bo Kurdan çêdike ku li gorî vê dîskûrsê ji sala 1919an pê ve êdî heq û mafê Kurdan jî wekî her milletekî heye ku ji xwe ra netewe-dewletekê ava bikin. Ev doktrîna han li ser çend prensîpên berbiçav saz dibe. Tiştê herî sereke ev e ku him rewşenbîrên kurd ên li Stenbolê xwendî him jî kurdologên fransî ji medenîyeta Ewropî û ji pêşveçûna teknîkî bawer dikin, ev bawerî rêgezêk derdixe holê, ew jî ev e, pêwîst e Kurd û bi awayekî giştî civakên misilman, bidin ser şopa Ewropîyan û xwe bigihînin asta wan ya teknîkî.

Pêwîst e ku Kurd him ji hêla maddî ve him jî, ji hêla me'newî ve xwe nêzîkî Ewropîyan bikin, lê divê taybetmendîyên xwe yê etnîkî jî wenda nekin. Ew dikarin ji tunebûnê xilas bibin bi şertekê ve ku ew qîmetê bidin eslê xwe û bala xwe bidin tiştên ku Ewropî dikin. Li gorî vê nêrînê, wekî Berberên li welatên Magrebê, Kurd jî li Rojhilata Navîn, komeke etnîkî ya wusa ye ku dikare bi hêsanî xwe hînî şaristanîya Ewropî bike, ji ber ku Kurd bi eslê xwe hîndo-ewropî ne, bi regekî sist Islamê tethîq dikin û xûy-fitrata wan ya neteweyî dişibe ya Ewropîyan. Yanî bi alîkarîya dewletên Ewropî, bo mînak Fransa, îxtîmaleke baş heye ku Kurd bikarin xwe bigihînin medenîyeta Ewropî.

Ev “doktrîna ji nav malê” çiqas ji aliyê rewşenbîrên kurd ve hatibe bikaranîn hewqasî jî, ji aliyê kurdologên fransî ve hatîye bikaranîn û argumanên vê doktrîne him di nav broşurên propagandaya nasyonalîst da cîh digrin him jî di nav gotarên zanistî da cîh digrin, ji ber vê yekê ye ku sê çar nişên Kurd û Ewropî bi dehan salan gotin qey ew argûman argûmanên objektîf in. Ev rol û karê aktîf yê ku elîtên Kurd pêk anîne ji bo avakirina nasnameya kurdî, li me welê dike ku em dîyar bikin êdî pêwîst e em ji teorîya Edward Said wêdetir herin, ji ber ku teorîya wî ku di berhema wî ya navdar de, *Oryantalîzm* (Said 1997), heye teorîyeke piçekî statîk û giran e. Belê rewşa elîtên kurd wê pêwîstîyê nîşan dide ku em teorîya wî ya navdar biguherînin, û bêjin yê ku

Rojhilata Navîn ya îroyîn ava kirine ne bi tenê hêzên Ewropî ne ango Rojavayê bi tena serê xwe, Rojhilat ava nekirîye. Rewşenbîr û elîtên rojhilatî ku dixwas-tin milletê xwe bikin rojavayî (Ewropî) û yên ku êdî guherîbûn nedişibîyan gelê xwe, wan jî li gel Ewropîyan tevî avakirina van doktrînan bûn. Loma biryardana hevbeş ya di navbera aktorên pênasekirina kurdîtîyê da kompleks bûn. Kurdîtî îro berhema çend avabûnên cuda ye: Kurdîtîya ku rewşenbîrên kurd ava kirine, kurdîtîya ku li dijî tirkîtîyê ava bûye lê herwuha kurdîtîya ku ji derve ango ji aliyê oryantalistan ve hatîye avakirin.

ÇAVKANÎ

- Anderson, Benedict (1996) *L'imaginaire social. Réflexions sur l'origine et l'essor du nationalisme*. Traduit de l'anglais par Pierre-Emmanuel Dauzat, Paris, La Découverte.
- Avez, Renaud (1993) *L'Institut Français da Damas au Palais Azem (1922-1946) à travers les archives*, Collection Témoignages et Documents 1, Institut Français da Damas, Damas.
- Bedir Khan, Celadet (1932) 'Notices sur la littérature, mœurs et coutumes kurdes', *Hawar* 1, r. 3233.
- Bedir Khan, Celadet (1997) *Günlük Notlar (1922-1925)*, Istanbul, Avesta.
- Bedir Khan, Kamuran (1933) 'La femme kurde', *Hawar* 19, r. 390.
- Bedir Khan, Kamuran; Paul-Marguerite, Lucie (1937) *Proverbes kurdes*, Paris, Editions BergerLevrault.
- Bedir Khan, Sureya (1936) *La littérature populaire et classique kurde*, Bruxelles, Imprimerie Médicale et Scientifique.
- Blau, Joyce (1995) 'Vie et œuvre da Thomas Bois', *The Journal of Kurdish Studies* I, r. 85-96.
- Blau, Joyce (2000a) 'Mémoires da l'émir Kamuran Bedir Khan', *Etudes kurdes* 1, r. 71-90.
- Blau, Joyce (2000b) 'Pierre Rondot (2 juin 1904-6 avril 2000)', *Etudes Kurdes* 2, r. 101-102.
- Bois, Thomas (1945a) 'Cigerxwîn, poète kurde', *Roja nû/Le Jour nouveau* 53, r. 4.
- Bois, Thomas (1945b) 'Le djebel Sindjar au début du XIX^e siècle', *Roja nû/Le Jour nouveau* 56, r. 3.
- Bois, Thomas (1945c) 'La citadelle da Khurs', *Roja nû/Le Jour nouveau* 60, pp. 1-2.
- Bois, Thomas (1946) 'L'âme des Kurdes à la lumière da leur folklore', *Cahiers da l'Est* 5-6, r. 1-57.
- Bois, Thomas (1962) 'La vie sociale des Kurdes', *Al-Machriq* (juillet/octobre), r. 599-661.
- Bois, Thomas (1965) *Connaissance des Kurdes*, Beyrouth, Khayats.
- Brunel, André (1946) *Gulusar. Contes et légendes du Kurdistan*, Paris, SFELT.
- Bozarslan, Hamit (1997) 'Histoire des relations kurdo-arméniennes', in Kieser, Hans-Lukas (dir), *Kurdistan und Europa*, Zurich, Chronos, r. 182-186.
- Bozarslan, Hamit (2001) 'Correspondance des frères Bedir Khan et Pierre Rondot', *Etudes*

- kurdes* 3, r. 73-98.
- Bozarslan, Hamit (2002) 'Correspondance des frères Bedir Khan et Pierre Rondot', *Etudes kurdes* 4, r. 77-98.
- Bozarslan, Hamit (2003) 'Pouvoirs et violences dans l'Irak da Saddam Hussein' in Bozarslan, Hamit et Dawod, Hosham (dir.), *La société irakienne. communautés, pouvoirs et violences*, Paris, Karthala, r. 31-46.
- Clerget, Marcel (1938) *La Turquie. Passé et présent*, Paris, Armand Colin.
- Copeaux, Etienne (1997) *Espaces et temps da la nation turque*, Paris, CNRS.
- Gellner, Ernest (1999) *Nations et nationalisme*, Traduit da l'anglais par Bénédicte Pineau, Paris, Payot.
- Hamilton, A. M. (1994) *Ma route à travers le Kurdistan irakien. Récit d'un ingénieur néo-zélandais en Irak*. Traduit da l'anglais par Thomas Bois, Paris, L'Harmattan.
- Hay, W. R. (1921) *Two years in Kurdistan; experiences of a political officer, 1918-1920*, Londres, Sidgwick and Jackson Ltd.
- Hazim, Rojan (1995) 'Mîr Kamiran A. Bedir-Xan', *Nûdem* 15, r. 12-25.
- Kohn, Hans (1946) *The Idea of Nationalism. A Study in its Origins and Background*, New York, MacMillan Company.
- Hutchinson, John (1994) 'Cultural Nationalism and Moral Regeneration', in Hutchinson, John; Smith, Anthony (eds.), *Nationalism*, Oxford & New York, Oxford University Press, r. 122-131.
- Khoury, Philip S. (1987) *Syria and the French Mandate. The Politics of Arab nationalism, 1920-1945*, New Jersey, Princeton University Press.
- Klein, Janet (2001) 'En-Gendering Nationalism: The Woman Question in Kurdish Nationalist Discourse of the Late Ottoman Period', in Mojab, Shahrzad (eds), *Women of a non-state Nation. The Kurds, California, Mazda Publishers*, r. 25-51.
- Lescot, Roger (1940 et 1942) *Textes kurdes*, Paris, Librairie orientaliste Paul Geuthner.
- Lescot, Roger (1975) *Enquête sur les Yézidis da Syrie et du Djebel Sindjar*, Beyrouth, Librairie du Liban.
- Lescot, Roger et Bedir Khan, Celadet (1991) *Grammaire kurde*, Paris, Librairie d'Amérique et d'Orient.
- Malmîsanij (1994) *Cizira Botanli Bedirhaniler ve Bedirhan Ailesi Derneginin Tutanaklari*, Spanga, APEC.
- Méouchy, Nadine (2002) *France et Liban 1918-1946. Les ambiguïtés et les dynamiques da la relation mandataire*, Damas, Institut Français d'Etudes Arabes da Damas.
- Méouchy, Nadine; Sluglett, Peter (eds) (2004), *Les mandats français et anglais dans une perspective comparative*, Leiden et Londres, Brill.
- Métral, Jean (2004) 'Robert Montagne et les études ethnographiques' in Méouchy, Nadine et Sluglett, Peter (eds), *Les mandats français et anglais dans une perspective comparative*, Leiden et Londres, Brill, r. 217-234.
- Mizrahi, Jean-David (2003) *Genèse da l'Etat mandataire. Service des Renseignements et bandes armées en Syrie et au Liban dans les années 1920*, Paris, Publications da la Sorbonne.
- Nikitine, Basile (1956) *Les Kurdes. Étude sociologique et historique*, Préface da M. Louis

- Massignon, Paris, Librairie C. Klincksieck.
- Nikitine, Basile (1960) 'Badrkhani, Thurayya (1883-1938) et Djaladat (1893-1951)', *Encyclopédie de l'Islam*, Vol. I, Leiden & Londres, r. 895.
- O'Shea, Maria T. (2004) *Trapped between the Map and Reality. Geography and Perceptions of Kurdistan*, New York, London, Routledge.
- Özöglu, Hakan (2004) *Kurdish Notables and the Ottoman State. Evolving Identities, Competing Loyalties, and Shifting Boundaries*, Albany, SUNY Press.
- Rambout, Lucien (1947) *Les Kurdes et le droit*, Paris, Editions du Cerf.
- Rondot, Pierre (1935) 'Trois essais de latinisation de l'alphabet kurde: Iraq, Syrie, URSS', *Bulletin d'Etudes Orientales* V, r. 1-31.
- Rondot, Pierre (1937) 'Les tribus montagnardes de l'Asie antérieure. Quelques aspects sociaux des populations kurdes et assyriennes', *Bulletin d'Etudes Orientales* VI, r. 1-49.
- Rondot, Pierre (1938) 'Les Kurdes', *CHEAM* 1411, r. 1-16.
- Rondot, Pierre (1939) 'Les Kurdes de Syrie', *France Méditerranéenne et Africaine* I, r. 81-126.
- Rondot, Pierre (1940) 'Les Kurdes et l'action de l'URSS en Orient', *CHEAM* I, r. 25-27.
- Rondot, Pierre (1946) 'Les revendications nationales kurdes', *En Terre d'Islam* (2^{ème} semestre), r. 114-120.
- Rondot, Pierre (1958) 'La nation kurde en face des mouvements arabes', *Revue d'Orient* 7, r. 1-15.
- Rondot, Pierre (1972) 'Vêtue masculine et artisanat du vêtement chez les Kurdes de la Haute Djézireh syrienne', *Bulletin d'Etudes Orientales* XXV, r. 257-264.
- Rondot, Pierre (1993) 'Syrie 1929, itinéraire d'un officier' in Bianquis, Anne-Marie (eds.), *Damas. Miroir brisé d'un Orient arabe*, Paris, Editions Autrement, r. 95-104.
- Said, Edward W. (1997) *L'Orientalisme. L'Orient créé par l'Occident*, Traduit de l'américain par Catherine Malamoud. Préface de Tzvetan Todorov. Postface de l'auteur traduite par Claude Wauthier, Paris, Edition du Seuil.
- Soane, E. B. (1926) *To Mesopotamia and Kurdistan in Disguise*, Londres, Murray.
- Surieu, Robert (1944) 'Kurdistan II', *Roja Nû* 41 (3).
- Tatchjian, Vahé (2004) *La France en Cilicie et en Haute-Mésopotamie. Aux confins de la Turquie, de la Syrie et de l'Irak (1919-1933)*, Paris, Karthala.
- Tejel, Jordi (2004) 'Le Khoyboun et la fabrication des premiers martyrs du nationalisme kurde', *Etudes kurdes* 6, r. 41-58.
- Tejel, Jordi (2007) *Le mouvement kurde en exil. Continuités et discontinuités du nationalisme kurde sous le mandat français en Syrie et au Liban (1925-1946)*, Berne, Peter Lang.
- Thiesse, Anne-Marie (1999) *La création des identités nationales. Europe XVIII^e-XX^e siècle*, Paris, Seuil.
- Trégan, François-Xavier (2004) 'Approche des savoirs de l'Institut français de Damas: à la recherche d'un temps mandataire', in Méouchy, Nadine et Sluglett, Peter (eds.), *Les mandats français et anglais dans une perspective comparative*, Leiden, London, Brill, r. 234-247.

Levant (1930-1946)', *European Journal of Turkish Studies*, Thematic Issue N°5 , Power, ideology, knowledge - deconstructing Kurdish Studies, URL: <http://www.ejts.org/document751.html> To quote a passage, use paragraph (§)

Watenpaugh, Keith D. (2004) 'Towards a New Category of Colonial Theory: Colonial Cooperation and the Survivors Bargain. The Case of the Post-genocide Armenian Community of Syria under the French Mandate' in Méouchy, Nadine et Sluglett, Peter (eds.), *Les mandats français et anglais dans une perspective comparative*, Leiden, London, Brill, r. 597-622.

WEKÎ ŞÛNGEHA DIJ- MÊTINGER; GOR DI ÇÎROKÊN “LEYLANA RASTIYÊ” Û “LI GORISTANEKE AMEDÊ” DE¹

Kurte

Çîrokên di kovara *Hawarê* de weşiyayî, digel ku form û teşeyên yekem yên çîroka modern yên Kurmancî ne jî, wekî eger û kartêkên nivîsînê jî, xwedî taybetiyeke xweser in. Ev taybetî danandî ye li ser helwêsta neyînkirina hêmanên ku ji ‘resenî’ û ‘xwebûnî’ya neteweyekê dûr in; û helwêsta ketî behsê di çîrokên ku di kovara *Hawarê* de weşiyane pir aşkera û xuyayî ye. Em ê di vê nivîsara xwe de hewlê bidin da ku karibin daynin rastê ka ‘gor’; wekî şûngeheke dij-mêtinger, di çîrokên *Leylana Rastiyê* û *Gornistanek Li Amedê* de çawa û bi çî rengûawayan hatiye destnîşankirin.

Destpêk

Em ji kîjan aliyê ve nêziktêdanê bo wê bikin jî, her nivîsar di çarçoveyekê de hiltê û çarçoveyên wê di heman demê de sînorên wê jî diyar dikin. Digel vê yekê jî, sînorê diyarbûyî, nivîsarê dike şûngeheke (mekanekî) berfireh ku şûngehên dîtir bi hêsanî dikarin tê de hîlbên. Û şûngehên ku di nav şûngeha berfireh, yanî di nivîsarê de, cî bi cî dibin, di heman demê de dibin warekî bo nîşandayîna heyîniyê. Û mirov, wekî heyîneke ku di şûngehê de bi keys dibe, pêwendiyekê nêz û di rengê canêcanê de bi şûngehê re datîne. Loma jî, pirî caran hebûniya mirovan digel hebûna şûngehan tê kifşê û tê pênasekirin.

¹ Di kovara *Hawarê* de, navê çîrokê wekî, ‘Li Gornistanek Amedê’ ye û wekî navê pirtûka hati çapkirin jî “Li Goristana Amedê” ye. (Weşanên Lîs, Diyarbekir, 2007)

Di çarçoveya dabaşa cîbicîbûna di şûngehê de, mirov digel hebûniya xwe, pêwendiyêke taybet jî bi şûngehê re datîne û ew şûngeh ji bo mirovan dibe “warekî hevkartêkî û ezmûndariyê” (Heiddeger, 2018: 24). Loma jî, şûngeh, bi wateya hebûniyê, “ew qad e ku mirov pê xwe li gerdûnê digire; li mirov dibe warê pêkanîn/çêbûnan ku hem berhema serketinên mirovan hem jî qada pêkanînên wan e” (Korkmaz, 2007: 400). Bi taybetî, di warê xwelêgirtinê de, hin tişt hene ku em di demekê de pêwendiyê bi wan re datînin; em der barê wan de hin tiştan ji bîr dikin û hin tiştên ji wan jî li me dibin bîranîn. Û çendî ku em di demajoya ezmûn û pêkanînên xwe de dikevin nav nehişberiyekê jî, hemû tiştên jiyayî, piştî hişberiyêke praxîsî û çalakgeriya jiyanê, di rengê ‘hişê palandî’ de li me dibe hişberiyêke ku dikare di helûmercên neyînî de jî şûngeha ezmûnê bo xwe bike şûngeha hebûniyê. Digel vê yekê jî, li ser awayên hevkartêkî û çalakiya jiyanê, şûngeh bi vî rengî li hev dabeş dibin;

“1) şûngehên dorhêlî; ew cî û war in ku pêwendiya kes-şûnê lê bi temamî nehatiye danîn û ew cî nehatine veguherandin û nebûne ciyên bibîranînê, 2) şûngehên têgihîni²; ew cî û war in ku pêwendiya kes-şûnê lê bi awayekî arîşedar (problematîk) didin der û ew cî hatine veguherandin û bûne ciyên bibîranînê” (Korkmaz, 2007: 402-403).

Hevkartêkî û ezmûndariya mirovan ya ku bi şûngehê re çêdibe, li gorî helûmerc û qewamên rûdayî dibe xwedî awa û dirûv; û di pey re jî rengê pêwendiya ku bi şûngehê re hatiye danîn, dide der. Her wiha, ji ber ku “şûngehên têgihîni ne tenê cîûwarên topografîk û cografîk in” (Korkmaz, 2015: 83) û ji ber ku “dorhêl û şûngeh kartêkeke mezin li ser kesan an jî li ser ruhê kesan dikin” (Kierkegaard, 2016: 123), di heman demê de, şûngeh; wateyê hildiberînin, şahidî dikin, li mirovan dibin bîranîn û ji ber ku jibîrkirina wan nakeve behsê, bi awayekî ji awayan di dinyaya hundirîn de teşe digirin û di praxîs û çalakiya jiyanî de didin der.

Şûngehên ku li mirovan dibin bîranîn; di heman demê de parçeyekî ji bîra hevpar in ku hem di bîra takakesî hem jî di bîra kollektîf de cî didin xwe. Û bîra hevpar a ketî behsê, xwedî îmajekê ye û ev îmaj, hêma û îmajên şûngehî ne ku di bîra hevpar de cî girtine û “...li ser bîra hevpar bi rol û kartêkeke girîng radibin” (Halbwachs, 2018: 162). Loma jî, wekî encama vê kartêkê, borîrojêdî “...ne ew tişt e ku di borîrojê de qewimiye: borîrojêdî tiştêkî wisa ye ku her tim di nav dema niha de geş û zindî ye” (Bergson, 2013: 46). Û zindîbûna borîrojê, bi awayê çalakiya ku ji bo zindîhiştina bîra hevpar tê kirin ve bestandî ye û hemin ku “Neteweyek bes dikare bi jiyandina borîroja xwe bijî” (Assman, 2018: 142) praxîs û çalakiya di warê zindîhiştina bîra hevpar de tê

2 Têgihî: perceptive, algısal

kirin, kakil û naveroka bibîranîn û geşîştina wê jî destnîşan û ava dike. Loma jî, naveroka bibîranînê, hem bi xwe re eger û sedemên bîra hevpar binecî dike hem jî dibe hîm û bingeha avabûna zanava hevpar û her çend “dibe ku gewdeya neteweyî dûçarî gelek tundiyên bê jî” (Halbwachs, 2018: 163) ev tundî di heman demê de digel encamên xwe; ji bo takekes an jî ji bo neteweyekê ‘şûngehên dorhêlî û şûngehên têgihînî’ ava dikin û li ser hîma bîra hevpar, zanava hevpar “hestê ‘jêbûna (aîdiyeta) hevpar’ di hafa hiş de bi cî dike”³ (Assman, 2018: 143). Û jêbûna (aîdiyeta) ketî behsê, herî zêde li ser axa terîtoryayî, ziman û çandê reng û teşe dide xwe û wekî şûngeha vegêran û derbiranê, bi taybetî di nivîsar û berhemên wêjeyî de digihîje wateya xwe.

Şûngehên di berhem û afirandên wêjeyî de cî digirin, digel çarçoveya berhemê, bi mijara ku di xwe de dihewînin ve jî bestandî ne. Û berhemên wêjeyî ku li ser bûyer, honaka afirandê, şewaza vegêranê û li ser leheng û takekesên di afirandê de li dar in; bi şeweyê vegotinê ku zêdetir bi şanek û sembolan dirûv dide xwe, bi pêş de tên. Di vê bipêşdehatinê de, rola nivîskariyê diyarker e û “ji ber ku her teksta wêjeyî bi ‘sekn’ û ‘awirekî’ ve pêwendîdar e, navê wê tişta ku di pey vê sekn û awirê re tê û ava dibe jî; şûngeh e” (Emre, 2006: 177). Û her wekî me destnîşan kir, ji ber ku pêwendîya nivîskar ya bi şûngehê re di asta canêcanê de ye, şûngeh di berhema wêjeyî de, hem qadeke heqîqetê ye û hem jî heqîqeta ketî behsê di dema hestpêkirinê de bi vegotîneke berayînî (esehî) digihîje wateya xwe. Loma ye, ji qonaxa afirana heqîqetê û şûnde, êdî şûngeha di afirana wêjeyî de, ne tenê cî û warek e û “ne tenê sazîkirina dekoratîf e” (Lüleci, 2017: 23) û şûngeha ku di afirana wêjeyî de amaje bi demjiyan û qewamên di demê de rûdayî jî dike; êdî ji bo avabûna wateyê kevîrê qorzi bir e. Û herçî demajoya avabûna wateyê ye, bi hestê nêz û canêcanêyî ya pêwendîya nivîskar ku bi afirana wêjeyî re heye, bi têgiha Kronotopê çêtir û xweşiktir xuyanî dibe ku “...bi saya Kronotopê dem di afirana wêjeyî de bigoştûcan dibe û dîsa bi heman awayî şûngeh jî ji alî dem û dîrokê ve tê watedarkirin”⁴ (Irzık, 2014: 28).

Şûngehên di Çîroka “*Leylana Rastiyê*” de

Ranêzikiya ku bo deqeke wêjeyî tê kirin, di hemû gavan de gelemşeyeke sînorî bi xwe re çêdike. Ji ber ku ji hêlekê ve deq bi xwe çarçove û konteksta

3 “Zanava hevpar: ew hêma ye ku komekê, neteweyekê afirandîye û li ser wê bûye yek”, Assman, Jan (2018), *Kültürel Bellek (Eski Yüksek Kültürlerde Yazı, Hatırlama ve Politik Kimlik)*, (Çev. Ayşe Tekin), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, üçüncü basım.

4 Kronotop: Têgihêk e ku M. Bahtin afirandîye û Sibel Irzık wê wiha pênase dike: ‘Kronotop navê xuyangên resen yê pêwendiyên navoyî (hundirîn) ya di wêjeyê de ye ku di navbera dem û şûngehê de û bi rêya ezmûneyên civakî û bi awayên ji hev cuda tên sazîkirin.’

xwe saz dike, ji hêlekê ve bi vê çarçove û kontekstê xetên sînorê xwe bel dike û ji hêlekê ve jî deriyên ku bi tandanê dibin deriyên serpiştê, di şûnên nediyar yên sînorê xwe de ava dike. Çîroka *Leylana Rastiyê* ya Kamuran A. Bedirxan jî, bi vî rengî ye. Çîrok ji hêlekê ve bi nermikî me dixe nava xwe û hestê ku em ê bi dilê xwe ger û geştekan tê de bikin, bi me re çêdike û bi carekê re, bi hevokên xwe ve me jî sînorên xwe berpêyî wêdeyan tan dide û ne em dikarin ji navê derkevin ne jî dikarin tê de bimînin. Û şûngehên di çîrokê de ew cîwar in ku hem nehatine guherandin hem jî hatine guherandin.

Di çîroka bi navê *'Leylana Rastiyê'* (Bedirxan, 1998: 203) de, em bi hevokên 'Nivê şevê ye. Ezman bê stêr e. Bayekî sar û dijwar tê. Li ser rêyeke asê û xweher bi hezaran û bi sedhezaran kurd...' dikevin nav hestên nediyar ku bêyî ku bînin binavkirin, tê de şûngehên wekî, 'ezman' û 'rêya asê û xweher' tînin çîbîkirin. Em bi peyva 'esman' digel hestên nerm, bi şûngeheke bêbalûpal û bi peyva 'rêya asê û xweher' jî digel şayîşekê, bi çetiniyekê re rû bi rû ne. Hevokên ku piştê tînin sazkirin, çîrokê digihînin cîwarên jiyandî ku 'Li dora wan, gund û bajar xirbe ne. Ji bixêriyan dû dernakeve. Rez (...) û dar şewitandine (...) hişk in.' Û ev cîwar der barê hêma û îmajê şûngehên ku nivîskar di hişê xwe de saz kirine de agahiyê dide me. Ev agahî, hestê çetiniyê jî asêbûnê wêdetir dike û hê jî destpêka çîrokê de, bi hevoka 'Wek kêlên tirban mane' şûngeha ku bûye cî û war ji bo gund û bajaran û pê re jî bi hevoka, 'Wek kêlên miriyên Kurdistanê', bi me dide zanîn ku demek heye; di vê demê de pêkanînen zilmkariyê li dar ketiye û di encama pêkanîna vê zilmê de ji 'rez, dehl û zevî şewitîne' û 'mazî, rêlî, guhîj, darberû hişk bûne' û xuyanga wan wekî goristanek e: ku 'wek kêlên miriyên Kurdistanê' ne. K. A. Bedirxan, bi vê destpêkê re, du şûngehên ku yek jê dorhêlî ye (gor), ya din jî têgihîniye (Kurdistan) saz dike û 'gor'ê wekî "şûngeha teng û bergirtî" û 'Kurdistan'ê jî wekî "şûngeha fireh û bervekirî" (Korkmaz, 2007: 403) saz dike.

Bi dû van hevokan re, bi gotina, 'ji dûr ve, gelek dûr' nîşaneyê şûngeheke nexuya tê dayîn ku em wê şûngehê nabînin û li wir, di dema aşopkirî ya çîrokê de, 'bihar e, kulîlk dibîşkivin, deşt û mêrg, germiyan û zozan bi giya û bi hêşinahî dikenin.' Û rêya asê û xweher dikude, qefle dimeşe û hêvî, ya ku bi dema aşopkirî re dê şûngehên çîrokê jî watedar bike, di şûngeheke nexuyayî û dûr de bicîkirî ye. Û heta gihîştina wê şûngehê, mirovên ku rê dikudînin, dê pêwendiyê nêz bi şûngehan re daynin. Û piştî ezmûndariyekê ku bi hevoka 'Gelek sal hebûn ku vê koma hê ronahî û şahî nedîtibûn' dide der û bi tevî rewşa diltezîn û keserda jî 'ji nişka ve di pêşberê de ronahiyek zelal diçirise' û 'birînen birîndaran goşt digire' û 'memikên dêyan tijî şîr dibin' û 'rihspî û pîrejin ji dilê xwe ve ciwan dibin' û mîna ku hemû 'kêlên Kurdistanê' di bihareke nexuyayî

de biguherin û bibin cî û warên wisa ku hemû ji hev re bibêjin, ‘-Ma em ketine bihuştê’ û piştî jî dengê bê ji wî ciyê nexuya û ‘qîrek şabûniyê rabe’ û ji nû ve, digel hevkartêkiyê, ronahiyek ne ji rojê lê belê ‘ji çavên xortê ku li serê çiyayî ye’ bide û pîrejînek bi dengê dia û zarî bêje, “Kurdistan ji xew rabû!!!”

Ev hevokên çîrokê ku demê; hem wekî demên nediyar û borîrojê hem jî wekî demên nihayî diyar dikin û bi hestên ku bûne ezmûndarî, digihîjînin şûngehên xwe û Kronotopa ku di çîrokê de pêk tê; bi rêya dema ku ji borîrojê dide ser rê û digihîje îrorojê; me ji karesata ‘tirb û kêlên miriyên Kurdistanê’ hildide û digihîjîne şûngehên ku ‘wekî bihuşt in.’ Borîroja ku bi zilmkarî û pêkanînen mêtîngeriye, her heyîn û şûngeh kiriye wekî miriyan, bi ronahiya ku ‘ji çavên xortekî li çiyayî ye’, dide watedar dibe û her çend ‘tirb û kêlên miriyan’ wekî şûngehên teng û bergirtî tên sazîkirin jî, beranberî wê, wekî helwêsteke neyînkê (redker) ya pêkanînen serdestî û mêtîngeriye, şûngeheke diyar û terîtoryayî, -Kurdistan- ku fireh û bervekirî ye, tê sazîkirin. Û ‘şopên ku li ser aşopan in’ û bi ‘rabûnekê’ hatine çîn û nexşîkirin, di şûngeha ‘tirb-gor’ê de ji heqîqetê (rastiyê) tê biwêdekirin û ‘çiya’ wekî şûngeh dibe warê ‘ronahiya çavên xortî’ ku wekî ‘leylan’ê dide çavên mirovan û di ‘jixewrabûna Kurdistanê’ de jî dibe ‘rastî’ û şûngeha Kurdistanê ku wekî şûngeha bervekirî ya çîrokê hatiye sazîkirin; û her wekî Ruth Ronen jî dibêje “Tîştêkî jênager e ku deqeke wêjeyî hin taybetî li avaniyên şûngehî bar bike û wan bike avaniyên şûngehî yên hîmî yên çîrokê” (Ronen, 2017: 147), taybetiya bişkivîna kulîlkan û kenîna deşt û zozanan li ‘tirb-kêlên miriyan: goristan’ê tê barkirin; pê re jî taybetiya ‘ronahiyê’ li ‘çiya’ tê barkirin û bi vî awayî şûngehên neguherbar yên çîrokê tên guherandin û bi ‘jixewrakirinê’ jî, şûngeha Kurdistan, wekî ‘şûngeha têgihînî’ ya çîrokê tê sazîkirin.

Şûngehên di Çîroka “Li Goristaneke Amedê” de

Şopên ku bajar wekî şûngeh, di hiş û aşopa nivîskaran de dihêlin, di heman demê de hêma û îmajan jî ava dikin der heqê wan bajaran de ku “bajar; çavkaniya herî rasterast in ku civak agahiyên der heqê xwe de jê digirin” (Belge, 1990: 59). Digel vê jî, hêmayên ku di ser şûngehan re ava dibin, ne tîştêkî wisa ne ku ji rastî û heqîqetên mirovbûnê cuda bin. Loma jî, şûngeh, tevî ku ew cî û war e ku hebûnê lê bike dibe jî, “Wateyên dorhêl, civat, jîyan, dinya û gerdûnê jî dihewîne” (Şengül, 2010: 528). Ji ber hindê jî, şûngeh; tevî ku sînorekî bergirtî diyar dike jî, ji hêlekê ve, sînorên dinyaya sosyo-psîkolojîk jî dide der. Û pê re jî, xetên sînorên ku di deqekê de hatine destnîşankirin, her yek ji şûngeheke dîtir dest pê dike û di heman demê de her şûngeh keviyeke deqê jî xuyanîtir dike.

Çîroka ‘*Li Gornistaneke Amedê*’ (Sebrî, 1998: 585) jî ji keviyeke xuyanî dest pê dike. Şûngeha destpêkî ya çîrokê behr e; ku fireh û bervekirî û xwedî keviyekê ye ku berê wê ber bi asoyê ve ye û bi hebûniya xwe ve hêmaya bêbalû-paliyê di hiş û aşopa mirovan de saz dike. Digel vê jî, vebêj-lehengê çîrokê, ji mala xwe, yanî ji şûngeheke teng û bergirtî û taybet derdikeve û berê xwe dide şûngeha fireh û bervekirî û giştî ku; ev yek nîşaneyê pîrbûna şûngehên hundirîn ên çîrokê dide me; û em bi vê nîşaneyê pê dihisin ku dê demeke têrebihurînê hebe û dê şûngehên çîrokê di nava wê demê de biguherin.

Vebêj-leheng, bi hevokên ‘Min fira teyran dixwazandin. Bi şêna Yezdanê gewre ba ket bin çengê min û firiyam’ efsûnekê ava dike û piştî behrê şûngeheke din ya giştî ku hestê balûpaliyê bi me re çêdike, saz dike; ew şûngeh, ‘esman’ e. Û di ser ‘esman’ re, ji wê pera dûr ya behrê xwe digihîne Diyarbekirê ku di çîrokê de hem bi rola şûngeha giştî hem jî bi rola şûngeha taybet ya fireh û bervekirî radibe. Û di heman demê de, Diyarbekir ew cî û war, an jî ew bajar e ku hêma û îmajên di aşopa vebêj-leheng de avabûyî, di bîra hevpar de bi cî û bi keys dike. Û nêzikiya pêwîst ya bi şûngehê re, di hevoka ‘Du mamên min di wê erdê de veşartî ne’ çêdibe û pê re jî hevoka ‘Min zanibû ku kîjan şêr li wir radizê...’ nêzikiya takekesî xwe digihîjîne asta nêzikiya bîra hevpar û kolektîf. Û gora Şêx Seîd ku wekî cî û şûn ne diyar e, dibe ‘şûngeha ûtopîk’ ya çîrokê û vebêj-leheng, bi bangkirinê dikeve nav hewldanê da ku karibe xwe bigihîne ‘şûngeha ne diyar û ne xuyayî ya Şêx Seîd û hevalbendên wî.’

Piştî ku vebêj-leheng sê navên ji hevalbendên Şêx Seîd bang dike, ji nişkê ve, ‘ji rojhilatê tîrêjê de deriyekî mezin ji erdê vedibe û yekî mezin serê xwe derdixe.’ Bi van hevokan, piştî ku yek ji şûngeha sereke ya çîrokê, yanî Diyarbekir, yanî bajarê bîr û hafizeya hevpar, ava dibe; çîrok jî şûngehên xwe yên pêreyî û ne-girîng (talî) diqete û derbasî du şûngehên din dibe; *dinyaya di binerdê de û bihuşt*. Ev awa têrebihurîna di navbera şûngehan de, li ser destnîşankirina Foucault e jî ku David Harvey radigihîne me û dibêje; “Wekî din, Foucault; nîşan dide ku şûngehên alternatîf hene li beranberî şûngehên ku civak xwe li wan radigire. Ev şûngeh; gor(istan) kampên civanê, mêtîngeh, hepsxane, kexxane, fabrîqe, navendên kirînûfirotinê ne” (Harvey, 2001: 227). Û şûngeha çîrokê, bi carekê û bi tîrêjê ku ji bin erdê dide re, diguhere û vebêj-leheng bi Şêx Seîd û hevalbendên wî re, ‘*di bihuştê bin erdê de*’ dikeve nav sohbetekê. Sohbet, li ser dabaşa welat e ku wekî ‘şûngeheke nebinavkirî’ ye di çîrokê de. Piştî ku gelek dem di ser re dibihure, êdî wext e ku dinya ronî bibe. Yanî, wext e ku bandora ‘tîrêjê ji bin erdê dayî’ nemîne û ‘nûra ku ji rûyê Şêx Seîd dide neyê dîtin’ û; dibe ku hevkartêkiya ku em bi têbihurîna di navbera şûngehan de tûşî wê dibin, bêbandor bibe û tiştên ku em bi xwendina çîrokê

re hîn bûn û di hiş û giyanê xwe de jiyan, li me nebe ezmûndarî. Loma jî, hevoka ‘Nabe, piştî şeveqê yekî li hir bête dîtî, divê ew li dinê venegere û em jî berpirsiyar dibin’ wekî dawî dide zanîn ku du şûngehên hatî diyarkirin, ‘bajar û bihuşt’ ne yê heman dinyayê ne. Û çendî ku vebêj-leheng daxwazê dike ku li wir, li bihuştê wan bi wan re bimîne jî, hevoka ‘No... mayîna te ne rast e. Ma li vir çi heye, heke welat e li Dinê ye û xebat jî li wir e. Ji bona dîtina Şêx û civîna mezin, şeveke din were’ jihev cudabûn û jihev dûrbûna her du şûngehan, ‘bajar û bihuşt’, datîne rastê; û çîrok careke din û wekî dawî şûngeha xwe diguherîne û bi carekê re vebêj-leheng bi hevokên ‘Min çavên xwe vekirin ku li nêzîka behrê me (...) Şeveqê hîn nuh gewr kiribû’ me ji şûngeha dinyayeke din tîne û datîne navîna dinyayeke din.

Şûngeha hîmî û esasî ya çîroka ‘*Li Gornistanek Amedê*’, ‘gor(istan)’ e û wekî riwangeyeke fantastîk hatiye danandin ku; bihuştê ne di heft teweqên esmanan lê di bin erdê de ava dike. Û bi vê avakirina xwe ve jî, ‘gor(istan)’ê, dike yek ji hêmana diyarker ya bîra hevpar ku wekî şûngeh, ji ber pêkanînen serdestiya mêtînger heye. Û bi vî awayî, ‘gor(istan)’ê ji kewara wateya xwe ya ku wekî warê miriyan tê zanîn, diavêje û ‘Gornistanek Li Amedê’ dike *bihuşt* ku piştî serxwerabûnên dij-mêtînger bûye warê (şûngeha) hebûniyê. Digel vê yekê jî, çîroka ‘Gornistanek Li Amedê’ li ser şûngeheke hîmî ya bi navê ‘welat’ ku wekî ‘şûngeha nebinavkirî’ ye, hatiye danandin û du şûngehên dîtî jî wekî ‘şûngehên pêreyî’ hene di çîrokê de. Şûngeha hîmî ya armanckirî ya çîrokê ‘Welat’, di rengûawayê şûngeha fireh û bervekirî de ye ku hem di aşopan de cigirtî ye hem di doz û daxwazan de heye û hem jî nexuyayî ye; loma jî welat ‘li Dinê ye’ û ji bo xuyanîkirina wî jî ‘xebat jî li wir e.’ Û her wiha, her çend çîroka ‘Li Gornistanek Amedê’ li ser ‘şûngeha hîmbajar’, yanî li ser bajarê Diyarbekir ya ku navenda bîra hevpar û kollektîf e, ava bûbe jî; ‘gor(istan)’ wekî yek ji şûngeha hîmî, bi rola danîna ber çavan ya pêkanînen zilm û mêtîngeriye radibe; û li ser helwêsta avakirin û zindîhiştina bîra hevpar û nîşandana domdariya doza ‘welat’, digel şûngehên din, wekî şûngeha bîra hevpar û li ser neyînkirina serdestî û mêtîngeriye tê avakirin.

**Hevrûkirinek li ser Çîrokên Leylana Rastiyê
û Gornistana Amedê**

Leylana Rastiyê	Li Gornistana Amedê
Tirb-Gor: Ji bo danzanîna pêkanînên mêtîngeriye wekî şûngehekê hatiye danîn.	Gor(istan): Wekî şûngeha hîmî û ji bo danzanîna pêkanînên mêtîngeriye wekî şûngehekê hatiye danîn.
Tirb-Gor: Şûngeheke teng, bergirtî û şûnneguharta ye.	Gor(istan): Şûngeheke fireh, bergirtî û şûnneguharta ye.
Dinya: Şûngeha fireh û bervekirî ye ku ji ber zilmê hişk dibe û dibe kavilekî tarî (kavilê tarî: di heman demê de gor e jî).	Dinya: Şûngeha fireh û bervekirî ye ku lê têkoşîna bo 'welat' tê kirin.
Bajar: Wekî beşek e yek ji şûngehên fireh û bervekirî yên li dinyayê	Bajar: Yek ji şûngeha hîmî ya bîra hevpar e. Û şûngeha fireh û bervekirî ye
Çiya: Wekî şûngeha fireh û bervekirî, ew kan û şûngeh e ku tîrêja ku ronahî jê dide û pêşiya vebêj-leheng ronî dike. (Çiya: Hem warê têkoşeran hem jî 'gor'a wan e)	Binerd: Wekî şûngeha fireh û bergirtî, ew kan û şûngeh e ku şewq û ronahî jê dide ser vebêj-leheng. (Binerd: Warê mirovên ne zindî, yanî 'gor')
Tîrêj-Şewq: Ji çavê xortî dide ser doz û daxwaza heyîkirina şûngeha navê Kurdistan.	Tîrêj-Şewq: Ji deriyekî di bin erdê de dide ser vebêj-leheng da ku bizane doza şûngeha bi navê 'welat' li 'dinê' ye.
Kurdistan: Şûngeheke fireh û bervekirî ya têgihînî ye.	Welat: Şûngeheke fireh û bervekirî ya têgihînî ye.

Encam

Şûngeh di vegêranên wekî çîrok û roman de, bi roleke diyarker radibe ku hin caran dibe piştevan bo vegotinê hin caran dibe eger û sedemên vegotinê hin caran dibe cî û warê pêwendîdanîna deqê ya bi xwendevanan re û hin caran jî bi rola karakterîzasyona hêman û naveroka çîrokan radibe. Her çî qas bi demê re rastî guherandinê tên û gelek awa ji formên xwe yên resen winda dikin jî, şûngeh, di vegêranên wêjeyî de, bi roleke girîng radibin ku; hem dibin ew cî û war ku bûyer lê rû daye û hem jî dibin alîkar da ku bîr û hafizeya kollektîf winda nebe û ji ber ku “hêma û îmajên şûngehî piştevanîyê didin berxwedana bîra kollektîf” (Halbwachs, 2016: 165) berxwedanên ku li dijî serdestî û mêtîngîyê tên kirin jî, şûngehan li xwe dikin mêlav (kotel). Û ev mêlav; di heman demê de, wekî şûngehên nayguher (inconvertible) û nayveguher (irreversible), bi rola zindîhiştina bîra hevpar û kollektîf radibin û dibin ‘şûngehên têgihînî’ ku ‘tîrêj û şewqa’ hêvîdariyê pê geş dibe.

Çavkani

- Assmann, Jan (2018) *Kültürel Bellek*, (Çev. Ayşe Tekin), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, üçüncü Basım.
- Bedirxan, Kamuran, A., (1998), *Leylana Rastiyê*, Stockholm: Hawar-Weşanên Nûdem, Cild, I, hej. 10.
- Belge, Taciser (1990) *Roman ve Kent*, İstanbul: İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi.
- Bergson, Henri (2013) *Metafiziğe Giriş*, (Çev. Atakan Altınörs), İstanbul: Paradigma Yayıncılık, 1. Baskı.
- Emre, İsmet (2006) *Postmodernizm ve Edebiyat*, Ankara: Anı Yayınları, ikinci baskı.
- Halbwachs, Maurice (2016) *Hafızanın Toplumsal Çerçevesi*, (Çev. Büşra Uçar), Heredik Yayınları, birinci basım.
- Harvey, David (2011) *Umut Mekânları*, (Çev. Zeynep Gambetti), İstanbul: Metis Yayınları, birinci basım.
- Heidegger, Martin (2018) *Varlık ve Zaman*, (Çev. Kaan H. Ökten), İstanbul: Alfa Yayıncılık, 1. basım.
- İrzık, Sibel (2014) Önsöz. [Mikhail Bahtin] *Karnavaldan Romana: Edebiyat Teorisinden Dil*
- Felsefesine Seçme Yazılar*, (Derleyen ve Önsöz: Sibel Irzık), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, ikinci basım.
- Kierkegaard, Soren (2016) *Baştan Çıkarıcının Günlüğü*, (Çev. Nur Beier), İstanbul: İş Bankası Kültür Yayınları, birinci basım.
- Korkmaz, Ramazan (2007) *Romanda Mekânın Poetiği ve Çözümlemeler*, Ankara: Akçağ Yayınları, 1. Basım.
- _____ (2005) *Yazınsal Okumalar*, İstanbul: Kesit Yayınları, birinci basım.

- Lüleci, Murat (2017) *Bir Hakikat Kategorisi Olarak Mekân ve Romanda Mekânın Fenomenolojisi Üzerine Notlar*, Ankara: Gece Kitaplığı Yayınevi, birinci baskı.
- Ronen, Ruth (2017) *'Kurguda Uzam'*, (Çev. Zeynep Şen), İzmir: Monograf, Edebiyat Eleştiri Dergisi, sayı 7, Kış.
- Sebrî, Osman (1998), *'Li Gornistanek Amedê'*, Stockholm: Hawar-Weşanên Nûdem, Cild, I, hej, 21.
- Şengül, Mehmet Bakır (2010) *'Romanda Mekân Kavramı'*, Uluslararası Sosyal Araştırmalar
- The Journal of International Social Research, Volume 3/11, Spring-Bihar.

JI NIFŞÊ HAWARÊ ŞA‘IREKÎ NEPENÎ: XEMGÎN

Kurte

Xemgîn di sala 1919an da li Tizyana Mêrdînê hatîye dinê, navê wî yê eslî Nezîr Aydın e. Bi mexlesa Xemgîn û bi şeweya edebiyata klasîk, gelek helbest nivîsîne. Gava diçe Iraq û Sûrîyeyê; li Binxetê bi nifşê ekola *Hawarê* ra hevnas dibe û dikeve civata kesên weke Cegerxwîn, her du birayên Bedirxan, Nûreddîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan û gelek kesên din.

Em ê di vê xebatê da li ser vî nivîskarê kovara *Hawarê* rawestin ku heta niha ne zêde navê wî hatîye bihîstin û ne jî bi *Hawarê* ra hatîye naskirin. Em ê bêtir li ser têkilîya wî ya bi *Hawarê* ra û manzûmeya wî rawestin ya ku di *Hawarê* da hatîye weşandin. Navê vê menzûmeyê “*Welatê Tirîvirîyan*” e, bi şiklê mesnewîyê hatîye nivîsîn û jî 43 malikan pêk tê. Lê belê ev menzûmeya hanê li ser navê Osman Sebrî hatîye qeydkirin û em ê jî hewl bidin sedemên vê yekê li gorî atmosfera wê heyamê analîz bikin û li ber çavan ronî bikin.

Di vê xebatê da, me berawirdeke biçûk kir li ser helbestên tesdîqkirî yên Mela Nezîr ku di dîwançeya bi navê “*Yekîtî*”yê da ne û hin berhemên ku bi zelalî nayê zanîn bê ka yên kê ne. Me li uslûba berhemên wî nihêrî û me li terzê temaşe kir da ku em bikaribin hin analîzan ji bo nezîreya li ser *Şêxê Sen’anî* ya Feqîyê Teyran bikin.

Bi vê xebatê dê berhem û cîhê berhemên Mela Nezîr di edebîyata kurdî da zelaltir bibe û herweha wê xumama ku li ser nivîs û nivîskarên heyamê ye hi-nekî din jî rabe û dê derfetên baştir bide lêkoleran ku bikaribin analîzên baştir li ser wê berhem û heyamê bikin.

¹ Xwendekarê Lîsansa Bilind a Zanîngeha Mardîn Artûklûyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Ma-kezanîsta Ziman û Çanda Kurdî. (m. zana47@gmail.com).

Ji ber ku hin berhemên wî û taybetmendiyên wî hene ku nayên zanîn, divê em bi kurtasî behsa wan jî bikin û herçî analîz û teferrûatên din in em ê wan ji mijara gotareke din ra bihêlin.

Peyvên Sereke: Mela Nezîr, *Hawar*, Xemgîn, Osman Sebrî, Welatê Tirîvirîyan, Şêxê Sen'anî, nezîre, dîwançe.

1. DESTPÊK

1. 1 *Rewşa Heyamê û Kovara Hawarê*

Li Sûrîyeya ku nifûsa Kurdan lê zêde bû, ji ber hin hedîseyên di sedsala 20an da her ku çû hejmara Kurdên li wir bicî bûbûn zêdetir bû. Bi taybetî li bakurê Sûrîyeyê (Rojavayê welêt), li cîhên kurdnişîn; li bajarên weke Qamişlo, Kobanî, Serêkanîyê, Dirbêsîyê û Amûdê bi minasebeta mervanîyê; di navbera Kurdên Serxet û Binxetê da têkilîyên xurt hebûn. Hin malbat û eşîrên Kurdan jî ji ber şer, pevçûn û dijminatîya di navbera eşîran da hatibûn li Sûrîyeyê bi cî bûbûn. Lê bi taybetî jî piştî serhildanên têkçûyî; kadroyeke xwende û rewşenbîr ji kurdên Serxetê derbasî Binxetê bûn û li wê derê bi cî bûn. Piştî van bûyer û geşedanan li Sûrîyeyê rewşa Kurdan hinekî guherî û fikrên nû yên mîna neteweperwerîyê li ba wan peyda bû û xurttir bû.

“Li Sûrîyeyê ramana neteweperwerîya kurdî bi bûyerên herêmî ve têkildar derkete holê. Piştî têkçûna serhildana Şêx Seîd (1925) a li Bakurê Kurdistanê, hikûmeta Enqereyê eşîrên kurdan ber bi rojavayê Tirkîyeyê ve sirgun kirin da ku bajarên kurdan ji wan ‘hêmanên xeternak’ xilas bikin. Di heman demê da endamên komeleyên kurdan ên Stenbolê ji tirsê cezayê bidardakirinê yan jî zîndankirinê û ji ber zordariya desthilatîya nû ya tirkan derketin sirgunê. Hinekan ji wan berê xwe dan Iraqê, yên din jî di bin parêzvanîya Fransayê da çûne rojhilatê Behra Spî.”²

Fransayê di sala 1920an da Sûrîye dagir kiribû. Ji ber ku Sûrîye di bin manda û desthilatîya Fransayê da bû; piranîya firar, nefî, sîyasetmedar û rewşenbîrên ku ji dewleta Osmanî revîyan, berê xwe dan Sûrîyeyê. Herweha di destpêka avakirina Komara Tirkîyeyê da jî dîsa li nav welêt bûyerên nexweş qewimîn û gelek rewşenbîrên kurd û serhildêrên Serhildana Şêx Seîd (1925) û Agirîyê (1926-1930) jî berê xwe dan derveyî welêt û Binxetê. Ev firariyên sîyasî û rewşenbîr li wê derê ketin nav xebatên çandî û rêxistinên fikrî û sîyasî yên weke **Xoybûnê** (1927) ava kirin.

2 Ronayî Onen, “*Ziman û Netewesazî Lêhûrbûnek li Ser Kovara Hawarê*”, (Wergera ji Îngîlîzî: Şehmuz Kurt), Weşanên Peywend, Stenbol 2018. r. 99.

Îbrahîm Seydo Aydoğan ji bo avakirina vê rêxistinê weha dibêje; “Di dawî-ya salên bîstî de, kurdên ku xwe bi vir de û wê de gihandin bin xetê, li wir rêxistineke niştimanperwer a bi navê *Xoybûn* ava kir ku mirov dikare wekî dewama komeleya “Hêvî”yê jî binirxîne. Endamên Xoybûnê yên avakir dîsa ji tevgera kurdan ya Stenbolî dihat û Celadet Bedirxan bi xwe yek ji pêşengên vê tevgerê bû. Rêxistina Xoybûnê dê piştgirîya xwe bida *Serhildana Agirî...*”³

Konê Reş ji di derbarê hin endamên *Xoybûnê* da hin navan dide; “Mîr Celadet Bedirxan, Haco Axa û her sê kurên xwe yên mezin Hesên Axa û Cemîl û Çeçan, Mustafa Beg û Bozan Beg Şahîn serokên hoza Berzan, kurên Cemîl Paşa Dîyarbekîrlî Ekrem û Qedrî û Qasim, Qedrî Can, Hemze Begê Miksî, Memdûh Selîm Beg Wanlî, Dr. Ehmed Nafîz Beg Zaza û birayê wî Dr. Nûredîn Zaza û gelekên din ji endamên komela Xwêbûnê.”⁴

Faysal Dağlı balê dikişîne ser projeyên nû yên rewşenbîrî û di derbarê vê heyamê da weha dibêje; “Di destpêka salên 1930an da li Kurdistanê serhildanên netewî hatibûn tefandin. Li çar aliyê Kurdistanê aramîyê konê dagirtibû. Kurdan hêrs û hesreta xwe ji bo serhildaneke din tûj dikirin. Ronakbîrên ku piştî serhildanên nîvçemayî li sirgûnê gihîştibûn hevûdû, berê xwe dabûn karên rewşenbîrî û projeyên çandî. Celadet Bedirxan piştî şikestina serhildana Araratê û lewazbûn û nakokiyên navxweyî yên Rêxistina Xoybûnê ji bo hêvîyeke nû bide kurdan, berê xwe da karên ku heta hingê di bin sîya sîyasetê da mabûn. Li gor wî dema sîyaset xetimî, rewşenbîr û serekên kurdan divêyabû ji bo parastin û pêşxistina nîrxên netewî hewl bidana. Bi vî awayî Celadet derxistina govarekî çandî/netewî dabû berxwe...”⁵

Gelek sîyasetmedar, serhildêr û rewşenbîrên ku ji Serxetê û ji Stenbolê berê xwe dabûn Sûrîyeyê, li dora *Xoybûnê* civîyan û gelek ji wan jî li dora Bedirxanîyan hatin ba hev; dest bi xebatên zimên, çand û hunerî kirin û xebatên rewşenbîrî derxistin holê. Ji aliyê çand û zimên ve di nav van xebatên bi qîmet da jî Kovara *Hawarê* pêşengî dikir. Di 15ê Gulana sala 1932yan da komeke rewşenbîrên Kurd bi pêşengîya Mîr CeladetElî Bedirxan (1893-1951) ve li Şama Sûrîyeyê dest bi weşandina kovara bi navê *Hawarê* kirin.

“Di navbera salên 1932 û 1946an de Celadet Bedirxan digel birayê xwe Kamiran Bedirxan du kovar weşandin: *Hawar* / 1932-1943 û *Roja Nû* / 1943-1946, her yekê jî pêvekek bi kurdî hebû: *Ronahî* / 1942-1945 pêveka *Hawarê* bû û *Stêr* / 1943-1946 jî ya *Roja Nû* bû.”⁶

3 Îbrahîm Seydo Aydoğan, “Celadet Bedirxan, çavkaniyên *Hawarê* û kurdaxetiyê nû”, Kovara Zend (Havîn 2009), Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2009, r. 44.

4 Konê Reş, Osman Sebrî, <http://amouda.com/osman-sebri.htm>

5 Dağlı, Faysal, *Hawar* a Mîr Celadet, <http://www.basnews.com/index.php/kr/opinion/275902>

6 Ronayî Onen, r. 93.

Ev kovar bi piranî bi mebesta pêşxistina ziman, çand û edebîyata Kurdî dihatin amadekirin. Bi tevahî 57 hejmarên *Hawarê* derketin û keda gelek pêşeng, nivîskar û rewşenbîrên Kurd di vê xebatê da hebû. Hejmara ewil di 15ê gulana 1932yan da hat çapkirin û ya dawîn jî di 15ê tebaxa 1943yan da derket. Kovar di serî da mehê du caran, ango 15 rojan carekê derdiket, lê paşê ev berdewamî pêk nehat û dem û rojên di navbera hejmaran da dirêjtir bû. 23 hejmarên ewil hem bi tîpên Latîni hem jî bi yên Erebi hatine çapkirin, lê hejmarên paşê tenê bi elîfbêya latîni hatine çapkirin. Di kovarê da bi zaravayên zimanê kurdî; kurmancî, soranî û zazakî nivîs hatine amadekirin. Lê belê di kovarê da nivîseke tenê bi zazakî ango dimilî ye û ew jî ji aliyê Celadet ve hatiye nivîsîn. Nivîsên bi soranî jî di hejmarên serî da giranîya wan xuya dike, lê belê her ku çûye di kovarê da kêmbûne û para mezin ji kurmancî ra maye. Herweha zimanê erebi jî di du hejmaran da xuya dibe û zimanê frensî jî di kovarê da têra xwe cî girtîye.

Ronayî Onen di derbarê endamên Xoybûnê da weha ji Jordî Tejel neql dike; “Di Xoybûnê de komeke rewşenbîr, serdarên berê, axa, şêx û serokeşîran kom bûn da ku ji bo li hember rejîma Kemalîst derkeve rêxistineke nû, hevpar û neteweperwer ava bikin.”⁷

Îsmet Şerîf Vanli ji bo nêrîna fransîyan a ji bo kurdên Sûrîyeyê dibêje: “Frensîyan di nava kurdên Sûrîyeyê da rê nedidan tu çalakîyên sîyasî yan jî artêşî yên li hemberî Tirkîyeyê, bi taybetî jî di nava Kurdên ku ji Bakurê Kurdistanê koç kirine.”⁸

Aydogan jî derbarê şert û mercên dema *Hawarê* da dibêje; “Nebûna sîyaseteke eşkere ya di dema *Hawarê* de nirxandinekê jî pêwîst dike. *Hawar* li Sûrîyeyê dihat çapkirin û Sûrîye jî wê demê di destên Fransîyan de bû. Fransîyan nedixwest ku pêwendîyên wan bi Tirkîyeyê re xerab bibe û ji ber wê jî yek ji şertên çapkirina *Hawarê* ew bû ku sîyaset tê de nehata kirin.”⁹

Aydogan ji Nûreddîn Zaza neql dike ku yek ji sedemên girtina *Hawarê* ew bû ku kurdan, li Sûrîyeyê dest bi sîyasetê kiribûn û gava ku kurd zêde derdiketin pêş jî fransîyan komele û sazîyên wan digirtin û heta çûyîna Celadet a herêmên Kurdnişîn jî hatibû qedexekirin.

Em dibînin ku serbestîyên berfireh ji bo kurdan tune ne û ji aliyê serdestên heyamê ve jî zext, zordarî û fişar li ser wan hatiye meşandin. Herweha ji bo li Sûrîyeyê astengî û pirsgirêkên mezin dernekevîne pêşîya wan, em dibînin ku

7 Heman berhem, r. 101.

8 Heman berhem, r. 100.

9 Aydoğan, r. 47.

di hejmara yekem a kovara *Hawarê* da bi mebesta hin daxuyanîyên di rengê tevdiran da jî hatine belavkirin. Qismekî nivîsa ku di hejmara ewil da hatiye belavkirin weha ye:

*“Me ev kovara hanê, Hawar, bi taybetî ji bo armancên edebî û zanistî ava kiriye. Ew ê valahiyeke mezin a neteweya kurd tijî bike. Ew bi tu awayî tevli siyasetê nabe. Ew ê tenê li ser mijarên têkildarî kurdan û kesên biyanî bisekine, yê ku dixwazin bi ziman û neteweyên rojhilatî bibin nasyar.”*¹⁰

Bi destguhertina desthilatdariya li Sûriyeyê ji bo kurdan jî rewşeke xirab derket holê û bû sedema girtina destgehên kurdan. “Di sala 1946-1947ê de, piştî ku Fransî ji Sûriyeyê derketin û hikûmet bû erebî, ew karê rewşenbîrî li ber Kurdan qedexe bû û (*Hawar*) û (*Ronahî*) hatin girtin.”¹¹

Di kar û barên amadekirin û derxistina vê kovarê da gelek rewşenbîran kedên mezin dabûn û bi saya vê kovarê bi dehan nivîskar perwerde bûn.” Di serî da, ji bo hejmara yekem tenê birayê wî Kamiran û helbestkarê navdar Qedrîcan alîkariya Celadet Bedirxan dikir... Di hejmara duyem de Osman Sebrî tevli wan dibe. Wî bi domdarî di *Hawarê* de nivîsiye û wek nivîskar tevkarî daye kovarê... Ji hejmara çaran û pêve mirov dibîne ku gelek nivîskarên din jî tevli malbata *Hawarê* dibin û Cegerxwîn yek ji nivîskarên sereke ye. Ew jî kedkarekî mezin yê *Hawarê* ye. Cegerxwîn perwerdeya medreseyê dîtîye û di sala 1928an de bûye mela.”¹²

Paşê Nûredîn Zaza (Ûsiv) jî di serdema duyem da tevli komê dibe. Ji bilî Kamiran ji malbata Bedirxan, Rewşen Bedirxan jî tekane nivîskara jin a *Hawarê* bû, digel ku hin xwendevanên *Hawarê* hin name ji kovarê ra şandibin jî, ew weke nivîskar nayên hesabandin.

Gelek kesan di amadekirin û çapkirina kovara *Hawarê* da ked dane û xebitîne. Herweha *Hawar* û kovarên wê demê jî gelek nivîskar perwerde kirine û ji gelek kesan ra jî bûye derfet ku nivîsên xwe tê da biweşînin. Yek ji wan kesan jî Mela Nezîr bû ku di *Hawarê* da helbesteke wî hatiye weşandin (li gorî ku ew dibêje), lê belê ev yek heta niha nehatiye zanîn û Mela Nezîr (Xemgîn) jî zêde nehatiye naskirin.

10 Onen, r. 108 [*Hawar*, Hejmar 1, r. 7. (Çapa Nûdemê, r. 29)].

11 Konê Reş, Osman Sebrî, <http://amouda.com/osman-sebri.htm>

12 Onen, r. 111-113.

2. JIYAN Û BERHEMÊN XEMGÎN

2. 1. *Jîyana Xemgîn (Mela Nezîr: 1919-2014)*

Mela Nezîr di sala 1919an da li gundê Tizyana¹³ (*Elmabahçe*) Mêrdînê hatiye dinê. Navê wî yê eslî Nezîr Aydın e û ji ber ku melatî jî kirîye weke Mela Nezîr jî hatiye naskirin. Navê bavê wî Mela Evdirrehman û yê dêya wî jî Henîfe ye û ji eşîra Surgucûyan e. Mela Nezîr li gelek bajar û di gelek medreseyan da li ber destê gelek seyda û melayan xwendîye. Piştî xwendina li medreseyan, îcazeta xwe ya ilmî ji Mela Hesenê Tawîkî¹⁴ (1888-1963)¹⁵ wergirtîye û piştî ra bi qîza seydayê xwe Mela Hesen ra zewaca xwe ya ewil kirîye. (Binêrin wêneyê Mela Nezîr: Pêvek-I).

Mela Nezîr li gelek gund û bajarokan melatî kirîye. Sê-çar salan li gundê Qetaro melatî kirîye, paşê ji bo demeke kurt dîsa vegeyîyaye gundê Tawîkê (li Dêrika Mêrdînê) û li cem mala Mela Hesenê Tawîkî maye. Piştîre bûye melayê gundê Bektaşîyê û derdora 20 salan li wir maye.

Di pirtûka wî da ya bi navê **Yekîtî**, di derbarê jîyana wî da zêde agahî tune, lê belê Hesen Cemil Şakar di pêşgotina vê pirtûkê da ji bo Xemgîn weha dibêje: “Seyda ji ilmê Cegerxwîn, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Şêx Sadî Şîrazî, Batî, Mele Hesenê Ta’wîkî û gelek mezinên Kurdan sûd wergirtîye. Seyda alimekî mezin e û bi çar zimanan dizane (Kurdî, Tirkî, Erebî û Farisî). Ilmê wî yên olî û sîyasî rast û têr in. Seyda mirovekî sosyal-demokrat e, her daîm ji ber neteweperestîya xwe ji alîyê dewlet û hikûmetan ve hatiye sûcdarkirin”¹⁶

Ji ber ku partîya PDK-Tyê bi awayekî derqanûnî hatiye avakirin, di 19ê Rêbendana 1968an da ji alîyê *Mît’ê (Teşkilata Saloxgerîya Netewî)* ve operasyonêk hatiye kirin,¹⁷ gelek sîyasatmedar hatine binçavkirin û di nav kesên binçavkirî da Nezîr Aydın jî hebûye. Di sala 1968an da ji ber doza PDK-Tirkîyeyê tê girtin û 9 mehan li bajarê Antalyayê di hebsê da dimîne. Paşê li gundê Emrûdê (li Qosera Mêrdînê) 3 salan dimîne, dema li Emrûdê dixebite hevîna wî ya ewil diçe ber rehma Xwedê. Piştîre di sala 1975an da dîsa dizewice û piştî

13 Gundê Tizyan berê bi ser Stewra navçeya Mêrdînê ve bû, lê niha ev gund bi ser Artukluya Mêrdînê ve girêdayî ye.

14 Tawîk=Tehewîk (Bucak) gundekî Dêrika Mêrdînê ye.

15 Derbarê Mela Hesenê Tawîkî da agahiyên zêdetir, binêrin; <http://www.derikdernek.com/derik-unluleri/>

16 Xemgîn (Nezîr Aydın), “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol, 2012, r. 7.

17 Ruşen Arslan, Türkiye Kürdistan Demokrat Partisi Davası, Kürt Tarihi Dergisi (Sayı 37), İstanbul 2019, s. 7.

ku dizewice, diçe Gundikê Hecî Elî yê bi ser Qoserê ve û li wira jî heft salan melatîyê dike. Piştî vî gundî, dev ji melatîyê berdide û li navenda Qosera navçeya Mêrdînê bi cîh dibe. Di sala 1991an da mala xwe bar dike û diçe Stenbolê, du salan jî li wir dimîne û dîsa vedigere Qoserê. Mela Nezîr demekê di jîyana xwe da bi nexweşîya pençeşêrê ketîye, lê belê ji ber enfeksiyonê di 5ê avrêla 2014an da ji vê dinyayê koç dike û diçe ber rehma Xwedê. Ji zewaca wî ya ewil keçek û lawekî wî dimînin û ji zewaca wî ya duyem jî şeş keç û du lawên wî çêdibin.

2. 2. Berhemên Xemgîn

Heta niha tiştê ku me tesbît kiriye sê berhemên Xemgîn (Mela Nezîr) hene, tevî ku li ser hin berhemên wî bi eşkereyî navê wî tune be û hin ji wan jî cîhê nîqaşê be. Her çiqas Mela Nezîr di vê dewra dawî da jîyabe jî, dîsa ji tesîra helbestkarên heyama mîrektîyan ên weke Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqîyê Teyran xilas nebûye û van şairan tesîreke mezin lê kirine û vê yekê rengê xwe daye berhemên wî jî. Hemû berhemên wî di bin tesîr û kevneşopîya edebîyata klasîk da hatine nivîsîn. Kesên ku tesîr li Mela Nezîr kirine bi tenê ne helbestkarên heyama mîrektîyan in, herweha helbestkarên piştî heyama mîrektîyan yên weke Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî, Seydayê Tîrêj û Cegerxwîn jî ji aliyê fikirî û edebî ve tesîreke mezin li Xemgînî kirine. Bi taybetî jî di mijarên weke azadî, neteweperwerî û hezkirina welêt da ev tesîr bi eşkereyî xuya dibe.

2. 2. 1. “Welatê Tirîvirîyan” (Menzûme):

Ev menzûme bi şiklê mesnewîyê, bi sernavê “**Welatê Tirîvirîyan**” û bi 43 beytan ve hatîye nivîsîn. Di hejmara 28an a kovara **Hawarê** da hatîye weşandin. Ev hejmara 28an jî li gorî tarîxa ku li ser e; di 15ê gulana 1941ê da li Şamê çap bûye (Binêrin, Pêvek-III). Xemgîn di Dîwançeya xwe da cî nedaye vê menzûmeyê.

2. 2. 2. “Yekîtî” (Dîwançe):

Mela Nezîr bi mexlesa Xemgîn û bi terza klasîk dîwançeyek nivîsîye ku ji 31 helbestan pêk tê. Ev dîwançeya wî ya bi navê “**Yekîtî**”yê bi elîfbêya latînî di zivistana 2012an da ji nav weşanên Zîbeqê derketîye. Di destên me da destxeta wê heye ya bi elîfbêya Erebî/Aramî ku bi destnivîsa mielîf ve hatîye nivîsîn û nimûneyên ku me nîşan dane ji vê destxetê hatine wergirtin, lewra di xebata çapkirî da hin qusûr hebûn.

2. 2. 3. “Şêxê Sen ‘aniya” (Nezîre):

Berhemeke bi navê “Şêxê Sen ‘aniya” ya Feqîyê Teyran heye ku mijara wê çîroka evîna sofiyekî bi navê Şêxê Sen ‘aniye. Mele Nezîr jî li ser 363 malikên vê berhema Feqîyê Teyran bi mexlesa Xemgîn 338 malik lê zêde kirine û bi giştî berhem derketîye 701 malikî; yanî berhem weke nezîreyê hatiye nivîsîn. Çapa yekem a vê berhemê¹⁸ pêşî di sala 2003yan da li Wienê (Vîyana-Awusturya) derketîye û çapa duyem jî di meha Îlona sala 2019an da dîsa bi amadekerîya Celîlê Celîl ve ji nav weşanxaneya Wardozê bi navê “Şêxê Sen ‘aniya” derdikeve û tê da nezîreya Xemgînê jî heye.

3. NIRXANDINEK LI SER AÎDÎYETA BERHEMAN

3. 1. Mexlesa Mela Nezîr

Helbestkarên ku terza helbesta klasîk nas kirine û kevneşopîya edebîyata klasîk dişopînin ji xwe ra ji bo înzeyê hin nasnavan bi kar tînin. Ji ber ku Mela Nezîr jî di medreseyan da perwerde bûye û ji kanîyên wê derdorê av vexwarîye; wî jî bi terzê edebîyata klasîk helbest honandîye û mexles (textellus) bi kar anîye. Heta niha li gorî tesbîta me Mela Nezîr di berhemên xwe yên nivîskî da ji bilî du cîhan bi tenê mexlesek bi kar anîye, ew mexles jî “**Xemgîn**” e. Di dîwançeya wî de, bi tenê di cîhekî da ligel mexlesa Xemgîn navê **Tizyanî** jî derbas dibe û herweha şaîr dîsa di helbestekê da jî ji dêvla mexlesa Xemgîn navê xwe yê eslî **Nezîr** jî bi kar anîye. Mela Nezîr hem di dîwançeya xwe ya bi navê “**Yekîtî**” yê da hem jî di nezîreya ku li ser “**Şêxê Sen ‘anî**” ya Feqîyê Teyran nivîsîye, ev mexlesa “**Xemgîn**” bi kar anîye. Mela Nezîr di dîwançeyê da ji bilî du cîhan, di helbesên xwe yên din da mexlesa Xemgîn bi kar anîye. Ger em van her du navên dinê ku bi tenê her yek xwedî nimûneyekê ne, weke mexles bihesibînin; bi tevahî dibe sê mexlesên Mela Nezîr. Mînakên ji bo mexlesan ên ji dîwançe û ji nezîreya li ser “**Şêxê Sen ‘anî**” weha ne:

“Nehin qet tu çare ev e rê ev e

*De **Xemgîn** bide ser bi yarê xwe ve”¹⁹*

*“Namê **Xemgîn** bit mubarek bo te **Tizyanî** ji lew*

Dil esîrê serxwebûn e û girîftarê xeman”²⁰

18 Di vê çapê da helbest bi şiklê malikan hatine nivîsîn, binêrin; Teyran, Feqîyê, “Şêxê Se’aniya” (Amd. Celîlê Celîl), Weşanxaneya Înstîtûta Kurdzanîyê, Wien 2003.

19 Xemgîn, “Yekîtî”, Nusxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî, r. 8. Herweha binêrin; Xemgîn, “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol 2012, r. 16.

20 Xemgîn, “Yekîtî”, Nusxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî, r. 20. Herweha binêrin; Xemgîn, “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol 2012, r. 28.

*“Hedîsa ‘Utrukû hum’**Nezîr** wiha dibêjî
Durûtiya ku em tê zingar gihande mêjî”²¹*

*“Ev sehîfne neh ferd in / li pey hev du li yek ‘erd in
Her pêncê pêş ê wî nin / her çarê paş ê **Xemgîn** in”²²*

3. 2. Menzûmeya “Welatê Tirivirîyan”êya Kê Ye?

Seydayê Mele Nezîr di dîwançeya xwe ya bi navê “**Yekîtî**”yê de; bi şiklê mesnewîyê helbesteke ku ji 44 malikan pêk tê nivîsiye û navê “**Hinek ji Tevgerê Min**” lê danîye. Mela Nezîr ev helbest di 83 (2002) salîya xwe da nivîsiye û di vê helbestê da behsa jîyana xwe kirîye. Em dikarin bibêjin ku ev helbest weke jînameyekê dikare were hesibandin. Seydayê Mela Nezîr di vê jînameya xwe da weke tarîxa jidayikbûna xwe 1335ê Romî dest nîşan kirîye, ev jî li gorî teqwîma mîladî ku îro tê bikaranîn beranberî sala 1919an e. Seyda bi van malikan (beyt) ev agahî pêşkêşî xwendevanan kirîye. Du malikên serî û yê dawîya vê helbestê weha ne:

*“Sala hezar û sêsed û sîh û pêncê romî
Bi bexşîna Îlahî **Xemgîn**²³ jîne didomî*

*Heta bûm şazde salî li Tizyana mey²⁴ rengî
Jîna xwe min dibûrand beyhûde kir derengî”*

...

*“Belê ez ne poşman im, min ev roja mezin dî
Dozê mezin tên kirin, ne bi tirs û ne fedî*

*Berê dara azadî va ye êdî xuya bû
Xemgîn piştî vî ‘emrî bi daxwaza xwe şa bû”²⁵*

Xemgîn di helbesta xwe ya bi navê “**Hinek ji Tevgerê Min**” da dûdirêj behsa jîyana xwe dike û herweha di nav vê jînameyê da dest nîşan dike ku ew

21 Xemgîn, “Yekîtî”, Nuxxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî, r. 44. Herweha binêrin; Xemgîn, “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol 2012, r. 54.

22 “Dîwana Feqîh(ê) Teyra, Li Ser Şêxê Sen‘aniya” Nuxxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî, r. 74. Herweha binêrin; Feqîyê Teyran, “Şêxê Se‘aniyan” (Nezîreya Xemgînî), Weşanxaneya Wardozê, Stenbol 2019, r. 176. (Ji bo bîdestxistina fotokopîya destxetê em spasdarê birêz Celîlê Celîl û Weşanxaneya Wardozê ne).

23 Mela Nezîr gava bi dengê xwe ev helbesta xwe xwendîye, ev nav jî dêvla “Xemgîn” weke “Nezîr” bi lêv kiriye. Binêrin; CD‘ya Dîwançeyê û berhema Xemgîn, “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol 2012, r. 89-93.

24 Mey=me yî.

25 Xemgîn, “Yekîtî”, Nuxxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî, r. 78-83. Herweha binêrin; Xemgîn, “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol 2012, r. 89-93.

li gelek herêman û li gelek gundên bajarên weke Mêrdîn, Amed û li herêma Serhedê jî li derdora bajarên weke Bedlîs û Mûşê gerîyaye, feqîti kirîye û ders ji mela û seydayên cûr bi cûr wergirtîye.

Seyda li gelek cîhên ilm û zanîne gerîyaye û dersên weke felekyat, farisî û dersên kitêbên rêzê yên li medreseyan têne xwendin wergirtîye. Piştî ku hatîye temenê zewacê jî zewicî ye û paşê daxwaz û armancên wî guherîne û meyla sîyasetê pê ra çêbûye. Seyda bi tenê ne li nav welêt, herweha li derveyî Tirkîyeyê; li dewletên derdorê yên weke Iraq û Sûriyeyê jî gerîyaye û bi gelek kesên sîyasetmedar, şair, edebîyatnas û zimannasan ra jî hevnas bûye û têkilî danîye. Xemgîn li Qamişloya binxetê bûye mêvanê Cegerxwîn û li wê derê Doktor Nafiz, Celadet Bedirxan, Osman Sebrî û Nûreddîn Zaza nas kirîye û ketîye nav civata wan. Paşê ji Qamişlo derbasî Şamê dibe û li wê derê jî dihere ba Kamûran Bedirxan û dibe şahidê medbexa Kovara *Hawarê* ku karên mezîni li wir dihatin kirin. Piştî Sûriyeyê dîsa derbasî Tirkîyeyê dibe û tê welêt û ji vir jî du caran diçe Iraqê û cîhên weke Zaxo, Dihok û Gilalayê dibîne.

Mela Nezîr yek ji helbestkarê *Hawarê* ye, lê belê ev yek heta îro zêde nehatîye zanîn. Menzûmeyerê bi terza mesnewîyê ku ji 43 beytan pêk tê bi ser navê "**Welatê Tirîvirîyan**" ve nivîsiye û ev menzûme di hejmara 28an a kovara *Hawarê* da hatîye weşandin. Ev hejmara 28an jî li gorî tarîxa ku li ser e; di 15ê gulana 1941ê da çap bûye. Di binê menzûmeyerê da jî dîsa tarîxa "26-9-933" û "Hema" hatîye nivîsîn, ev jî wer xuya dike ku bi vê yekê cîh û tarîxa nivîsîna vê helbestê hatîye qestkirin (Binêrin Pêvek-II). Lêbelê li bin vê menzûmeyerê weke îmze ne navê Mela Nezîr, lê navê Osman Sebrî (çêbûn: 1905-wefat: 1993) heye û ev menzûme di listeya naverokê ya *Hawarê* da jî dîsa li ser navê Osman Sebrî hatîye qeydkirin (Binêrin Pêvek-III).

Di "*Dîwan*"a Osman Sebrî da ku piştî mirina wî ev *Dîwan* hatîye berhevkirin û çapkirin, dîsa ev helbest hatîye nîşandan. Di *dîwana* Sebrî da ev menzûme jî aliyê şiklî ve jî bi qusûr hatîye nîşandan, rêbaza malikan hatîye xerakirin û xeletîyêke mezîni derketîye holê. Herweha di *Dîwana* Osman Sebrî da li binê vê menzûmeyerê navborî tarîxa "26. 09. 1955"ê jî hatîye nivîsîn.²⁶ Xuya ye ku divê tarîxdayîne da jî xeletîyêke teknîkî derketîye holê.

Lê Mela Nezîr di helbesta xwe ya bi navê "**Hinek ji Tevgerê Min**"²⁷ da ku behsa jîyana xwe tê da kirîye, dest nîşan dike ku wî menzûmeyerê bi navê "**Tirî û Virîya**" nivîsiye û di qoncîkek *Hawarê* da jî ev menzûme hatîye weşandin. Lêbelê Mela Nezîr di vê menzûmeyerê da mexlesa xwe bi kar neanîye

26 Binêrin; *Dîwana* Osman Sebrî, (Berhevkar: A. Balî) Weşanên Pêrî, Stenbol 2004. r. 142-144.

27 Ji bo tevahîya helbestê binêrin; Xemgîn, "Yekîti", weşanxaneyê Zîbeqê, Stenbol 2012, r. 89-93.

û ev menzûme nexistîye dîwançeya xwe (jixwe gelek menzûme di dîwanan da cî nagirin). Hin malikên wê helbesta di *Hawarê* da hatiye weşandin ku Mela Nezîr tê da behsa vê menzûmeya dike, ev in:

*“Di kovara Hawarê derdê Kurda digotin
Li xwendevanê hêja cerg û hinav disotin*

*Şora Tirrî û Virrîya serpêhatek me da’ê
Avêt qorzîk Hawarê li wir xweşik cî da’ê*

*Kesê Hawar xwendibe ew çîroka dîtîye
Gelek kûr û dirêj e ê bizane ew çi ye”²⁸*

Mela Nezîr di dîwançeya xwe da bi eşkereyî dibêje ku ew menzûmeya wî ye; herweha di saxîya xwe de, berîya wefatê bi du salan jî bi awayekî şîfahî ev yek ji Mesut Ornekê xwedîyê weşanxaneya Zîbeqê ra behs kirîye. Lêbelê bi eşkereyî di wê demê da lê xwedî derneketîye. Bi qenaeta me, ger ev menzûme ya wî be; ew ê ji ber rewşa sîyasî ya wê heyamê be ku nexwestîye navê wî eşkere bibê. Lewra ji bo kar û barên sîyasî gelek sîyasetmedar û firarên Romê bi weşartî xwe li sînora dixistin û geh derbasî binxetê û Sûrîyeyê dibûn û geh jî derbasî Iraqê nav pêşmergeyan dibûn. Yek ji wan kesan jî ku ew sînora bînpê dikir û li gund û bajarên zîz dibû û xwe digihand Kurdên li wan cîhan, Mela Nezîr bû. Bi qenaeta me ev derbaskirina sînoran û bilîna wî ya bi karên sîyasî jî ji bo wî rîsk û talûkeyek bû ku nedixwest dewleta Romê pê bihese û wî xwe bi vî awayî distrand. Ji ber sedemên bi vî rengî gelek nivîskarên dinê jî înzeyên xwe neavêtine bin nivîsên xwe. Îhtîmaleke mezin e ku ji ber van hincetan Mela Nezîr jî înzeya xwe neavêtibe bin vê menzûmeya ku di *Hawarê* da hatiye weşandin. Jixwe paşê di emrê mayî da jî rastî gelek zor û zehmetîyan hatiye û jîyana wî di bin fişar û sextîyê da derbas bûye û çend caran rêya wî bi zîndanên jî ketîye. Hesên Cemil Şakar jî ji bo Mela Nezîr weha gotibû; “Seyda mirovekî sosyal-demokrat e, her daîm jî ber neteweperestîya xwe ji aliyê dewlet û hukûmetan ve hatiye sûcdarkirin.”²⁹

Di navbera temenê Osman Sebrî û Mela Nezîr da 14 sal ferq heye û gava ev menzûme di *Hawarê* da hatiye weşandin Osman Sebrî 36 salî û Mela Nezîr jî 22 salî bûye. Gava em li uslûba vê menzûmeyê jî dinîhêrin em dibînin ku ev uslûb ne durrî her du helbestkaran e jî. Lêbelê nêztirî Osman Sebrî xuya dike, çimkî bi vê terza fablan nivîsên Osman Sebrî gelek in û em hêj rastî helbestên bi vê şeweyê yên Mela Nezîr jî nehatine.

28 Xemgîn, “Yekîtî”, Nusxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî, r. 81. Herweha binêrin; Xemgîn, “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol 2012, r. 91-92.

29 Xemgîn, “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol, 2012, r. 7.

Mela Nezîr di berhema xwe ya bi navê “*Yekîtî*”yê da dibêje ev nivîsa di *Hawarê* da ya min e. Lê belê cîhê pirsê ye ka çima ne navê Mela Nezîr, lê navê Osman Sebrî di bin vê menzûmeyê da hatiye nivîsîn. Ger em navdanîna li bin vê menzûmeyê weke xeletîyeke teknîkî qebûl bikin, wê demê çima Osman Sebrî rojekê behsa vê yekê nekirîye û ev xete teshîh nekirîye; ango çima lê xwedîtî kirîye û çima em di vê mijarê da qet rastî agahîyekê nehatine ku vê îdiaya Mela Nezîr piştrast bike? Gelo Mela Nezîr bi navên mustear tu berhemên din dane çapkirin? Bi qasî ku em dizanin tu berhemên Mela Nezîr ên din di kovarên wê demê da nehatine weşandin. Tiştê bi me xerîb tê ev e ku ger ev malê Mela Nezîr be, çima entelektuelekî weke Osman Sebrî lê xwedî derketîye. Em nizanin çî ye hiqûqa di navbera her duyan da. Lê belê ev hemû pirs hêj jî li ber me ne û divê bi awayekî objektîf û bi delîl werin bersivandin.

3. 2. 1. *Naveroka “Tirrî û Virrîya”yê*

Mela Nezîr menzûmeyaya xwe ya bi navê “*Tirrî û Virrîya*” ku di *Hawarê* da hatiye weşandin, bi forma fablê nivîsîye. Peyama ku xwestîye bide ji ser heywanên weke rovî û şêr daye. Rovî û şêr bi rêya teşxîs û întaqê daye axaftin û bi vî rengî helbesta xwe bi ruhekî folklorîk û bi terzeke klasîk hûnandîye (Binêrin, Pêvek-I). Hin malikên serî û yê dawî weha ne:

*“Dibêjin ji Serhedan / Heya dîghê Amedan
Berê ne bûn şehrîstan / Ne bajar, bax û bîstan*

...

*Ji dest fenên roviyak / Şêr derketin ji çîyan
Çîrçîrok çû diyaran / Rahmet l’bavê guhdaran”³⁰*

Jixwe di dawîya menzûmeyê da jî mîna ku çîrokek gotibe, dibêje;

*“çîrçîrok çû diyaran,
rahmet l’bavê guhdaran”*

Di vê menzûmeyê da bêjeya “*Tirrî*”, ji “*tir*”ê tê ango bayê ku bi ber mirovan dikeve û bêhneke pîs li derdorê belav dike û bêjeya “*Virrî*” jî ji “*virr*”ê tê ku ev jî li herêmê mahneya derewê dide.

Têkçûyina mêrxasan a li hember kesên bêheysîyet, bêşeref û bêxîret bi şeweya fablê ji ser ajalan hatiye vegotin. Rovî ajaleke bêxîret e, sîxur e, derewkar e, bi xap û fenan şêrî têk dibe. Şêr jî bi vê yekê nayê ser, tehemul nake û wî warî ji wan ra dihêle û ji wir diçe.

³⁰ *Hawar*, Weşanên Nûdem (Amd. Firat Cewerî), Cilda 2. hejmar 28, Stockholm 1998, r. 710.

3. 3. *Nezîreyên Xemgînî*

Kevneşopîya nivîsîna nezîreyan di edebîyata klasîk da cîhekî girîng digire û ji bo gihandina nivîskarên peyrew û şopajo jî roleke mezin bi cîh tîne. Mela Nezîr (Xemgîn) jî ji ber ku ehlê medreseyê ye, ji vê çandê dûr neketîye û hem mexleşek ji xwe ra wergirtîye û hem jî nezîre li ser helbestên helbestkarên payebilind nivîsîne. Xemgîn ji bilî nezîreya li ser “*Şêxê Sen‘aniya*” herweha di dîwançeya xwe da jî li ser helbestên helbestkarên weke Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Seydayê Tîrêj jî nezîre nivîsîne. Xuya ye ku gelekî kêfa Xemgînî ji nivîsîna nezîreyan ra hatiye, lewra li ser çend helbestkarên qerase nezîre nivîsîne. Em ê bi tenê çend nimûneyên nezîreyên wî li vê derê nîşan bidin û zêde dirêj nekin.

Di vê helbesta Xemgîn da ku me li jêr nîşan daye; malika yekem a Melayê Cizîrî ye û Xemgîn jî li ser vê malika ewil a xezela Cizîrî helbestek 16 malikî bi şiklê mesnewîyê lê zêde kirîye. Malika ewil û ya dawîn a vê nezîreya Xemgînî jî bi vî şiklî ye:

*“Îd e û her kes ji dîdara te lê pîroz e ‘îd
Ez tenê mehrûmê dîdar im bi sed menzil be‘îd³¹*

*Na Mela wek te gelek mehrûmê dîdar in di ‘îd
Îsweç û Îskendînav bêtir ji sed menzil be‘îd*

...

*Derdê bêderman e Xemgîn, lakin Luqmanê Welat
Her ji gorîne dibakî, çare yektî û xebat³²*

Yek ji wan helbestên meşhûr jî helbesta bi navê “***Bilbilê Dilşadî***” ye ku ji aliyê Seydayê Tîrêj ve hatiye nivîsîn. Tîrêj ev helbest weke 18 malikan nivîsîye, lê belê Xemgîn jî malikên wî xistiye şiklê çarîneyan (çarristeyî) û weke 9 çarîneyan nivîsîye û 9 çarîne jî wî weke muşa‘ere/gotûbêjê (bi gotina Xemgîn; danberhev) lê zêde kirîye. Çar risteyên ewil ên Tîrêj in û 4 risteyên piştî wê jî yên Xemgîn in. Ev helbesta Tîrêjî ku di dîwana Xemgîn da derbas dibe û dîsa heman helbesta ku di Dîwana Tîrêj da derbas dibe, bi hin ferqên gelekî biçûk ve ji hev cuda ne.³³ Bendên pêşî û paşê yên danberheva Xemgîn a li ser helbesta Tîrêj bi vî şiklî ne:

31 Ji bo helbesta Melayê Cizîrî binêrin; Melayê Cizîrî, Dîwan (Amd. Selman Dilovan), Weşanên Nûbiharê, Çapa Sêyem, Stenbol 2013, r. 87.

32 Xemgîn, “Yekîtî”, Nuxxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî, r. 46-48. Herweha binêrin; Xemgîn, “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol 2012, r. 57-58.

33 Ji bo heman helbestê binêrin; Seydayê Tîrêj, Dîwan (Xelat-Zozan-Cûdî), Weşanên Peywend, Stenbol 2014, r. 120.

TÎRÊJ:

*“Ey bilbilê dilşadî hela wer bikî fixan
Derdê me giran e ey bira, birîna me kûr e
Gorî te bitin cerg û dil û mêlak û hem can
Dengê te ye xweştir ji ney û nay û bilûran”*

XEMGÎN:

*“Ey murxê seher bo çi li ser latê dişîrî
Xunçe te bi derda, hê ji nû ve çi diqêrî
Qey wek me tu jî derd û cefayan dikişênî
Derdê me giran e tu li halê me dinêrî”*

...

TÎRÊJ:

*“Çerxa felekê her dem bi fetl û ger û dewran
Hêvî û hawara me di Yezdanê dilovan
Qey çare û umîda me ye Serdarê li Berzan
Wek **Tîrêj** dibê jîn li dinê kotek û zor e”*

XEMGÎN:

*“Berzanî û Yezdan ji me ra çareê nakin
Ka wek ‘Ho Şî Mîn’ em bi na‘ora mezin bakin
Xemgîn tu “Weenleyse” dixwênî çi dibêjî
Ancax wekî *Vietnam* em xwe bi merdane cuda kin”³⁴*

Xemgîn li ser vê helbesta Tîrêj ku ji 18 malikan pêk tê, weke wê ew qas malik jî lê zêde kirine. Ev helbesta Tîrêj di sala 1975an da hatiye nivîsîn û bi şiklê malikan hatiye ristin, lê belê Xemgîn malikên vê helbestê di dîwançeya xwe da bi terzê çar risteyan ango çarîneyan rêz kirîye. Em vê muşa ‘ereyê (danberhevda) jî weke cûreyekî nezîreyê dibînin. Çimkî heman mijar bi heman terz û şiklî ve hatiye honandin.

Nezîreya li ser “Şêxê Sen’aniya”yê, ya kê ye?

Ev berhem ji aliyê Celîlê Celîl ve hatiye amadekirin û du caran jî çap bûye. Lê belê birêz Celîl derbarê Xemgînê nivîskarê vê nezîreyê da tu agahî bi dest nexistîyeû birêz Celîl ji bo nivîskarê vê nezîreyê dibêje; “Em nizanin Xemgîn kî ye. Dûr nîne ku ew hemdemê me bûye û di temenê kalbûnê da bûye. Weke

34 Xemgîn, “Yekîtî”, Nusxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî, r. 71-74.
Herweha binêrin; Xemgîn, “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol 2012, r. 83-86.

helbestvan navê “Xemgîn”î, di edebîyatê da nehatîye naskirin, lê şureta wî ya helbestvanîyê li ber çavan e.”³⁵

Celîlê Celîl derbarê vê destxeta³⁶ nezîreyê da ku berîya bi salan ji Qamişloyê hatîye ketîye destê wî, hin gumanên wî hene û derbarê wê da hin agahîyan dide û dibêje; “Ev destnivîsar Xelîlê Yûnis, helbestvanekî şuret ji bajarê Qamişloyê, gihandîye destê min. Destnivîsara poemê kevin nîne, gelekî bi rêk û pêk hatîye bergirtin. Di vê destnivîsarê da hin beyt û bi taybetî dawîya poemê, parçeya texelûsê (beytên 695-701) bi destê xerîb, bi nivîsareka neciwan bi ser da hatîye zêdekirin... Wekî navê helbestvanê ku nezîre nivîsiye Xemgîn e... Sala nivîsîna nezîreyê, 1987 gelekî nû ye. Ev yek şikberîyê bi pêş da tîne: gelo sala nivîsîna nezîreyê ya bingehîn e, rast e yan pêşwextîyê bi destê yekî din, bi destnivîsîna neciwan bi ser da hatîye zêdekirin?”³⁷

Derbarê sala nivîsîna berhemê û destxetê da hin teredutên Celîlê Celîl jî hene û herweha derbarê nivîskarê vê nezîreyê da jî agahîyên zêde di destê wî da tune ne.

Me ji tu kesî heta niha nebihîstîye ku Mela Nezîr ji wan ra behsa nezîreyeke xwe ya bi vî rengî kiribe. Lê em dibêjin ev Xemgînê nivîskarê vê nezîreya li ser “Şêxê Sen ‘aniya” û Mela Nezîrê ku mexlesa “Xemgîn” bi kar anîye, îhtîmaleke mezin heman kes e, lewra tiştên ku em xwe dispêrinê, me ber bi vê tesbîtê ve dibe. Hin angaşt û argûmentên ku em xwe dispêrinê jî ev in:

- Di tradîsyona edebîyata klasîk da mexles dewsa îmzeya îro digire û Mela Nezîr jî ev kevneşopî şopandîye û ji xwe ra mexlesa Xemgîn bi kar anîye. Heta niha di edebîyata klasîk a Kurdî da ji bilî Mela Nezîr em li rastî tu kesî nehatine ku mexlesa “Xemgîn” bi kar anîbin. Mela Nezîr di helbestên xwe da mexlesa xwe weke “Xemgîn” bi kar anîye.

- Mela Nezîr di dîwançeya xwe da jî gelek cûreyên tarîxdayînê daye û mînaka ku di nezîreya “Şêxê Sen ‘aniya”yê da jî hatîye dayîn, pir dişibe terz û uslûba mînakên ku wî di dîwançeya xwe da bi kar anîye. Di dîwançeyê da yek ji wan mînakan weha ye:

*“Mîladê heşt da ber şeşa
Meh yek di bîst û çar meşa”³⁸*

35 Feqîyê Teyran, “Şêxê Se’aniyan” (Nezîreya Xemgînî), Weşanxaneya Wardozê, Stenbol 2019, r. 19.

36 Di rûpela serî ya destxeta vê berhemê da mustensix ev sernav nivîsiye: “Dîwana Feqîh(ê) Teyran” Li ser Şêxê Sen ‘aniya”. (Nasnameya mustensix jî hêj nayê zanîn).

37 Feqîyê Teyran, “Şêxê Se’aniyan” (Nezîreya Xemgînî), Weşanxaneya Wardozê, Stenbol 2019, r. 18-20.

38 Xemgîn, “Yekîtî”, Nusxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî, r. 13. Herweha binêrin; Xemgîn, “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol 2012, r. 21.

Di helbesta bi navê “**Roja Reş Roja Girtina Me Bû**” da jî dîsa Xemgîn tarîxek daye. Gava ku li gorî tarîxa teqwîma mîladî ev malik were nirxandin tarîxeke weha derdikeve holê. 8 û 6 li ber hev du dibe 86 yanî sala 1986ê gect dike. Herweha “meh yek” jî ji 12 mehan meha ewil yanî ew jî dibe meha Rêbendanê û “24 meş” jî 24ê meha Rêbendanê ye, bi tevahî tarîxa “24. 01. 1986”ê derdikeve holê ku Xemgîn di vê tarîxê da hatiye girtin û wî ev roj (roja Çarşemê) di heman helbestê da weke rojê reş bi nav kirîye.

- Zimanê di dîwançeyê da û yê di nazîreyê da jî ne dûrî hev in û ji alîyê uslûb û kevneşopîya edebîyata klasîk ve pir nêzî hev in.

- Mela Nezîr jî demekê çûye binxetê û li Qamişloyê maye û jixwe destxet jî ji Qamişloyê hatibû bidestxistin.

- Mela Nezîr di medreseyan da perwerdeya xwe dîtîye û bi terza klasîk a Kurdî helbest honandîye û bi forma nezîreyê jî çend helbest nivîsîne. Nivîsîna nezîreyê jî tê wê mahneyê ku ew di bin tesîra wan helbestkaran da maye yên ku li ser berhemên wan nezîre hatine nivîsîn. Heta niha li ser helbestên Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Seydayê Tîrêj nezîre û danberhev nivîsîne û ji bilî vê yekê gelekî di bin tesîra Cizîrî, Xanî, Feqîyê Teyran, Şêx Evdirrehmanê Aqtepî û Cegerxwîn da jî maye. Bi vê yekê derdikeve holê ku Mela Nezîr ne dûrî çanda nazîre û vê kevneşopîyê ye. Gava em van argûmentan li ber çavan digirin şerheke weha derdikeve pêş ku ev nezîreya li ser “Şêxê *Sen ‘aniya*”yê jî îhtîmaleke mezin yek ji berhemên Mela Nezîr e.

Herçiqasî kêm be jî, di edebîyata klasîk da hatiye dîtin ku du helbestkaran di nezmên xwe da heman mexles bi kar anîbin. Îhtîmal e ku ji bo vê mexlesa Xemgîn jî heman tişt derkeve holê. Lê belê heta ku agahî û belgeyên nû bi destên me nekevin em ê xwedîyê vê berhemê jî weke Mela Nezîr bizanibin.

Li gorî tarîxa ku di malikên destxetê da derbas dibe ev nezîreya li ser “Şêxê *Sen ‘aniya*”yê di sala 1408ê Hicrîyê (1987ê Mîladî) da hatiye nivîsîn. Malikên ku tê da behsa berhem, nivîsîna tarîxa berhemê û xwedîyê berhême tê kirin û malikên texelusê ku tê da mexlesa şairî derbas dibin ev in:

*“Sala heşt û sifr çar û yek / **Xemgîn** nivsî ev reşbelek
Min pê ra kêşa ev xîre / li ser xezelê **Feqîhê Teyra***

*Ev sehîfne neh ferd in / li pey hev du li yek ‘erd in
Her pêncê pêş ê wî nin / her çarê paş ê **Xemgîn** in*

*Hinek ji wan rûpela / ji ewil heta ya talî
Xemgîn bi ta ‘b û bela / rûpel nehişte xalî*

*Hindî giya û dar û ber / selawat li ser pêxember
Her subh û her êvar / istixfîr û istixfar*³⁹

4. ENCAM

Em di vê xebatê da bi awayekî hûrgulî li ser dîwançe û nezîreya Şêxê Sen'anîyan nesekinîn û me ew analîz nekirin. Lewra mijara me ne analîza dîwan û helbestan bû. Me xwest di vê derê da balê bikişînin ser menzûmeya wî ya ku di *Hawarê* da hatiye weşandin. Çunkî ew menzûmeya li ser navê Mela Nezîr nehatibû qeydkirin û li ser navê Osman Sebrî hatibû belavkirin. Me jî xwest ev yek were destnîşankirin ku di vê derê da xeletî an jî problemek heye.

Gelek helbestkaran ji ber çand û tradîsyona edebîyata klasîk navê xwe yê eslî eşkere nekirine. Gelek kesan jî ji ber şert û mercên zor û zehmet ên heyamê an jî ji ber hin sedemên din navê xwe bi eşkerîyî nedane nîşandan. Mela Nezîr jî yek ji wan kesan bû û îdiayeke wî heye. Mela Nezîr bi awayekî eşkere di dîwançeya xwe ya bi navê *Yekîtîyê* da dest nîşan kirîye ku ew menzûmema malê wî ye. Me jî xwest em vê yekê bînin rojevê û hewl bidin bi hin delîlan pêşkêşî we bikin. Çimkî wî di helbesta xwe ya bi cûreya jînameyê da ev yek anîbû zimên. Lê belê hin pirs hebûn ku me bersiva wan peyda nekirîye; pirsên weke çima navê Osman Sebrî di bin vê menzûmeyê da hatiye nîşandayîn û çima em di vê mijarê da qet li rastî agahîyekê nehatine ku vê îdiaya Mela Nezîr piştrast bike. Ger ev menzûme malê Mela Nezîr be, çima rojekê Osman Sebrî ev neanîye zimên û ji bo sererastkirina wê tiştê nekirîye?

Me herwuha tiştêkî mîna vê nêrîn û analîzêjî pêk anîli ser nezîreya wê berhema bi navê "*Şêxê Sen'anî*" a Feqîyê Teyran, da ku ev mijar jî were zelalkirin û xwedîyê wê nezîreyê jî derkeve holê. Me heta niha ji tu kesî nebihîstîye ku Mela Nezîr jî wan ra behsa nezîreyê xwe ya li ser "*Şêxê Sen'anî*" yê kiribe. Lê belê bi mexlesa Xemgîn ve li ser "*Şêxê Sen'anî*" ya Feqîyê Teyran jî nezîreyek hatiye nivîsîn û em di wê geneetê da ne ku ev berhem jî ya Mela Nezîr e. Çimkî hem mexles mexlesa wî ye û hem jî hin argûmentên ku me ber bi vê fikrê ve dibe henin û ev argûment jî argûmentên xurt in. Mela Nezîr li medreseyan tehsîla xwe kirîye û çanda edebîyata klasîk jî nêz ve nas kirîye, lewra di berhemên wî da jî ev kevneşopî û tesîra şairên klasîk bi zelalî xuya dibe. Mela Nezîr li ser şairên mezin gotûbêj û nezîre nivîsîne û bi qenaeta me ev nezîreya

39 "Dîwana Feqîh(ê) Teyra, Li Ser Şêxê Sen'anîya" Nusxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî, r. 74. Herweha Celîlê Celîl ev malik di şiklê çaristeyî (çarîne) da nîşan daye, binêrin; Feqîyê Teyran, "*Şêxê Se'anîyan*" (Nezîreya Xemgînî), Weşanxaneya Wardozê, 2019 Stenbol, r. 176-177.

bi mexlesa Xemgîn kuli ser “Şêxê Sen’anî” ya Feqîyê Teyran hatîye nivîsîn jî, ya wî ye.

Weke hezkirin û bikaranîna nimûneyên ji çanda nezîreyê, ziman û uslûba berhemana, erdnîgarîya ku lê maye û gerîyaye û heyama nivîsîna nezîreyê û heyama ku Mela Nezîr tê da jîyaye jî yekin. Ev hemû argûment teza me xurt dikin. Weke şerhekê em vê yekê jî bînin zimên; heta belgeyên zelaltir bi destên me nekevin, em nikarin bi awayekî teqez bibêjin ku ev nezîre berhema Mela Nezîr e.

Lêbelê heta ku li ser vê mijarê di lêkolîn û xebatên kûr û berfirehtir da belge û agahîyên nû yên berovajî van agahîyan bi destên me nekevin, em ê vê nezîreyê ya ku Xemgînî li ser “Şêxê Sen’anî” ya Feqîyê Teyran nivîsîye, weke berhemake Mela Nezîr qebûl bikin. Heta niha sê berhem ketine destên me û îhtîmaleke mezin e ku ev berhemên Mela Nezîr bin. Bi awayekî teqez heta niha em dizanin ku dîwançeya wî ya bi navê “Yekîtî”yê, malê wî yê tesdîqkirî ye. Lê belê her du berhemên dinê cîhê nîqaşê ne. Ji bo menzûmeya “Tirrî û Virrîya”yê ku di Hawarê da weşiyaye, beyana Mela Nezîr a devkî û nivîskî di destê me da mewcûd in. Lê belê ji bo nezîreya ku li ser “Şêxê Sen’anî” ya Feqîyê Teyran hatîye nivîsîn, tu beyanên Mela Nezîr di destên me da tune ne ji bilî hin argûmentên ku me xwe spartîyê. Hêvîya me ew e ku ev nivîs rê li pêşîya me veke, bibe wesîleya hin agahî û belgeyên nû ku hin alîyên tarî yên edebîyata kurdî ronak bibin.

ÇAVKANÎ

Yên Çapkirî

Arslan, Ruşen, “Türkiye Kürdistan Demokrat Partisi Davası”, *Kürt Tarihi Dergisi*, Sayı 37, 2019.

Aydoğan, İbrahim Seydo, “Celadet Bedîrxan, çavkaniyên Hawarê û kurdariya nû”, *Kovara Zend* (Havîn 2009), Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2009, r. 44.

Cizîrî, Melayê, *Dîwan* (Amd. Selman Dilovan), Weşanên Nûbiharê, Stenbol, Çapa Sêyem 2013, r. 87.

Hawar (1932-1943), Weşanên Nûdem (Amadekar: Firat Cewerî), Stockholm 1998.

Onen, Ronayî, *Ziman û Netewesazî Lêhûrbûnek li Ser Kovara Hawarê*, (Wergera ji Îngîlîzî: Şehmuz Kurt), Weşanên Peywend, Stenbol 2018.

Sebrî, Osman, *Dîwan* (Berhevkar: Abûzer Balî), Weşanên Pêrî, Stenbol, Çapa Duyem 2004.

Teyran, Feqîyê, “Şêxê Se’anîyan” (*Nezîreya Xemgînî*)(Amd. Celîlê Celîl), Weşanxaneyê Wardozê, Stenbol 2019.

Teyran, Feqîyê, “Şêxê Se’anîya” (Amd. Celîlê Celîl), Weşanxaneya Înstîtûta Kurdzanîyê, Wien 2003.

Tîrêj, Seydayê, *Dîwan (Xelat-Zozan-Cûdî)*, Weşanên Peywend, Stenbol 2014.

Xemgîn (Nezir Aydın), “Yekîtî”, weşanxaneya Zîbeqê, Stenbol 2012.

Yên Elektronîk

Derik Kùltür ve dayanişma Derneđi, *Derik Ünlüleri*: <http://www.derikdernek.com/derik-unluleri/> (gihandina dawî: 25. 09. 2019)

Dađlı, Faysal, *Hawar a Mîr Celadet*, <http://www.basnews.com/index.php/kr/opinion/275902>

Reş, Konê, *Osman Sebrî*, <http://amouda.com/osman-sebri.htm> (gihandina dawî: 23. 09. 2019)

Yên Destnivîs

Xemgîn, “*Dîwana Feqîh(ê) Teyran, Li Ser Şêxê Sen’anîya*” Nusxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî, [“*Şêxê Se’anî (Nezîreya Xemgînî)*”, Bi rêya Weşanxaneya Wardozê ji Celîlê Celîl].

Xemgîn, “*Yekîtî*”, Nusxeya fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a Zana Zengenî. (Ev destxeta Diwançeyê bi elîfbêya Erebî ji aliyê muelf bi xwe hatiye nivîsîn).

Hevpeyvîn

Hişyar Aydın (Kurê Mela Nezîr), Li Qosera Mêrdînê di navenda rehabilîtasyonêke taybet da dixebite. (Hevpeyvîn ji aliyê me ve di navbera Tîrmeh û Mijdara 2019an da hatîye kirin).


Mela Xidir (Dilbirînê Xursî), Ji gundê Xursa Navê (Yüceli) ye û niha li Stenbolê dimîne. (Hevpeyvîn ji aliyê me ve di navbera Tîrmeh û Mijdara 2019an da bi rêya telefonê hatîye kirin).

Mesut Örnek, Xwedîyê Weşanxaneya Zîbeqê, (Hevpeyvîn ji aliyê me ve di navbera Tîrmeh û Mijdara 2019an da hatîye kirin).

PÊVEK

Me di pêvekan da wêneyê Mela Nezîr û helbesta navborî ku Mela Nezîr dibêje min li Şama Sûrîyeyê ew daye kovara *Hawarê* û tê da hatîye weşandin, dane nîşandan.

Pêvek-1



WELATÊ TIRIVIRIYAN

Dibêjin ji Serhedan
Berê ne bûn şehristan
Tev rêl û dehl û devî
Hebû şahê di şêran
Rojekê ew çû neçîr
Pencek lêda wergerand
Gava zikê xwe kir tîr
Kes tine bû di geli
Roviyekî pîr xaznag
Dema wî dît şêr raket
Hêdlî hêdlî hate jêr
Bi rêviyên zikê gê
Revî çû ket nava kir
Ro ji ezmên pengizî
Heya ji xew pênişî
Tezîk da xwe bi awîr
Gelek zor da dest pê
Rovî dît ev halê ha
Got: bonswar memê şêr
Simbêla xwe girî bada
Şêr gelekî enirî
Serekê weş û kovî
Lê çî bike nika bû
Hêdlîka got: birazî!
Roviyê bi fên û fût
Min divê te hold xweş
Ev çiyayê pîr bilind
Çî dirende mûr û mar
Teyrek nika bîfirî
Du sê lotik dane xwe
Wê şevê şêr ma li wê
Sibê roviyê xîzî
Hate pêş şahê zerî
Gotê: eman ya siltan
Kî bê bavê quz jin kir
Zûka vekir piyên şêr
— Lawê Ebasê guri
Şêr got: bi heqê Xwedê
Di nav van rêl û beran
Girêdana bi Tiri
Vê minetê nagirim
Ji dest fênên roviyak
Çirçirok çû diyarên
Hema 26—9—933

Heya dîghê Amedan
Ne bajar, bak û bîstan
Tê hebûn weş û kovî
Kuç û zinar dihéran
Di rê da dît gaki pîr
Kezeb lê bi bergerand
Xew ji xwe ra dît bi xêr
Ber cendek ra vezell
Rawestî bû di nav pag
Rabû di nav pêg daket
Wî ji zikê xwe kir tîr
Ji şêr şidand dest û pê
Ji girtiyê xwe hêre kir
Rêvî li hev çingizî
Rêvî li ser bûne ji
Girêdana xwe bîr bir
Bo felatê nedît rê
Rabû daket hate ba
Yanê êvar pîr bi xêr
Li ber serî tût veda
D'zêkê xwe da mîrmîrî
Îro bû tewzê ravi
Êdî gewrî ziha bû
Te xêre, çî dixwazî?
Gotê: memê shehbelût
Bîbînin her bestêreş
Ko tê ninin şêr û gund
Ez im tê da fermandar
Bê destûra min Tiri
Revî çû ket kuna xwe
Girêdayî ta sibê
Bi semtika weke diz
Jê ra nizim kir serî
Gorî te bin ser û can
Girêpa ye ev emîr
Şêr got: navê te bi xêr?
Xulamokê te Virî
Bi wê keda bav û dê
Namin im li van deran
Berdana bi destê Virî
Bila j'xwe ra bîmîrim
Şêr derketin ji çîyan
Rehme l'ê bavê guhdaran
OSMAN SEBRÎ

diroka welatê xwe re dixebite. Di wî wari da pîr û hindik gotinên ko bibin pêşdetir di destê diroknivîsên kurdan da ji goreyl xwe dibin ronahîkê.

Piştlî berpê kirina pesn û spasên xwe ji cenabê nivîsevan Emlin Zekî beg re; min dil heye li ser çend bendên kitêbê bîpeyivim. Heke wek daxwaza Emlin Zekî beg kitêbeke bi serxwe nenivîsin jî, teqez li ser kitêba ko gihandiye destê me û di warên ko tê da haydar im, dê zanîna xwe bêjim û bi wî awayî bi karê xwe ê welatî rabim. Min hêvlî gelek mezin e ko xort û zanayên kurd zanîna xwe ya di wî wari da ji gelê kurd û diroka wan nehêvîşînin.

OSMAN SEBRÎ

ŞIVAN Û BERAN

BERAN:

— Şivano... derdê te çî ye, tu çîre hevqas mitalan dikî û berjêr li erdê dinêrt; fedkire... dinya bihar e; gul û çîçek li çîya û zinara şin bûne; xema me xwe; Xwedê heye, xem tu ne ye...

ŞIVAN:

— Berano... beranê min ê pênçbirinî... galgala te xweş e, tu li ber dilê min dikî hêveron û ronikahi; tu beraneklî pozbillindî rû bi şamî, çavên te mîna çavên şêr in, qilochên te mezintir in ji kiloçên beranê pezkûvî, te xwe di firehiyê de ditiye, te tengî û kêmanî ne ditiye...

BERAN:

— Belê; ez li ser mêrg û çîmenên deşî û zozana hatime çêrandin, min ava delavê Bingolê vexwariye, di van pûk û berf û bandevî de, li Serhedan mezin bûme, tîrsa dengê gur û cinawîra tu cara ne ket dilê min, ber bi êvarê li ser tehtî û pehnava min berê xwe da rojavayî û bayê xerbi li mûyên singa min dixist û di şevinkirina şivana de, min qilochên xwe dida erdê û min stêrên ezmana dihejmartin.

ŞIVAN:

— Berano... tu xweş dibêjtî; wadê ez xort bûm, deşî û zozan, govend û stran, teştî û bêrivan besî min bûn... Berî rohelatî li seh-gura sibê, gava min blûr û herbangî ji pezê xwe re lédixist û dengê min hikim dibû li diyar û newala, dilê min vedibû, kêfa min dihat û li cem min û hevala dibû şahînet.

Wê çaxê ez serekê şivana bûm û min ji xwe re wê wextê digot: Ji Xwedê pê ve mezin ez im.

Carna min xwe ji çiyê hera dida û ez di-keşim deştê û diçûm nav gundî û cotkariyên xwe...

Di gundê me de du xortên xwenda hebûn wan carna ji min re digot: Halê te û halê me giya ne tu hal e; min henek û qeşme-riyê xwe bi wan dikir; wan li min vedi-gerand û digot: Tiştîna hene ko tu pê ni zantî lê em dizanin.

BERAN:

Tu dibînî, li cem te bû dilxweşî û firehî...

ŞIVAN:

— Belê; lê rojekê min dixwest, ez ji xwedî kon û pez bîm, Axê ji min dilgiran bû, berê xwe ne da min û herçend jî min rih û porê xwe di ber xidmeta wî de spî

Pêvek-III

SAL 9
HEJMAR 28
PÊNCŞEMB
15 GULAN 1941

HAWAR

ANNEE 9
NUMERO 28
JEUDI
15 MAI 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefstra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Tarîxa Kurdistanê	Osman Sebri
Welatê Tirtiriya	Osman Sebri
Şivan û beran	Çiyayiyê Agiri
Em' arî ne	Cegerxwîn
Bi yek bin	Dr. K. A. Bedir-Xan
Strana mirinê	Mamosteyê gerok
Marşa rêçenasan	Cegerxwîn
Gramêra kurdmançî	C. A. Bedir-Xan
Kurd û kurdmanç	Hişyar
Jin û bextiyarî	Rewşen Bedir-Xan
Ferhengok	Ferhengvan
Pehlîzok	Stranvan
Paşlavjok	Stranvan

BIRÊ FRENSIZI

Chants d'automne	R. Lescot
Memê Alan	D. A. Bêdir-Khan



ŞAM—1941
ÇAPXANA SEBATÊ

- 703 -

Fırat AYDINKAYA

Wergera Ji Tirkî: Sînan GÜLTEKIN

DI DERBAREYÊ “NAMEYA JI REWŞENBÎREKÎ KURD BO MUSTAFA KEMALÎ” DA¹

Bo bîranîna Apê Rîho

Destpêk

Desthilatdarîya nûjen, ji bo têgihîştina dîyardeya nûjen a ku jê re “rewşenbîr” tê gotin, bi piranî “kargîna neynikê” hildide. Ji bo zanîna erk, nasname û rewîştê awarte, teqilandina rewşenbîr di pîvana desthilatdarîyê da gelekî fêrker e. Bi taybetî jî, awayê têkiliya rewşenbîrên dijber bi desthilatdarîyê ra, teknîkên nêzîkbûna desthilatdarîyê, cîhana dijberîyê bêtir dawerivandî dike. Ji aliyê din ve, cîhê rewşenbîr weke kategorîyekê, bi piranî li ser mahneya ku dide desthilatdarîyê û dûrahîya ji desthilatdarîyê ve tê mahnedarkirin. Awayê xîtab, dîyaloga rexneyî ya rewşenbîrên dijber bo rayedaran, weke nameya ku ev gotar xwe spartîye, di hin rewşan da dibe ku mahneyên taybet bihêwirîne.

Di vê nivîsê da, ez ê li ser wê nameyê rawestim ku ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatîye nivîsandin ku têde dijberîya wî ya li hember rejîma sîyasî ya Tirkîyê westar e û ji gelek alîyan ve xwedî wesfên daxuyan (manîfesto) e.² Nameya navborî, ji aliyê naverokê ve ji nivîsarên rêzê zêdetir mahneyan dihewîne. Mebesta min ew e ku ji aliyê du sernavên bingeh ve li ser nameyê hûr bibim. Ev name, berîya her tiştî, yek ji wan nivîsarên pêşîn ya rastîhevhatina teorîk a rewşenbîrên kurd û rejîma sîyasî ya “Kemalîzm”ê ye. Ev nivîsar di dewra me da jî çavkanîya naveroka rexneya rewşenbîrên kurd bo Kemalîzmê ye ku bi

1 Aydınkaya, Fırat, «Bir Kürt Aydınından Mustafa Kemal'e Mektup», Dipnot, n° 2, 2010, pp. 63-82.

2 Ev name ku di sala 1933 da hatîye hinartin, li Şamê bi tîpên erebî hatîye çapkirin. Nameya ku bûye mijara vê nivîsê, weke Celadet Bedirxan, Nameyek ji Rewşenbîrekî Kurd bo Mustafa Kemal (Stenbol, Weşanên Dozê, 1992) hatîye weşandin.

vê mahneyê rêyeke nû vekir. Ji bilî vê, ji ber ku ev nivîsar, nivîsara rexneyî ya teorîk û sîyasî ya pêşî ye, girîng e ji ber ku ji aliyê rewşenbîrên kurd ve, li dijî Kemalîzmê hatîye kirin. Herweha, ji aliyê nêzîkbûna “netewperwerîyê” ya rewşenbîrên kurd a dewra xwe jî, ev nivîsar mînakeke baş e. Herî dawî jî, di kesayeta nivîskarê nameyê da, ez ê li ser ferqa taybetmendîya veguherînê rawestim yê ku pêk hatîye ji kevneşopîya entelijensîya komîtager a hewesa pey sîyasetê ku bi awayekî azwer û kelecane û rewşenbîrê xweser û rexneyî.³ Lewre, Celadet Bedirxan figurekî hîm e ku bi awayekî eşkere derbasbûna ji komîtegerîya rewşenbîrî bo rewşenbîrîya xweser di xwe da dihewîne.

Dema van tiştan dikim, ez ê ji nameyekê hereket bikim ku weke rûpelên pirtûkî ji nêzî sed rûpelî pêk tê. Helbet dûvdirêj be jî ne guncav e ku tespîten ewqasî girîng ji naveroka nameyekê bînin kirin. Ji ber vê, ez ê van rêçan ji berhemên din ên nivîskarê nameyê bişopînim.⁴ Digel vê, ez ê berhemên ji aliyê entelijensîyayên kurd ên din ve hatine nivîsîn ku di dewra behskirî da jîyane, bikim referans.

Bi rastî, name ji binî heta serî dikare weke nivîsareke welê bê xwendin ku lêpîrsîn û tewer darizandinekê di nav xwe da dihewîne. Nivîskarê ku doktoraya hiqûqê kirîye, di bin bandora zêde ya nasnameya hiqûqnasîya wî da, bi derfetên berfireh ên pozîtîvîzma hiqûqî ve, belgeyeke çespana silek û bervederîyê hatîye amadekirin. Bi têkelhevbûna rexneya sîyasî, hewlên çespana zimanzanî û bervederîyeke neteweyî-folklorîk, bi rewşeke wêneyekî bandorkar hatîye nivîsandin û şandin. Ev name, di tarîxa 8ê Berfenbara 1933an da hatîye nivîsandin. Bîrxistina paşbingeha dîrokî ya kurt ku bandor li naveroka nameyê kirîye, dibe ku kêrhatî be. Li gorî vê, di ser derketina wî “çîyaye Kahtayê” ya Celadet Bedirxan ra ku tehdîteke ciddî bû bo hereketa Mustafa Kemal, çardeh sal, di ser derxistina fermana Mustafa Kemal ya li ser darvekirina Celadet Bedirxanra yazdeh sal, di ser damezirandina Komarê ra deh sal, di ser serhildana Şêx Seîdra heşt sal, di ser serhildana Agirî ra sê sal derbas bûbûn ku bi awayekî trajîk bi dawî bû ku ji aliyê Celadet Bedirxan ve cara

3 Têgihên rewşenbîr, entelektuel û entelijensîya bi awayekî bêpergal gelek caran ji dêleva hev ve tên bikaranîn. Herçend ev her sê têgih weke çarçove têkil hev bin jî di eslê xwe da xwedîyê resenîyên cuda ne. Ji ber vê sedemê, ez dixwazim îfade bikim ku min di gotarê da hewl daye ku van her sê têgihan di pêwendîyên wan da bi kar bînim. Ji bo van danberhevên berfireh bnr. Edward Said, Entelektüel, wer. Tuncay Birkan, Stenbol, Weşanên Ayrıntiyê, 1955; Ali Şeriatî, Medenîyet ve Modernizm, wer. İsa Çakan, Stenbol, Weşanên Yeni Zamanlarê, 2004; Frantz Fanon, Siyah Deri Beyaz Maske, wer. Cahit Koyak, Stenbol, Weşanên Versusê, 2009; Abdülkerim Sürüş, Aydınlik ve Dindarlık, wer. Sabah Kara, Ankara, Weşanên Kiyamê, 1990; Şerif Mardin, Türkiye’de Din ve Siyaset, Stenbol, Weşanên İletişimê, 2007.

4 Ji bilî vê nameya çapkirî ya nivîskar, gelek berhemên wî ên din jî hene. Tespîten ku di vê gotarê da hatine kirin, pêşî ji Notên Rojane ku dem ali Almanya dijîya girtine û ji cildên yekem û duyem ên *Hawarê* ku dema li Suriyê dijîya çap kirine pêk tên.

paşî li hember rejîma Kemalîst bi hêvîyên çekdarî pêk hatibû. Gava name hat şandin merheleya rizgarbûna berxwedanên elîtên Komarê qedîyaye, rejîma rizgarîyê bi hin nûsazîyan hatiye kutakirin. Heta radeyekê, rewş dîyar bûye, rengê sîyasî ya rejîme eşkere bûye.

Rejîma sîyasî, piştî tepeserkirina serhildana Agirîyê, rêbera xwe ya polîtîkayên kurdî dîyar kir. Polîtîkayên kurdî, bi termînolojîyeke klîşebûyî, weke “înkarkirin û bişaftinê” hatine birêvebirin. Ji bo pêkanîna vê, ji bo transferkirina rêbazên Hitlerî, Recep Peker hatiye peywirdarkirin, ji bo teorîyên zimanê roje (*Güneş dil*) dezgehên ziman, dîrok, erdnigarîyê hatin avakirin. Êdî kurd tune ne, dewra tirkên çiyayî (*dağlı Türk*) dest pê dike. Tam di vê hîne da, ji bo rûmeta dehsalîya Komarê bexşandineke berfireh di rojevê da ye.⁵

Gelo Yekî Got Rexneya Kemalîzmê?

Rexneyên zû li “îzm”ên ku ji navê kesayetekî nasnameyê werdigirin her dem birîsk e. Lewre, ne hêsan e ku mirovek îdeolojîyên ku ji şexsekî tên darîştin, rexne bike bêtir ku berê xwe bide kesayeta wî şexsî. Îcar ev, rexneya sîyasî gelekî diwartir e. Ha, rexneya Kemalîzma di vê nameyê da di vî warî da nivîsareke serkeftî ye. Tewer, ev nivîsar hêj bêtir balkêş e ji ber ku rexnevan li hember rexnegir, dewrekê teşebûsî serhildane kirîye û rexnegir di heqê rexnevan da fermana îdamê der xistîye. Rexneya Kemalîzmê ya vê nameyê bi sê pêwendîyên têkilhevbûyî hatiye nivîsandin. Di ya pêşî da, teswîrkirina rewşa perçebûna civakî ya wê dewrê li kar e ku ji alîyê rewşenbîrekî zanayê sîyaset û sosyolojîya sîyasetê ye. Di ya duyem da, polîtîkayên înkâr, bişaftin û îmhayê ya rejîma Kemalîst ku li hember kurdan bi rê ve dibir, bûye mijara rexneyê. Dawîyê da jî, bervederîyên hema bêje di şiklê redkirinê da li hember projeya rojavabûyîne ya Komarê ku ji alîyê rewşenbîrekî ku rojhilat û rojavayê Ewrûpa ji nêz ve dizane, li ber çavan e.

Teşhîsa komareke çewt heye ku di pêşengîya şexsîyeteke modernîst û otokrat a sîyasî ve dimeşe. Ji alîyê ve, ev name rexneyeke pêşwext a pergaleke

⁵ Di dehsalîya komarê da, ji bo komara nûciwan pîrozbahîyên mirêsdar hatin lidarxistin. Di heman dema şahîyên pîrozbahîyan da, ji bo jibîrkirina tecrubeyên bijan ên dewrên borî, normalbûna piştî tevdirên tund û destpêkeke nû hikûmet di 25ê Cotmeha 1933an da Zagona Bexşandinê amade kir û pêşkêşî meclîsê kir. Çapemenîya wê dewrê, vê teşebusa bexşandinê weke bexşandineke sîyasî ragihand. Hat qeydkirin ku tenê ew kesên ku weke 150yan (150likler) tên zanîn, nikaribûn ji vê bexşandinê istifade bikin. Hikûmet, di Peyman Lozanê da, mafê dersînorkirin û sirgûna ew kesên ku weke 150yan tên zanîn, bi dest xistîye. Bi bexşandinê ra, nûnerên Fırkaya Komarê ya Terakkîperwer û hin bertawanên sûiqasta İzmirê kirin ber bexşandinê. Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Cahide Sınmaz-Sönmez, “Cumhuriyetin Onuncu Yıldönümü Kutlamaları ve 26 Ekim 1933 Tarihli Genel Af Yasası”, Ankara Üniversitesi Türk İnkılap Enstitüsü Atatürk Yolu Dergisi, Sayı: 33-34, Mayıs-Kasım 2004, rr. 89-101.

olîgarşik e. Bi rastî jî, nivîskarê nameyê yê ku di dewrên hilweşîna Osmanîyan da jîyaye û di vê dewrê da mafê dijberiyê ji nêz ve raçavî kirîye, nebûna mafê dijberiyê di rejîma komarê da têngihiştîye. Celadet Bedirxanê ku weke yekî ku li Komara Weimarê jîyaye û di derbareyê ezmûnên komarên cihanê da xwedî zanyariyan e ku hin mafên demokratîk ewle kirine, ji bo vê rewşê matmayî dibe. Nivîskarê ku rexneyeke tûj û eşkere li yekzilambûna çewisîner ya rejîmê dike, îşaretî qanûnîbûna mafên dijberiyê dike û demokrasîyê bi bîr dixê. Ji aliyê sîyasetnasîyê ve, ev rexne û hişyarîyên ji bo demokratîkbûna komarê dikarin weke hişyarîyeke pêşwext bîna şirovekirin. Digel vê, rexneya duperçekirina welatî ya asîmetrîk ya rejîma yekzilamî tê kirin. Fikra Tirkîyeke ku sînoren wê yê sîyasî dîyar in û Tirkîyeke bêdewlet ku sînoren wê nedîyar, mafên wê sirgûn, mexdûr û xespbûyî ne berbiçav dibe û kirpeke eşkere ya ciwakeke perçebûyî heye. Hebûna du komên bingeh hatîye dîyarkirin ku ji aliyê sosyolojîya sîyasetê ve sîyasîbûyî û cudabûyî ne. Ji vê wêdetir, balê dikişîne ser şerekî nepen, ciddî û nebilêvkirî di navbera van her du koman da heye ku bi awayekî cuda sîyasî bûne. Gava ku wêneyê sosyolojîk ê tevlihev ê komara nû tê teswîrkirin, tê bibîrxistin ku rîskeke heye ku qeza û bela bîna serê komarê.

Mebesta nivîsîna nameyê ya bingehîn ew e ku polîtîkayên kurdî yê rejîma Kemalîst hilweşîne. Eşkere ye ku nivîskar bi vê nameyê ra li hember rejîma Kemalîst şûrê xwe tûj kirîye. Name bi rexneya polîtîkayeke rojane dest pê dike, sîyaseta kurdî ku tê meşandin, dubare dike. Ji ber ku sozê bexşandîneke sîyasî û gelemperî hatibû dayîn, lê piştra tenê sînoren wê bi tawanên adî û sînordar hat birîn- û belkû jî tevlinekirina wî bi xwe- nivîskarê nameyê hêrs kirîye. Di vir da rewşeke girîng heye ku divê bê qeydkirin. Xwesipartina bextê Mustafa Kemalî û rejîmê ya nivîskar ji bo bexşandîneke divê bê dîyarkirin. Mahneya vê mijarê, di derbareyê nivîskar da, me ber bi hin pêş-pejirandinên veşartî ve dibe. Berîya her tiştî her çend nivîskarê berhemê bi bîr bixe ku naveroke şaş hatîye tijîkirin, hebûna tirkî ya serwer ya rejîma komarê teslîm û tescîl kirîye. Heta mahneyek wîrdetir, rêyên tevlihbûna rejîmê li ser bexşandîneke têt gotûbêjîkirin. Ji ber ku bexşandin weke gotî nebûye, dilê nivîskar jê maye; belkû, lê gelekî mahnedar e ku hêvîya bexşandîneke ji rejîmê kirîye ku ji aliyê sîyasetê ve mahne û encama wê hebe. Her ku nivîskar ne tenê bexşandîneke, bi bexşandîneke ra nasîna mafên dijberiyê jî, ji otorîteyê sîyasî “ji aliyê moral û dij-sîyasetê ve” bixwaze, daxwazeke bi vî rengî qelşeke kûr dihewîne, di derbareyê radeya biçûkbûna çarçoveya têkoşîna wî da hin fikran pêşkêş dike. Nivîskar gawek wîrdetir diçe û bawer dike ku bexşandîneke sîyasî û gelemperî dibe ku bibe sedema veguherîneke girîng a polîtîkayên kurdî. Encama ku ji vir tê bi destxistin ew e ku biqasî hizirkirina bexşandîna sîyasî weke navgî-

neke têkoşîna sîyasî, bazarkirina sîyasî yan hêvîyên minîmal û heta radeya şexsî ber bi çav dike. Bi destxistina bexşandinê ra rejîma sîyasî dê gavekê bê şûndebirin. Weke ku ji pêwenda nameyê jî tê fêmkirin, hizirkirina bexşandinê weke navgîneke polîtîkayê peywira agirbestê werdigire. Mixabin, dê rejîm qet li banga agirbestê nefikire jî.

Nivîskar hêvîşkestina di mijara bexşandinê da zû çareser dike, rasterast xitabî xwedîyê rejîmê dike û dipirse bê “çima heta niha hebûna pîrsgirêka Kurdistanê⁶ bi awayekî eşkere bilêv nekirîye”. Nivîskar di vê pîrsê da balê dik-îşîne ku peyva “sarahatan” (dîyar, eşkere) bi zanebûn bi kar anîye. Her ku ev peyv li hundir û derve nayê bilêvkin jî, polîtîkayên bi vî rengî tîrên birevebirin. Li gorî vê, pîrsgirêk bi awayekî eşkere tê zanîn, tevdir ji bo vê tîrên stendin lê nav lê nayê kirin. Nivîskar ji xwedîyê rejîmê daxwaz dike ku navê pîrsgirêkê rast bê lê kirin. Piştî vê merhaleyê, dest bi hilweşîna binyadî ya bingehîn a sîyasetên Kemalîzmê yê zimanî, dîrokî, polîtîk û cezaî tê kirin. Divê bê diyarkirin ku bi vê azînzaniya hilweşîna binyadî, xalên rexneyên bingeh ên teorîk him ên sîyasetê kurdî him ên sîyasetê tirkî tê avakirin. Lewre, him rewşenbîrên kurd û him sîyasetên kurdî yê piştî vê dîrokê, gava ku Kemalîzmê rexne bikin dê wê reyê bişopînin ku nivîskar di rexneya Kemalîzmê da vekirîye. Tiştê ku sêyîneya înkâr, îmhayê û bişaftinê kirîye klîşe û bingeha rexneya Kemalîzmê bi pîranî ev berhem û nivîskarê wê ye. Jixwe, heman aktor di teknîk û rêbazên tekoşîna hemberî rejîma Kemalîzmê da jî deyndarê nivîskar û berhema wî ne. Lewre, sîyaset û rewşenbîrên kurdî eynî weke ku di vê berhemê da jî cih digire, li hemberî sîyasetê înkârê ya Kemalîzmê dîroka kurdî ji nû ve vedîtin. Li hemberî sîyasetê bişaftinê, eynî weke vê berhemê bi peşvebirina kurdî bersiv hatîye dayîn. Tevdîrên li hemberî sîyasetê îmhayê jî hema hema eynî ne. Ji gelek alîyan ve ev name, ji aliyê kurdan ve li hemberî sîyasetê Kemalîzmê weke mifteya bersivê ye. Bi rastî jî, nivîskar jî li hemberî polîtîkaya înkârê ya Kemalîzmê ji dîroka kurdan a neteweyî beş pêşkêş kirine û jêderkên pîrsgirêkê yê bingeh îfşa kirine. Li gorî nivîskar, dîrokîya pîrsgirêkê digihîje heta Îdrîsî Bêdlîsî. Li gorî wî, pîrsgirêk bi îtaatkirina Bêdlîsî dest pê kirîye. Herweha, nivîskarê nameyê dîroka kurdan jî tîne bîra xwedîyê rejîmê. Bi referansa Ksenofon û Medan balê dikişîne ser bîwarên pîrsgirêkê. Herweha, nivîskar hay jê heye ku Mustafa Kemal bi dîrokê ra eleqedar e. Belkû jî bikaranîna zanyariyên dîrokî yê bikitekit jî bi vê bê ravekirin. Nivîskar xitabî Mustafa Kemal dike û dibêje ku ew dizane ku di demên dawî da Mustafa Kemal bi dîrokê ra mijûl dibe, li ser nijada arî lêkolînan dike, lewma dibêje ku divê ev fikrekê bide wî di derbareyê kurdan û Kurdistanê de.

6 Nivîskar di vir da bi awayekî balkêş pîrsgirêkê ne weke “pîrsgirêka kurdî” lê weke “pîrsgirêka Kurdistanê” pêşkêş dike.

Pevçûna di Agorayê da

Yek ji aliyên girîng ên vê nameyê yên dîrokî jî ev e ku rexneyan li bingegehên girîng ên tirkperest ên Kemalîzmê dike. Kokên Kemalîzmê yên tirkperest ji du alîyan ve bûne mijara rexneyê. Li gorî vê, rexne li sîyaseta nijadî bi bîwarên referansî ve hatîye kirin. Digel vê, bi awayekî girîng, bingeheke somkar a fikrî, îdeolojîk hatîye rexnekirin ku tirkperestî tê referanskirin. Bi rastî di nameyê da, ne tenê weke terzeke Kemalîzmê ya sîyasî, ji bilî vê weke bergeheke çandî-îdeolojîk berîya sîyasetê, hîmên girîng ên Kemalîzmê tên rexnekirin. Ji ber ku ji aliyê sîyasetê ve Kemalîzm bermayeya tirkperestîya Îttîhatvanan e û bi awayekî organîk Îttîhatvan di nav elîtên Kemalîzmê da cih digirin, ev yek hatîye pirsîyarkirin. Jixwe nivîskar hemû binasên tirkperestîyê bi Kemalîzmê ve nade destpêkirin û naspêre Kemalîzmê. Tehdeyên ku Îttîhatvanên ku weke pêşekên elîtên Kemalîst li yên ne-tirk kirine bi bîr dixê, bikaranîna bi heman awayî ya vê dîyardeyê ya Kemalîzmê rexne dike.⁷ Ev mijar ji vî aliyê ve girîng e. Nivîskar pêşkêş dike ku di mijara pirsgerêka Kurdistanê da kevneşopîyeke domdar a bingegeh û hevpar a tirkperestîyê di navbera Îttîhatvan û Kemalîstan da heye. Nivîskar hewl dide ku kevneşopîya domdar bi metafora pirtûkê vebêje. Li gorî vê, ji pirtûka ku naveroka polîtîkaya kurdî ya Îttîhatvanan dihevwîne, tenê nusxeyek maye, nivîskar balê dikişîne ser ku tiştên ku di vê pirtûkê da nivîsandî ne û temenê Îttîhatvanan têrî nekirîye, ji aliyê Kemalîstan ve hatîye sepanandin. Vê pêvajoyê jî wilo rave dike ku tirkperestîya bi vî rengî dixwaze neteweyan bibiştirîne. Di vê qadê da balê dikişîne ser tevdîr û çespanên çandî ku li Kurdistanê tatbîk bûne. Nivîskar rexneyan dike ku dîyardeyên pêşwext ên teorîya emperyalîzma çandî eşkere ne. Nivîskar gazindan dike ku li erdnigarîya kurdan bişaftineke çandî, sistematîk û biplan tê sepanandin. Ji bo vê polîtîkayê, ji heman dewran guvahekî din balê dikişîne. Behs dike ku li dibistanê mamoste ji wan ra dibêjin “hûn ne kurd in”, wan diçespînin, wilo kirine ku divê zarokên kurd bi tirkî bipeyivin.⁸ Nivîskarê nameyê dibêje ku li Kurdistanê li gorî projeya ku ew bi “guhîlênkirina perwerdehiyê” bi nav dike, lîseyek bi tenê ji venebûye, tenê ji bo zarokên kesên burokrat dibistanên navîn vebûne. Di encama vê da, rêjeya xwendeyên bajarên tirkan ji % 33 ye lê li coğrafya kurdan ev rêje ji % 3.5 e. Nivîskar bi van daneyan bi awayekî eşkere emperyalîzma çandî û heta tezen mêtîngehkarîyê tuwanc dike. Ji bilî vê,

7 Nuredîn Zaza jî wilo difikire ku kevneşopîya tirkperest û bişaftinhez a Kemalîzmê ku ji elîtên Îttîhatvan wergirtine bêyî pirsîyarkirin hatîye pejirandin. Li gorî wî, yekane sedema xwespirtina fikrên tirkperest û Jön-tirkperest a Kemalîstan ew e ku ew dixwazin fikra kurd û Kurdistanê tune bikin. Nuredîn Zaza, *Weke Kurdekî Jiyana Min*, Stenbol, Weşanên Perîyê, 2000, r. 29.

8 Dibistana navborî di 1929an da li Amedê perwerde dikir. Nivîskar, weke guvah ji raçavên pêşî dibêje ku li dibistanê çespanên dijwar hebûn ku nêzî tundîyê ne. Nuredîn Zaza, *bnb.*, r. 43, 62.

nivîskar ji wan şiroveyên bin-oryantalîst gazindan dike ku di çapemenî û hin derdorên zanistî da henekên xwe bi kurdan dikin ku kurdan weke nijadeke nezan û talankar nîşan didin.

Piranîya beşa berhema ji bo barê peyitandinê hatiye terxankirin. Bi rastî jî, nivîskar bi berfirehî li ser sepandinên sehayên wêjeyî û çandî ya sîyaseta tirkkirinê disekine. Weke sepandinên şênber, vê dike pisrgirêk ku Wekilê Perwerdehîyê Necatî Beg gava ku hatiye Kurdistanê gotîye zimanekî bi navê kurdî tune ye, ev ziman bi rastî zimanê çîya ye. Herweha li hemberî tezên sîyaseta zimanî ya rejîma Kemalîstan têdikoşe ya ku ji Dr. Fritz referans dike û dibêje zimanekî bi navê kurdî tune ye. Nivîskar hevî dike ku tiştên ku nivîsîne bala Mustafa Kemal bikişîne. Tezên filolojîk ên ku nivîskar li dijî wan derdikeve, bingeha zimannasîya kurdî pêk tîne. Ji bilî vê jî, di vir da, taybetmendiyên kurdî yên fonetîk, binyada rêzimanî û binyada zimanî bi mînakên berawirdî rave dike. Bi xêra zanîna nivîskar a zimanên almanî, inglîzî, frensî, rûsî, yewnanî, farisî, erebî, malbatên zimanî bi berawirdî û awayekî hînkêr ji guhdaran/xwîneranra tê vegotin. Ji aliyê pergala zimanî ve, dibêje ku kurdî aîdî malbata arî-ewrûpî ye, tirkî aîdî malbata ural-altay e. Ew dibêje ku di navbera van zimanan da ji aliyê sosyolojîya zimanî ve dibe ku danûstendin pêk hatibin. Bi vî awayî, hewl dide ku bipeyitîne û biparêze ku ji aliyê binyad û jêderkan ve kurdî ji tirkî cihê ye. Li dijî bişaftina çandî, di roja me da jî, berhemeke bi vî rengî zehmet e ku bê dîtîna ku parastin û peyitandina kurdî bi daneyên zimannasî dike. Weke encam nivîskar, bingehên ku rejîm xwe dispêre û dibêje ku kurdî zimanekî çîyayî ye, bi xêra zanîna hiqûqê, tezên ku bi referansa Dr. Fritz ve tên girêdan, bi awayekî hilweşîner nîqaş dike. Nivîskar dipeyitîne ku digel ku kurdî û tirkî nav hevda ne, kurdî taybetiyên xwe yên binyadî parastine. Nivîskar bi taybetî bi bîr dixê ku ev dane û peyitandin bi hizra polîtîk pêk nehatine. Divê bê pejirandin ku ev aliyê berhemê yê behskirî, xwe dispêre felsefeyêke ciddî ya zimanî û zanistî. Digel ku alîkarî ji pozîtîvîzma mentiqî û felsefeya zimannasî ya kemilînkêr hatibe xwestin jî, ev tez hêj jî ji bo zimannasîya kurdî lûtkeyek e.

Digel van rexneyên tund, nivîskar tirkperestiyê weke rewşeke civakî dibîne. Lê sînoren wê ji diyar kirine: “Teşebusên weke tirkperestiyê divê negihîjin wê radeyê ku xwîna neteweyên din bimijin.”⁹ Digel ku nivîskar tirkperestiyê weke rewşeke asayî ya civakî bibîne jî, li hember sîyaseta tirkkirinê zêdetir, ji aliyekî rexneker ve li tirkperestiyê dinêre. Tîrên rexneyê yên pêşî di vê mijarê da bi awayekî xwezayî ji bo Îttîhatvanan in. Li gorî nivîskar, Îttîhatvan rêya ku diçe erdnîgarîya îdeolojîk a “Turana Nû” divê paqij bikirana. Pêşî ermen paqij

9 Celadet Bedirxan, hb, r. 70.

kirin, peyra neyta xwe li kurdan xera kiribûn. Ji bo xatirê bidestxistina Turana Nû, kurd jî di her rewşê da dê bihatana tirkkirin. Yan mîna ermanan dê bihatan dîrxistin û tunekirin, yan jî dê nifûsa tirk ber bi Kurdistanê ve biçûya û operasyon dê bihata kirin. Nivîskar zagonên ji bo vê armancê bi bîr dixê ku divê ev yek neyê pejirandin. Ew îddîa dike ku kurdan baş dinase û kurd nakewin vê xafikê. Weke encam, nivîskar tirkperestiyê weke îdeolojîyekê, weke rewşeke xwezayî ya dîrokî, civakî û tewer sîyasî dibîne. Tenê li hemberî polîtîkaya tirkkirinê û armanc û rêbazên tirkperestiyê yê êrîşker û bişavker e. Ew gelekî ji Kemalîzmê hêrs bûye ji ber ku Kemalîzm jî van armanc û rêbazan bi kar tîne û hêvî dike ku di dawîya van armanc û rêbazan da “înkarkirina kurdan” pêk bê.

Dabaşa din ku girîngiya dîrokî dide berhemê jî ew e ku têkilîyeke binîqaş di navbera elîten sîyasî yê Kurdistanî û Mustafa Kemal da di dewra damezrandina komarê da heye. Di vir da taktîkên sîyasî yê aktorê damezrandinê Mustafa Kemal bixwe, dîyalogên wî bi kurdan ra û hin sozên ku wî ji kurdan ra wehd kirine, tîbî bibîrxistin. Lê mixabin, ji ber ku rexne gelekî serveyî ne û spekulasyonên şexsî dihewîne, biwarên civakî nehatine behskirin. Tiştê xerabtir jî ew e ku, kêmasî û xeletiyên kurdan ên tarîfa vê têkilîyê nehatine rojevê. Digel ku nivîskar di rewşeke dijber da be jî, ew jî di pêvajoya damezrandinê da xwedî peywir e. Lê tu rexneyan li xwe nake. Bi awayekî basîd ji Mustafa Kemal ra vê gazindê dike û dibêje “wexta tu muhtac bûyî te wehd dane kurdan. Bi xêra vê te alîkariya kurdan wergirt. Lê gava dinya li te fireh bû, te êdî ew nas nekirin.” Nivîskar bi awayekî tund rexne dike ku kurd bi peyvên xweşik mîna “birayê min, axe” hatine xapandin. Ew kurdên ku navên birayê min û axe li wan hatiyê kirin, vêca peyra hatine darvekirin.¹⁰ Rexneyên bi vî rengî keliyên pêşîn in ku zimanê mexdûrbûnê tevî sîyaseta kurdî bûye. Îdeolojî û retorîka mexdûrbûnê hêj jî yek ji performansên bingeîn e di nûjenbûna kurdan de. Digel vê, teza ku kurd bi wehdên şexsî û spekulasyonan hatine xapandin, hêj tezek ji tezen girîng ên rewşenbîrên kurdan e. Ev termînolojî him bûyerên borî weke têkilîyên şexsî rave dike him jî tenê aliyekî tawanbar dike ku wê konformîzmê bi dest bixe ya ku dihêle ew destên xwe ji her tiştî bişon. Ev termînolojîya ku dramatîzebûyî, ji bo “edebîyata mexdûran” bingeheke zexm ya insanî-psîkolojîk ava dike û ji ber vê yekê eşkere ye ku nikarin dev ji vê berdin.

10 Nuri Dersimî bûyereke mîna vê hema hema bi heman hevokên ji mera vedibêje. Dersimî di biranînên xwe da bi bîr tîne ku di sala 1912an da gava ku sekreterê giştî yê Cemiyeta Hezkiriyên Kurdistanê ye, Riza Tevfîk ku wê dewrê di desthilatdîreyê da xwedî gotin bû, xwe weke dostê cemiyetê daye nasîn, sond xwarîye ku ew ê hewl bide da ku mafên kurdan bîn naskirin. Lê mixabin, yê ku cemiyet piştî wextekî da dîsa heman kes e. Nuri Dersimî, Biranînên Mîna, Stenbol, Weşanên Dozê, 1997, r. 25. Xwendeyên kurd gelek caran listik û wehdên sîyasî yê mîna van gudah kirine, lê kes nikare rave bike bê ka çima ew bi van listikan tîbî xapandin.

Nivîskar van tiştan hemûyan rêz dike, weke encam radigihîne ku sîyaseta Kurdistanê ya Komarê îflas kirîye. Name, berhemeke wilo ye ku îflasê pêşkêş dike. Ji bo vê jî, ji bo vê pirsgirêkê çareserkirina xwe jî rave dike û rejîma Kemalîst vedixwîne muzakereyê. Li gorî vê, tê nîşandayîn ku “Ger ku bi fer-maneke fermî hebûna Kurdistanê, mafên kurdan ên dîrokî, nijadî, harsî bên naskirin, ji bo çareserkirina pirsgirêkê gaveke mezin û girîng dibe ku bê avêtin.¹¹ Ligel vê, ku wilo pêk bê jî pirsgirêk bi tevahî dê neyê çareserkirin; bi bîr dixê ku bi tenê bibe destpêkek ji bo çareserkirina pirsgirêkê. Nivîskar ji bo çareserîya pirsgirêkê ya dawî jî tenê vê dibêje: “Dîlgirtin an bişaftina kurdan, ji kuştina wan diwartir e.”¹²

Geşkirina Neteweperestîyê

Nivîskar, di nameyê da cih dide fikrên xwe yê şuştî-belkû kirêtbûyî- yên di derbareyê neteweperestîyê da ku taybetmendîyên karakterîstîk ên dewra xwe dihewînin. Fikrên nivîskar ên di derbareyê neteweperestîyê da bi tevgerên salên 1908-1933an tijî ye. Ji ber vê, bijarte ne lê ne gelekî resen in. Ev fikir, bi awayekî ku mirov metel nehêle, rêçên bandora neteweperestîya almanî dihewîne ku di bin bandora peresana zîndewerzanîyî û darwînîzma civakî da ye. Nivîskar jî dipejirîne ku hebûna naverokên neteweperest ên wê dewrê xwezayî ye. Nivîskar ramanên nijadê xwerû û hebûna taybetmendîyên bijarte yên hin nijadan, hilberandina zîndewerzanîyî yên manend asayî û tewpêwîst dibîne. Heta parastina hin taybetmendîyên bijarte yên nijadê xwerû ji aliyê nivîskar ve tê ecibandin. Pêwîstîya parastina taybetmendîyên bijarte bi şibandina hin mînakên cîhana ajalan tê asayîkirin. Ramanên nivîskar ên di derbareyê neteweperestîyê da bi giştî nêzîkî neteweperestîya gelparêz e, nemaze gava ku yek him li jîyana wî û him jî li naveroka kovara *Hawarê* binêre dê vê yekê bibîne. Ev raman neteweperestîyê weke rewşeke xwezayî û dayî dibîne û neteweperestîyê ne bi hişmendîyeke bikelecan, êrîşker û sîyasî dişayesîne lê kevneşopîyên otantîk ên gelêrî, awayên çandî-folklorîk weke rewşeke civakî û wijdanî dişayesîne. Bi vê nameyê gava ku yek li berhemên din ên nivîskar û jîyana wî binêre, dibe ku rêçên stûr ên neteweperestîya gelparêz û çandî ya Herder bibîne.¹³ Di vê nameyê da, bi gotina “neteweyîya

11 Celadet Bedirxan, hb, r. 95.

12 Celadet Bedirxan, hb, r. 96.

13 Gava ku nivîskar ji bo xwendinê li almanyayê bû, jîyana entelektuel ya almanya, neteweperestîya Herderî nû veditibûn. Ev cureya neteweperestîyê ku ziman, çand û şanazîya neteweyî referans digire piştî Cenga Cîhanê ya yekem li almanyayê ji bo veherandina şanazîya neteweyî hatiye rojevê. Ji bo neteweperestîya Herderî bnr. Acar Sevim, Herderê Pêşengê Neteweperestîya Gelparêz, Stenbol, Weşanên Bilgi Kültür Sanatê, 2008. Li aliyê din, b imin naveroka neteweperestîya kovara *Hawarê* bi piranî dişibe ramana Herderî.

tevger û wijdanî ya kurdî” nivîskar qala neteweperestîyeke gelparêz dike. Ji ber naverok û pêşekiya sîyasî ya vê berhemê, nivîskar dev ji kevneşopîya neteweperestîya gelparêz berdide û bi zimanê neteweperestîya sîyasî dipeyive. Li gorî vê, bi awayekî eşkere pesnê neteweperestîya almanan ya wê dewrê dide û metaforeke bi kar tîne ku wê dewrê zêde tê bilêvkirin. Bi rastî jî, tê hewldan ku neteweperestîya nijadî û peresanêr ya bi awayê nijadê kêm û nijadê bilind bi referansa pozîtîvîzma mentiqî û darwînîzma civakî mafdar bê nîşandayîn. Bandora çanda almanî bi awayekî eşkere li ser nivîskar xuya ye.¹⁴ Tewer ew bandor ewqas zêde ye ku hatiye hewldan ku Mustafa Kemal bibîne gonxwarina hespên esîl û hespên ketûber xwerûbûn û esîlbûna nijadî xera dike. Nivîskarê nameyê, hewlên parastina taybetmendiyên bijarte yên nijadê aryanî û neteweperestîya almanî ya wê dewrê û di encama vê da, hewlên bergirtina tevlîbûna xwîna bîyanîyan bi xwîna almanan tîne zimên. Van hewlan weke pratîkeke erênî nîşan dide. Nemaze, weke ku tê dîtîn, kevneşopîya kovara Jînê û pêşketinên zîndewerzanîyî û darwînîzma civakî ku ji aliyê Abdullah Cevdet¹⁵ ra ketine nav hişmendîya kurdî, tê referanskirin, pênaseyên neteweperest ên ku xwe dispêrin xwînê, weke tiştên pêwîst hatine nivîsandin. Dîyar e ku qewseke kêrperest ji neteweperestîya gelparêz ya Herderî ber bi tezên neteweperest ên partîya sosyalîst-nasyonî ya almanî heye. Lê belê, ji bo dubarekirinê jî be, ewqasî ne hêsan e ku pênaseya neteweperestîya ku nivîskar di vê nameyê da dike, di berhemên din da bînin dîtîn. Di dewama van ramanan da nivîskar neteweperestîya Kemalîst tîne rojevê û hişyarîyan dide ku bi polîtîkayên tirkîkirinê dê xwîna gelan tevlî hev bibe û ev yek şaşî ye. Tê gotin ku tevlîkirina xwîna gelên din bi xwîna tirkan ra dê bikêr neyê û ev yek dê xwîna tirkan jî xera bike. Rêçên neteweperestîya sîyasî ya bi vî rengî di entelijensîya kurdî ya wê dewrêda tune ye. Belkû heyranbûna Nuredîn Zaza ya bi giştî ewrûpa, bi taybetî Fransa-Swîsre bê gotin. Ji bo entelijensîya din, neteweperestîyeke gelparêzî weke îdeolojîyeke serdest ya bidestxistina mafan bi referansên otantîk û bi derûnîyeke car car bi mexdûrîyet heye. Weke encam, nivîskar, bi bandora tewîşandinên zîndewerzanîyî yên wê dewrê, teorîyên darwînîst ên civakî û zanista sîyasî û civakî ya nijadî, kompozîsyoneke

14 Nivîskar gava ku li almanyayê ye rojnivîsk nivîsandine, di van rojnivîskan da dibêje ku ew hez ji xîreta têkoşîna gelê alman dike û vê xîretê diçibîne. Ev rojnivîsk di salên 1922-1925an da hatine nivîsandin. Gava yek bi baldarî li wan binêre dê bibîne ku jinûvepêşketina almanan ku di demeke kurt da pêk hatiye, nivîskar kelecani dike. Celadet Elî Bedirxan, Nişeyên Rojnivîskê, Stenbol, Weşanên Avestayê, 1997, r. 37.

15 Abdullah Cevdet hema hema bi heman hevokan ramanên xwe yên di derbareyê neteweperestîya dewra Osmanî da vedibêje. Cevdetê ku pêşketinên zîndewerzanîyî û teorîsvanên darwînîzma civakî ji nêz ve dişopîne, ramanên gelekî binîqaş yê di derbareyê xwerûbûn û serdestbûna nijadê xwerû da pêşkêş kirine. Bnr. M, Şükrü Hanioglu, Doxtor Abdullah Cevdet û Dewra Wî, Stendol, Weşanên Üçdalê, 1981.

neteweperest dişayesîne ku nêzîkî neteweperestîya almanî ye. Helbet, dibe ku nivîskar ji ber ku di erdnîgarîya sûrî da ku di bin kontrola Fransayê da bû timî dihat çavdêrîkirin, dema serhildana Şêx Seîd ku leşkerên Tirkîyeyê bi destûra Fransayê derbasî xaka Sûrîyeyê bûn, Fransayê di dema serhildana Agirî da alîkarîya sîyasî û lojîstîk û moral dide dewletê, ji ber van sedemên sîyasî, ber bi fikra neteweperestîya sîyasî ve çûbe. Digel vê, nivîskar di hin xalên nameyê da balê dikişîne ser wê yekê ku neteweperestîya kurd pîrikî ji neteweperestîya tirk ra dike û dibêje ev dibe sedema nakokîyekê. Nivîskar bi bîr dixê û balê dikişîne ser wê hindê ku ew di dewra Îttihatvanan da xwendekar e tevî konferansa Îsmâîlê Gaspîrayî dibe, kesên ku di konferansê da navborî ne hemû tirk in û bi bandora vê yekê di rojnameya dibistanê da gotareke derbareyê dîroka kurdan da nivîsandîye.¹⁶ Dîsa behs dike ku di dewra Osmanîyan da komeleyên tirk bi qasî ku tirkperest perwerde kirine kurdperest jî perwerde kirine. Di vir da bi awayekî eşkere balê dikişîne ser zagona neteweperestîyê ya giştî. Ew dibêje ku neteweperestî ji hev hêzê digirin, bi awayekî pêwîst ji hev dizên. Herweha ew hewl dide ku muxatabê wî di vê mijarê da jê bawer bike ku ev yek ne çareserî ye.

Astengkirina Projeya Rojavayîbûnê

Nivîskar rejîma Kemalîst bi awayekî metelhişt ne tenê li ser kurdan û kurdî, lê li ser xaleke din rexne dike. Weke ku tê zanîn, elîta Kemalîst bi ragihandina komarê ra rêbazêke nipînû bireve birine û guherînên binyadî pêk anîne. Di qada sîyasî da seltenet û xelîfetî hatine rakirin. Di qada çandî da qanûna şepqeyê hatîye ragihandin, derbasî tîpên latînî bûne, tekke û zawîye hatina asêkirin. Bi vî awayî bi tevahî nûyatî hatine pêkanîn û di çarçoveya sîyasî û çandî da sîyaseta rojavayîbûnê hatîye meşandin. Gava ev pêk hatine sazîyên olî yan hatine tesfîyekirin yan jî bêîtîbarkirin. Nivîskar vê guherîna civakî ji nêz ve dişopîne. Herweha nivîskarê nameyê civak û çanda rojava ku weke mînak tê girtin, ji nêz ve dizane û nas dike. Nivîskarê nameyê ramanên xwe yên di derbareyê vê mijarê da qeyd dike û projeya rojavayîbûnê ya Kemalîstan bi awayê mîna redkirina dijberên Îslamî-muhafezekar yên wê dewrê dide ber tîrên rexneyê. Rejîmê bi wê yekê tawanbar dike ku Tirkîyeya reformîst gava ku di rêya pêşdeçûnê da diçe hewl dide ku aqîdeyên Îslamîyetê yên dinyewî û ûxrewî bin pê dike.

¹⁶ Hema hema Nûrî Dersimî jî ji ber heman tiştan dilnerihet e. ew behs dike ku di dewra xwendekarîya wî da di sala 1913an da li Stenbolê ji Îttihatvanan Bahaddin Şakir ji bo belavkirina sîyaseta tirkîkirinê di nav ciwanan da konferans li dar xistine. Ew bi taybetî dibêje ku ew û hevalên wî bêyî bertek nemahne. Nûrî Dersimî, hb., r. 31.

Nivîskar weke ku ji hevokên borî tê fêmkirin ji dêleva hişê şoreşvan-reformîst ê hilweşîner û jinûveavaker, nîşaneyên bihêz ên ramana muhafezekarîyê pêşkêş dike ku guherînên bikontrol û mutedîlweke bingeh digire. Bi rastî jî, muhafezekarî weke ramanên sosyalîzm û lîberalîzmê li hember tundîya şoreşkerîya Şoreşa frensî weke bertekekê hatiye pê.¹⁷ Muhafezekarî guherîneke encama serûbinbûna civakî naxwaze. Ew guherîneke bikontrol, sînordar û hêdî diparêze. Nivîskar di rojnivîskên xwe da tundîya bêkontrol, serûbinbûna civakî û hêrsdarbûna sîyasî ya Almanyayê ji nêz ve dîtîye. Bi bandora vê guvahîyê, wilo dixûye ku nivîskar fikra guherîneke bikontrol û zexm dipejirîne. Herweha rehên arîstokratîk û binyada polî ya nivîskar dibe ku terza tevgereke mutedîl ji nivîskar ra guncan kiribe. Ji ber van sedeman nivîskar weke ku wî ji gotîye, ne teqlîdkirina mîsoger lê islahkirina sazîyan girîng dibîne. Ji alîyê ramanî ve, nivîskar nêzî muhafezekarîyê dixûye, ji rexneyên pêşengên rejîma laîk, rexneyên wêrektir pêşkêş kirine. Lewre, li gorî nivîskar bêolîtî li Ewrûpayê bi bertekeke bi hêz ra rûbirû dimîne. Sazîyên olî ji nû ve tîn vejandin. Heta bi Mussolînî jî papa paye bilind dikir. Tirkîyeya ku sazîyên Îslamî û rojhilatî hilweşandine û di dewsa wan da sazîyên latînî damezrandine, tiştên wilo dikir ku tenê dewletên mêtîngêhkar kirine. Herweha nivîskar bi bîr dixê ku ev tişt kêfa ewrûpîyan tîne ku naxwazin Tirkîyeyê bi pêş keve. Ma ne serokwezîrê Fransayê gotibû ku reforma herî girîng ku Tirkîyeyê pêk anîye hilweşandina xelîfetîyê ye? Weke encam, nivîskar wilo difikire ku rêça jakoben, Enverîst û maceraperest didome. Nivîskar ji alîyê ramanî ve di alîyê muhafezekarîyê ra derdixê û şoreşvanîya jakoben rexne dike.

Rewşenbîrên Kurd:

Jîyanên Nefibûyî ji bo Daxwaza Avakirina Dewletê

Dîrok, raman û zanyarên rewşenbîrên kurd xwedî kevneşopîyêke bextreş e û fersendê nade entelektuelîzmê ku ev kevneşopî hewl bide dewletê ava bike. Nemaze, ji alîyê dîrokî ve, mudaxileya Kurdistanê ya Mehmûdê II. ji bo navendparêzîyê û di encama vê da tesfîyeya elîtên rêvebirên Kurdistanê bû sedema rewşeke wilo ku dest û nigên Kurdistanê hatin girêdan. Ji ber ku elîtên sîyasî hebûneke mayînde ya pola îlmîyeyê ku ketibû dewsa otorîteya kevneşopî ku bi Şêx Ubeydullah ra dest pê kir û weke encam dîrketina Kurdistanê ji rêveberîya navendî û sererastkirî, ev sedemên objektîf entelijensîyaya nû ku perwerdehîya hevçerx wergirtîye, dihizirand. Ji ber ku gelê kurd ji yekîtî û sîyasetê mehrûm e û ne xwedî rêveberîya xweser e, ev rewşa dîrokî ji bo ola

17 Ji bo agahîyên zêdetir ên di derbareyê ramana muhafezekarîyê da bnr. F. A. von Hayek, "Çima Ez ne Muhafezekar im?", wer. Atilla Yayla, Liberal Düşünce Dergisi, hej: 34, Bihar 2004, r. 73-84.

nû nedibû bê pejirandin û tamîrkirin. Di vê derdora dîrokî da, bi hatina tevgerên neteweperest ên sîyasî ra ku bi xêra xwendekaran derbasî Kurdistanê bûne, pêwendîya rewşenbîran a sîyasî zêdetir dikir. Bi vê dîyardeyê ra xwendekarên kurd ên wê dewrê, bi awayekî pêwîst xwe weke pêşengên xwezayî yên peywira sîyasî hesabandin. Lê hilgirtina vê peywirê ji bo entelîjensîyaya kurd a wê dewrê ra ne bi tenê ji ber xwebawerîya huner û taybetmendiyên entelektuel ên xweser e. Hema hema hemû di bin sîya kevneşopîyeke sîyasî, arîstokratîk û ronîbûyî da ne. Bi gotineke rasttir, ew bixwe çûne ber vê sîyê. Weke mînak Nûrî Dersimî şêwirmendîya Seyîd Riza kirîye û bi pey lihevkiirineke bihêz ketîye. Îhsan Nûrî bi eşîrên Celalî û Broyê Hesikê Tellî ra sîyasetek bireve birîye. Osman Sebrî hevî ji apê xwe û serok-eşîrê xwe Şikrî Beg kirîye.¹⁸ Nûredîn Zaza tevî Mela Mustefa Barzanî bûye. Nivîskarê vê nameyê jî bi rêya kalê xwe yê arîstokratîk berê xwe daye peywira sîyasî. Hertim, entelîjensîyaya kurd a wê dewrê ne bi xêra xwebawerîyê bûne xwedî peywira sîyasî. Hema hema giş berê xwe dane otorîteya kevneşopî û bihevrebûna sîyasî, xwestine bi wan ra koalîsyonê pêk bînin. Sedema herî mezin a vê yekê ew e ku bawerîya wan bi gel nedihat, ji ber ku gel ne wekî xwedî hişmendî û kamilîbûna sîyasî didîtin. Wan herweha ji xwe jî bawer nedikirin. Lêgerîna bawerîya ontolojîk a dualî wan ber bi kesên xwedî statu û arîstokrat ve dibir. Sedemeke bi vê ra têkildar jî ew e ku ji bo pêwendîya bi gel ra rêyeke kurt bijartine. Entelîjensîya ji dêlêva têkîliya bi gel ra, bi destê gel berê xwe dane kesên xwedî hêz ên otorîteya kevneşopî. Bi min, sedema vê bijartinê ya entelîjensîyaya kurd ketîye bin bandora kevneşopîya dibistanên eşîran ku ji aliyê Abdulhamîtê II. ve hatina damezrandin. Weke ku Nûrî Dersimî jî bi bîr dixê, têkîliya dibistanên eşîran bi dilşahkirina serokên kurdan û şandina xwendekaran bo perwerdehiyê ji bo serokatîya eşîrê ra heye.¹⁹ Weke ku gelekî tê dubarekirin, ger ku rewşenbîrên tirk îmalata odeya tercumeyê ya dewletê bin rewşenbîrên kurd ên pêşî jî îmalata dibistanên eşîran in. Mahneya vê ya sembolîk perwerdekirina serokên eşîran e. Jixwe bi bandora vê, nîgekî entelîjensîyaya kurd li dibistanê ye, yê din li eşîrê ye. Li aliyê din yê ku têkîlîkirina rasterast bi gel ra girîng dibîne, bi awayekî metelhişt figurekî dîrokî ye. Abdullah Cewdet di sala 1913an da di nivîsa xwe ya rojnameya Hetawî Kurd²⁰ da xitabî rewşenbîrên kurd dike û dibêje “gava ku ji dêlêva ku hûn bibin midûr û qeymeqam, hûn avakarbûna dibistaneke gundekî kurdan hîlbijêrin hingî hûn ê bikevin rêya rast.”²¹

18 Osman Sebrî, Bîranînên Osman Sebrî, Stenbol, Weşanên Aramê, 2004.

19 Nûrî Dersimî, hb., r. 14.

20 Veguhêzer: Malmisaniy, Bedirxaniyên ji Cizîra Botan, Stenbol, Weşanên Avestayê, 2000, r. 259.

21 Nûrî Dersimî ku di bîranînên xwe da behsa Abdullah Cewdet dike, muhtemelen bi bandora banga wî teklîfa parlementeriyê red kirîye. Piştî vê jî, ew dibêje ku di qonaxa Seyîd Rizada dibis-

Piştî bibîrxistina vê tespîta giştî, divê bê gotin ku cara pêşî ku entelijensîya kurdî bi Mustafa Kemalî ra rastî hev hatîye berîya damezirandina komarê ye. Weke mînak divê bê veguhastin ku Îhsan Nûrî li hemberî hikûmeta Stenbolê piştgirîya Mustafa Kemalî kirîye. Bi rastî jî, Îhsan Nûrî di sala 1919an da li Stenbolê serokê sazîya nûnerên garnîzona efseran bû. Ji bo alîkirina hêzên Mustafa Kemalî yên ku li Anatolyayê bûn, li hemberî hikûmeta Ferîd Paşa bi hêzeke leşkerî ku ji hengekê pêk dihat, serî hildaye û di hilweşîna hikûmetê da peywireke girîng wergirtîye.²² Seîdê Kurdî jî piştgirîyeke manewî daye tevgera Anatolyayê ya ku pêşengê wê Mustafa Kemal bû. Seyyîd Abdilqadirê ku serokê Cemîyeta Bilindkirina Kurdistanê bû û piştî serhildana Şêx Seîd hat bidarvekirin, bi awayekî eşkere wilo digot: “Di van demên dijwar da nabe ku kurd derbeyekê li tirkan xin, ji bo aniha divê alîkarîyê bidin tirkan.”²³ Mustafa Kemal berî kongreya Sêwasê gava ku hatîye Sêwasê, Nûrî Dersimî jî vexwendîye kongreyê û teklîfa parlementerîyê lê kirîye. Lê Nûrî Dersimî tiştên ku dê di pêşerojê da biqewimin texmîn dikir, lewma wî ev teklîfa comerd red kirîye û tevî kongreyê nebûye.²⁴ Di vê navê da Mustafa Kemal di derbareyê Bedirxanîyan da ku yek ji wan name şandîye, ne xwedî fikrên erênî ye. Di *Nutukê* da jî behsa vê malbatê dike û balê dikişîne ku ev malbat ji berê da dijmintîya Osmanîyan dike.²⁵ Bi taybetî jî Celadet Bedirxan û Mustafa Kemal hê ji gava damezirandina komarê da hatine dijberî hev, Noelê Serdar di sala 1919an da gava behsa komeleya ku çûye Kurdistanê dike, qala Celadet Bedirxan dike. Bi rastî jî nivîskarê nameyê ji bo pevçûna bi hêzên Mustafa Kemalî ra li çîyayê Kahtayê dest bi berhevkirina hêzên kurd kirîye.²⁶ Dîsa di sala 1921ê da Celadet Bedirxan û bavê wî Emîn Elî Bedirxan serî li Komîserîya Bilind a Îngîlîzan dane û destûra derbasbûna Misûlê kirine daku bikin li hember Kemalîstan hêzên kurdî serî hildin.²⁷ Digel vê, bi bandora Xelîl Ramî Bedirxanîyê ku mutsarrifê Meletîyê yê wê dewrê bû, walîyê Elezîzê Alî Galîp li hemberî Mustafa Kemal ketîye tevgerê.²⁸

Kemalîstan ev tevgerên han ji nêz ve dişopandin. Jixwe di fersenda pêşî da ji bo nivîskarê nameyê biryara îdamê hat dayîn. Weke encam ji ber ku pêwen-

tanek ava kirîye û waneyên kurdî bi tîpên latînî daye ciwanên eşîran. Nûrî Dersimî, hb., r. 116.

22 Îhsan Nûrî Paşa, Serhildana Çîyayê Agirî, Stenbol, Weşanên Medê, 1996, r. 29.

23 Ji ber vê fikrê cemîyet bû du perçe, koma Emîn Elî Bedirxan li hemberî Seyyîd Abdilqadir derdikeve û fikra serxwebûnê diparêze. Bnr Nûrî Dersimî, hb., r. 96.

24 Nûrî Dersimî, hb., r. 98

25 Mustafa Kemal Atatürk, Nutuk, Cilda-I., Stenbol, Weşanên Çağdaş, 1981, r. 55.

26 Malmisanij, hb., r. 102.

27 Hb., r. 133.

28 Osman Sebrî, hb., r. 132.

dîya entelîjensîyaya kurdî ya sîyasetê zêde bû û wan ji bo gelê kurd daxwaz berpêş kirine, têkîlîya wan bi rejîma Kemalîst ra gelekî bi pevçûn û sanco dest pê kirîye.

Lê belê, ev têkîlî ne di rêyeke dûz a dijmintîyê da ye. Ji ber ku Celadet Bedirxan di nameyê da bi awayekî rasterast daxwaza bexşandina sîyasî kirîye û ev yek nehatîye pejirandin, rewşenbîren kurd hê pirtir ji rejîmê hêrs bûne. Ev dîyaloga di navbera rewşenbîrên kurd û desthilatîya hakîm da fersenda hin tuwancên nû dide me. Banga ewlekirina mafên gelên dijber a nivîskar bi bexşandina sîyasî ra, em nikarin wê tenê weke bangeke razber bibînin. Ji alîyê subjektîf ve, nivîskar gava ku sirgûnîyên mîna wî bîn bexşandin û derfetên dijberbûnê yên qanûnî bîn teslîmkirin, ew sînyalên tevlibûna rejîma sîyasî dide. Ev sînyal meraqa rewşenbîrên kurd a lihevkirina bi otorîteyê ra, peyama veşartî ya tevlibûnê jî dihewînin. Bi awayekî eşkere beranberî hin demanên biçûk meraqa tevlibûna otorîteyê tê hîskirin. Rehên lihevkirina bi otorîteyê ra di nava rewşenbîrên Osmanî da jî tîn dîtî ku entelîjensîyaya kurd di nav wan da mezin bûne. Mîzancî Murat û hin serokên Jon-Tirkan jî timî hewl dane ku dîyaloga lihevkinê ya bi otorîteya sîyasî ra zindî be.²⁹ Ne zehmet e ku ev kevneşopîya lihevker a feydeperest di kodên entelîjensîyaya çandî ya nivîskar da jî bîn dîtî. Rewşeke mîna vê ji bo Nûredîn Zaza jî dikare bê vegotin. Zaza, beranberî bicihbûna Kurdistanê wilo dixûye ku amade ye ku li ser hin rêgezên bi rêveberîya sîyasî ra li hev bike. Her ku melankolîya penaberîyê ya ku bêbawerîyeke ontolojîk a kûr dihewîne, patolojîya sirgûnê û çanda diasporîk retorîkeke tund, lihevneker û dijwar hilberîne jî ji alîyê bingehî ve di nav vê tundîyê da bermayîyeke lihevker her tim heye. Di vir da em dikarin bigihîjin encameke hêmayî: “Ji bo rewşenbîrên kurd ên ku xwedî fikrên herî lihevneker in jî em dikarin bibêjin ku destekî wan weke kulmê jidandîye lê yê din ji bo merhebayê her tim vekirî ye.”

Weke ku hat behskirin, ji ber ku entelîjensîyaya kurd him bi awayekî çavgirtî tevli otorîteyên kurdî yên arîstokrat dibin him jî ji ber ku nivîskarê nameyê derîyekî vekirî ji bo otorîteya Kemalîst dihêle, dike ku em têkîlîya bipirsgirêk a bi sazîya otorîteyê ra vepirsin. Ji van her du mînakên dîrokî jî tê fêmkirin ku ji bo mercên destpêkê entelîjensîyaya kurd bêyî otorîteyê naqedîne. Sedema vê jî ew e ku entelîjensîyaya kurdî bixwe hêj nebûye otorîteyek. Bi bandora vê, entelîjensîyaya kurd bêyî otorîteyeke derveyî, navxweyî, alîgir yan dijber nikare li ser pîyan raweste. Ji bo hebûnê yan dê xwe bispêre otorîteya navxweyî –arîstokrasîya kurdî–yan jî dê otorîteya derveyî –Kemalîzm-

29 Şerîf Mardîn, Fikrên Sîyasî yên Jon-Tirkan 1895-1908, Stenbol, Weşanên Îletîşîmê, 1983, r. 63-103.

red bike. Weke xala duyem jî, di têkilîya xwe û otorîteyê da qet nebe di mercên destpêkê da rêçeke xweser ava nekirîye ji ber vê di tengasîyê da ye. Yan tevî wê dibe yan jî wê red dike. Bi gotineke din bi şeweya bav nêzî otorîteyê dibe.³⁰ Mercên objektîf ên karakterê xweserîyê jî hêj pêk nehatine. Sêyem jî, rewşa xwe ya li hemberî otorîteyê hêj dîyar nekirîye. Otorîteya hundirîn, wî weke kadroyeke sîyasî ya di xizmeta gel da dibîne, otorîteya derveyîn wî weke pêş-mêrîyê hêzên bîyanî dibîne. Hêza vepirsina serbixwe weke taybetmendîyeke rewşenbîrîyê û mesafeya rexneyî di vê têkilîyê da hêj nehatîye rojevê. Weke encam şiklê têkilîya rewşenbîrên kurd bi otorîteyê ra di serî da û hêj jî weke têkilîyeke bipirsgirêk xuya dike.

Ji alîyê din ve nivîskarê nameyê him di qada ramanî him qada sîyasetê da di demên pêşî yê tevgerên entelijensîyaya kurd da kesekî sereke ye. Heta çûna Almanayê ji bo perwerdehîya doktorayê di dibistanên hevçerx ên wê dewrê da perwerde dîtiye, lê li alîyê din haya wî ji kevneşopîyên gelêrî yê gelê xwe heye û wî ev taybetmendîyên xwe ji bo sazîya sîyasetê seferber kirine. Hema timî di destekî wî da pêûs heye ku ramanên wî temsîl dike, di destê din da xencer heye ku têkoşîna sîyasî temsîl dike.³¹ Jixwe taybetmendîyeke karakterîstîk ya wê dewrê ew e ku rewşenbîr di serî da perwerdehî, hemû hunerên xwe ji bo sîyasetê seferber kirine, rewşenbîran sîyaset, ji bo armancên gelê xwe yê meşrû, weke amrazekê bikar anîye. Ev tevgera bi vî rengî, çalakîyeke tîpîk ya entelijensîyaya ronîbûyî ye. Ji dêlêva rexnekirin, vepirsînê ku wesfên potansiyel ên rewşenbîrîyê ne, ew pirtir bi du sîyaseteke rizgarker û honandker çûne. Em di vir da behsa kesayetîyên wan dikin ku leyzsaz in. Peywira sazker û rizgarker a sîyasetê weke nexweşî yan taybetmendîya rewşenbîrî, pêşî ji rewşenbîrên Tanzîmatê derbasî Jon-Tirkan³² bûye, ji wir jî derbasî rewşenbîrên kurd bûye. Fikra “bikêrbûna bo welêt” weke patolojîyeke kelecane ya nû, îcadeke rewşenbîrên Tanzîmatê ye. Ev patolojîya kelecane ku ji kevneşopîya romantîzmê hatîye wergirtin ji alîyê rewşenbîrên Tanzîmatê weke Namik Kemal ve bi vê fikrê ra hatîye girêdan ku “dewlet tenê ji alîyê rewşenbîran ve dikare bê rizgarkirin.” Kevneşopîya entelijensîyaya Jon-Tir-

30 Çawa ku wextê serhildan Şêx Seîd da hin kesên ji entelijensîyaya kurd serhildana li hemberî dewletê weke netebtîyên zarokî dîtine û serhildan bi vî awayî teswîr kirine da ku hawir binermije. Wan daxwaza bexşandinê ji otorîteyê-bav kirine.

31 Bi rastî jî, nivîskar ku pêşengîya rêxistina Xoybûnê kirîye nişanka vê rêxistinê li gorî paradîgmaya jîyana xwe hîlbijartîye. Li gorî vê, li alîyekî nişanka Xoybûnê di nava simbilê genim da xencerek heye û li alîyê din jî pêûseke bi serîkê diwîtê heye. Îhsan Nûrî Paşa, hb., r. 53. Û herweha ji bo nixandîneke di derbareyê ramana bihevrebûna pêûs û şûr ya nivîskarê nameyê da bnr. Firat Aydınkaya, “Rexneya Hevçerxbûna Kurdî ya Veguhastî bo Wicahîyê Berîya Daketina ji Neqeba Golgothayê”, Dipnot, Hej.: 1, Nîsan-Gulan-Pûşber 2010, r. 205-227.

32 Şerif Mardin, Sîyaset û Dîn li Tirkîyeyê, Stenbol, Weşanên İletişimê, 1991.

kan ev raman “gelekî bi pêş da birine”.³³ Ango bi gotineke din, kevneşopîya entelîjensîyaya Jon-Tirkan fikra “rizgarkirina dewletê bi destên rewşenbîran” veguherandine bo pratîkeke çalak. Ev tevgera çalak ku bi awayekî giran ketîye bin bandora rola rewşenbîrên di şoreşa frensî da, di çavdêriya îdeolojîyeke şoreşger da dest bi çalakîyên “komîtagerîyê” kirine. Bere bere, fikra rewşenbîrên komîtager³⁴ di nav tevgera Îttîhat Terakkî da cih girtîye û ev raman hatîye dagerandin bo kategorîyekê ku em dikarin weke çîneke entelektuel a organîk bin av bikin.

Xwendekarên kurd di demên dawî yê Osmanîyan da û di demên pêşî yê komarê da bi awayekî giran ketine bin bandora ve kategorîya rewşenbîrên komîtager. Fikra “rizgarkirina dewletê” ku bi Tanzîmatê ra dest pê kirîye, ji alîyê entelîjensîyaya kurd ve bi awayekî mîsoger hat revîzekirin û dagerandin bo fikra “avakirina dewletê”. Ji vir pê da, hilgirtina peywira “avakirina dewletê” weke dîrokî ji bo rewşenbîrên kurd bûye taybetmendîyeke karakterîstîk. Ev peywir bere bere bûye ametûya rewşenbîrên kurd. Sirûdeke ji alîyê nave-rokê ve hema hema weke sirûda “serê çîya duman girtîye” ku di fikrîyata tirk-perestan da weke banga rizgarkirina dewletê ye, ji alîyê rewşenbîrên kurd ve hatîye wergerandin bo kurdî, navê “Kine em”³⁵ lê hatîye kirin ku ramana avakirina dewletê tuwanc dike. Weke helwesteke rewşenbîran ji alîyêkî ve pêşkêşkirina tekoşînê li hemberî rêveberîya sîyasî ya otorîter; lê li alîyê din weke helwesta sîyasetvanan li hemberî rêveberîyê weke bîrkirin û tekoşînê dikare bê kurtekirin ku em behsa figurên sentetîk dikin. Bi gotineke din, kokê xwe ji kevneşopîya entelîjensîyaya komîtager wergirtine û li hemberî pergala sîyasî ya dewletên serwer dijberî kirine. Ev armanc weke armancên pêşekî hatine dîyarkirin ku kesayetên ronak ên ragir û sazker ên sîyasetê li hemberî me ne. Bi bandora perwerdehiyeke ronak, rêçeke wilo ji xwera însa kirine ku peywira wan a sîyasî ew e ku gel hişyar û rizgar bikin û heger gengaz be, dewletê ava bikin. Weke xwezayî jî, kevneşopîyeke entelîjensîya ya ku pêşekîyê dide çalakbûnê, pêk anîne. Ber bi 1930an ve Nûrî Dersimî, Osman Sebrî, Cigerxwîn, Celadet Bedirxan, ku di nav tevgera Xoybûnê da bûn...

33 Şerif Mardin, hb., r. 46-54.

34 Şerif Mardin dîroka rewşenbîrên komîtager bi bûyerên Makedonyayê, çalakîyên çeteyan ra girê dide ku hatine pêpêskirin. Li gorî wî, rewşenbîrên tirk gava ku efsêr çûne wir da ku çeteyan pêpêskirin, hîn bûne. Lewre, efsêr li hemberî vê komîtegerîya çeteyan çalakîyên komîtagerîyê pêk anîne. Şerif Mardin, hb., r. 53.

35 Ev helbest aîdî Cigerxwîn e ku helbestvanekî girîng e ji rewşenbîrên kurd. Helbesta navborî, bi rapirîya lirîzmê, bi peyamên sîyasî, bi bandora xwe ya derasayî, hema hema weke destaneke gelêrî ku sazkerê pergale ye hatîye pejirandin. Bnr. Cigerxwîn, Kine Em?, Stenbol, Weşanên Pelê Sor, 1992.

JI PERSPEKTÎFA REXNEYA FEMÎNÎST A WÊJEYÎ LÊKOLÎNEK LI SER ÇÎROKA NÛREDÎN ZAZA YA BI NAVÊ “GULÊ”

Puxte:

Rexneya Femînîst a wêjeyî derfetê dide ku bi berhemên edebî yên nivîskarên jin û mêran ra, meriv rewşa jinê ya di nava civakê da û cîhana wê ya di metnan da, ji nêz ve bibîne. Di vê xebatê da, me hewl da ku di çîroka Nûredîn Zaza a bi navê *Gulê* da, em nîşan bidin babetên ku bi jinan ra derketine pêş, pirsgirêka jinê û nêrîna nivîskar, lehenga jin ya di vê çîrokê da, têkilîyên wê bi mêran ra, bi civakê û malbatê ra, hest û fikrên jinê, daxwaz û pirsgirêkên jinê, nêrîn û tevgerên jinê û di heman demê da rewşa jinê ya di nava civak û wêjeyê da. Bi xwendina vê çîrokê ra, em dê bikevin pey hin pirsan wekî ka gelo jin bi çi awayî di çîrokê da cih girtiye, çîroknûsên mêr lehengên xwe yên jin, çawa afirandine, gelo di vê afirandinê da nêrîna xwe ya nêranî çawa dane xuyakirin. Pêşî em ê rave bikin ka rexneya femînîst ya wêjeyî çi ye. Paşê emê hewl bidin van pirsan bibersivînin.

Rexneya Femînîst a Wêjeyî

Îro mijara zayenda civakî û femînîzmê di gelek qadên zanistî, civakî, sîyasî, çandî û hunerî da bi rêbazeke pirrêl cihê xwe digire. Ji bo xebatên lêkolînî û wêjeya kurdan jî pêdivî bi mijara zayend û desthilatdariyê heye. Her çend rexneya femînîst û rexneya wêjeyî ya femînîst neşibin hevûdu jî, ew bandorê li hev dikin û ji hev sûd werdigirin û mijarên cuda tînin zimên. Humm (2002) vê cudahî û bikaranînê bi gelemperî bi îdeolojî û pratîkên civakî ve rave dike,

lê rexneya wêjeyî ya femînîst bala xwe dide ser bê ev bîrdozî çawa teşe digire. Lê belê her du jî li ser zayendê weke kategorîyeke bingehîn a analîzê disekinin. Her du jî bi teorî û pratîkên femînîst ên sazîrî ra têkildar in. Rexneya femînîst a wêjeyî xwendinên zayendparêzî yên li ser nijad, zayend û cudahîyên din siyaseteke çandî ya firehtir hewce dike (Humm, 2002: 11). Teorîyên femînîst, ku armanc dikin jinan ji girêdana rûhî ya wêranker, ya ku ji hêla çanda bavîksalarî ve hatîye afirandin rizgar bikin, bi eşkerekirina nêrînên serdest di metnên mêran da û destnîşankirina wêneyê jinan li ser tekstên jinan dikin. Pirsên ku ji hêla rexneya femînîst ve têne pirsîn, xwedî girîngîyeke bingehîn in. Ma hêza me heye ku em rojev û estetîkeke femînîst dîyar bikin? Ma ji me ra gengaz e ku bêyî afirandina navnîşeke alternatîf ya nivîskarên jin, danasînên zayendê, ku bi xwe pîrsgirêk in, vekolînin û bişkinin? Ma em çawa dikarin dûr bisekinin ji hîyerarşîyên nivîsandina “bilind” û “nizm” yên ku perçeyên pratîka edebî ya bavîksalarî ne? Ya herî girîng, em çawa dikarin ji pergala dualî ya cîhana yekem û sêyem û nijadperestî dûr bisekinin? Ew li ser temsîla pasîf û hestîyarîya femînîzmê disekine. Dema ku jin di rewşa lênihêrîna pasîf da be, zilam bi mantiq û çalakîyên ra têkildar e. Temsîlkarîya jinan her gav bi pênasîkirina mêran di çerçoveya taybetmendîyên wan û cudahîyên wan bi zayenda mêran ra temam dimîne (Millet, 1987; Humm, 2002: 21-22-76). Rexneya femînîst ya wêjeyî, bavîksalarîyê bilind dike, di edebîyatê da nîgarkirina jinên destdirêjî lê dike, hewl dide ku bi çareserkirina raza pêşandanên bavîksalarî rola destdirêjîyê di hêza mêran da li ser jinan eşkere dike. Kate Millet tercîh kir ku bi rexnegirîya wêjeyî êrîşî bavîksalarî bike. Di wêjeyê da nîgarên jinên destdirêjî lêpîrsîn, nehênîya nîgarên bavîksalarî vedibin û bi vî rengî bi rola ku tecawiz di hêza mêran da li ser jinan dilîze tîrsa destavêtinê ji holê radike. Pêşketina tevgera femînîst bixwe ji rexneyên femînîst nayê veqetandin.

Jin bi naskirin û rexnekirina hêza nîgarên sembolîk yên jinan dibin femînîst. Ji bo fêmkirina awayên ku em cinseke bi navgînîya zimên digirin dest û fam dikin ku rola ku ziman di damezrandina subjektîvîteyên me, pîrsgirêkên me da dilîze, wezîfeyê girîng dide ser rexneya wêjeyî ya femînîst (Humm, 2002: 12-19). Di sedsala XXan da ji gava yekem rexneya femînîst heke ne pîrjimar be, bi rengekê dualî pêş ket. Yek ji girîngtirîn destkeftîyên Virginia Woolf, nîşan dide ku wêjeya ku bi nêrîn û çavekî femînîst tê xwendin, herweha nêrînek û perspektîfeke dualî derdixe holê. Woolf pêşîyê destnîşan dike ku temsîlîkirina jîyana jinan di teşeya wêjeyî da jî zayendî ye û ji ber vê yekê rastîya civakî û sîyasî ya jinan ji hêla zayendî ve, weke rastîya civakî û sîyasî ya mêran jî teşe digire. Ya duyem, wê nîşan da ku dema di wêjeyê da taybetmendîyên dîyarker yên nîgarên jinane û afirînerîyeke rastîn ya

jinan nehatibûn vegotin. Ji ber vê yekê, divê pergala kevneşopî ya sembolîk û zimanê baviksalarî were hilweşandin (Woolf, 2012: 18). Rexneya wêjeyî ya femînîst alîyekê dualî ya xwendina berhemên wêjeyî yên Virginia Woolf e. Nêrîn bi tespîta ku ew hewce dike teorîze dibe. Li gorî Woolf, mîna rastîya civakî ya jinan, berhema edebî jî zayendî ye û nîgarên jinan di wêjeyê da cewherê rastîn yê jinê nadin xuyakirin. Woolf dibêje ku rexnevan di bin tespîtên alîgir yên rexneya edebî ya zayendperest da; ew dibêje ku pîvanên nîrxê di vê mijarê da bêguman ji jîyanê têne nivîsandin: “Rexnevan difikire ku ev pirtûkek girîng e, ji ber ku ew bi şer ra mijûl dibe. Ev pirtûk pirtûkeka sivik e ji ber ku tê da qala hestên jinan ên li odeyeke yan jî cihekî rûniştinê dike” (Woolf, 2012: 82). Femînîzm tevgereke teorîk û siyasî ye ku li ser binyada cinsiyet-parêzîyê, sedemên cudakerîya di navbera zayendan da dipirse û li çareserîyan digere. Rola çalak a dabînkirin û domandina vê cudahîyê ya di wêjeyê da dibe sedem ku di qada wêjeyê da heman tevger wekî rexneya edebî ya femînîst jî hebe (Polat, 2017: 1508). Humm dîyar dike ku tirs sereke ya rexneya edebî, kevneşopî helwesta anarşîst a nivîskarên jin e û teorîyên şirovekirin û xwendevan-rêber dibin sedema rexneya wêjeyî ya femînîst. Ji 1980yî ve li ser rexneya wêjeyî ya femînîst lêkolînên tûj dîyar dikin ku teorî xwedan gelek taybetmendîyên cihêreng e ku “di nav teşegirtina kevneşopîyek tenê ya jinan de” nayê nîrxandin (Humm, 2002: 34). Rexneya femînîst a wêjeyî bi jin ra wekî nivîskar û xwendevan mijûl dibe û her weha bi pîvanên ku têne temsîl kirin, jinan jî vedikole. Yek ji armanca rexneya femînîst ew e ku rexneya femînîst ya wêjeyî di nav teorîyên wêjeyî da bibîne. Di nîrxandina temsîlkirina jinan ya di romanên curbecur da bê bikaranîn. “Ji bo destnîşankirina îdeolojîya cinsî, nîgarên jinan û celebên stereotîp ên jinan di berhemên nivîskarên mêr da bi çavê xwendevana jin û ji hêla femînîst ve wan şirove û rexne dike” (Moran, 2011: 251). Rexneya femînîst a wêjeyî dinihêre ka jin di metnên nivîskarên mêr da çawa têne temsîl kirin û yek ji wan mijara sereke cih digire. Rexneya femînîst a wêjeyî, qadekê bi tena serê xwe vedike û nêrîn û perspektîfeka cuda dide lêkolîner, xwendevan û nivîskaran. Xwendin û lêkolînên li ser çîrok û nivîskaran ji bo vê têkildayîna bi jinê ra derfeketek girîng çêdikir.

Gulê

Nûredîn Zaza di sala 1919an da li Madenê hatîye dinê û hê di zaroktîya xwe da ji cih û warê xwe koç dike û li Sûrîyeyê bicih dibe. Ew li Sûrîyeyê xwe digihîne Celadet Elî Bedîrxan û di kovara *Hawarê* da dest bi nivîsandina kurteçîrokan dike. Nûredîn Zazayê ku ji ber xebatên xwe yên siyasî gelek caran hatîye girtin, piraniya jîyana xwe li derveyî Kurdistanê bihurandîye. Nûredîn Zaza

li Swîsreyê bicih dibe, li wir dizewice, doktoraya xwe ya li ser filozofê Frensî Emmanuel Mounier li wir dike. Nûredîn Zaza di sala 1988an da li wir çû ser heqîya xwe (Zaza, 2007). Zaza, pirranî problemên pêvajoya neteweyîbûnê û kêmbûna tekoşîna neteweyîyê tîne zimên. Di naveroka çîrokên Nûredîn Zaza da bi gelemperî qeweta hikûmdariyê û sazîyan, nêrînen jinan, feqîrî, hêvîyên mirovên piçûk, kelecânî û xeyalên şikestî cih digirin. Bûyerên lehengên wan çîrokên Zaza, exleb ew mirov in ku hatine terkkirin an jî yê dûrxistinê ne. Ango xwedîyên dem û mekanên diyar in. Di çîrokên Zaza da leşker, mensûbên darazê, polîs, axa, alîgir û temsilên hukimdarîyê zilmê dikin (Dinç, 2016: 36). Lêbelê dema ku em li çîrokên Zaza dinêrin, ew di çîrokên xwe da serhildana lehengên xwe dernaxe asteke serkeftî. Di nav çîroknûsên kovara *Hawarê* da yê ku hişmendtirîn û bi awayekê modern nivîsiye ew e. Nûredîn Zaza di kovara *Hawarê* da yê herî berhemdar e jî. Nivîskar hin çîrokên xwe ji zimanên biyanî adapte kiriye. Naverok di çîrokên Zaza da dibin du birr. Girêdana Kurdan ya bi tekoşîna rizgarîyê û tekoşîna hîndarî û perwerdehiyê ne (Shakeli, 1998: 34). Nûredîn Zaza, heta ku jê hatiye lehengên xwe û mijarên xwe ji nava tebaqeya civakê ya herî bi êş û kul hîlbijartîye. Lehengên çîrokên wî gundî ne, şivan in û carinan evîndar jî dibin lehengên çîrokên wî. Lêbelê hemû lehengên di çîrokên wî da bi tirs in, bi endîşe ne, di heman demê da jî wêrek in. Ev yek jî derdixe holê ku çîrokên Nûredîn Zaza her çiqas lehengên xwe ji gundî û şivanan, ango bi piranî jî ji xizan û êşkêşan hîlbijartibe jî, çîrokên wî yê modern ên dema xwe ne. Di van çîrokên xwe da yê ku bi hejmar gelekî kêr in, Nûredîn Zaza di hin waran da hêmayên klasîk ên wêjeya Rojhilatî ji hev weslewele kiriye, ji ber ku di wêjeya Rojhilata Navîn da hêmaya bingehîn, gihaştin e, ango vuslat e. Lê wek ku di mînakê *Gulê* da, wî ev hêmaya klasîk serobinî kiriye û ev vuslatî ji hev çirçirî kiriye (Zaza, 2007: 7-8). Nûredîn Zaza çîroka xwe ya bi navê *Gulê* di kovara *Hawarê* da, di hejmara 29an da çap dike. Paşê wek pirtûk ji alîye weşanxana Lîsê bi çend çîrokên wî ra tê çapkirin. Di destpêka pirtûkê da Sîdar Jîr wuha rave dike bê çima navê pirtûkê “*Gulê*” hatiye danîn: “Her çiqas ez ê hewl bidim ku çîroka wî ya bi navê “*Gulê*” hildim dest û çîroka wî û mîrateya ku li pey xwe hiştiye bînim zimên jî, bi giştî ez çîroka Nûredîn Zaza bi navê “*Gulê*” bi nav dikim. Ji ber ku gul di hemû serdeman da gul e. Lewma jî divê em bikaribin wê *Gulê* bi rengê wê yê ku Nûredîn Zaza dirûv û gîyan dayê, bêhn bikin...” (Zaza, 2007: 7).

Gulê lehenga sereke, ji gundê Şadiyan e. Berî çend salan, bavê wê, wê bi zorê dide mêrekî. Qaçaxekî kurd, Qoçoyê ku bi wêrekî û zordestîya xwe tê nasîn, dadikeve wê odeyê ya ku gundî lê civiyane. Ew dibêje ku wî heta niha gelek tiştên xirab kirine, lê belê êdî amade ye ku bi wan ra şer bike da ku

gundê xwe ji dijminan paqij bikin. Gundî jî ji bo mirina di rêya welêt da sond dixwin. Piştî jinek derdikeve pêş. Ew dildara Qoço ye û mêrê xwe kuştîye da ku bigihêje Qoço. Gulê mêrê xwe dîkuje û bi pey Qoço ye rêbir dikeve. Ji ber vê yekê gundî bi çavê nebaş li Gulê dinêrin lewra li gund û di çavê gundîyan da dibe “Gula qehbe, Gula bênamûs.” Dijmin dora gundekî digirin û gundî jî nizanin ka çawa tev bigerin. Gundî zêde jê hez nakin û wê dûtî nîrxên civakê dibînin. Ew jinik dixwaze ligel wan şer bik. Lê belê gundî wê derdixin derve. Axirê, Gulê serokê dijminan dîkuje û bi şaşî tê kuştin. Di dawîya çîrokê da Qoço Gulê dîkuje û piştî Gulê dibe lehengek. Di çîrokê da nivîskar du lehengên balkêş derdixwe pêşîya xwendevanan.

Lehenga jin a çîrokê, Gulê ye. Gulê ji bo ku di jîyana xwe da tiştêkî nû ava bike, li hemberî hin tiştan serî radik. Bo nimûne, mêrê xwe dîkuje û bi Qoço ye dildarê xwe ra diçe serê çîyan. Em dikarin ji bo vê tevgera Gulê wiha bibêjin; figûra jin, ji bo ku bikare bibe şexsek (ferd) li pey dezgehên nû ye û ji bo ku di jîyana xwe da pelege nû veke di nav hin lêgerînan da bi nasnameyê hov û serhişk (serîrakirin) radibe (cîret dike) (Bülbül, 2010: 135). Jin ji ber ku bikaribe di pergala pederşahiye da ji zayenda duyem xelas bibe, hem li dijî rolê dûçar hem jî li dijî hêmanên sazkirina civakê ber xwe dide (Polat, 2017b: 1508). Gulê ji bo ku xwe ji hin tiştan xelas bike, serî hildide. Her çiqas Gulê tevgerê nîşan bide jî, lêbelê ev tevger di dawîya çîrokê da ji bo xelasbûna jinê qels dimîne. Digel ku çiqas Gulê li pey hezkirîye xwe diçe û serhildaneke pêk tîne, dîsa jî mêr dibe “desthilatdar”. Tevgera Gulê tenê ji bo hezkirîye wê ye. Di çîrokê da em bi serpehatîyên Gulê dibînin bê ew ji bo avakirina jîyaneke nû çawa tevdigere.

Gulê ji gund bû. Berî çend salan bavê wê bi zor ew dabû yekî. Gulê rojeke mêrê xwe kuştibû, ketibû pey Qoço û li serê çîyan pê re digeriya. Gundiyan bi çavê nebaş lê dinihêrin, her gav jê re dijûn dikirin û deriyên xwe her gav lê digirtin. Ji tîrsa Qoço nebûya belkî ew bikuştana. Lê, ne tehqîra gundiyan, ne jî tajanga Qoço ji Gulê re ev rê nedida berdan. Di çîyan de bi Qoço re ger, di şikeftan de raketin, di berfê de qefilin, jê re bextiyariyeke mezin bû (Zaza, 2007: 16).

Jin, yan bi xwe yan jî ji derdora xwe sê nasnameyan hildigirin “dayîka fedakar”, “jina çê”, “keça malbata çê” ev her sê têgeh di kodên exleqî da di nav civakê da cihekê qedirgiran (muhteber, rêzdar, hurmet) sembol dikin. Gulê di nav sembolan da “jina xirab”, “oruspî” û “jina qul û bexşeyan” di hîyerarşîya ehleqa civakî da di asta herî jêr da cih digire. Daxwaza wê jî, weke her jinekê her tim li gor daxwazên civakî yê laşî û zayendî tê daraştin û kontrolkirin. Ev daxwaz li gor taybetmendiyên jîyana çandî bi rolên zayendiyên civakî jî di navbera “jina çê” û “jina xirab” tê çêkirin. Û her wisa zayenda jinê ya civakî

tê rêxistin. Zayendîya jina di bin rolên exleb serdest yê zayenda civakî da tê paşguhkirin û jin di nav sînorên taybetî yê malbatî da dimînin. Jinên ku ji vî sînorê derdikevin wek “orûspî” û “jina sivik” tên bi navkirin (Sevgi, 2009: 267-268). Gulê ji ber ku daxwazê xwe pêk bîne wekî “oruspî, jina xerab, jina neçê” di çîrokê da tê ber çavê me. Herweha ji bo vê daxwazê ji aliyê civakê ve tên cezakirin. Nêrîna pedersahî li ser têkilîyên di navbera jinan û mêran da tu caran tesîra xwe winda nekiriye. Her wisa kespên tevgera femînîstê jî li gor daxwazên mêran li ser laşê jina hat kedîkirin, asîmîlekirin û bazarkirin. Ev rewş hê jî li dijberê jinan ve berdewam dike (Polat, 2017: 1508). Vegêr, pêşî jinê li gorî pergal û hişmendîya civakê şayes dike ku di wê civaka patriarkî da her ji aliye mêran van hatiye avakirin û her di destên desthilatan da ango di destên mêran da ye. Gulê ji bo jîyana xwe ya nû di têkoşînek û tevgerekê da ye. Em dikarin bibêjin ku jin di bûyerên civakî da jî derdikevine pêş. Jin tenê di nava mal û malbatê da nemane her wisa xwe ji civaka xwe jî berpirsîyar dibînin. Em dikarin bibêjin ku vegêr, bi Gulê ra, bi serlehenga jin a di çîrokê da, rola jinan a civakî bi me dide nîşandan. Yanê em dikarin bibêjin ku vegêr dixwaze bibêje jin ne tenê di nava malbatê da mane û ne tenê bi bûyerên şexsî û malbatî ve girêdar bûne û herwisa bi bûyerên civakî ve jî têkildar bûne. Em dikarin bibêjin ku li vir vegêr lehenga jin ya di çîrokê da, Gulê wekî lehengeke îdeal derdixe pêş.

Di wê gavê de, ji nişkê ve derî vebû, jinekeke zirav, narîn û şîrîn, wek pelekî dara bîşengê li ber bayî, ket hundir û got: “Ez jî bi te re me, ez jî mêrê Pola!” Gundîyan gişan bi dengê wekî ken kir qîr: “Gula qehpik! Gula bînamûs! Li çareya xelasbûnê digeriya. Diviyabû ku gundê xwe, welatê xwe, çîyayê xwe û serbestîya pilingê xwe “Pola” jî dijmin biparêze. Ji nişkê ve rabû. Tiştê hatibû bîra wê. Xencerek bi şiv girt. Ji şikefte derket. Riya aliye dijmin girt û winda bû (Zaza, 2007: 16-17).

Di çîrokê da civaka pedersahî Gulê weke jinekê yan jî lehengekeke tawanbar, qehp, xerab, pîs teswîr kiriye. Gulê bi awayekî xerab hatiye nîşandan lêbelê bi çavê civaka bavkanî ve. Qoço û gundî di civakê da serwer in. Her tişt li gorî daxwaza wan pêk tê. Dekonstruksiyon (*deconstruction*) ew nêzîk-têdayînê nîşan dide yê ku wekî pêwîstiyekê dihesibîne ji nû ve nixandina tiştên dijber û ji nû ve nixandina tiştên ku bi gelemperî tên pejirandin; ji ber vê jî hewcedarîya perçekirina têgeh û wateyan dide pêş. “Di bingeha hemû teorîyên wêjeyê da baweriyek heye ku di rastîyê da metn tu caran wateya tiştê ku dixwaze vebêje, nabêje; û tu caran wateya ku dixwaze vebêje eşkere nake” (Humm, 2002: 210-211). Dekonstruktor wuha rave dikin ku pêvajoyên wateya wêjeyî li ser bingeha dijberîyan tene damezirandin, yek ji wateyên dijberî tê pejirandin û ya din jî tê înkarkirin. Ew wisa qebûl dikin ku têgîna “mêr” li

dijî jinê, her mêt tê pejirandin û têtgîna jin di vê asta dijberîyê da tê înkarkirin û çewisandin. Rexneya dekonstruktîv a femînîst li ser xala ku ramanên neyînî yên ji jinan ra têne vegotin ne biyolojîkî ye û ev neyînîyên wisa ne ku ji hêla civaka bavîksalarî ve li jinan hatine ferzkirinê (Humm, 2002: 213). Gulê di serî da ji bo axa xwe mêtê xwe nakuje û dernaveke serê çîyê. Gulê dîsa her dem di nava hişmendîyeke neteweyî da nîne. Li ser axaftina Qoço, ew jî ji bo piştgirîya wî bîryara xwe dide ya ku em paşê hîn dibin.

Gula qehpik! Gula bênamûs! (Zaza, 2007: 16).

Qehpikê em xistine xefkê! (Zaza, 2007: 17).

Lêbelê, civaka bavkanî di çîrokê Qoço da wuha tê teswîrkirin: şêr, bihêz, zordar, zilmdar, şervan û hwd. Ev taybetîyên bingeîn in yên ku civaka pederşahî li têtgeha “mêt” bar kiriye ji hêla fizîkî, hişî û hestiyarî ve. Helwest û tevgera mêtê ku divê wêrek, bibiryar, merd û ciwanmêt be, wekî taybetmendîyeke di rêza duyem da ye. Lêbelê di Qoço da di taybetmendîyên eslî dixuyin û ev hemû wesf bi talebên avaniya pederşahî ve li hev dikin. Mêt bi gelemperî xwe bi wan wesfan dinirxînin ên ku bi çandê ve temam bûne (Yapıcı, 2016: 168-287). Em dibînin ku Qoço xwedîyê taybetîyên tundî û şer, mêtanî, qebatî hişkbûn û hêrsîyê ye. Di rastîyê da ev taybetmendîyên neyînî îmajê mêtanî ya “bihêz” in, lêbelê di kontrolkirina hêrsê da “zehmetkêşîyêkê” çêdike. Dema ku Gulê tê kuştin, Qoço di vê îmajê da dixuye. Her çiqas bihêz, biqewet be, an jî wêrek be, dîsa dibe qurbana hêza xwe ya nekontrolkirî û di bin tesîra wê hêzê da dimîne. Herweha li gor daxwaza civaka pederşahî û hîsên xwe yên feodal, radibe Gulê dikuje.

Asîman girtîbû; bandevêkê ji reşîya şevê re hîn bêtir dida. Di vê gavê de derî bi şid vebû; qîralê çîyan, Qoço yê pola, bi heşt mirovên xwe ve kete hundir. Cilên wan şil bûn; av di tivingên wan re dihate xwar. Gundîyan gişan da ber qîran: “Polayê kurd, sergavê çîyayên Kurdistanê fermo!” Lê qoço rûnenişt, di nivê odayê de ma û wekî serdarekî bi dengê xurt û gur gote wan: “Gundîno! Ev panzdeh sal in ku ez gunehan dikim. Xelkê dikuji. Xerabiyê dikim. Stranên min di van rêlên rojnedîtî de hatin gotin, lê ji duhî vir de ji devê tu kesî dernakevin. Belkî ji bo me hemûyan, ev şev, li ser axa welêt şeva me ya dawiyê be. Ji bo avêtina gunehên xwe ji ser xwe, min sond xwariye ku dijmin ji welêt derxînim. Sorahiya rivîna agirê êzingan di tîfkê de li dîwaran dihejîya. Pola li dora xwe dinihêrî. Çavên wî diçîrisîn. Çil gundî bi tev de rabûn û gotin: “Em jî bi te re ne, pilingê kurd! (Zaza, 2007: 15-16).

Serleheng Gulê li hemberî desthilatdarîyê serî radike. Lê belê piştê dîsa xwe dixê bindestê desthilatdarekî din ango Qoço. Digel ku destkeftîya revê ji bo mêtan wekî “jin hilgirtin” (rakirin û birina jinê) tê îfadekirin, ji bo jinan

wekî “bi dûv ve ketin” (paşvemayîn) tê pênasekirin (Hassanpour, 2001: 248). Li vir Gulê bi dû mêrêkî ve diçe. Di çîrokê da, Gulê bi zorê didin yekî, lê Gulê wî berdide yanê dukuje û li pey hezkirîyê xwe Qoço diçe ser çîyê. Ji ber ku mêrê xwe dukuje û li pey hezkirîyê xwe diçe; civak, ji ber vê tevgera Gulê wê pîs û qirêj dibîne. Tevgera Gulê ev e; ew li dû mêrêkî diçe ser çîyan, bi wî ra digere, bi wî ra di şikeftan da dimîne û bi wî ra radize. Lewre Gulê, çî bike jî di civaka pedersahî da her tim pîs, oruspî û qirêj dimîne.

Gulê rojêke mêrê xwe kuştibû, ketibû pey Qoço û li serê çîyan pê re digeriya. Gundiyar bi çavekî nebaş lê dinihêrin, her gav jê re dijûn dikirin û deriyên xwe her gav lê digirtin (Zaza, 2007: 16).

Hezkirin, mîna mêran di jîyana jinan da jî heye. Lewre hebûna hezkirinê weke beşek ji jîyana xwezayî ya jinê jî ye. Lê ev di heman demê da wezîfe û pîşeya jinê jî ye (Dowling, 1995: 155). Herwiha em dikarin bibêjin ku Gulê dibê qurbana hezkirina xwe ya li hemberî Qoço û dipelçiqe. Qoço, çî bîne serê wê dîsa jî li hemberî wî serî ranake. Li vir hezkirina Gulê li hemberî Qoço wek erk an wezîfeya jinan hatiye xuyakirin. Ji ber ku Gulê reviya Qoço, em rast-rast dikarin bibêjin ku Gulê di civakê da têkilîya jin û mêr yanê malî û malxoyê simbol dike. Her wiha civaka pedersahî ji ber ku jinek xwestinan bike û tevgerê li hemberî hin tiştan nîşan dide wê qebûl nakin. Li jêr jin her çiqas li hemberî hin xeterîyan û civakê û malbatê serî rakin jî di bin hişê wan da mêr serdest in. Serdestbûna Qoço, ji hezkirin, biqawetbûn û bihêz wî derdixe ber çavê me. Gulê, qurbana hişmendîya mêranî û civaka bavixsalariyê ye.

Gava Qoço ew dida ber tajanga, Gulê digot: Li min xe pilingê min! Li min xe! Heya destê tebiweste! Tu jîna min î! Ez goriya te me. Bêyî te ez nabim! (Zaza, 2007: 16).

Dema ku Gulê ji Qoço ledan dixwe qet li hemberî desthilatê xwe serî ranake. Gulê ji serê çîrokê heya dawîya çîrokê jineke fedakar e. Ji bo hezkirîyê xwe, ji bo welatê xwe û hwd. Yanê em dikarin li vir bibêjin ku di hişê jinan da serdestîya mêran dixuye. Civak û malbat çî hînî jinan kiriye? Em bi alîkarîya serborîya Gulê û civaka ku ew tê da dijî, vê yekê dibînin. Girîngiya li ser “pelçiqandin û rûşkirinê” jinan di serî da derdikeve pêş. Lê belê, gengaz e ku meriv bibîne ku her celeb “fedakarî”, ku berê di nav taybetmendîyên kesayetîyê da bû û rewş û jîyaneke bi “êş û azar” ra carinan bi zordestîya di nav çanda bavixsalarî da têkildar in (Yapıcı, 2016: 160). Gulê, Qoço yan civak çî bîne serê wê, li dijî wan tu tiştên xerab nafikire û her erênî difikire. Li vir pasîfbûna Gulê gellekî zêde eşkere ye. Tenê di tişteki da Gulê ne pasîf e. Ji bo welatê xwe, xemgîn dibê. Dixwaze welatê xwe ji destê dijmin xelas bike. Ji ber wan sedeman şev û roj difikire û ranaze. Li vir Gulê ew qas îdealîzî kiriye ku

em dikarin bibêjin ramanên nivîskar li ber hin tiştan eşkere dixuye. Em dikarin wiha bibêjin, nivîskar belkî di vir tevî çîrokê dibe. Herweha nivîskêr, Gulê her çiqas pasîf afirandibe jî, dîsa ew dixwaze hin tiştan nîşanî xwendevanan bide. Jinek her çiqas di hin tevgerên xwe da wek jineke xerab, pîs û qirêj xuya bike jî, tiştê ku ew dike, mêr nakin. Belkî jî dixwaze vê nîşanî me bide.

Wê şevê Gulê dîsa digirî, lê îcar ne ji êşa tajandiya Qoço ve ku wekî marekî xwe li bejna wê ya zirav dipêçand. Xew, qet nediket çavê wê. Dijmin dê bike-ta welêt... Rojên geşî, ji bo wan ne diman. Her tişt dibû xeyal. Denge topên dijmin gelek ji nêzik dihatin bihîstin... Çiyayên Qoço yên serbest, diketin destê dijmin... (Zaza, 2007: 16)

Di çîrokê da jîyana Gulê ya xeternak ya berê dev ji Gulê bernade. Gulê carekê bi awayekî neyînî di hişê civaka xwe da derketîyê pêş, ji ber vê jî, her tim bi şik lê dinerin û wê tawanbar dibînin. Ji ber vê ye ku her dem em digihîjin heman encamê. Heya civak bi gelemperî ji nû ve neyê organîzekirin, “şoreşek rastîn di tevgera jinan de” ne gengaz e (Mitchel û Oakley, 2017: 156). Ji ber ku Gulê ji aliyê dijmin ve tê, alîgirên Qoço wê di wê qadê da dibînin ya ku bin kontrola dijmin da ye û mafê axaftinê nadinê û hema wê kêlikê wê dikuvin. Zagonên ku ji aliyê mêran ve hatine diyarkirin û sazkin, bi xwe ra serdestîya mêran, digel wê jî bindestîya jinan avakirine. Ji ber wisa ye ku jin hatiye tawanbarkirin, herweha ji aliyê mêrên serdest ve tèn kuştin. Em dikarin bibêjin Qoço û civaka pederşahî li ser jinê xwedî hukm e. Lewma zagonan ew dîyar dikin, zagonan ew pêk tînin. Dema ku em li şerên di tevahîya dîrokê da dinêrin, em dibînin ku jin her dem wekî alîgir an piştgirên şer tev li şer bûne, her çend wekî şervan nebin û nayên xuyakirin jî. Têkilîya di navbera mîlîtarîzm û mêranîya hegemonîk da ku bi hev ra xurt bûne, dibe sedema serdestîya rejîma zayendî ya li ser bingeha danasînên herî tund û jêveqetên cudahîyên zayendî. Ev yek li ser hewcedarîyên parastina rojane ya civakan vediguhere çêkirina makîneyên cengê yên mezin. Herweha stratejîyeke zayendparêzîyê derdikeve holê ku robotên şervan ji mêran û alîgirên pasîf lê dilsoz ji jinan diafirîne (Sancar, 2016: 157). Em bi rejimeke zayendî ra rûbirû dimînin, ne ku mêr wê hêviyê dikin ku jin tevî vê pratîka şer û parastinê bibin bi fonksiyonên bi tevahî cuda - heta dijberî û jêveqetandî. Her çiqas Gulê here serbazê dijmin bikuje jî, weke lehengekê yan jî şervanekê naxuye. Tenê ji bo Qoço weke amûreke alîkarî derdikeve pêş me.

Siya ku xuya dikir bêtirs û bêtelaş dihat. Dengê şikên wan rakir: “Ev Gula qehpik e!” Gundiyekî din digot “Qehpikê em xistine xefkê! Tivingê berdê, Pola! Ew rêberîya dijmin dike! Qoço rûyê xwe tîrş kir kiribû; birihên wî lê gijgijîn, kûr li pêş xwe dinihêrî. Wî gotinên gundîyan rast didît. Gulê li cem dijmin çi dikir? Nexwe cihê wan şanî dijmin kiribû. Qoço di bin ronahiya

heyva sor re tivinga xwe dirêjî Gulê kir û got: Ha ji te re Gulê! Berî dijin berika pêşîn para te be... Berikê wekî çîrekê tariya şevê çirand û armanca xwe ya zirav wekî çarşevê raxiste erdê (Zaza, 2007: 17- 18).

Di çîrokê da em dikarin bibêjin ya herî bi tesîr bû. “Bêguman dibe ku tesîr ji rewşa ku kurd tê da dijîn da jî tesîr wergirtibe” (Zaza, 2007: 8). Her wisa nivîskar li vir mêrxasîya Gulê nîşanî me dike. Tenê ne mêrxasî, tiştên ku mêrek nikare bike, bi alîkarîya jinekê, yanî bi alîkarîya Gula pîs û qehpikê pêk tê ya ku di civakê pedersahî da wisa hatiye şayesandin û naskirin, belê ew bi wêrekî diçe serleşkerê dijminî dike. Li vir nivîskar dibe ku tiştên ku mêran nekiriye bi jinekê ji bo me dabe nîşandan. Zaza bûyerekê û lehengeke wiha rave dike ku sembola têkçûya îdealan “bi jineke bî” nîşan dide. Jin jî dikarin şer bikin, li hemberî dijmin serî rakin. Lê belê dîsa Gulê di dawîyê da dimire. Her çiqas xwestibe welatê xwe ji dijmin xelas bike, ji alîyên mêrên serdest ve tê kuştin. Ji ber vê yekê, her dem digihîje heman encamê. Wekî ku me dubare kiribû heya civak bi gelemperî ji nû ve neyê rêxistin, “şoreşeke rastîn di tevgera jinan de” ne mumkun e (Mitchel û Oakley, 2017: 156). Dema ku vegêr, rexneyeke civakî dike hingê pîvanên trajedîya jinan jî vedibêje. Di çîrokê da em rastî trajedîya jineke bi tîna Gulê bê dilê xwe hatiye zewicandin. Paşê li pey hezkirîyê xwe diçe, lê belê dîsa jî ji ber hezkirina xwe tê pelçiqandin. Rewşa Gulê, bi tevgera wê dîsa jî nayê guhertin.

Qoço xencer rakir, wî ew xencer dabû Gulê? Di kulma zêbit a guvaştî de gurzek porê Gulê zer pêl dida. Qoço kulmikên xwe gez kir û wî pilingê ku çiya dihejand ji bo cara pêşîn da girî û gotê gundiyan: -We bi min gunehê paşîn da kirin, ji gulê qehpik re me qehpetî kir. Bi dengekî têrêş, têr poşmanî û têrbirîn gotina xwe ya paşî kir: -Gulê! Te deynê xwe da, te gunehên xwe rakir! Niha dora min e, Gulê! Gula min a zer! -Bi xencera xwîndar wek bayekî ji odayê derket, berê da dijmin nema xuya kir (Zaza, 2007: 18).

Cengeker-qurban û efendî-xulam wekî model ji hîyerarşîya mêr û jinan hatiye çêkirin. Her wekî peywendîya di navbera serdest û bindestan de. Lêbelê her çî qas mêrên qurban jî hebin hejmara wan pir hindik e. Prototîpa eslî ku tedayî dîtiye jin e (Mitchel û Oakley, 2017: 127). Di vê çîrokê de nivîskar xwestiye ku bi lehenga xwe ya jin yanê Gulê wek prototîpekê bide nîşandan. Di çîrokê de du leheng hene ku bûne qurbana civaka pedersahîyê: Yek Gulê ye û yê din Qoço ye. Çima Gulê ji bona xelasbûna xwe nefikirî û tevgerên xwe ji bona xwe nekir? Li vir du dijmin hene: Yek Qoço ye û yê din Rom. Gulê ji bona azadbûna welêt tevgerêkê pêk tîne lêbelê çima ji bona azadîya xwe tevgerêkê pêk neîna? Gulê ji ber ku hez Qoço dikir, çavên xwe ji bona zilma wî digirt, lê çima ji bona zilma Romê çavê xwe negirt? Gulê wek jineke di civaka kurdan de ji bo prototîpekê jin qels maye. Loma em dibînin ku di çîrokê da

ya ku herî zêde hatiye pelçiqandin jin e. Lewra jinek bikaribe li hemberî dijmin bi wêrekî serî hilde her wisa dikare li hember malbata xwe jî û li hember civaka xwe jî serî rake. Loma Gulê nikare bibe sembola jinên kurd. Herwisa em nikarin bibêjin wekî jin, nikare bibe sembola civaka kurdan jî. Gulê di wê civaka ku tê da dijî weke sembola “jina bî” tê xuyakirin. Yanî di vir da sekna vegêr dîyar e, lehenga xwe ya jin di wê rolê da dihêle û Gulê di çîrokê da wisa maye û dixuye. Dibe ku vegêr li ser Gulê ve di civakê da dijiwariya jîyana “jinên bî” bi me bide nîşandan. Sekna vegêr, mafê axaftin û lêpirsînê nade lehenga jin, biryar di rêça bidawîkirina jîyana lehenga jinê da bi kar tîne. Gulê ji ber tevgerên xwe wek ku me vegotibû, diçe şer, mêrê xwe dikuje û li pey hezkirîyê xwe diçe ji ber wisa di civakê da qehpik tê dîtîn. Lê belê Qoço di civakê da çiqas zordar û zilmdar be jî, ji ber ku mêr e û beşdarî şer dibe, wekî qehreman, tê dîtîn. Çîrok bi mirina lehenga jin a îdealîzekirî ve diqede û qehreman Qoço hêrs dibe û diçe tola wê ji dijmin bistîne. Qoço di heman demê da dema ku tê ser lehenga jin, yê ku di civakê da rola wê ya xurt û dîyarker heye ji rexneyan ra vekirî ye. Çîroka *Gulê*, di paşxaneya xwe ya civakî, çandî û siyasî da ramanên devoka bavixsalarî ya serdemê radigihîne. Di vê çîrokê da, civak şahidê bêdengîya kuştina jinekê ye. Di çîrokê da vegêr, li ser lehengê mêr rolên zayendî didomîne û mêr wekî mirovekî serfiraz xuya dike. Rewşa ku meriv hêvî dike, bi helwesteke zelaltir û tundtir tê dîtîn û nîgarkirin; lê belê heman rewş ji hêla jinê ve nayê eşkerekirin. Ew nahêle karakterê jinê wekî nîgareke nazik, saf, delal, ku civak jê ra tayîn dike û dide xuyakirin. Ji ber ku jina mêrê xwe kuştî, wekî jineke xirab û kurmik tê dîtîn. Em dibînin ku Gulê wêneyê jineke ku bi xwe netêr, bêçare û hewceyê zilamekî ve hatiye avakirin. Di çîroka Zaza da, ew kesayeteke jin e û dibe alîkar di geşedana vê kompoyê de ku Gulê îfade dike. Dîtina fizîkî ya Gulê, qelsîya xwe ya hundirîn li alîyekê hişt, wêneyê jineke bihêz afirand ku hewl dide di jîyana xwe da li hember mirovan bisekine. Lê belê tevgera wê qels e. Gulê di sîstemên bavixsalarî da, di bawerîya ku jin û hewcedarîya parastinê da zilaman serdest, xurttir û girîngtir bike. Belkî Zaza, hewl da ku civaka bavixsalarî bi karekera jinê vebêje. Nûnerê karakterê mêr ê civaka bavixsalarî Qoço ye. Hatina Gulê ji wargeha dijmin serbilindîya mêranîya Qoço birîndar dike. Di rastîyê da ji bo wî têkçûneke mezin e. Têkçûna di pergala bavixsalarî da ji bo zilamekê nayê qebûlîkirin. Ji bo vê yekê, Qoço bêyî ku bi çavê xwe bibîne, bi mêrxasîyekê Gulê dikuje. Mirina Gulê îronîk e. Çimkî Gulê pir bi êş û fedakar e. Gulê dikare xwe bi kapasîteya dîtina wêrekî û berxwedana xwe bibîne ku ew, mêrê xwe dikuje û Qoço dişopîne, ku divê ew bi vê rêya xwe, hebûna xwe, xwe û jîyana xwe dîyar bike. Karaktereke jin a neyînî li Gulê çavên me xuya dike. Taybetmendîya herî girîng a Gulê çalakîyeke jinan e ku serhildana jinê

ya li dijî nîzama baviksalarî û kuştina mêrê xwe pêk tîne. Gulê bi hilgirtina çîya li pey hezkirîyê xwe Qoço, jineke serbixwe sembolîze dike. Nûser hewl dide destnîşan bike ku divê jin di civaka mêrserwer da mafên xwe biparêze bi kesayetîya jin ra hêza ku ew tevbigere. Lê belê vê serhildanê nikaribû bi tevahî ji neheqîyên ku Gulê kişand, rewşên xirab ên ku ew tê da bû û jîyana ku bi fermana baviksalarî hatî ferzkirin, ji holê rake. Gulê li hember Qoco, ku ew dengê xurt ê civaka baviksalarî ye, pasîf û guhehkar e. Gulê, weke kesayeteke jin ya welê dixuyê ya ku li gorî mêran tevbigere. Lê belê di civaka baviksalarî da jinek dîsa jî zilma ku li ser wê ferz dike napirse û dema ku pêdivî be ji bo parastina mafên xwe dikare dengê xwe bilind bike. Desthilatdarî serhildana kesek bi serhildana hêza ku ew bi naskirinê saz dike, xurt dike. Serhildan wekî amûrekê, ji xurtkirinê bêhtir ji bo desthilatdarîya mêran kar dike. Naskirina serwerîya mêran dibe destpêkek û radestbûneke domdar. Ji ber vê yekê, desthilatdarîya hêzdar hêzek e ku rêyek ji nû ve avabûnê dibîne, herweha dema ku ew bêtehemul dibe û bi serhildanê têk diçe. Serhildan hema hema vege-randina desthilatdarîya mêran peyda dike. Serhildana ku herêmi maye, di-keve bin desthilatdarîya mêran û wê desthilatdarîyê rêxistinbûyî û berfirehtir dike. Li vir Gulê tevî kuştina fermanarê dijmin serfiraz dibe, lê belê li gor desthilatdarîya mêr û civakê, ango Qoço û şervanên wî, ew jineke xirab e û ji ber vê yekê ew wê dikujin. Ji ber vê yekê, serhildan û serfirazîya Gulê dikeve bin desthilatdarîya mêrên serdest. Gulê mêrê xwe dikuje û diçe dû Qoço, ev tevger e. Erê, li vir serhildanek heye, lê ev serhildan paşê dîsa vediguhere radestbûnê. Weke ku tê dîtîn, ev helwest bawerîyeke rûreş û paşguhkirinê ye ku danasînên ku ji jinan ra têne vegotin li ser navê jinan nasnameyeke nû diafirîne. Li vir tê dîtîn ku zilam bi zimanekî qirêj û pîs li ser Gulê diaxivin. Ew çalakîyeke, serhildaneke li dijî helwesta hov, bêperwa ya civaka jinan dibînin. Ev rewşa xwe dibîne ku ew jîyana xwe di bin siya zilamekî da derbas dike, ango Qoço, bi rastî garantîyek e. Li vir, nivîskar di heman demê da bi raber-kirina rola bindest ya jinan di têkilîyên jin û mêr da, hêza mêran di civakeke baviksalar da jî nîşan dide. Ji ber ku jin ji hêla civakê ve hate zextkirin û mafê axaftinê jê ra nehat dayîn, ew wekî “jina xirab” ango “jina çê” hat îfadekirin, ji ber ku wê mêrê xwe kuşt, Gulê bi laşê xwe û bi hestên xwe ve her di civakê da qirêj ma. Her çiqas di dawîyê da wek lehengekê derkeve pêş jî. Nûredîn Zaza, du kesayetên gunehkar, du lehengên neteweyî diafirîne: Gulê û Qoço. Nivîskar di çarçoveya rewabûna berevanîya welat û derkirina leşkerên da-girker da kesayetîyên neyênî yên civakî vediguherîne û rewabûnê dibexşîne wan. Zaza, di çîroka xwe da dagirkeriya dijmin bikerên bindest bédeng dike, berevajî zemîna veguherîna van kesayetên neyînî amade dike û dihêle ku den-gê xwe bilind bikin.

Encam


Me di xebata xwe da hewl da ji perspektîfa rexneya femînîst ya wêjeyî texlî-la lehenga jin a çîroka Nûredîn Zaza “Gulê” dahurînin û rola jinê di çîrokê da, hişmendiya civakê ya li hember zayenda lehenga jin binirxînin. Em dibînin ku di çîroka Zaza da jin, di nav nêrîn û zimanê nêranê da hatiye afirandin. Nivîskar di çarçoveya nêrîna xwe ya li jinê û di bin bandora hişmedîya baviksalarî da jin afirandîye. Herweha bandora hişmendiya civaka baviksalarî ya li ser nivîskêr jî di çîrokê da berbiçav e û bandoreke mezin li ser çîrokê çêkirîye. Nivîskêr, bi lehenga xwe ya jin xwestîye fikr û ramanên xwe bîne zimên. Herweha bi lehengên xwe yê jin û mêr ra du kesayetên ku bi hiş û raman hatine guherîn daye nîşandan.

Çavkanî

- Amir Hassanpour, M. (2005). “Kürt Dilinde Ataerkilliğin (Yeniden) Üretilmesi”. *Devletsiz Ulusun Kadınları Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*. (wer. Fahriye Adsay, Sema Kılıç, Ekin Uşaklı). İstanbul: Weşanên Avesta.
- Bülbül, M. (2010). İnci Aral ve Barbara Frischmuth'un Romanlarında Kadın Coğrafyası. İstanbul: Çizgi Kitapevi Yayınları.
- Dinç, M. (2016). “Sabahattin Ali Ve Nûredîn Zaza'nın Öykülerinde Toplumsal gerçekçilik Açısından Karşılaştırılması” (Teza mastirê nehatiye çapkirin). Mardin Artuklu Üniversitesi Türk Dili Ve Edebiyatı Sosyal Bilimler Enstitüsü: Mardin.
- Dowling, C. (1995). *Sindrella Kompleksi*. Ankara: Öteki Yayınevi.
- Humm, M. (2002). *Feminist Edebiyat Eleştirisi*. (Çev. S. Günoğlu), İstanbul: Say Yayınları.
- J. M & A. O. (2017). *Kadın ve Eşitlik*. İstanbul: Pencere Yayınları.
- Moran, B. (2011). *Edebiyat Kuramları ve Eleştirisi*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Sancar, S. (2020). *Erkeklik İmkânsız İktidar*. İstanbul:Metis Yayınları
- Shakely, F. (1998). *Kürt Öykü Sanatı*. (wer. Rohat Alakom). Stenbol: Weşanên Avesta.
- Woolf, V. (2012). *Kendine Ait Bir Oda*. (Çev. Suğra Öncü). İstanbul: İletişim Yayınları.
- Yapıcı, A. (2016). *Toplumsal Cinsiyet Din Ve Kadın*. İstanbul: Çamlıca Yayınları.
- Zaza, N. (2007). *Gulê*. Amed: Weşanên Lîs.

Serdar Ay

LI SER SANSÛR Û SIRGÛNÊ BI YAQOB TILERMENÎ RA HEVPEYVÎN



Yaqob TILERMENÎ, di sala 1972yan de, li Qosera Mêrdînê ji dayik bûye. Tilermenî dibistana seretayî, navîn û berhevî li Qoserê xwendiyê. Li Zanîngeha Dîcleyê, Fakulteya Perwerdehiyê, Beşa Fizîkê qedandiyê. Di Gulana sala 2002'yan de ligel deh mamosteyan û endazyarekî, bi bahaneya 'xebatên perwerdekirina kurdî' hatiye girtin, mehekê di Girtîgeha Mêrdînê de maye û şeş mehan ji kar hatiye dûr xistin. Piştî serbestmayîn û rizgarbûna Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) di 1ê îlona 2002yan de li karê xwe vegeriyaye û ji hêla Walîtiya Mêrdînê ve sirgûnî bajarê Yozgatê bûye. Weke sirgûn sê salan li gundekî bi ser navçeya bi navê Çekerek a bi ser bajarê Yozgatê ve maye. Piştî mamostetiya 15 salan li bajarê Mersinê û bi giştî 22 salên mamostatîyê bi Biryarên Di Hukmên Qanûnê (KHK) de 7ê Sibata 2017an ji karê xwe hatiye derxistin. Ji ber gef û gurên polîsan û şertên neyînî yên jiyane mecbûr maye ku welatê xwe terk bike û biçê Swîsreyê. Ji Îlona 2018an û vir ve ligel hevsera xwe ya helbestkar Dîlber Hêma û keçên xwe Şarezîn û Yezda li Swîsreyê dijîn...

Tilermenî heta niha pênc pirtûkên kurteçîrokan ên bi navên *Êşbazî*, *Bermeqlûb*, *Ferhenga Sirgûnê*, *Metamorfoz* û *Pizdank* û pênc romanên bi navên *Kitim*, *Qerebafon*, *Bavfileh*, *SERGOTina Calvino* û *Hêlange* û du pirtûkên zarokan ên bi navên *Kulîlkên Apê Mûsa* û *Kermêşa Gerok* dane çapkirin. Pirtûkek bi navê *Salnameya Çîrokên Kurdî yên 2012-2013-2014an* amade kiriye. Şanonameyeke wî ya bi navê *Danişîna Zimanekî* di sala 2011an de ji hêla pêşbazîya lîstikên şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ve şayanî xelata duyemînîyê hatiye dîtin û hatiye çapkirin. Helbestên Şükrü Erbaş ji tirkî ligel Dîlber Hêma bi navê *Cam û Kevir*, helbestên Hicri İzgören ji tirkî ligel Lal Laleş bi navê *Bêbaran* û desteyeke çîrokên çîroknûs Özcan Karabulut ji tirkî bi navê *Rojda*, romana Sırrı Ayhan bi navê *Dansa Berber* û şanonameya M. Cevdet Anday bi navê *Yên Di Hundir De*, şanonameye Eşber Yağmurderelî bi navê *Dûvpişk*, romana Fatma Kök bi navê *Aso* ji zimanê Tirkî wergerandine zimanê kurdî.

Tu sansûra li ser zimanê kurdî û wêjeya wê çawa pênase dikî, li Tirkîyeyê?

Yaqob Tilermenî: Ger pênaseya sansûrê dê têkildarî Dewleta Tirkîyeyê were kirin, hingê pêdivî bi lêvegêra rabirdûyê heye. Ji ber ku di esasê vê dewletê da qedexe, bişaftin, tunekirin, tunehesibandin, çewisandin û jixwêrebirina (bi gotineke dîtir 'dizî'ya) çandan heye. Ger em pirsê xwe bi vî awayî li ser esasekî rast deynin, hingê dê bersivên me jî bigihîjin rasteqînîya xwe.

Çawa ku di Fermana Îslahkirina Şerqê (Kurdistanê) da xal bi xal hebûn

û nirxên gelek neteweyan, xulase yên Kurdan bi awayekî pergali hatine qedexekirin û tunehesibandin, bi awayekî dîtir jî ew ji bo avakirina netewetîya tirkî ji xwe ra birine. Ji bo vê jî çî bîrbir û zana û çî çalakgerên siyasî hebûn, bi awayekî sistematîk hatine bêtesîrkirin (girtin, sêdarkirin, kuştin, bédengkirin û mişextkirin), bi gotineke dîtir, mirovên kurd bêserî hatine hiştin. Ji ber wê ye ku dema Kovara *Hawarê* hejmara xwe ya yekem derdixe, di nava mehekê da li dadgehên Tirkîyeyê biryar hatîye stendin ku kovar were qedexekirin û rê li ber ketina wê ya nava sînorê Tirkîyeya fermî were girtin. Ev kiryar û sansûr heta roja me jî bi gelek rê û rêbazan hatîye berdewamkirin. Jixwe zimanê kurdî jî û wêjeya wê jî di xala sereke ya sansûrê da cih digire.

Li gorî te, çend demên sereke yên cuda yên vê sansûrê hene ku dikarin li gel taybetmendiyên xwe bêne selimandin?

Y. T.: Ger berî avakirina Komara Tirkîyeyê di sala 1916an da ji Kurdistanê bi qasî 600. 000 mirovên kurd hatibin mişextkirin û li hemû herêman hatibin belavkirin, mirov dikare bibêje ku pîlan û organîzasyonên tunehesibandin û tunekirinê ne jixweberî, lê bi kitêb û hesêb hatine kirin. Li dû sirgûna mirovan, bîrbir û zanayên kurd bi muzakereyên xapînokî hatine xapandin û ew li nik xwe dane xebitandin heta ku gihîştine armanca xwe ya sereke. Pêla dîtir jî, bi guhertina alfabeyê û qedexekirina medreseyan dest pê kirîye. Dû ra jî pêla tunekirina rewşenbîran dest pê kirîye ku yên karibûne xwe, bi awayekî, ji nava lepên dewletê rizgar bikin, ji xwe ra palên ewle bi dest xistine. Jixwe heta vê derê ferhenga kurdî ya ji gelek destxet û kitêban pêk dihat, hema hema bi temamî hatîye tunekirin. Dema li Binxetê (Rojavayê Kurdistanê), Başûrê Kurdistanê û Rojhilatê Kurdistanê yek bi yek mirovên kurd ên di nava çalakgerîya zimên û wêjeyê da hewl dane da ku karên afirînerîyê û hilberînerîyê bikin, dewleta Tirkîyeyê dîsa destdirêjî û destwerdan li wan xebatan kirîye ku hişmendîya yekîti û neteweyî neyê avakirin. Ev hem bi awayekî pratîkî kirîye û hem jî bi lihevkerinên rayedarên Îran, Îraq û Sûrîyeyê ra kirîye. Ji ber wê ye ku dema li Başûrê Kurdistanê hewldanên perwerdehîya bi zimanê kurdî dest pê kirine, ne kurmançîya berbelav a zaravayê sereke lê soranîya li herêmekê ya kêmaxêvî bi zora dewleta Tirkîyeyê hatîye ferz kirin. Jixwe bi guhertina alfabeya aramî kurdên du parçeyên mezin ji binî ve ji hev hatine veqetandin. Bi dû ra jî bédengîyeke dûdirêj dest pê kirîye...

Tu serborîya xwe ya di nav sansûrê da û bi sansûrê ra çawa dibînî û dixwînî îro? Li gel wê, li dijî wê bûyîna nivîskarîya kurdî çawa bû?

Y. T.: Ez jî neferek ji nava kedkarên çanda kurdî me. Çawa ku bav û kalên me tûşî tundîtî û çewisandinan bûn, ez jî ji wan kiryarên nemirovî bêpar

nemam. Gef, binçavkirin, girtin, ji kar derxistin, tirsandin, rêlibergirtin, sirgûn û dîsa sirgûn: Çîrokeke dirêj û çîrokeke nas a kurdekî ye çîroka min. Îcar, ger mirov hay ji rabirdûya xwe hebe, kirinên pergalekê bi hişkê azad bibîne, ji bo bûnwerîya xwe ya netewî li ber xwe bide, misoger, dê bêtirs ew birîna xwîndarî ya ku pergal her tim lê dixê, bikewîne û hewl bide rihet bike. Ez bi vî hişyarî û bi van hestan digel her xerabîyên li pêşîya xwe, di qada zimên û wêjeyê da bi cih bûm. Her darbeyek li serê min ket, ez arasteyî afirandinên bêtirîn kirim. Kurt û kurmancî; bêtirs nivîsandina bi zimanê kurdî tê wê wateyê ku tu yê jî di deftera sûcdarîya dewletê da cih bigirî. Ew dewlet dê tu caran dev ji te bernede û her li ser piştê te be. Di sala 2003yan da xizmekî min ê nivîşkan ji bo alîkarîyê serî li qeymeqamîya Qoserê dabû; lê qeymeqamîyê, ez û merivekî me yê sîyasetmedar weke hincet nîşan dabû û alîkarî pê ra nekiribû. Jixwe wê demê ez weke sirgûnekî li bajarê Yozgatê bûm.

Sansûra vê pêla dawî, piştî 2015-2016an, sansûreke çawa ye? Cudayî û hevşibîyên wê çi ne li gorî pêlên din?

Y. T.: Dema mirov cencereya (makara) filmê jîyana kurdî bi paş ve vege-rîne dê bi rihetî hevşibîyan bibîne. Belkî ferqek ji salên berê hebe, ji ber ku wê serdemê amûr û destkeftîyên Kurdan ne bi qasî îro zêde bûn û rêyên ragihan-din û haydarkirinê kêmbûn. Girtina sazî, dezgeh û navendên çand û hunerê, qedexekirina rojname û kovaran, jikaravêtina nivîskaran, xerakirina pirtûkx-aneyan, guhertina navên bi kurdî, gefxwarin-reşkirin-tunehesibandina li ber çavên cîhanê û hemû mirovan, nîyet û armanca dijberên Kurdan aşkere dike. Yanî, ew gotina ku tê gotin, 'Beka Sorunu (Meseleya Mayînê)', bi hemû hêlên xwe ve weke topyekunî ji bo ji-holê-rakirina hemû hebûnên kurdîtîyê di merîyetê da ne. Ji ber wê, hemû nirxên mirovatîyê têne binpêkirin û ji vê saetê bi şûn ve vegeer ji van xerabîyan nemaye.

Wek nivîskarekî, te ev pêla dawî çawa jîya?

Y. T.: Berîya desthilatdarîya muhefezekaran (2002) makyajeke sexte û hiqûqeke sexte li ser kar bû. Mirov carna bi rêya dadgehan dikaribû hin mafên jideststandî bi paş ve bistenda. Hinekî tirsê welatên Ewropayê hebû û ji ber berjewendîyên bi wan ra, carna ji mirov ra lê dihat. Mînak; di sala 2002yan da digel ku ez û 11 hevalên xwe yê xemxwirên kurdî bi tawana cud-axwazîyê dihatin darizandin û ji kar hatibûne dûr xistin, bi rêya dadgehê em li karên xwe vegeerîyabûn û ji mecbûrî ketibûn ser rêya sirgûneke sêsalî. Piştî serkeftina Kobanîyê, li Tirkîyeyê misqalek bi tenê aydî mafên mirovan nema. Ew mîladek bû, destpêkek jêneveger bû. Hemû destkeftîyên serencamên sed-salekê di nava çend mehan da hatin tunekirin. Îro hiqûqa Nazîyan a li dijî

Cihûyan li ser kar e û nahêle mirov bi tu awayî xwe bilivîne. Ez ji kar hatim derxistin, sigorteya min a tenduristîyê hate betalkirin, xebitîna min a li cihekî hate qedexekirin, bi ser da bi rêya tirsê û destê polîsan gef li min hate xwarin... Dema ku ez ji mecbûrî ji bo debara xwe û malbata xwe bi nanozîkê xebitîm, bi tu awayî derfetên min ê xwendin û nivîsandina bi kurdî neman. Min jî, ji bo ku binivîsim, jîyam û di ser sînorên qaçax ra gihîştim welatê Swîsreyê. Yanî, rêyeke bêveger bû û her talûke li pêşîya min hebû. Niha jî, bi hesreta welatê xwe û bêrîkirina nas û xizmên xwe, di nava civakeke xerîb da li gel zimanên bîyanî dîsa li ber xwe didim ku binivîsim.

Serê salên 2000an tu tevî gelek hevalên xwe hatî sirgûnkirin ji ber karên xwe yên zimanî û wêjeyî. Wê demê, tu sirgûnî Yozgatê bûyî û îro li welatekî din î. Ku em van her du deman bidin ber hev, wenekî çawa li darî çavan dibe?

Y. T.: Di rastîyê da “Sirgûn” li kû derê be jî, ji bo mirovên hestiyar û dilbidax kêm zêde weke hevdu tê jîyîn. Gotineke Julio Cortazar heye, dibêje, “Peywira yekem a rewşenbîrê sirgûn, divê li odeya otêleke welatê xerîb xwe di mirêka tenêtîyê da şilfûtazî bibîne; bêtî ku li cihekî asê bimîne, divê xwe weke xwe bibîne.” A rast, mirovê rewşenbîr ango nivîskarê afirîner, di nava civaka xwe da jî bi tenê ye û li ber çavên civakê şilfûtazî ye. Îcar bajarê Yozgatê jî ji bo min jîyaneke sirgûnê bû û bajarê Lozanê jî ji bo min jîyana sirgûnê ye. Dem û çax guherî, temen derbas bû, azmûn pirr bûn, hêza afirandinê kêmbû lê ji bo afirandineke cîyawaz û nimûne berxwedana min berdewam e. Min berê jî gotîbû, dîsa dubare dikim: Kurd du temenan di temenekî da dijîn. Ji bo min jî wiha ye. Bi qasî du temenên mirovekî, ez bûm şahidê gelek bûyer û qewaman. Heyf e ku li dijî zilmeke wiha, serê xwe bi aramî deynim ser balgîfê û rakevim. Ger hewce bike, bi rojan ez ê ranekevim û projeyên xwe yên nivîsandinê pêk bînim. Qet nebe, li van deran tirs û xof tune ye, gef û gurên yekser tune. Lê nezanîna bi zimanê vê derê û xweifadekirina bi awayê nivîşkanî her tim weke hesinekî germ e û bi canê min dibe. Madem dijberên me tîr ji kevanê raberî me kirine û vegera wê tîrê ji ser me tune ye, ê me jî zirêx û mertalên me yên qewîn hene ku em wê tîrê bişknin. Ev jî jîyîna bi kurdî ye, ziman e, wêje ye, afirandin e.

Gelek nivîskar û helbestvanên kurdî li derveyî welêt dest bi nivîskarîyê û helbestvanîyê kirin. Lê, tu û gelek kesên ji nîfşê te li welêt û an jî, ji welêt ne dûr, bûne nivîskar û helbestvan. Wekî ku ji berhemên te jî tê dîtîn, bi taybetî ji *Sêbareya Mêrdînê: Kitim, Qerebafon û Bavfileh*, nivîskarekî wek te ku ji hundir dinivîsî, îro ji derve nivîsînê çawa dijî?

Y. T.: Şert û mercên nivîsîna bi kurdî li nava pergala Tirkîyeyê pîrr zehmet bû, zehmet e! Jixwe hema ez di hemû zehmetîyan ra derbas bûm û sedem jî israra min a nivîsîna bi kurdî bû. Dema li Kurdistanê bûm, ji bo me nivîskarên Bakurî, nivîskarên li derve (li welatên Ewropayê) weke lehengên sereke bûn û me di serê xwe da ji bo wan û jîyana wan xeyalên neditî disêwirandin. Lê mixabin, em ji bo wan ne wiha bûn. Ev di hevpeyvînên wan da dîyar dibûn, ji nivîsên wan me dixwendin, ji helwestên wan arasteyî me dibûn. Dema girtina me ku li bajarê Amedê gelek nivîskaran ji bo me îmze berhev dikirin, yek ji nivîskarê me yê li pêş bi gotina xwe ya “ev kes navên qod bi kar tînin û ez wan nas nakim”, li ber çavên me weke qetranê rêş bûbû. Piştî ku hatim li van deran niştecih bûm, hin tişt bêtir ji bo min zelal bûn. Mirov dikarin li Ewropayê bijîn, dikarin di nava jîyaneke nûjen da bin, dikarin şahidîya çalakîyên hunerî bikin, lê ger ku di nava vê jîyanê da kêmtir li xwe zêde kiribin, ev tê wê maneyê ku yên li welêt di nava jîyana sûrrealîstî da karên nivîsînê dikin, hîna xurttir in, hîna dilsoztir in. Jîyana li Ewropayê dikare derfetên zêdetir bide mirov, ger ew mirov ji van derfetan ra derîyê xwe vekiribe.

Ji bo min ferqîyek çêbû, ew jî nivîsîna helbestan bû. Ev welatên ku bi qelem û firçeyê hatine dîzaynkirin zor li min kir ku ez berovajî bifikirim, kelevajî li jîyanê binêrim, bermeqlûb qelema xwe bi kar bînim. Çandeke ewqasî qedîm ku hemû mirovahîyê para xwe jê wergirtiye, erdnîgarîyê ewqasî dewlemend ku bi destên mirovên barbar hatîye talankirin, yanî çanda kurdî û yanî erdnîgarîya Kurdistanê jî dikaribû weke van welatan xweşî û aramî bidîta. Çinku Kurdan li talanê bavê tu kesan nexistine, tu nirxên miletekî bin pê nekirine, xwe di ser tu nîjadê ra nedîtine. Ji ber wê kurdan hemû aramî û xweşîyên jîyanê heq kirine û di salên pêşîya me da dê bigihîjin vî heqî. Ev e peywira rewşenbîr û nivîskarên kurd ku karibin bi sekna xwe û qelema xwe vê rastîyê bisêwirînin. Çinku netewe bi vî awayî têne avakirin. Van hestan li min ferz kir ku helbestan binivîsim.

Ku te *Ferhenga Sirgûnê* (2004) îro nivîsandiba, te yê çawa binivîsanda gelo?

Y. T.: Pablo Neruda ku yek ji sirgûnên nivîskarîyê ye, wiha gotîye: “Îtalya. Li vî welatî her tişt li ber çavên min bêhempa xuya dikir. Bi taybetî jî jîyana rojane ya îtalyayî. Nan, şerab û zeyt. Tew bi polîsên îtalyayî... Van polîsan tu caran tehdeyî li min nedikirin, lê bêwestan li her derê bi dû min da bûn. Ez biçûma ku derê polîsek derdiket pêşberî min. Di xewa min de, tew di wê şorbeyê de ku min vedixwar. Wêjevanan ji bo helbestxwendinê ez diezimandim. Min ew bi kêfxweşî dixwendin. Li derve, li kolanê polîs li benda min bûn. Polîsên îtalyayî ku ne li ber beroşk, ne jî li ber sîyê ji dû min venediqetîyan.”

Ez weke kurd, weke nivîskarê kurdî her tim bi xema welatê xwe dijîm û li vî welatî di her derên jîyanê da li kurdîtîyê digirim. Carna bêhna hêkeke kelandî, min vedigerîne dema zarokîya hêkên kurmancî; carna kêzik û marmarok û ajalên bêtirs di ber mirovan ra dibuhure, min digihîne axa Kurdistanê ya weke xweyê berê. Belkî ev weke çarenûsa mirovê sirgûn, weke toqekê di stuyê wê/î da ye. Ji ber wê nivîskar hewl dide têkîldarî nasnameya xwe, afirîneriyê bike. Ev avantaj e an dezavantaj e, baş nizanîm. Û her “sirgûn”ek bi awayekî dîtir xwe bi mirov dide nivîsandin. Ez ê jî wê binivîsim.

Merve Şivan

NÊRÎNEKE REXNEYÎ LI SER ROMANA ÊVARA PERWANEYÊ YA BEXTÎYAR ELÎ

Kurte

Bextîyar Elî yek ji wan nivîskarên kurd e ku bi hewil û xebatên xwe asta edebîyata kurdî bilind kirîye. Pirtûka *Êvara Perwaneyê* yek ji wan xebatên wî yê girîng e ku bi realîzma efsûnî hatîye nivîsîn. Bextîyar Elî bi saya bikaranîna rêbaza realîzma efsûnî rastîyên jîyanê û bûyerên efsûnî bi hev ra di nava romana xwe da honandîye. Mebesta vê gotarê ew e ku em bibînin ka realîzma efsûnî di pirtûka *Êvara Perwaneyê* da rewşên efsûnî û rastî çawa hatîye pehtin. Bi gotineke din, ev gotar wê bipîve ka bûyerên rast di taldeya bûyerên efsûnî da maye an na? Ev gotar dixwaze ku ji alîyên teknîkî ve li ser meseleya karakterîzasyonê hûr bibe û binihêre ka nivîskar karakterên xwe çawa karakterîze kirîye. Peyre jî meseleya vegêran û bikaranîna zeman û mekanê binirxîne di çarçoveya realîzma efsûnî da.

Peyvên Sereke: Bextîyar Elî, *Êvara Perwaneyê*, Realîzma Efsûnî, Karakterîzasyon, Vegêran, Zeman û Mekan

Destpêk

Nivîskarê kurd Bextîyar Elî di sala 1960î da li Silêmanî, li Başûrê Kurdistanê hatîye dinyayê û ji sala 1996an vir ve li Almanyayê dijî. Bextîyar Elî bi ceribandina realîzma efsûnî û bi serketina di vê qadê da û dîsa bi saya nivîsîna pirtûka xwe ya bi navê *“Hinara Dawîya Dinyayê”* ra Xelata Nelly Sachsê¹ wergirtîye û cihekî wî yê taybet di edebîyata kurdî da heye. Pirtûka wî ya *Hinara Dawîya Dinyayê* ji bo heşt zimanan hatîye wergerandin: ere-

¹ Nelly Sachs nivîskar û şairê Almanî ye. Di mijarê romanên xwe da bandora rûxandina herban a li ser mirovan honandîye. Di sala 1966 an da xelata Nobelê wergirtîye. Piştê li Almanyayê du salan carê Xelata Nelly Sachs'ê hatîye dayîn. Ev xelat di sala 16. 01. 2018 an da bû para Bextîyar Elî.

bî, almanî, rûsî, tirkî, frensî, îspanyolî, îngilîzî û yûnanî. Wek Bextîyar Elî bi xwe jî tîne ser zimên: Ez ji bo wan kesan dinivîsim, ewên di şer û bêşansîyên mezin da jîyane û dijîn (Rehim, 2019). Pirtûkên wî herçiqas bi bûyerên efsûnî hatibin neqîşandin jî bûyerên di nava romanê da ji rastîyên jîyanê bêpar nehiştîye. Bextîyar Elî, bi bikaranîna realîzma efsûnî ra xwestîye rastîyên jîyanê bi çavekî din û ji pencereyeke din nîşanî me bide. Pirtûka wî ya *Êvara Perwaneyê* wek pirtûkên wî yê din bi zaravayê soranî hatîye nivîsin û ji alîyê Besam Mistefa gihiştîye ber destê xwendevanên kurmançî. *Êvara Perwaneyê* bingeha xwe wek pirtûkên wî yê din ji rastîya kurdan û Kurdistanê digire. Romana wî ya ewil *Margî Tanqanay Duhemyanê*, *Mirina Tekanê Duyem e*. Herwiha *Êvara Perwaneyê* romana duyem ya nivîskêr e. Di heman demê da nasnameya helbestvanîyê ya nivîskêr jî heye, di vê qadê da xwedî sê pirtûkên helbestan e. Îcar Şêrzad Hesên ji bo Bextîyar Elî gotîye: “Heq e Bextîyar Elî xelata Nobelê ya edebîyatê werbigire, lê bextreşîya wî ew e ku kurd e. Di nav kurdan da dijminê mirovên xwedî şîyan û talênt ji dostên wî zêdetir e.” Helbet Xelata Nelly Sanchsê jî gaveke mezin e ji bo edebîyata kurdî.

Kurteya Romanê

Roman bi axaftina karaktera bi navê Xendana Piçûk dest pê dike. Perwane serlehenga romanê ye. Xendan, piştî ku Perwane û Mîdyayê mirine û rejîma welat guherîye vegeyîyaye mala xwe. Ji me ra behsa hestên xwe yê piştî mirinên Perwaneyê û Mîdyayê dike ku dixwaze li ser Perwaneyê pirtûkekî binivîse û bi saya vê yekê têkilîya Perwaneyê bi dinyayê ra qut nebe. Peyra Xendan a xwişkê Perwaneyê cara ‘ewil derdikeve ser dikê û xwe dide nasîn, bi behskirina tevgerên xwişkê xwe ya Perwaneyê ra piçek me ji derûnîya Perwaneyê haydar dike. Roman, bi teknîkeke kronolojîk nehatîye nivîsîn, berevajî vê yekê bi teknîneka *flashbackê* hatîye nivîsîn. Ji ber vê yekê bûyer ji dawîyê ber bi serî tê qisetkirin. Di beşên ‘ewil ên pirtûkê da bédengîyê hukmê li ser bûyeran kirîye, wiha nivîskêr xwestîye bi tevgerê karakteran, wan bi me bide nasîn. Û dû ra pirtûk di beşê da behsa revîna Perwaneyê dike û di beşê de jî qala bûyeran dike ku bi serê Xendanê ve tîne. Yanê bûyerên di pirtûkê da diqewimin ji Eşîqîstanê û Tobexaneyê paralel tîne behskirin. Meriv wisa hîs dike ku Perwane karakterek e di wan salan da ku di Rejîma Iraqê da xort û ciwanên ji ber fikr, raman, tevgerên xwe ji alîyên kesên dindar ve dihatin tewanbarkirin, wekî karaktereke serhildêr derdikeve pêş û xwişkê wê jî wek kesek newêrek xwe nîşan dide. Nivîskar wek encama bûyerê di destpêkê da jî xwîn rijandîye, roja cejna qurbanîyê û li her sikak û kolananan xwîna qurbanîyan diherike û bajarekî wiha li ber çavên me xêz kiriye ku bêhna xwînê jê difûre. Di wan

salan da, keçan zêde nedidan xwendinê û keçên serên xwe nedigirtin jî wek keçên nebaş û gunehkar dihatin dîtin. Di vê serdemê da ku li ciwanan bibû sehm “evîn” a ku bi saya wê rihjena ciwanan dilezîya û kelecaniya wan zêde fikir li wan hatibû qedexekirin. Di nava bajêr da kuştina evîndaran zêde dibe. Perwane û hezkirîyê wê Ferîdûnê Melek ê ku di nava wê beyabanê da xwe spartibûn hev, biryarê didin ku ji malê birevin. Dû reva Perwanê û Ferîdûnê ra, meta wê û bav û birayên Perwaneyê, ji bo kuştina wan bi dû wan dikevin. Piştî reva Pewaneyê, Xendan tê tewanbarkirin ji ber ku bi Perwaneyê ra di heman odeyê da mezin bûye û bavê wê ji bo wê ji wê gunehkarîyê bişo û rizgar bike radestê meta wê ya bî dike ku çend keçên wê hene. Keçên metê jî bi ex-laqê dêya xwe mezin bûne. Xendan tu caran sedema acizîya Perwaneyê fahm nake û tu maneyê nade tevgerên Perwaneyê, heta ku Perwane ji malê direve û Xendan bi rastîyan ra rûbirû dimîne. Xendan piştî tevkirina çenteyê xwe bi meta xwe ra diçe mala wê. Mala meta wê wek terbiyexaneyê ye, tevî keçên lê, Xendan jî ji bo ji gunehkarîya xwe rizgar bibe tê perwerdekirin. Perwane û Ferîdûn tevî hevalên xwe yên li ser heman fikrê ne bi rîyên dûr ve diçin û li paş çîyayan li daristaneke ewlehî ji bo xwe gerstêrkek ya evîndaran ava dikin û êdî ji bo evînê xizmetê dikin. Li Eşîqîstanê mêr ji bo ku debara Eşîqîstanê bikin peykerên evînî çêdikirin, keçan jî ji dara bîyê zembil çêdikirin û bi keş-tîyan difrotin bajar û kîşwerên dûr. Li Eşîqîstanê Mîdya hevala Perwaneyê ye, li daristanê xwe spartine hevdu û li ber dilê hev xemên hev piçûk dikin. Ferîdûn ro bi ro ji Perwaneyê dûr dikeve û têkilîya wan qut dibe. Bi pêhesîna xeberên wek kuştina evîndaran, wan evîndarên ku li Eşîqîstanê hêwir danîne, bawerîya wan a bi ‘evîn’ û ‘evîndarî’ yê dişikîne û ro bi ro hêza xwe winda dikin û ji hev dûr dikevin. Lihevnekirinên di nava aşiqan da hêdî hêdî aramîya wan xerab dike.

Yek ji nav wan jinên li Eşîqîstanê, Masûma, ji hevalên xwe hêrs dibe û ji Eşîqîstanê difire diçe her tiştî digihîne Mela Kewser, ew kes jî, yek ji wan serokên cimaeta dîndaran e. Ew jî hima xeberê digihîne yên din û tev ji bo hilweşandina Eşîqîstanê dikevin rê. Xendan li terbiyexaneyê bi tirsên xwe ra dikeve nava fikrên ecêb û bi xwestek û daxwazên xwe ra dikeve nava gengeşîyan, fahm nake ka ev daxwazên wê di destê wê da ne an bêdaxwaz ev tiştana lê peyda dibin. Keçên li tobexaneyê bela xwe li Xendanê didin ji ber ku ew xwişka Perwaneyê ye, û bi carekî ve ba û bahozek radibe, wê tobexaneyê li bin guhê hev dixê. Bi ser vê yekê ra kesên şahide vê bûyerê dibin Xendanê wek keçeke sihirbaz nîşan didin û wisa qala wê dikin. Xendana piçûk û Fetane xwişka Mîdyayê hevdu li terbiyexaneyê Meta Xendanê nas dikin. Li tobexaneyê keçên wek wan ên xwişkên wan ji mal revîya ne bi gunehkarîyê tèn

tewanbarkirin û her çend gunehên wan tune be jî, li tobexaneyê tèn şuştin û rizgarkirinê. Fetane û Xendan wek Perwane û Mîdyayê dibin du dostên qewî û bi dû rastîyan dikevin û naxwazin ku xwişkên wan bikevin destê wan wan kesan ku xwe wek xwedîyê dîn dihesibînin û rojê dibin celadê bi sedan evîndaran. Xendan û Fetane dema aciz dibin an jî dikevin tengasîyê xwişkên wan dibin perperik û tèn cem wan, alîkarîya wan dikin. Ew warê ku ji bo evîndaran bibû Eşîqîstan ji alîyê niştecihên wir ve dema hat keşîfkirin wek cihê gunehkarîyê hat binavkirin. Piştî hinek wextan ev cih ji alîyê kesên dîndar ve hat peytandin û ew kes bi dû Perwaneyê û Mîdyayê dikevin û li gundekî wan digirin. Di şeveke berfînî da wan li ser berfê li ber çavê herkesî dikujin, rengê berfa spî wê şevê sor dibe û perperikên ku bi hezaran di gihanê wan da bûn, bi mirina wan ra ber bi asîmanan ve difirin.

Rêzebûyer

Bûyer, mijar an meseleya ku di roman û çîrokan da diqewime, bi saya wê rêzebûyerê tê hûnandin. Di roman an çîrokê da tiştê ku diqewime rêzebûyer e. Di vê behsê da tespîteke navdar a E. M. Foster heye: Dema mirov bibêje ‘Qral mir û dûre jî qralîçe mir’ ev dibe çîrokek. Lê belê dema mirov bibêje ‘Qral mir û ji kerba wê qralîçe jî mir’ ev dibe rêzbûyere (Alan, 2019). Foster, bi qeydeyê din di vir da cudahiya çîrok û romanê jî ji hev cuda kirîye. Lewra çîrok li gor bûyerên kronolojîk li ser xêzekî têne rêzkirin. Roman, bûyeran li gor kêfa xwe rêz dike û dibe ku dawîyê di serî da vebêje an serîyê di dawîyê da vebêje. Ji ber vê serbestîya romanêye ku çîrok li gor romanên kurt e û roman jî ji çîrokan dirêjtir e. Bi vê sayê di romanên da nivîskar, wek Foster jî dîyar kirîye, di rêzkirina bûyeran da bêje “Qral mir û ji kerba wê qralîçe mir” û hin tahlîl û tenkîtan ji bo derûnî û fikrên wan bike, dikare sedema hin bûyeran bi hinek bûyerên din ve girê bide û bûyerên xwe rêz bike. Di romanên modern da meriv dibîne ku nivîskar bendê bûyeran daye destên karakterên xwe, û karakter berê bûyerê bixwaze bi ku da bike an bixwaze bi ku ve bikişîne bi wir da kaş dike. Karakter hin caran bi monologan bûyerê dirêj dike, hin caran behsa tiştên wisa dike ku bi carekî da kelecaniyê zêde dike. Helbet sedema vê yekê ew e ku di romanên modern da zêdetir qîymetê didin şexsiyê û derûnîya wan, û ev yek jî bi xwe ra teknîka “*herikîna hiş*” tîne. (Alan, 2019, r. 129) Zeman û mekan du hêmanên girîng in ku bi saya wan bûyer têne rêzkirin.

Helbet hêmanên din yên wek “deng û zîq” (Alan, 2019, r. 120) jî bûyeran zeximtir dikin, lê belê ya herî muhîm ziman e. Nivîskar zimanê xwe çiqas edebî bi kar bîne ewqas bi ser dikeve. Tekin dibêje: “*Bûyer rihê sistema vegêranê ye.*” (Tekin, 2019, r. 66) Yanê vegêr berdevkê nivîskê e ku vegêranê ji bo me

qiset dike, vegêran jî hêza xwe ji rêzebûyerê digire pê pišta xwe dûz dike. Di rêzebûyerê da mentiq sereke ye ku meriv bi qewîmîna hin bûyeran ra îlhem pirsan ji xwe dipirsin û dibêjin: “ka ev yeka çi bû?” an “wey! wê-î çima rabû carek da wisa kir?” Helbet her pirtûk meriv wisa heyirî nahêle. Rêzebûyer bi hêmanên wek pevçûn, armanc, hest, meraq, teher û hwd. tê hûnandin. Di rêzebûyerê da berdewamî lazim e ku divê bûyer ji hev qut nebe. Di vê mijarê da pîramîdek e Gustav Freytag heye ku rêzebûyerê li gor van pênc hêmanan dinirxîne: Destpêk, hilkêş, lûtke, daketin û encam. Helbet di her roman an çîrokê da ev hêman cih digirin, lê ya muhîm bikaranîn û serkeftîbûna van hêmanan e û pevgirêdana wan e. Li gor herikîn û qewimîna bûyeran dibe ku hin bûyer zû bi zû were behskirin û hin bûyer jî bi hûrgilî bèn qisetkirin. Bextiyar Elî, sedem-encam û armanc-encam ji hev qut nekirîye.

Êvara Perwaneyê û Realîzma Efsûnî

Em ji bo ku bikarin behsa bikaranîna realîzma efsûnî bikin, divê em ewil hinek taybetiyên wê dîyar bikin. Rastî û efsûnî du têgeh in ku li hev nakin, çawa dikarin di romanekî da li gel hev cih bigirin? Kê ev yeka pêk anîye, çawa pêş ve çûye û cihekî çawa ji bo xwe di edebîyatê da dîtîye. Di van salan da ku zanist û teknolojiyê pêş ketine, helbet rewşa edebîyat û huner jî bi xwe ra guherandîye û bi vê yekê ra miletê rû ji rêbazên klasik badaye û rêbazên nû peyda kirine. Wek têgehekê, koka *realîzma efsûnî* diçe 1925an dema ku rexnegirê alman ê hunerê Franz Roh ew di resmê da “ji bo piştgirîya arasteyeke nû bike” bi karanî. Bi vê têgehê wî taybetmendiyên vê arasteya nû dest nişan kir û ew “piştî şeweya razbertir a *ekspresyonîzmê* vegera ser realîzmê” terîf kir. Di gel ku ev têgeh ji qada hunerên dîtbarî derket jî, pişt ra ew bi serekî di qada wêjeyê da, bi taybetî ji bo romanê û di berhemên romanûsên wek Borges, Fuentes, Garcia Marquez da hate bikaranîn. (Ahmedzade, 2011, r. 90) Ji aliyekî din vetê angaştîkirin ku kesê yekem car ev tevgera realîzma efsûnî bikaranîye, nivîskar û rexnegirê Îtalî Massimo Bontempelli ye. Massimo, li ser vê yekê wisa dibêje: “Edebîyat xwedî hêzekê ye ku dikare bi tevlihevkirina dinyaya rast û dinyaya xeyalî atmosfereke din pêk bîne. (Sağlam, r. 2) Di realîzma efsûnî da rastî û nerastî, tiştên adetî û neadetî tevlihev in. Di van berheman da bûyereke rast dikare bibe efsûnî an jî bûyereke efsûnî dikare bibe rastî û bi vê qaydê bê vegotin. Ev bizav ji aliyê derhêneran ketîye nava filman û ji aliyê wênesazan ve di nava wêneyan da hatiye nexşîkirin. Wek mînak romana Laura Esquivel ya bi navê Çikolataya Tehl (*Coma Aqua Para Chocolate*, 1989) ji aliyê derhêner Alfonsa Arau ve bûye film, di heman demê da ev film di nava klasîkên vê qadê da cihekî taybet wergirtiye (Arargüç, 2016, r. 17). Ji

bo şanoyê jî dikarin bibêjin ku yekem nimûne ya lîstikê, ji aliyê Massimo Bon-tempelli ve bi navê Xwedawenda Me (*Notsra Dea, 1925*) derketîye ser dikê û bi vê yekê ra realîzma efsûnî di şanoyê da reng vedaye. Realîzma efsûnî derîyê rexneyê li rewşên polîtîk vedike. Wek mînak pirtûka Gabriel Garcia Marquez a bi navê *Tenêfîya Sedsalekê (Cien anos da soledad, 1967)* behsa dîroka êşbar ya Kolombîyayê dike. Salman Rushdie jî bi pirtûka xwe ya bi navê *Zarokên Nîvê Şevê (Midnight's Children, 1980)*, behsa wan pirsgirêkan dike ku piştî serxwebûna Hindistanê derketine û behsa tengasiyên aborî û civakî, dinî û çandî dike (Arargüç, 2016, r. 18).

Dema em vedigerin ser romana xwe em dibînin ku Bextiyar Elî, *Êvara Perwaneyê* ji aliyê sîyasî û civakî di parzûna realîzma efsûnî da derbas kirîye. “Di *Êvara Perwaneyê* de, hin wechên realist ên dîyar hene ku girêdayî ne bi wê realîteyê ve ya civakî-sîyasî ya Kurdistana Iraqê ya di salên 1980yan û bi destpêka 1990an.” (Ahmedzade, 2011, r. 81) Rejîma Iraqê ya wan salan ji her aliyê ve civaka wê serdemê tevlihev kirîye û ciwan tevde hecirandîye.

“Bajar bi eşqên bêmiraz û nîvcomayî dagirtî bû. Di vî bajarî tarî û piçûk da Nesredînê Behnxeş di kolanan da diçû û digot, “Ax Xwedêyo, ev hemû eşqên nîvcomayî çi ne? Ev hemû eşqên bê armanc çi ne?” (Elî, 2015, r. 77)

Bi hebûna realîteya wê rejîmê ra ciwan dixwazin bi dinyaya muxeyyel da birevin. Realîteya jîyana wan, acizîyeke bitihîn li wan peyda dike ku wan ber bi dinyayên xeyalî ve tehn dide, ev yek jî dibe sedema lêgerina cihekî ewlehî, ku tê da her tişt li gor dinyaya evîndaran dirûv bigire.

“Govend ku xwe ji cinse pêxenberan dihesiband, şiyaneke wî ya ecêb li ser axaftinê hebû, şiyaneke wê çaxê di seatên teyisîna xwe yên herî zêrîn de dijiya, li her cihî bi dengê bilind behsa bêwateyiya vî bajarê dikir û digot, “Ev çi bajar e, cihek lê nebe mirov here û bi keçê re çayekê lê vexwe, ev çi jîyan e bostek zevî nebe bi piştrastî mirov hilmekê tê de bikişîne.” Govend di xeyalên xwe de dûrtir diçû û qala zevîyeke bona aşiqan dikir, qala afirandîna împaratorîyekê ku evîndar lê serdar be, dikir. Li ser rîyan dimeşîya, pêhîn li tiştên peşberê xwe dida û digot, “Mirov bo vê yekê nehatiye çêkirin, gîroyê bajarekî bi vî rengî be ku tevlihevîyeke bêwate ji keleh û hucreyan e.” (Elî, 2015, r. 81)

Kuştina evîndaran bi destên bi wê civakê dihat kirin ya ku fikrê wan ji aliyê dîndaran ve destbend bûbû. Roj bi roj kuştina evîndaran zêde dibû. Ev yek bibû noqteya qedandina sebra evîndaran ku êdî hew dikaribûn li wî bajarî bijîn. Nivîskar diyalogên gelek xurt di nava karakteran ra derbas dike ku haya me ji derûnîya wan çêdibe û êdî xebardana wan bi tenê li ser evînê û çûyîne ye. Evîn bi serê xwe hesteke efsûnîye, koçkirana ji bo evînê bûyerê efsûnîtir dike. Dawîya dawîn, ew bûyerên ku di jîyana wan da rû didin çiraya xortanîya

wan temirandîye ku Govend ji ber vê gazinan dike û ev yek wan derdixe rê-yeke efsûnî ku li paş çîyayan, li daristanekê cihekî ewlehî, gerstêrkeke aşiqan ava dikin. Evîndar xwe li vê gersterkê digirtin roj bi roj hatina evîndaran zêde dibû. Perwane, di soranî da tê wateya perperokê. Di romanê da Perwane ji bo Bextîyar Elî dibe xêro ku bi wê û bi bûyerên, li derdora wê diqewimîne gelek rastîyan bi tevlêkirina hest û bûyerên efsûnî ra ji bo me qiset kirîye. Perwane û hevalên wê di nava jîyanekê eşbar da ne, rewşa ku ew tê da ne û bûyerên ku li welat û bajarî diqewimin wan dike perperok. Xendan a ku li dû xwişka xwe maye, li terbiyexaneyê meta xwe ye û bûyerên derasayî tînen serê wê, met û keçên metê wê wiha dibînin û didin nasîn wekî ku ew keseke sihirbaz be ku ba û bahozan çêdike.

“Lê divê mikur werim ku hikayet hemû ji serî heta binî ne derew in, Perwanê car caran ji min re digot, ‘Tu jî ji qencî û xêra şeytanan ne bêrî yî’, wê behsa wan rojên şîrvexwarîna min dikir ku piştî serhişkîyên min yê bê bahane, bê mala me serobînî hev kir.” (Elî, 2015, r. 69).

Belê gotinên Perwanê ji bo xwişka xwe Xendanê, û bûyerên di romanê da qewimîne her çiqas ji aqil dûr bin jî, wek ji rêzê bintên vegotin. Bextîyar Elî, di romana xwe da bûyerên derasayî di nava rastîyê da girtîye bin kontrola xwe ji bo ku bûyer ji me ra zêde awarte neyên. Helbet bi van bûyerên derasayî ra behsa rewş û atmosfera wî bajarî û behsa rewşa miletê wir jî dike ku di nava rastîyên jîyanê da tiştên ecêb tînen serê ciwanan. Di romanê da ji serî heta dawîyê bûyerên rast û yê efsûnî an derasayî bi hev re hatine pijandin. Meriv di dawîya romanê da tehma xagîbûna rastîyê an xeyalîbûnê nagire ji ber ku herdu jî di heman pîvanan û heman nermî û hişkîyê da hatine pijandin. “Beravajê tekstên fantasîk, yê realîzma efsûnî tîkilîya karakterên xwe bi rabirdûya wan ra qut nake.” (Özsevgeç, 2015) Her çiqas em hay jê hebin jî ku tiştên efsûnî di nava romanê da diqewimin, nivîskar ew di navbera rewşên efsûnî û rastîyên jîyanê da pîvanekê baş di navbera rewşên rastî û xeyalî da çêkirîye.

Di romanê da karakter zêdetir bi tevgerên xwe derdikevin pêş, nivîskêr di romanê da vegotin berteraf kirîye û bi nîşandanê û bi gotara rasterast û nerasterast behsa derûnîya civakê û wan ciwanan kirîye. Nivîskar ji serî heta dawîyê qeflik li devê xwe xistîye û sewta xwe ya ku bi bîhengîyê meyndîye bi alîkarîya berdevkê xwe vegêr ra xwe digihîne ber dilê xwîneran. “Wekî tekstên postmodern yê realîzma efsûnî jî ji me dixwaze ku em ji tiştên li ber çavên me ne zîyadetir li tiştên paş sînoran mêze bikin” (Özsevgeç, 2015). Bi tevlîhevîkirina bûyerên rast û efsûnî nivîskar hinekî jî dixwaze bûyerên ku ji me ra wek ji rêzê dixwîyê balkêştir bike û haya me pê bixe.

“Min hest dikir tevahîya gerdûn ketîye rewşa sisbûneke helbestane, hemû gerdûn rawestîyaye bi çaveke xilmaş dinêre, dar û çîya û berf bêdeng li wan dinêrin, gava dengê tîfingan bilind dibû, dinya di pêlekê da bi tozê tije bû, ez piştrast bûm ku Perwane dibe toz, dibe tozeke hevrişimî ya nerim û çirûskdar, tîfin bêdeng dibû û Perwane hê li se pîyan bû, Mîdya diket û Perwane şîpîya dima, nedixuya bikeve, lê bi awayeke ecêb belav dibû.. ev toza Perwane, li ser rû û laş û daran vedinişt, di wê kêlîyê da ku Perwane wekî sirekî li ser hemû gerdûn belav dibû, perperîk zêdetir dibûn, hinek ji wan di hewayê da derdiketin û fetlek li xwe didan û dimirin, lê belê hinek ji wan bêtir û bêtir diman û mina şahideke sîhîrbaz neyinîya wê êvarê di kûrahîya jîyana xwe ya nehîni û aloz da hildigirtin, Perwane diket.. mi didît Perwane bi hêminî li çok dibe, bi hêminî xûz dibe, bi hêminê serê xwe datîne ser erdê û dikeve, bi ketina Perwanê ra perperîk bi şepêleke mezin berbê kûrahîya ezmen bilind dibû...” (Elî, 2015, r. 302-303).

Ev beşa me li jor parve kiriye ji rûpelên dawîyê yê romanê ye ku tê de êdî herdu serlehêngên romanê tên kuştin. Nivîskar bi mirina serlehengan ra perperokên di gîyanê wan da li ber çavê herkesî azad kirîye. Ev mirin ne têkçûn e, rizgarî û azadîya fikrên lehengan e. Heger Bextîyar Elî ev serborîya Perwaneyê û rewşa ku civak di nav da hitikîye bi zimanekî hêsan û bi vegotîneke sade ya çîrokane behs bikira, em qet newestanda û bêyî ku bûyer bi realîzma efsûnî bihêra, helbet wê ewqas bala me nekişanda û wê li ser me bandor nekira. Realîzma efsûnî yek ji wan cureyan e ku serî li hember romantîzm û klasîzmê radike û dixwaze bala me ji alîyekî din ve bikîşîne ser bûyeran û dinyayê bi çaveke din nîşanê me bide. Realîzma efsûnî derîyê rexneyê ji bo rewşên polîtîk vedike. Bi derfetên vê rêbazê, Bextîyar Elî di vê pirtûka xwe da bi têkilkirina bûyerên efsûnî û rastî ra xwestîye birînên ciwanan derman bike û rêyeke felatê ji bo wan veke.

Karakterîzasyon û Rewşa Vegêran

Karakterîzasyon çî ye? ‘Peyva ku li vê kategorîyê tê ‘avakirin’, ‘çêkirin’ an ‘wergirtin’ nîne, ‘afirandin’ e. Lewra xwedîyê kaînatê Xwedê be, yê karakterên çîrokê jî nivîskar e. Ew wek guneh an xêrekî tenê aîdê nivîskar in’ (Alan, 2019, r. 133). Belê di her roman an çîrokekê da ilhem karakter hene ku ji alîyê nivîskar ve tên afirandin û tên karakterîzekirin. Nivîskar karakteran çawa bixwaze wisa araste dike. Ger bixwaze karakterê xwe baş nîşan bide bi wê/wî başîyê dide kirin, ger biwaze xerab nîşan bide jî bi wê/wî xerabîyê dide kirin. Heta nivîskar hin cara karakterên wisa diafirîne ku meriv qet hebûna nivîskar hîs nake û meriv tevî serborîya karakteran dibe, wisa roman bêhtir xweş dibe. Nivîskar vê serkeftîbûnê çawa dikare bi dest bixe? Em di pirtûka Mehmet Tekin ya bi navê ‘Roman Sanatî’yê (Hunera Romanê) da li rastêvan gotinan

tên: ‘Di xêzkirina karakteran da du bingeh hene: Ya yekem ew karakter e ku ji alîyê nivîskar ve bi ‘teknîka vegotinê’ tê xêzkirin û tê behskirin ku nivîskar bi xwe behsa her tiştî dike û ji bo karakter tiştêkî nahêle, ev yek jî meraqa xwendevanan dikuje. Ya duyem jî nivîskar wisa dike ku karakter bi hebûna xwe tevger û halê rûhîyeta xwe, xwe bi xwe nîşan dide ku ev jî ‘teknîka dramatik’ e. Nivîskar li gor dilê xwe dikare karakteran bi teknîkekê an jî bi herdu teknîkan jî nîşan bide.’ Helbet dema ku em li van herdu teknîkan dinihêrin ya yekem hêsantir e ji bo nivîskar û xwendevanan, ya duyem jî ji bo nivîskaran zehmetir lê ji bo xwendevanan bi tehmîr e. Lewra di teknîka duyem da karakter xwe bi xwe tevdigere ji ber vê yekê jî asta meraqê di vê teknîkê da zêdetir dibe û tehma romanê jî xweşiktir dibe. Dema ku em van teknîkan didin ber çav û li ser pirtûka xwe hûr dibin em dibînin ku di romana me da vegêr dema behsa vegêranê dike teknîka dramatik bi kar anîye. Di teknîka dramatik da nivîskar divê karakteran bi tevgerên wan, wan bide axaftin. Bi monologan an jî bi axaftina xwebixweyî ya karakteran ra dikare vê tiştê pêk bîne.

Di romanê gişkî da seranser vegêr bûyeran bi gotara rasterast û bi gotara nerasterast qiset kirîye. ‘Gotara rasterast, gotin û ramanên karakteran qiset dike. Ji monologa karakteran jêgirtinek e. Gotara nerasterast jî di nav vegêranê de rewşa hişê karakteran qiset dike.’ (Alan, 2019, r. 128-129) Cohna ji vê ra dibêje ‘*vegêrana-pîsîko*’ derbarê hişê karakteran da gotara vekirî ye. Di nav herdu gotaran da zêdetir ya rasterast hatiye bikaranîn. Wek me di serî jî diyar kiribû roman bi devê karaktera romanê tê vegotin. Dema ku kesê bûyeran ji bo me qiset dike yanê vegêr hem karakterek ji nava romanê be û hem jî romanê ji bo me qiset bike, em ji vê yekê têdigihêjin ku roman bi vegêrana şexsê yekem tê behskirin. Ev yek wê hêzê dide vegêr ku dikare wan bûyerên di nav da ye tecrube bike an bibe şahidê wan bûyeran. Di romanên klasîk da zêdetir teknîka vegotinê hatiye bikaranîn. Bi guherîna rewşa dinyayê ra bizavên nû peyda bûne û bi peydabûna van bizavan ra rewşa edebîyatê jî guherîye ku ji ber vê yekê bikaranîna teknîkan jî guherîye. Berê nivîskar xwe dikir berdevkê karakter ku nedihîşt karakter bi serê xwe tevdigere û hest, fikr û helwestên xwe bi tevgerên xwe derbirîn bike, ji dêvla karakter ve nivîskar bi xwe fikr, raman û xwestekê karakter dianî zimên, ev tişt jî meraqê dikuje.

‘Têkilîya Ferîdûn bi Govend ra gelek adetên jîyana wî guherandin, êdî kêmîr li wan cihan ku berê li wan dihat ditin derdiket, pîranîya demên xwe bi Govend ra derbas dikirin, bi îşkirinê ra guhdarîya wan çîrok û serpêhatîyên dûr û dirêj dikir ku Govend li ser jîyana xwe di kuçeya he-sinkaran û di nav hunermendên paytextê da vedigotin.’ (Elî, 2015, r. 87).

Em dibînin nivîskar karakterên xwe wisa karakterîze kirîye ku hay ji tevgerên wan ên berê û niha heye. Roman ji alîyê vegêr ve bi rewşa vegêrana şexsê

yekem hatîye vegotin. Ji ber vê yekê vegêr çiqas bixwaze bûyera ji bo me qiset bike jî nîşandan li pêş e. Di wan romanên da ku nîşandan li pêş e, meriv xwe wek camêr an canikeke wê cimaetê hîs dike. Her wext bihîstin û dîtînin ne heman tişt in. Ma bûyera ku meriv dibîhîse û ya ku meriv dibîne heman tesîrê li ser me dike? Helbet na! Dîtînin her wext meriv qanetir dike.

‘Tîrsa jîyana wê ya herî mezin ew bû ku bê jibîrkirin, her wisa jî bû, îro merivên me keçên taxê, ew xortên ku di zemanê aşiqîniya Perwane da komeke rewalên bi coş bûn, pir kêr wêneyê Perwanê li bîra wan maye, tenê kesek ku herdem li bîra wî ye, Rezayê Dilxweş e wî digot, ‘Jinek bû divîya bû di vê dewranê şer û agirbaranê da jidayik nebûba, ew jî wê ya naziktir bû, xwe li ber agir, ronahî û bageran bigre, wê xwe negirtibû, bûnewêreke dilmê bû, weke şerebeke ku pêşwext hatibe rûkirin dixuya. (Elî, 2015, r. 161)

Nivîskar di vir da bi zimanekî serdest û ‘gotara rasterast’ û ‘gotara nerasterast’ bi hevra hêraye, hem rewşa hişê karakteran dîyar dike hem jî bixwe hay ji hişê wan heye. Em bi bikaranîna gotara nerasterast ra dikarin bejin ku di hin cihên pirtûkê da vegêr, bûyer li gor ‘vegêrana îlahî’ ji bo me qiset kirîye. Nivîskar di nav rêzkirina bûyeran da hin alîyên karakterên xwe dinixumîne ku piştra hêdî hêdî derdixê pêş me. Di wê pirtûkê da ku bi bizava romantîzmê hatine nivîsîn, em dibînin ku nivîskar kareterekî baş afirandibe ji serî heta dawîyê ew karakter baş e û bûye lehengê her tiştî. Kesên nerind jî hertim nerind in. Lê dema em li van romanên modern dinîhêrin em dibînin ku ji serî heta dawîyê rûhîyeta karekeran diguhere û muphemîyek li ser karakteran e. Dibe ku carek da rehm dikeve dilê wî/wê û dev ji xerabîyê berde û bibe kesekî/ê baş an jî di serî da kesekî/ê gelek baş be bi carekî ve xerabîyekî dike yan jî derûniya wî xerab dibe zirarê dide xwe yan dide kesê derdorê xwe.

Di mesele ya karakterîzasyonê da teknîka herî zêde berbelav û hatîye ye qebûlîkirin ya Foster e. Foster karakteran wek karakterên dût û karekerên gilover ji hev cuda kirîye. Ya dût, yekalî kesekî di serî da çawa be, di dawîyê da jî wisa ye hem ji alîyê başî û xerabîyê hem jî ji alîyê fikr û ramanan ve. Ya gilover jî pir alî ye dikare li hemberê bûyeran helwest û fikrên xwe zû bi zû biguherîne. Di vê romanê da gelek karakter hene ku alîkar in wek Govend, Dilaram, Nesredînê Bêhnxweş û pir kesên din hene ku tevli serborîya Perwaneyê dibin û ji heman derdê muzdarîp in. Meriv ji bo wan karakteran baş têngîhêjin ku, bêjin gilover in an dût in. Lewra di hin cihan da dikevin nav meseleyê û di hin cihan da winda ne. Wan karakteran, tenê piştgirî dane Perwaneyê û bûne alîkar di wê rêya ku tê da dimeşe. Serlehenga romanê Perwane karaktereke dût e, ji serî heta dawîyê li ser xêzekî ye. Keçeke serhildêr e û bi qîymetdayîna fikrên xwe ra mecbûr dimîne ku ji mal bireve. Ji ber fikrên xwe û tevgerên xwe jîyana ku tê da ye ji bo wê bêhenas e. Bi hevalên xwe ra yên ku li ser heman fikrê

ne derdikeve rêyeke din û li ser vê rêyê jî canê xwe dide. Dema em li Xendanê dinihêrin keçeke newêrek e û ji rewş, tevger û halê rûhîyeta Perwaneyê xam e, bi reva Perwanê ra hay ji meselayan dibe û ew jî di nava wê beyabanê da, bi sertirsên xwe ve diçe. Lê meriv tam ténagihêjin ku gelo Xendan bi wêrekîya xwe, ji bêfamîya xwe û ji tirsên xwe mîyeserbû an bi saya guherîna rewşê ra. Karakterîzekirina Xendanê ji alîyê nivîskar ve wek karaktereke gilover hatîye afirandin.

Zeman û Mekan

Di her romanekê an jî di çîrokekê da îlhem zeman, saet, û mekan heye, bûyer bi saya van xalan tê rêzkirin. Nivîskar bi saya zeman û mekan ra dikare bûyerên xwe bihûne û dîsa zeman û mekan di serkeftûbûna romanê da piştî nivîskar qewî dike û alîkarîyê dide nivîskar. Nivîskar di bikaranîna wan da bi dilê xwe ye. Di romanan da bikaranîna zeman û mekan jî wek teknîkên din bi rewş, şert û mercan ra guherîye. Zeman û mekan di hin romanan da bi serê xwe bûye babet. Di pirtûkên klasîk da wek ramana bingeş bûyer giştîk li ser zeman û mekanê dihat hûnandin. Romanê peyama xwe di ser vê teknîkê ra dixwast bigihîne xwendevanan. Her çiqas em hertim zeman û mekanê bi hev ra bi nav bikin jî helbet ew ji hev cuda ne. Tekin li ser bikaranîna zeman û yekê dîyar dike û dibêje: “Di pirtûkên modern da zêdetir giranî li ser kesayet û şexsîyeta karakteran e, bi vê yekê ra zeman û mekan jî li gor vê yekê hatîye bikaranîn.” Zeman û mekan wek di pirtûkên klasîk da ne li gor kronolojîyê ye, ji dêvla vê yekê ra zemanekî psîkolojîk serdest e. Yanî ji dêvla nîşandana zemanî ra hîskirina wê derdixistine pêş. (Tekin, 2019, r. 121-123) Ew wiha lê zêde dike û dibêje: “Di romanên modern da sedemê bikaranîna zemanê tevlihev, ji ber vê yekê dizê ku nivîskaran xwestîye tevlihevîya dinyaya mirovan baştir bide ber çavan.” Bi bikaranîna zeman û mekan ra dixwazin rewşa rûhîyeta karakter an derûnîya wan baştir bide nîşandan.

“Wê şevê gava çenteyê xwe kom kirû got, ‘Êdî vê carê ez diçim.’ Şevêk bû ji şevên din ronîtir û aramtir bû, baxçeyê me ji her demeke din kûrtir razabû. Dîwar ji her demeke din bêdengtir bûn, xirexira bav û birayan nebe ku ji ricifîneke piçûk di hewayê fetisîya malê da çêdikir, tiştên din hemû bêdeng û xilmaş bûn.” (Elî, 2015, r. 33)

Di vir da mebesta nivîskar ne ew e ku xweşikî an şayesandina a rismekî ji bo zeman û mekanê bike, berevajî vê yekê ji bo çûyîna Perwaneyê bandortir bike ev şayesandin hatîye bikaranîn. Me got di her romanê an çîrokê da zeman heye lê nivîskar ne mecbûr e ku rasterast navnîşanekî binivîse û bide destê me. ‘Di metnên wek roman û çîrokê da dahûrîna zeman li ser sê xalan tê

kirin: Rêzik, mawe, frekans' (Alan, 2019, r. 126). Dema em ji alîyê rêzik ve li ser hûr dibin, em dibînin ku ne li gorî kronolojîyê ye ku me li jor jî behs kiribû bi teknîka *flashback*ê hatiye nivîsîn. Zeman li tu derê tam ne dîyar e.

"Dotira rojê li pêşber studyoya wî min ew girt, dinya baranek şirşirek ecêb bû" (Elî, 2015, r. 20). Wek di vê hevokê da û di pir cihên din da em rastê zemanek ne dîyar tên ku li ciheke din *"Nîveşeveke hênîk ya biharê bû gava di dawîyê de..."* (Elî, 2015, p. 31)

Nivîskar zeman dernexîstîye pêş ku li vir mesele jixwe ne zeman e, nivîskar li gorî daxwaza xwe zeman bi kar anîye. Di vegêranê da ku bi realîzma efsûnî hatiye nivîsîn, nedîyarbûna zemanî heye. Wek Alan û Tekin jî dîyar dikin *"Bûyerên ku di romanên da tên hûnandin zemanê qewîmîna bûyerê û zemanê gotarê heye."* Bûyerên ku diqewimin tu caran germegerm nayê behskirin. Bi zeman ra tê dagirtin û divê rojek bê vekirin û jê were xwarin. *"Lê mawe tu car tam nikare were tespîtkirin. Encax meriv bi ziman û helwestê dikare texmîn bike ew dema ku vegêr vegêranê qiset dike. Frekans rasterast bi helwesta nivîskarê zimanî an vegêr re eleqedar e ku ew di qisetkirina çîrokê da car bi car dikeve nav şîroveyan, teswîran, kurte an dubareyan. An jî ka nivîskar çîrokê qiset dike, nîşan dide ango sehne dike, li gor vê kategorîyê tê dîyarkirin.* (Alan, 2019, r. 126). Dema em li gor van navnîşanên Alan liser romanê hûr dibin em dibînin ku nîşandan li pêş e. Wek mînak; *"Nesredîn îro di studyoya xwe da tê û diçe destê xwe li gulên laylonî yên li ser masê dide û dibêje..."* (Elî, 2015, r. 161)

Bextîyar Elî, bi vegêrê bûyer bi hostetî daye neqilkin ku vegêrê xwe ji bo xwe kirîye berdevkekî xurt ku em di tu cihê da rastê şîroveyên nivîskar nayên. Di romanekî da rast lê hatina şîroveyên nivîskar bûyeran ji hev kut dike û tehma çêja romanê xerab dike.

Belê mekan jî wek zeman ji bo hûnandina bûyeran hêmaneke girîng e. Bivê nevé zeman û mekanê ku meriv tê da dijî li ser keseyat û derûnîya meriv tesîrê dike. Helbet herçiqas karakterên di roman û çîrokan da ji alîyê nivîskar ve hatibe afirandin jî, îlhem têkilîyeke wan bi jîyanê ra heye. Ger têkilîyeke wan bi rastîyê ra nebûya, dema em wan romanên dixwînin ma wê ewqas li ser me tesîr çêkîra? Em haydar in ji wan sikakên ku Perwane tê da derbas dibe, û bi saya tiştên tîne bîra xwe em ji fikr û derûnîya Perwaneyê û ji kesên li derdora Perwaneyê haydar dibin. Mekan li gorî daxwaza nivîskar hatiye bikaranînin ji bo hal û rûhîyeta karakterên xwe dîyar bike.

"Vêga gava diramim, dîzanîm Perwane di xeleka jiyana xwe ya tarî de bi awayekî berdewam li ronahîyê digeriya, ew tunela reş ya ku odayên tarî û korîdorên dirêj û xeter yên malê ew çêdikirin, jiyana wê guherandibûn ser

ger û evdaliyeke bêdawî li pey ronahiyeke nehênî û nenaskirî, pişt re ew kolanên dirêj bi ava baranê û herriya reş ya zivistanan, ew bahoza hedemî kuqet aram nedibû, germa dijwar ya tava havînan, avîya ku birayên wê li ser cihên we dihiştin, qêrîn û hawarên diya wê bi tiştên malê ve zeliqî bûbû.. hemû sedemiya wê bêzariya kujer bûn ku Perwane û rihê wê dihejandin. ' (Elî, 2015, r. 26)

Belê di vê hevokê da jî dîyar dibe ku nivîskar ji dêvla mekanekî berbiçav, bikaranîna mekana xwe di nava psîko-mekanê da hêraye.

Encam

Êvara Perwaneyê yek ji wan romanên Bextîyar Elî ye ku bi bizava realîzma efsûnî hatiye nivîsîn. Bextîyar Elî ev barê xwe bi saxlemî ji ser piştta xwe danîye. Hebûna karakteran di pirtûkê da çiqas zêde be jî ev zêdebûn hişê meriv tevlihev nake û ramana sereke ya romanê li pişt wan nahêle. Di romanê da bi saya Perwaneyê û hevalên wê yên dilsoz nasnameyeke xurt û wêrekî li ser jinê hatiye barkirin. Lê ji aliyekî din ve bi tevgerên meta wan û keçên metê, bi nezanî û fikrên wan yên hişk jî wan jinên ku di nava civaka me da bê ronî xwe bi fikrên tûnd ve digirin û xetereyeke mezin çêdikin û rûxandinê li ser derûnîya ciwanan dikan, xwe daye der ku bi vê yekê ra jî nasnameyeke nezanîne ji bo jinan li ber çavê me xêz kirîye. Bextîyar Elî her çiqas bûyerên xwe sîyasî-civakî nivîsîbe jî, ji aliyekî din ve meseleya derûnî-civakî jî li paş nehiştîye. Helbet eger mesele civak be, bê daxwaz derzên derûnî û sîyasî jî xwe di nava metnê da didin der.

Pirtûk bi zimanekî bala hatiye nivîsîn her çiqas dest avêtibe meseleyên civakî û rojane jî, jixwe şensê pirtûkeke bi realîzma efsûnî hatibe nivîsîn tune ye ku bi zimanekî ji rêzê were nivîsîn. Saloxandina karakteran û karakterîzekirina wan û bikaranîna zeman û mekan giştik li gor mebestê hatiye bikaranîn. Nivîskar bi piranî bi ser gotinê vegêr neketîye û bûyer li bin guhê hev nexistîye. Pîvana rastî û efsûnîyê bi serkeftî di romanê da bi cih kirîye. Ev pirtûk ji dema ku hatiye nivîsîn da ciheke hêja ji bo xwe dîtîye û ji aliyê xwendevanan ve bi meraq tê xwendin. Qurmê realîzma efsûnî di pirtûkên Bextîyar Elî da şax û şitil daye ku dema meriv ji aliyê teorîyê da li ser hûr dibe, serkeftîbûna wê li ber çavan dîyar dibe.

ÇAVKANÎ

Ahmedzade, H. (2011). *Romana Kurdî û Nasname*. Stenbol: avesta.

Alan, R. (2019). *Zanista Edebiyata Modern*. Stenbol: Peywend.

Arargüç, F. M. (2016). *Büyükü Gerçeklik*. Konya: Çizgi.

Elî, B. (2015). *Êvara Perwaneyê*. Stenbol: Avesta.

Özsevgeç, E. (2015). Büyülü Gerçekçi Kurgu Üzerine. *Uluslar Arası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, 188-193.

Rehim, S. (2019). Axaftina Bextiyar Elî ya ji bo Wergirtina Axaftina Nelly Sachsê. *Kovara Kund*, 6-7.

Sağlam, E. (bê dîrok). *Büyülü Gerçekliğin Tanımı, Tarihi Gelişimi ve Kavramsal Çerçevesi/ Büyülü Gerçekçilik*.

Tekin, M. (2019). *Roman Sanatı*. İstanbul: Ötüken.

DANASÎNA ÇEND XEBATÊN DI DERBARÊ QONAXA HAWARÊ DA

Seîd VEROJ, *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran BEDIRXAN (1913-1923)*, Diyarbakır, Dara, 2018.

Pirtûka Seîd Veroj ya bi navê *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan* çapa yekem, di sibat 2018an da ji weşanên Dara derçûye. Ev xebat, ronîyek e li ser xebatên sîyasî û civakî yê Emîn Alî Bedirxan, bi taybetî xebatên herdu lawên wî: Celadet û Kamiran Bedirxan. Di nava pirtûkê da 35 gotarên Bedirxanîyan hene. Naveroka van gotaran ronîyê dide ser tevgera netewî û sîyasî ya kurdîya di navbera salên 1918-1922an da. Pirtûk paşê li ser deh salên dawî yê Dewleta Osmanî sekinîye. Veroj, vê xebata xwe li ser dem û dewreya ber bi dawîya serdema 19an û destpêka serdema 20an çêkirîye. Di navbera wan serdeman da em rastî gelek şexsiyetên Bedirxanîyan tên, wekî, Emîn Alî Bedirxan, Abdurehman Bedirxan, Mîdhed Mîqdad Bedirxan, Şamîl Bedirxan, Xelî Rehmî Bedirxan, Necîp Paşayê Bedirxanî, Surreya Bedirxan, Celadet Bedirxan û Kamiran Bedirxan. Ev şexsiyetên ku hatin jimartin, di xebatên sîyasî, rêxistinî, çandî û dîplomasîyê da, wê demê bi nav û deng bûn. Armanca vê xebatê; bi bîrxistina rola Emîn Alî Bedirxan û ya zarokên wî ye di nav tevgera sîyasî û civakî ya Kurdistanê da. Pirtûk bi gelemperî li ser xebatên Celadet û Kamiran Bedirxan disekine, yê di navbera salên 1913-1923yan da. Di navbera wan deman da, nivîskêr herî zêde berê xwe daye ser xebata wan a piştî salên 1918an û nivîsên wan ên di rûpelên rojnameyan da yê wekî *Serbestî, Türkçe İstanbul û İctihad*.

Xebat ji du beşan pêk te. Beşa Yekem bi kurdî ye û li ser Emîn Alî Bedirxan (1851-1926), Celadet Bedirxan (1893-1951) û Kamiran Bedirxan (1895-1978) rawestîyaye. Beşa Duyem bi tirkî ye û li ser nivîsên Celadet û Kamiran Bedirxan sekinîye. Du girîngiyên wan deman hene; ji alîyê ve rêxistinên civakî

û neteweyî yên dema nûjen tîn saz kirin, ji alîyekî din ve jî xebatên nivîs û çapemenîyê derdikevin pêş. Beşa yekem ji sê sernavan pêk te. Sernava ewil li ser Emîn Alî Bedirxan e. Nivîskar di vê beşê da behsa jîyan, tevger û serpehatîyên Bedirxaniyan dike. Ji serhildana malbata Bedirxaniyan heya li ser tevgerên wan ên sîyasî û sirgûnî disekine. Sernava duyem Celadet Bedirxan û ya sêyem jî Kamiran Bedirxan e. Em di vê beşê da dibînin ku herdu birayên Bedirxanî tevli Şerên Balkanê û Cihanê bûne. Celadet Bedirxan di pêvajoya Şerê Yekemîn da, bi wezîfeya zabîtê îhtîyatê li Iraqê, başûrê Kurdistanê, Kafkasyayê û ciyên din da karê leşkerîye kirîye. Em di wan beşan da li rastî bîranîn û nirxandinên Celadet, yên li ser tevger û bûyerên wê demê tîn.

Nivîskar di bin sernava Celadet Bedirxan da, xebatên li ser ziman û berhemên nivîsandî yên kurdî û rabîhûrîya bikaranîna alfabeya latînî, kovar û çapamenîya kurdî rawestîyaye. Beşeke girîng a weşanên wê demê, nivîs û gengeşeyên li ser xebata ziman û berhemên kurdî ye. Di vê çarçoveyê da; ji çapkirina berhemên klasîk yên kurdî, heta nivîs û nûçeyên di derheqê xebatên rêxistinên çandî û sîyasî yên kurdan da, herwiha, sansura li ser zimanê kurdî, meseleya şêwe û dîyalektan, hewldanên li ser standartkirina zimanê kurdî, çêkirina elfabeyê nû, babetên tewr girîng ên nivîs û nivîskarên weşanên wê demê tîne zimên.

Em di pirtûkêda dibînin ku Celadet û Kamiran Bedirxan ev herdu bira, herî zêde bi xebatên xwe yên li ser ziman û çanda kurdî hatine naskirin. Ev dirûvên wan, ji ber xebatê çandî û dîplomatîk yên piştî rawestandî û cudabûna ji Xoybûnê ye. Salên pêşîn yên ciwanîya wan ne têda, ji salên 1918 bigirin heya 1932an, pîranîya xebatên wan li ser sîyaset û rêxistine bûne. Di vê xebatê da, bi giranî li ser deh salên pêşîn yên wê têkoşînê, li ser dema navbera salên 1913-1923an hatîye lêkolînkirin. Bêhtir li ser nivîsên wan ên di nav rûpelên rojnameya *Serbestî, Türkçe İstanbul İctihad'*ê de hatîye rawestandî. Celadet di rojnameya *Serbestîyê* da dibe redaktorê alîkar, Kamiran jî wek nivîskarê herdemî kar dike. Herdu birayên Bedirxanî di rojnameyê da bi tirkî dinivîsin. Agahîyên din yên li ser wan ji bîyografiyan pêk tê.

Dema em nivîsên herdu birayên Bedirxanî yên di rojnameya *Serbestîyê* da mêze dikin, em fahmdikin ku ew di bin bandora fikra Osmanîparêzî û Îslamîparêzî da mane. Herî zêde Kamiran Bedirxan di bin bandora Îslamîparêzîyê da maye. Herdu bira di rojnameya *Serbestîyê* da bi tirkî nivîsandine. Nivîskar dibêje Celadet nameya xwe ewil di rojnameya *Serbestîyê* da nivîsandîye. Di vê nameyê de, naverok wiha hatîye nivîsîn;

“Daxwaz dike ku rêvebirên Meşrûtiyetê, divê dema teng û qrîza aborî de, dawî li wî halî bîne yê ku ji dewra îstîbdatê mayî.”(r. 40).

Dema ku me nivîsên herdu Bedirxanî xwendin, pirs di hişê meda çêdibin. Çima bi kurdî nanivîsîn û hişmendîya neteweyî çima hingî dernayê? Herdu bira xilasîya Kurdan bi xilashûna dewleta Osmanî dibînin. Ne ku rewşa kurdan nayîne zimên, helbet anîne zimên lê bele bi hişmedîyeke Osmanîparêzî û Îslamîparêzî. Paşê ji ber hin sebebên fikra wan tîne guherîn. Celadet Êdî ji bo zimanê kurdî dixwaze tiştinan bike. Mîna kovara *Hawarê* bi nivîsandina alfabeya latînî, xebata li ser *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî hwd. Gengeşeyên li ser standartkirina zimanê kurdî, şexsîyetê wê demê tenê wekî alfabetîk fikirîne. Xetereyên piştî standartkirina zimên neanîne berçavên xwe. Di pirtûkê da dema nivîsên herdu birayan hatine wergerandin zimanekî qels û peyvên tirkî bikar anîne. Di nameyekê de, em dikarin nêzikî deh peyvên tirkî bibînin. Helbet ger kurdîya wan peyvên nebe dikare peyvên tirkî bikarbîne, lê belê peyv ku bi tirkî hatibû nivîsîn hêsan bûn û kurdîya wan peyvên tirkî jî hene.

Dilawer ZERAQ, *Bêjara Neteweparêz Di Kovara Hawarê De*, Diyarbakır, Lîs, 2018.

Dilawer Zeraq, xebata wî ya bi navê *Bêjara Neteweparêz Di Kovara Hawarê De*, çapa ewil 2018, ji weşana Lîsê derçûye. Ev xebat wekî tezeke mas-tirê hatîye amadekirin û derpêşkirin. Di vê xebatê da, nivîskar pêşî ji bo danîna bingeha teze, piştê bi kurtasî têkilîyên têgehên modernî, netewe û neteweparêzîyê analîz dîke. Nivîskar piştî ku bingehê teze ji bo xebata xwe çêdîke, pêşî li ser serdema afirîna neteweyan lêkolîn dîke. Her wiha armanca lêkolîna nivîskêr, ew e ku nîşan bide wan qonax û sedemên netewebûnê yê ku di ser gelên etnîkî ra û di ser afirandina neteweyan ra pêk tîne. Ev her sê sernavên bingehî ev in: yek “Modernbûn Neteweparêzî û Ziman”, du “Jêderkên Neteweparêzîya Kurd”, sê “Kovara *Hawarê*”. Bêjar wateya wê ‘awayê gotinê ye ku bi hingivandina armançê te gotin.’ (Bi tirkî, *söylem*, bi îngîlîzî: *discourse*).

Sernava ewil “Modernbûn Neteweparêzî û Ziman” di vê beşê pêşîyê de li ser modernbûnê radiweste. Nivîskar dibêje “Gelo destpêkeke modernbûnê heye an na?” pîrseke berbelav û bêbersivmayî ye. Her wiha em nikarin behsa demojayêke diyarkirî a modernbûnê bikin. Lê belê li ser kirûya modernbûnê raveyên pîr cure hene. Her wisa nivîskar, riwangeyên cuda ên pênaseyên modernbûnê bi me dide danasîn. Li gorî hin kesan destpêka modernbûnê heye, lê belê hê jî gengeşe hene li ser van destpêkan. A. Gidden dibêje ku “*destpêka modernbûnê sedasala 17. e*” li beramberî wê gotine Peter Wagner jî dibêje ku “*mirov dikare sedasala 18. wekî destpêke qebûl bike.*” Zeraq van gotinan wisa rave dîke “*Di vê biwarê da ji ber ku hin têgih tîne bikaranîn*

da ku bikaribin pêşdemên dîrokî, ên wekî Ronakbûn, Şoreşa Endustrîyê, Şoreşa Fransî, Ronesans û Reform û paşdem bèn diyarîkirin; ew dem wekî 'gerdîş' û 'modern' tèn derbirandin. Di analîzên modernbûnê da jî herdu têgihan, têgihên gerdîş û modern, pîr zêde havil tê girtin. Ji ber ku civakên Rojavayê, ev demojaya guherîn û jihevkartêgirtinê di 400 salan da temam kiriye." Lê belê dîsa jî di her rewş û wezîyetê de, cudabûna gerdîş û modernê bi gelemperî di bin çarçevoya teorîk da dimîne. Her wiha nivîskar, pêşdemên dîrokî yek bi yek îzah dike. Nivîskar di vê beşê da pêşî li ser pênaseya netew û neteweparêzîyê jî disekine. Piştî li ser raman û îdeolojîya netewparêzîyê radiweste. Netewparêzî, bi wateya xwe a modern ve: "Serê pêşîn wek îdeolojîyekê di nav sînorekî terîtoriyal (axeke dewletî a sînokirî), bi pêşda tê û bi xwe re wek paldêneke meşrûbûnê, kirûya neteweyê avadike." Her wiha li ser netewparêzîyê gelek raman û îdeolojîyên cur bi cur hene. Nivîskar, li ser girîngîya ziman jî radiweste. Li gor Herder "Tiştê ku mirov dike mirov, ziman e." Di heman demê da em di ramanê da jî vê yekê dibînin. Mirovbûn ew wate ye ku zimanekî te heye û tu bi wî zimanî ra di nava civakêda diji.

"Jêderkên Netewparêziya Kurd" sernava duyem e. Di vê beşê da nivîskar behsa serhildanên kurdan dike ku di dema Osmanîyan da pêk hatine. Serhildanên ku wê demê qewimîne; Serhildana Mîr Bedîrxan, Serhildana Şêx Ubeydullah û Serhildana Koçgirî. Piştî serhildanan nivîskar, tevgerên rewşenbîrîya kurd di dema Osmanîyan da rave dike. Di dema Osmanîyan da, ji alîyê rewşenbîr û xwendevanên kurdan ên wê demê ve çend komele û weşan hatine avakirin. Armanca wan cemîyeta di nav dewleta Osmanî da ew e ku yekîtiyeke kurdan û kurdbûnekê çêbikin. Her wiha van cemîyetan ji weşandina kovar û rojnameyan heya avakirina dibistanan jî ji xwe ra kiribûn armanc. Rewşenbîrên wê demê bi weşan û waran da bêjara neteweparêz bi kar tînin. Nivîskar weşanên wê demê bi awayekî kronolojîk bi me dide danasîn. *Kurdistana*, *Rojî Kurd*, *Yekbûn*, *Hetawî Kurd* û *Jîn*. Cemîyeta Teavûn û Terakkî Kurd û Cemîyeta Hêvî ji alîyê rewşenbîrên wê demê hatine avakirin.

"Kovara *Hawarê*" sernava sêyem e. Nivîskar di vê beşê da kovara *Hawarê* analîz dike. Pêşî mercên dîrokî ên derketina kovara *Hawarê* ravedike. Bi pêşengîya Celadet Bedîrxan û hevalên wî kovara *Hawarê* 15ê Gulanê di 1932an da li Şamê derdikeve. Êdî dest diavêjin pênûsê, ew dê her tiştî bi hêza pênûsa xwe biafirînin. Pênûs vê carê reng, dirûv û awayê xebata xwe a di biwara netewparêzîyê da diguherînin, ew êdî zêdetir xebatên xwe bi biwara nivîskîda pal û bala xwe didin ser avakirina neteweya kurd. Nivîskar piştî li ser naveroka kovara *Hawarê* disekine. Wan nivîskaran yek bi yek bi me dide nasîn. Her wiha armanca sereke ya kovarê, zimanê kurdî ye. Celadet armanca

xwe ya sereke wiha tîne ziman; “*Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide naskirin. Lewma ko ziman şerta heyînê a pêşîn e.*” Balê dikişîne ser girîngîya zimên, hebûna neteweke bi zimanî çêdibe. Her wiha mijarên kovarê yên din, *Al û Welat, Sirûd, Cografya û Etnografya, Folklor û Çand, Bîr û Baweriyên Gel* in. Nivîskar di vê beşê peyvên ku wek sembola di helbestên kovara *Hawarê* da derbas dibin bi me dide danasîn. Ji ber çî û bi çî awayî bikaranîna sedeman yek bi yek vedibêje û analîz dike. Wekî mînak, Felat bi wateya rizgazbûne bi kar anîne.

Wekî encam em dikarin bibêjin ku kovara *Hawarê* di warê xebat û çalakîyên xwe da ji weşanên serdema Osmanî cuda ye. Kovara *Hawarê* bi kurdî derdikeve û rewşenbîrên kovara *Hawarê* zimên wekî hebûnê qebûl dikin. Lê belê weşanên serdema Osmanî hebûna xwe bi hebûna dewleta Osmanî dîyar dikirin. Her wiha weşanên serdema Osmanî kêma û qels mane. Zimanê wan weşanan bi du zimana bû. Lê belê *Hawar* bi kurdî bû, ji alîye xebatên xwe ve, *Hawarê* ji bo gelê kurd gelek tişt kirine. Lewra kovara *Hawarê* bi rol û kartêke li ser gelê kurd erênîyek çêkirîye.

Mahmûd Lewendî û Nedîm Baran (amed.), *Nameyên Nûredîn Zaza, Istanbul, Rûpel, 2019.*

Pirtûka bi navê *Nameyên Nûredîn Zaza*, çapa yekem 2019, ji weşanxaneya Rûpelê derçûye. Di pirtûkê da nameyên ku Nûredîn Zaza nivîsandine ji bo Hemreş Reşo û Hoşeng Sebrî wekî pirtûk hatîye çapkirin. Mahmûd Lewendî û Nedîm Baran ev pirtûk amade kirine. Nûredîn Zaza di nameyên xweda him li ser rewşa xwe disekine him jî rewşa çandî, hunerî û sîyasî ya wan salan bi me dide naskirin. Nûredîn Zaza di sala 1919an da li bajarê Madenê hatîye dinyayê. Jîyana Nûredîn Zaza di sirgûniyê da derbas dibe. Nûredîn Zaza li Şamê Ekrem û Qedrî Cemîl Paşa, Celadet û Kamûran Bedirxan û gelek kurdên din nas dike. Her wiha di nav rewşebîrên kurdan da ye û di dewra duyem a kovara *Hawarê* da ew jî dibe yek ji nivîskarên kurd yên kovara *Hawarê*. Nûredîn Zaza di kovara *Hawarê* da gelek nivîsan dinivîse. Ji alîye nivîsê ve nivîskarekî gelekî xurt e. Her wiha Celadet Bedirxan ji bo xurtbûna Nûredîn Zaza wiha vedibêje: “Nûredîn Zaza Çehovê Kurda ye.”

Bi weşandina wan nameyan ra em jîyana Nûredîn Zaza ya ji salên şestî heya salên nodî nas dikin. Dema ku mirov nameyên Nûredîn Zaza dixwîne yên ku wî ji bo Hemreş Reşo û Hoşeng Sebrî nivîsandine, merivdibîne bê Nûredîn Zaza çi qas zehmetî kişandîye. Nûredîn Zaza ji bo ku pardanîya dibistana kurê xwe bide, kemana kurê xwe firoştîyê û ji alîyê aborîyê ve gelek zehmetî kişandîye. Nivîskar, rewşenbîr û ronakbîrê kurd Nûredîn Zaza, ji bo kurd û Kurdistanê,

ji bo ziman û çanda kurdî, gelek xebatên hêja kirine. Di nameyekê de Nûredîn Zazayê ku ji bo Hemreş Reşo nivîsandîye, ji bo ku çanda kurdî bi Ewropîyan bide danasîn, pêşangehekê amade dike. Di nameyê da wiha dibêje: *“Ez li vir, bi hevaltiya xanimeke swîrî ku xudî mexeze ye, peşraxistiyêke kurdî (sergi) pêk tînim. Li ser “artisanat” ya kurdî, heçî bi deste kurdan çêdibe, ku bikeve destê me, emê deyninê de. Me hin cil, tûrik, bazin û guhar li Libnanê kirîn. Pêşraxistiyêke me, wê di 11ê meha têda çêbibe. Em dixebitin ku sêlikekê jî derêxin (stranên kurdî).”* Ne tenê di vê nameyê da, di gelek nameyan da, em li rastî xebatên Zaza yên wiha tên. Di nameyan da ji hevalên xwe, metelok, mamik, stran û hwd. dixwaze û di kovarên swîsrî da çap dike. Her wiha Nûredîn Zaza, di nameyên xwe da wekî sîyasetmedarekî kurd li ser rewşa Kurdan û rewşa rêxistin, têkilî û nakokiyên di navbera perçeyên Kurdan da, dîtî û fikrên xwe ji hevalên xwe ra dinivîse. Zaza di nameyên xwe da dibêje ku gelê Kurd ji bo ku ji bin bindestiyên dargirkeran xilas bibin, divê pêşî bibin yek. Ji her aliyê ve ji bo gelê Kurd yekîtîyê dixwaze.

Zaza, hin nivîsên wî di van nameyan da hene ku ji bo di kovaran da bê weşandin ji Hemreş Reşo ra dişîne. Di nameyên xwe da Zaza, ji hin hêlan ve li ser standarkirina zimanê kurdî disekine. Hemreş Reşo kovareke kurdî derdixe. Nûredîn Zaza jî ji bo ku bi zimanekî dûrist kovar bê weşandin, hin tiştan pêşniyarî Hemreş Reşo dike: *“Berî çend rojan Şêxmûs ji Çiya re anibû. Min ew bi dilxweşî xwend. Lê, ji aliye zimên û ji yê nivîsandinê hîn gelek tişte hene ku divê bêne rastkirin. Berî her tiştî pîrsa “Çiya” divê “Çiya” be. Di kurmançî da “î” berî “y” dibe “i”, “ê” dibe “e” û “û” jî dibe “u”.*”

Di dawîya pirtûkeda Kemal Cemîl Seydo û Samî Ehmed Namî raman û bîranînên xwe yên li ser Nûredîn Zaza nivîsandine. Herdu jî Nûredîn Zaza ji nêz ve nas dikin.

Her wiha di pirtûkêda danîna wêneyên nameyên Nûredîn Zaza, nivîskar û stranbêjên ku di nameyên da derbas dibin yek bi yek nîşan dana wan xwendina pirtûkê xweştir kirîye. Her wiha di nameyan da bersivên Hemreş Reşo û Hoşeng Sebrî nehatine weşandin. Ger bersivên wan di pirtûkê da hebûya dê xweştir bûbûya.

Ronayî ONEN, *Ziman û Netewesazî. Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê, wergera ji îngilîzî Şehmuz Kurt, Istanbul, Peywend, 2017.*

Xebata Ronayî Onen a bi navê *Ziman û Netewesazî Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*, çapa ewil di 2018an de, ji weşana Peywendê derçûye. Ev xebat teza lîsansa bilind a Ronayî Onen e. Wergera jî Îngilîzî ji aliyê Şehmuz

Kurt ve hatiye çêkirin. Xebat ji xêncî pêşgotin û destpêkê ji du qisman pêk tê. Qisma ewil ji du beşan, qisma duyem jî ji sê beşan pêk tê.

Di beşa yekem ya qisma ewil da, bi sernavê “Çarçoveya *Teorîk û Rêbazî*”, bi gelemperî behsa neteweperwerîyê û pênaseya neteweperwerîyê kirîye. Nivîskar rola rewşenbîran a di pêvajoya avakirina neteweyekê da di vê beşê da nîqaş dike. Her wiha ji alîye neteweperwerîya sîvîl û neteweperwerîya çandî li ser nîqaşên neteweperwerîyê disekine. Rola ziman a di avakirina neteweyekê da jî nîşan dide. Di beşa duyem ya qisma ewil bi sernavê “*Paşxaneyê Dîrokî*” li ser hin weşanên girîng disekine yên ku berî serdema *Hawarê* hatine çapkirin. Nivîskar wan weşanan bi awayekî kronolojîk dide danasîn. *Kurdistan* rojnameya yekem destnîşan dike, piştî *Teavûn ve Terakki Gazetesi* (Rojnameya Alîkarî û Pêşveçûna Kurdistan) komeleya ewil e ku ji bo pêşvebirina nasnameya kurdî hewl daye, *Rojî Kurd-Hetawî Kurd* ev herdu kovar jî, di nava rewşenbîrên Kurdan da bûn sedema hişyarîyeke çandî û etnîkî. Di dawîyê da jî kovara ‘*Jînê*’ dide danasîn. Nivîskar ji bo ku xebata xwe piştrast bike ev beş veqetandîye. Wê demê di wan rojname û kovaran da “perwerdeya kurdan” hilgirtibûn ser milê xwe da ku neteweya kurd “hişyar” bikin. Di wan rojname û kovaran da wiha dihat îfade kirin. Lê belê em têdigihişin tenê bi vegotine mane, derbasî pratîkê nekirine. Ji ber vê girîngîya kovara *Hawarê* di vir da dixuyê.

Qisma duyem, ji beşên sêyem, çarem û pêncem pêk tê û şeweya esil ya xebatê pêktîne. Her sê beşên qisma duyem, di çarçoveya kovara bi kurdî *Hawarê* da, berê xwe didin girîngîya zimên di newetesazîya kurd a vegotinî da. Di beşa sêyem da, nivîskar berî ku derbasî mijarê bibe, avakirina ekola *Hawarê* wiha tîne zimên “*Neviyê Bedîrxan Beg, Celadet Elî Bedîrxan piştî têkoşîneke dîrûdirêj a siyasî bi hinek hevalên xwe re biyar da ku ji bo xatirê ‘qelem’ê dev ji ‘xençer’ê berdin. Bedîrxan pêwîstî pê heye ku di nava kurdan da hesta dilsoziyê pêk bînin û ji bo serfiraziyê diviya zimanê bê venûkirin, perwerdeya kurdî bê bipêşvebirin û her wiha bê vejandin. Ji bo ku biryara xwe bi cih bînin komeke rewşenbîran bi pêşewatiya Celadet Bedîrxan li Şamê dest bi weşandina kovara *Hawarê* kir.*” Di vê beşê da nivîskar li ser jîyana Celadet Bedîrxan û wê pêvajoyê radiweste. Ew pêvajoya ku Celadet, ber bi biryara derxistina kovarekê ve birîye. Her wiha jîyana xwe ya mayîn, bi xebatên pêşvebirina zimanê kurdî ve derbas dike. Di vê beşê da, piştî li ser çîroka derxistina kovara ‘*Hawarê*’ û naveroka wê disekine. Onen, nivîskarên ekola *Hawarê* yek bi yek bi me dide nasîn. Di 15 Gulana 1931an da, komeke rewşenbîren kurd bi pêşengîya Celadet Bedîrxan ve hejmara yekem a kovara *Hawarê* (1932-1943) çap kirin û îlan kirin ku ew dê zimanê xwe bi pêş ve bi-

xin lewre li gorî wan ‘ziman şerdê bingehîn ê hebûne miletekî bû.’ Nivîskarên ekola *Hawarê* mebestên xwe yên di derbarê çand û nasnameya kurdî da wiha diyar kirine: “(...) *belav kirina alfabeya kurdî; senifandin û çapkirina kurdî; xebateke beravirdî ya li ser zaravayên cuda yên zimanê kurdî, çapkirina berhemên klasîk û folklorê kurdî; pênasekirina taybetmendiyên mûzîka kurdî ya kevnare; çapkirina xebatên etnografîk ên li ser kevneşopiyên kurdî û çapkirina xebatên dîrokî û ernigarîya Kurdistanê.*” Ji nav van xalan, belavkirina zimanê kurdî ya bi alfabeya latînî, armanca sereke bû.

Di beşa çarem da, nivîskar li dû şopên netewperwerîya zimên ya kadroya *Hawarê* û rewşebîrên wê demê diçe, her wiha wan dinirxîne. Di vê beşê da em fahm dikin ku rewşebîrên wê demê dîtine ku avakirina nasnameyê neteweyî tenê bi zimanê kurdî çêdibe. Ger ziman nebe, em nikarin behsa tu neteweyekê bikin. Lewra, ziman hebûna neteweyekê ye. Ekola *Hawarê* nîşanî me dide ku ziman di vê pêvajoyê da roleke sereke dilîze. Rewşebîrên wê demê yên Tirkîyeyê dibêjin ku zimanê kurdî ji tirkî pêk tê û zaravayekî zimanê tirkî ye. Rewşebîrên ekola *Hawarê*, ji wan rewşebîrên ra dibêjin ku zimanê kurdî ji zimanê Tirkî pêk nayê. Her wiha rewşebîrên kurd ji dîroka zimanê kurdî ra argûmenteke dij-kolonyal av kirine. Xebatên rewşebîrên kurd yên *Hawarê* li ser zimanê kurdî dikarin wekî hewldanên zimanî yên dij-kolonyal bîn dîtin. Ji ber ku wan dixwest li hemberî dîskûrsa dagirkeran berxwedanekê pêk bînin.

Bi beşa pêncemîn, xebata nivîskar temam dibe. Nivîskar, di vê beşê da mijarên din ên kovara *Hawarê* ku di netewesazîya kurdî da hatine bikaranîn, analîz dike. Mijarên kovara *Hawarê* yên din; *Welat: ‘Neteweyîkirina’ Xakê, Ala Kurdî, Bilindkirina Rabirdûya û efsanewîkirina kesayetên dîrokî, Gaziya Yekîtî, Hevgirtin û Hevalbendîyê, Dîn* in. Nivîskar van mijaran yek bi yek bi sebebê wan vedibêje û bi nivîs û helbestên nivîskarên kovara *Hawarê* wan nîşanî me dide.

Ji serî heta biniya xebatê, em fahm dikin ku hebûna neteweyekê bi zimên çêdibe. Ji bo zimên, ekola *Hawarê* kedeke mezin daye. Onen bi xebata xwe ve, fikrên rewşebîrên wê serdemê û armanca wan tîne ber çavê me. Temamê nivîskarên kovara *Hawarê* xebatên welê li ser zimên kirine ku ew xebat wekî hewldanên zimanî yên dij-kolonyal dikarin bîn fahmkirin. Lewra wan dixwest li hemberî vegotinên dagirkeran berxwedanekê pêk bînin. Nivîskarên kovara *Hawarê* gişt mêr bûn. Weke jin, tenê Rewşen Bedîrxana xanima Celadet, di kovara *Hawarê* da du nivîs nivîsandine. Helbet mirov ji dil dixwest ku jinên kurd zêdetir bûyana, we baştir bûya. Lê belê rewşa wê demê ji xwe dîyar bû.